

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**



**Rengdanên Ola Îslamê ya Di Helbesten Nalî De**

**ARAM MUHALDIEN AL BARAZANJI AL BARAZANJI**

**15950001076**

**Şêwirmend**

**Alk. Doç.Dr. KEMAL KAYA**

**WAN- 2017**

T.C.

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Yüksek Lisans Tezi**



**İslam Din'inin Nalî'nin Şiirlerindeki Yansımaları**

**ARAM MUHIALDIEN AL BARAZANJI AL BARAZANJI**

**15950001076**

**Danışman**

**Yrd. Doç.Dr. KEMAL KAYA**

**VAN – 2017**

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**



**Rengdanên Ola Îslamê ya Di Helbesten Nalî De**

**ARAM MUHIALDIEN AL BARAZANJI AL BARAZANJI**

**15950001076**

**WAN- 2017**

## ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada (Rengdanên Ola Îslamê ya Di Helbesten Nalî De)

Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi.

Tüm bilgi belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumumu.

Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi.

Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı.

Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak hayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

## Naverok

Kurte.....	vii
Özet .....	viii
Abstract .....	ix
Pêşgotin .....	xi
Despêk.....	1
1 JIYANA NALÎ, REWŞA SERDAMA NALÎ, NAVEROK Û AWAYÊ HELBESTÊN WÎ .2	
1.1 Jiyana Kesî ya Nalî.....	2
1.1.1 Nasnavê Helbestvan .....	4
1.1.2 Ligel Nalî Heskirin .....	8
1.2 Rewş Civakî di Dema Nalî da .....	12
1.2.1 Beşek ji Jiyana Civaka Kurdan.....	12
1.2.2 Beşek ji civakan Kurdewarî da Dema Nalî da Jiyana.....	13
1.2.3 Jiyana Xwendekarî û Rewşenbîrî di Dema Nalî da .....	15
1.2.4 Di Serdema Nalî da Rewşa Abûrî.....	17
1.3 Naveroka Helbestên Nalî.....	18
1.3.1 Naveroka Helbestên Nalî.....	19
1.4 Zimanê Helbesta Nalî .....	28
1.4.1 Zimanê Helbestê .....	28
2 PEYWENDIYÊN DI NAVBERA OL Û WÊJEYÊ DE.....	38
2.1 Helwesta Îslamiyetê ya Beramberî Helbest û Helbestvan .....	39
2.1.1 Helwesta Qur-anê ya Beramberî Helbest û Helbestvan.....	39
2.1.2 Helwesta Pêximber (S.A.S) Beramberî Helbest û Helbestvan .....	43
2.1.3 Pêximber (S.A.S) û Helbest.....	45
2.2 Ola Îslamê li Ser Helbestvanên Kurd Bandora .....	46
2.2.1 Mizgeft û Hucre Dibistana Helbestvanên Kurd Bûn .....	48
2.2.2 Feqe û Qonaxên Feqatîyê .....	49
2.2.3 Feqe, Helbest û Helbestvanî .....	52
2.2.4 Perwerdeya Ayînî Ligel Hinek Helbestvanên Kurd .....	54
2.3 Perwerdeya Ayînî y Nalî .....	57
2.3.1 Kurd û Ola Îslamê.....	57
2.3.2 Perwerdeya Ayînî y Nalî .....	58
2.4 Bandora Nalî li Ser Helbestvanên Serdema Xwe û Yên Piştî Wî .....	68
2.4.1 Bandora Nalî li ser herdu heval û hevserdemên xwe yên.....	70

2.4.2	Bandara Nalî li Ser Berhemê Helbestvanên din ên li navçeyên din ên Kurdistanê yên	73
2.4.3	Bi Dîtina Helbestvan Nalî.....	78
3	AYÎNA ÎSLAMÊ Û CIHÊN PÎROZ DI HELBESTÊN NALÎ DE .....	82
3.1	Qur-an Weke Çavkaniya Helbestê Ligel Nalî .....	83
3.2	Gotinên Pêximber û Pêximber Weke Çavkanî Ligel Helbestên Nalî.....	96
3.3	Kesayetiya Bawermendan Weke Çavkaniya Helbestan Ligel Nalî.....	106
3.4	Cih, Dem, Vexwarin, Kereste û Kelûpelên Ola Îslamê Weke Çavkaniya Helbestên Nalî	115
	Encam .....	128
	Çavkanî.....	130
	Xwe jînenîgarî .....	137

## **Kurte**

Navê Nalî yê tamam, Xidir Kurê Ehmedê Şaweysê Mîkayliye. Li derdora salên 1797'an li gundê Xak û Xol ji dayîk bûye. Ev helbestvan yek ji damezirînerên dibistana bingehê helbesta klasîka Kurdî ya li navçeya Baban e. Nalî ji bo helbestvanên serdema xwe û piştî xwe jî çavkaniyeke fikrî bû. Ev helbestvan di warê awayê helbestê û peyvên de, kesayetiyek jîr û jêhatî bû. Herwekî di helbestên wî de diyar dibe, bi endazyariyek bêhempa listikê bi peyv û wateyan dike. Di warê naverokê de jî gelek mijar vejandiye û ji wan jî; helbesta dildarî, helbesta wesfî, helbest, ayîna helbestva nîştîmanî û helbesta civakî. Ji ber ku Nalî despêka xwendinê li mizgeft û hucreyan destpê kiriye, kesayetiyek ayînî bû. Her ji despêkê ve bandora ayînî û ola Îslamê, bi taybetî Qur-an û gotinên Pêxember (S.A.S) li ser bû. Ji ber vê yekê jî timî sûd ji Qur-an û gotinan wergirtiye û kiriye bingehê helbestên xwe. Li vir bi destnîşankirina tekstên helbestan û berhevkirina wan a ligel Qur-an û gotinan, nêzîkatî û dengvedna ola Îslamê bi helbestên Nalî ve derdikeve.

## Özet

Nali'nin tam olarak adı Xıdır oğlu Ahmed Şaweysî Mikayîl'dir. 1797 yılların da bir köy evinde dünyaya gelmiştir. Şair, Baban bölgesinin Kürt klasik okulunu temellendiren kurucu isimlerden biridir. Nali kendi döneminin şairlerini ve kendinden sonrakî şairlerin önemli bir esin kaynağı olmuştur. Şairin şiir kurgusu ve tümce kurgusu ile oldukça yetenekli ve özel biri olduğu kesindir. Şiirlerin de de görüldüğü gibi, bir mühendis gibi kelimeler ve anlamları ile oynamasını çok iyi bilen biridir. İçerik olarak da birçok konuyu dirilmesini bilmiş ve bunlardan da bazıları şöyledir: aşkın şiiri, övgü şiiri, şiir, yurtseverlik dininin şiiri ve toplumsal şiir bunlardan bazılarıdır. Nali okumaya ilk olarak cami ve hücre evlerin de başladığı için, kendisi de dini karakterde bir kişiliktir. Başlangıçtan itibaren din'in ve islam dininin ve özellikle de Kur'anın ve peygamber (S.A.V)'in etkisindedir. Bundan dolayı da Kur'an terminolojisinden oldukça faydalanmış ve kendi şiirlerinin temel kaynağı haline getirmiştir. Bu yazı da Nali'nin şiirlerine yer vererek Kur'an dan yapılan alıntılarını ve Kur'ana olan yakınlığı ele alınarak, islam din'inin Nali'nin şiirlerindeki yansımaları yalın bir şekil açığa çıkarmıştır.



### **Abstract**

The full name of the so called kurdish poet Nali is 'Mullah Xidir Ehmed Shawaysi Mikaili' who was born around 1797 in a village named Khaku-khol. He is one of the pioneers of establishing the Kurdish Classic Poetry school in Sulaimaneya region. He was considered as a theoretical conceptual source for his contemporary poets. Furthermore, he precisely paid attention to connotation and denotation in his poetic style, and the thematic patterns of his poems contained romantic, religious, praising, social, and patriotic themes. Nali began his academic education at a dedicated prayer room (Hujra) inside a mosque, and thus he became a religious person as he was affected by the Holy Muslim scriptures including Quran and Hadith. Eventually, because of his religious background, he was inspired by religious ideas which can obviously be seen in his poems.

## **Spasî**

Ez pir spasiya mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Herwiha ez pir sipasiya Alk. Doç. Dr. Kemal kaya dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê li stûyê xwe girt. Herwisa sipasiyeke min a bêhed ji birêz. Hejar feqî silêman ku pir alîkariya min kir. Li dumahî de ev xebat pêşkêşî bav û daykî xwe dikim û her wisa ji bo hevjinna xwe jî gelek sipasiyan dikim.

**ARAM MUHIALDIEN AL BARAZANJI AL BARAZANJI**

## Pêşgotin

Nalî yek ji helbestvanên klasîk ên wêjeya Kurdiye. Qonaxa destpê kirina helbestan a vî helbestvanî dikeve qonaxa yekemîn a wêjeya klasîka Kurdî li Başûrê Kurdistanê. Bi awayek din Nalî li navçeya Silêmaniyê damezirînerê dibistana helbesta klasîk a Kurdiye. Wekî helbestvanên berî xwe û yên pişt xwe jî, rengvedana ola Îslamê pêve diyar bû. Wate weke bingehekî giring awirek daye ola Îslamê û ev yek jî bi zelalî di naveroka hevokên wî de diyar dibe. Ji ber ku ji dema Îslamiyet li Kurdistanê belav bûyî, bûye nasnameya ola xelkê. Li her gund û bajarokekê mizgeftê hebû. Mizgeft jî di heman demê de hem cihê xwedaperestiya xelkê bû, hem jî cihê fêrkirin û perwerdekirina xwendekaran bû.

Tevî ku di nava lêkolînên wêjeyî de karên cûr bi cûr di derbarê Nalî û berhemên helbestên wî de hatine encamdayîn, lê hê jî qasî pêwîste maf jêre nehatiye dayîn û gelek kêmasî di nav de hene. Lewra me jî hewl daye ku vê lêkolîna xwe li ser aliyek ku karekî kêr jêre hatiye kirin, encam bidin. Ew jî alî jî rengdayîna ola Îslamê ya li ser helbestên Naliye.

Armanca lêkolînê jî li ser du beşan dabeş dibe. Ew jî armancên giştî û armancên taybet in. Armanca giştî rengvedana ola Îslamê ya li ser helbesta klasîka Kurdiye û armanca taybet jî destnîşankirina mijarên ayîniye ku di helbestên Nalî de heye.

Rêbaza lêkolîna me jî ji rêbaza wesfî û şîrovevî pêktê. Di beşa yekemîn û duyemîn de me bi awayek giştî wesfê mijarê kiriye. Di beşa sêyemîn de jî me rêbaza şîrovekirinê bikaraniye. Me bi awayek şîrovekarî behsa mijarên lêkolînê kiriye.

Pirsgirêkên lêkolîna me jî bi awayek giştî kêmiya çavkaniyên derbarê Nalî û berhemên Nalî de ye. Pirsgirêkek din jî kêmiya çavkaniyên bi zimanê Kurdî ya li ser ol û bandora ola Îslamê ya li ser wêjeya Kurdî. Ji bilî alozî û awayê helbesta Nalî, ji ber ku Nalî zimanek aloz heye û di helbestên xwe de gelek zimanên din jî bikaraniye. Ev jî di naveroka lêkolînê de eşkere dibe.

Ev lêkolîn ji ‘Pêşgotin, Despêk, Kurtî, Sê Beş, Encam û Lîsteya Çavkaniyan’ pêkhatiye. Beşa yekemîn a lêkolîna me ji çar bendan pêkhatiye. Me di benda yekemîn de

behsa ‘Jiyana Kesî ya Nalî’ kiriye. Di benda duyemîn de me behsa ‘Rewşa Serdema Nalî’, di benda sêyemîn de behsa ‘Naveroka Helbesta Nalî’ û di benda çaremîn de jî behsa ‘Zimanê Helbesta Nalî’ kiriye.

Beşa duyemîn jî ji çar bendan pêktê. Me di benda yekemîn de ‘Helwesta Îslamê li Beramberî Helbestan’ şîrove kiriye. Di benda duyemîn de jî me behsa ‘Dengvedana Ola Îslamê li ser Helbestvanên Kurd’ kiriye. Di benda seyemîn de behsa ‘Perwerdeya Ayînî ya Nalî’ kiriye û benda çaremîn de jî behsa ‘Bandora Nalî ya li ser Helbestên Serdema Xwe, Piştî Xwe û Mezinahiya Nalî ligel Helbestvanan’ hatiye kirin.

Di beşa sêyemîn de jî me behsa ‘Ola Îslamê û Cihên Pîroz ên Di Helbestên Nalî De’ kiriye. Ev beş jî ji çar bendan pêktê. Di benda yekemîn de behsa ‘Dengvedana Ayetên Qur-anê ya Di Helbestên Nalî De’ hatiye kirin. Di benda duyemîn de jî me behsa ‘Gotinên Pêximber û Pêximber (S.A.S) Weke Çavkaniya Helbestê Ligel Nalî’ kiriye. Di benda sêyemîn de jî em behsa ‘Kesayetiyan Ayînî Weke Çavkaniya Helbestan Ligel Nalî’ dikin. Me di benda çaremîn de jî behsa ‘Cih û Demxwarin, Kereste û Kelûpelên Ola Îslamê Weke Çavkaniya Helbestê û Dengvedana Wê ya Di Helbestên Nalî De’ kiriye.

Em di dawiya lêkolîna xwe de jî ghiştin çend encaman û piştî jî bi awayek zanistî û rêzbendî me çend çavkanî bikaranîne.



## Despêk

Wêjeya klasîk a Kurdî bi awayek berfireh di bin bandora wêjeya Erebi û Farisî de bû. Eşkereye ku wejeya klasîka Erebi û Farisî jî di bin bandora ola Îslamê de bûn. Lewra wêjeya klasîk a Kurdî peywendiyekî baş ligel ola Îslamê heye.

Giringiya ola Îslamê di helbestên Nalî de deng daye. Ew jî vedigere rewşa civakî, cih û kesayetiyên ayînî yên li navçeyê. Tevî bandora ola Îslamê ya di helbestên wî de, bandora gelek bingeh û taybetmendiyên berî ola Îslamê û kevneşopiyên ayînî hebûn. Li vir Nalî kesayetiya xwe bi awayekê tevî ola Îslamê dibe, dibe çavkaniyek ji bo helbestên serdema xwe û yên piştî xwe.

Di naveroka helbestên wî de gelek mijarên cûr be cûr vejandiye, di hemû mijaran de jî ola Îslamê li berçav girtiye. Ji bo vê armancê jî di naveroka lêkolînê de, ev yek bi awayek eşkere û zelal derdikeve.

# 1 JIYANA NALÎ, REWŞA SERDAMA NALÎ, NAVEROK Û AWAYÊ HELBESTÊN WÎ

## 1.1 Jiyana Kesî ya Nalî

Nalî navnîşana îcata di warê helbesta Kurdî de ye û yekemîn dibistana helbesta klasîk a Kurdî di Kurmanciya Jêr de afirand. Ne tenê di serdema xwe de, belkî heta niha jî ew îcata (dahênan) cihê serbilindiyê berdewam dike.

Di dîroka wêjeya Kurdî de dîtînen cûda li ser dîroka dayîkbûn û mirina helbestvanên klasîk heye. Gelek caran dîroknas û lêkolînavanên wêjeya Kurdî salên cûda ji bo dayîkbûn û mirina helbestvanan diyar kirine. Heta niha jî ew dîrok bi temamî nehatine zelalkirin. Zanyariyên di derbarê jiyana Nalî de hatine diyarkirin, gelek nirxandin li ser hene. Ev jî ji ber "Koçberbûna ji Kurdistanê, dilgiranî û mirina wî ya li Stenbolê ye. Tevî ku heta niha jî gelek tişt li ser jiyanameya Nalî hatine kirin, lê nehatiye zanîn ku dîroka dayîkbûn, mirin û rawestgehên jiyana wî bîn diyar kirin. Het agora wî jî nayê zanîn li kûderêye." (Hebîb, 2013, s. 230) Vê yekê jî wisa kiriye ku em nekarin dîroka wî ya rast û dirûst ji bo dayîkbûna wî danin.

Ji ber ku "Tiştê mejî nîşan dide, ewe ku heta niha li vê cîhanê kesek nîne ku bêje Nalî kengê ji dayîk bûye. Ev jî tenê ji ber wê yekê ye ku Nalî Mikayîlî, eger bavê wî Cafekî koçberî Germiyan û zozanên bêdeng nebûyî be, kurê felahekî baş ê herêma Şarezûr bû. Çi bi navê Caf û çi jî Şarezûrî, wê serdemê pir kêr xwendekar di nava wan de rabûne. Li tevayî Kurdistanê kurên mîr, mela û bazirganên mezin nebe, dibe ku bavê wan dîroka dayîk bûna wan li ser piştê pirtûkekê nivîsandibe û bê zanîn kengê ji dayîk bûne. Dibe ku li bîra bav, dayîk, xizim, derdor û cîranê yek ji wan be wek mînak di sala giraniyê de yan jî di sala girtina rojê de ji dayîk bûye. Lê ma çi encameke vê yekê heye û eger nezane ew çi sal bû. Heta me zanyariyek bi vî awayî jî li ser Nalî nîne." (Mihemed M. K., 1979, s. 10)

Navê Nalî, "Xidir-Xidre û kurê Ehmed Şaweys Elî Begê Mikayîliye. Li gundê Xak û Xol yê deşta Şarezûr ji dayîk bûye. Li gor rêbaza xwendina wê serdemê, despêka Qur-ana Pîror, piştê jî hêdî-hêdî pirtûk xwendiyê. Ji bo feqetî û ji bo wergirtina zanistaayîn, li gelek bajar û dibistanên beşeke Kurdistanê geriya ye. Pileya herî dawî jî melatî wergirtiye." (Ebdülkerîm, 1976, s. 23-24)

Nalî di helbestên xwe de bal kişandiye ser navê xwe. "Bi anîna navê 'Xidir' hem bal kişandiye ser xwe ku navê wî Mele Xidre û hem ji bo Xidirê Zindeş ku tê gotin heta

niha jî dijî û heta roja qiyametê namire." (Mihemed M. K., 2009, s. 15) Di vê helbestê de wiha dibêje:

*Le bî to awî beqa min Xizirim*

*Feyzî to rehmet û, min sewze giya* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 125)

Wate: Ango yara min a nazdar lêvên te ava kaniya heyatê ye. Ez jî Xidirê zindî me, hatime min vexwariye û qet namirim. Mîhrîbana te ligel min barana rehmetê ye, ez jî giyyayê kesk ê wê barana rehmetê me. Mele Ebdûlkerîmê Medris dibêje: di vê parçe helbestê de "Îşareta navê Nalî bi xwe di nav de ye." (Ebdûlkerîm, 1976, s. 125)

Nalî di demekê de ji dayîk bûye, dîtînen cûda li ser dîroka dayîk bûn û mirina wî hene. "Di nava mij û dumana nebûna çavkaniyên resen ên tarîk û kêr, yê cihê baweriyê wînda bûne." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 63) Bi dîtina mamosta Elaedîn Secadî, "Li sala 1979'an li gundê Xakû Xol ê deşta Şarezûr ji dayîk bûye." (Elaedîn, 1952, s. 214) Marûf Xeznedar dibêje: "Li sala 1800'an ji dayîk bûye. Bavê wî ji eşîra Caf bû, ne ji malbatek diyar û navdar bû. Ti zanyariyek li ser dayîka wî nîne. Wisa derdikeve ku êkaneyê dayîk û bavê xwe bû. Bavê wî zû miriye û dayîka wî bi bijînî (Bêmêr) êkaneyê xwe mezin kiriye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 63) Bi vî awayî roja dayîkbûna Nalî zelal nebûye. "Ligel hemû lêkolînan berê nehatiye zelalkirin, her yekê salek ji bo dayîkbûn û mirina wî danîne. Belge û dokûmenteriyek li ser yek ji wan dîrokan jî nîn." (Zana, 2012, s. 17) Ev jî sedemek serekiye ji bo "Vê gengeşeyê ya ji bo ronîkirina rastiya dayîkbûn, jiyan û mirina Nalî, gelek lêkolînan bi xwe ve mijûl kiriye. Lê her yek bi awayekê behsa Nalî kirine." (Zana, 2012, s. 18) Eger li gor dîroka her yek ji wan be, zûtir an derengtir dayîkbûn an jî mirina wî, ti tiştê ji vê teza me nagûherîne.

Diyare timî zarokên bê bav, dayîk zêdetir dikeve xema wan. "Di nava Kurdehariyê de ev yek gelek diyare ku dayîka bijîn (Bêmêr, jina hevserê wê mirî) êkaneyê xwe bide xwendinê. Bi vî awayî despêka hucreya wî li gundê Xak û Xol bû. Divê dema zarokatiya xwe li wir derbas bike, ji ber ku bîranînen wî ligel cihê ji dayîkbûna wî hene. Wan bi heskirin, soz û keyfxweşî bi nav dîke." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 64)

Di helbestan de navê Xak û Xolî bikaraniye. Cihê dayîkbûna wî 'Evîndarê wî cihîye, ji ber ku li wir ji dayîk bûye. Li wir perwerde dîtiye û mezin bûye. Name ji bo Silêmaniyê dişîne û ji bo derbarê rewşa welat de agehdariyên wî çêbibin. Eger fikra cihê



dayîkbûna xwe bike ku Xak û Xole, divê serdana wir jî bike û divê her di rêya Silêmaniyê de biçê." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 121) dibêje:

*Daxîl mebe be enberî saray Xak û Xoll*

*Taku nekey be xakî Silêmanî ubûr* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 181)

Nalî di helbestên xwe de 'Hewayek' li cihê xwe şandiyê Kurdistanê. Ango, Berî di Silêmaniyê re derbas bibe û biçê deşta weke enberê, bêhnxeşiya 'Xak û Xol' Silêmanî li pêşiya her kûderê be ji bo min.

Di despêka xwendinê de li gor "Kevneşopiyên wê serdemê xwendiyê û di jiyana xwe ya feqetiyê de li gelek navçeyên Kurdistanê geriya ye. Herî dawî li Silêmaniyê xaneqaya Mewlana qedandiyê û destûra melatîyê wergirtiye. Nalî li Silêmaniyê mezinbûn û pêşveçûna mîrîtiya Baban dîtiye" (Mihemed H. , 2014, s. 6)

Her wê demê û piştî destûr wergirtinê, "li Mizgefta Seyd Hisên wek mela hatiye wergirtin. Heta kêliyên dawiyê yên jiyana xwe li Silêmaniyê û li hucreya wê mizgeftê bû. Mele Mihemedê Qizlicî wê xweşiyê dideyê û wê yekê radigihîne ku helbestvanê navdar ê Kurd Mele Xidirî Nalî li mizgefta Seyd Hisên de odeyeke xwe ya taybet hebû. Piştî wê bextreşiya hatî serê Babaniyan, ji Silêmaniyê derket û venegeriya." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 64)

Çawa nehatiye zanîn ku sala dayîkbûna wî bi awayek rast û dirûst bê zelal kirin, "Her bi wî awayî nayê zanîn ku serdama jiyana wî bi awayek dokumenterî bê zelal kirin. Tê zanîn ku Nalî li Sine, Sablax, Zerdiyay Qeredax û Helebce jiyan kiriye, piştî jî ji Kurdistanê derketiye. Çûye hecê, Şam û Stenbol û dîsa çûye hecê. Ligel vê yekê jî dem û rêzbendiya jiyan wî ya li van cihan baş nayê zanîn." (Zana, 2012, s. 18) Derbarê mirina wî de jî her ye dîtinek cûda heye. Mamosta Elaedîn Secadî dibêje, "Li sala 1855'ê zayînê hemû nexweşiyekê vê cîhanê li dîwanxaneyê dirûne û di temenê 58 saliyê de ji şeraba mirinê vedixwe û dimire." (Elaedîn, 1952, s. 218) Lê Dr. Marûf Xeznedar dibêje: "Li sala 1856'an li Stenbolê koça dawî kiriye kiriye û cihê gora wî ne diyare." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 66)

### **1.1.1 Nasnavê Helbestvan**

Weke eşkere ye piraniya helbestvanan nasnavên helbestî ji bo xwe hilibijartine. Ev nasnav jî derbirînê li cîhana dîtin, hest, soz û dilê wan dike. Ji bilî vê yekê jî "Li gor

destûra wêjeya kevin, pêwîst bû her helbestvanekê navek ji bo pênasê helbestvaniya wî hebe. Helbestvan wî nasnavî li beyta her parçe helbestekê de radigihîne yan jî berî helbest bi dawî dibe radigihîne. Yan jî her bi wî nasnavî hatiye naskirin ku yê di helbestê de tê bikaranîn." (Hemebor, 2010a, s. 21) Tevî vê yekê jî "Nasnav komkirina yek ji kiryarên pêwîst ên di vehûnandina helbestê de ligel helbestvanê Kurd ji wê yekê pêk tê ku piraniya di hevoka dawî de bikartîne. Berî wê jî her di xezel û qesîdeyekê de pêwîst bû helbestvan nasnavê xwe tomar bike. Hinek caran ev nasnas peywendî bi ayîn, malbat, sofîzm, nîştîmarperwerî yan jî wergirtina ji helbestvanên xezeliyên neteweyên din ên Mûsilman hebûn." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 191) Eger di demên berê de nasnav yasayek be ji bo helbestvan helbesta xwe pê nas bike, niha; "Bikaranîna nasnav li aliyê helbestvanên nû jî diyar e. Lê ev yek heye, weke navekê helbestvan pê tê nas kirin, berhemên wan di dîwan, rojname û govaran de bi wî navî belav dibin. Bervajî weke helbestvanên berê nasnavê xwe tevî helbestan nakin. Ji ber ku eger ên berê tîrsa wan ya wê yekê hebe ku wê helbestên wan werin dizîn, çapemenî û rojnamegerî di dema niha de ew tîrs nehiştiye. Pîranî nasnavê helbestvan a di serdemê de peywendî bi jiyana xwe, civak, siyaset, ax, nîştîman û serwetên netewî ve heye." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 192)

Eşkereye ku Xidir-Xizir, kurê Ehmed Şaweys nasnavê Nalî hilbijartiye. Dibe ku ev nasnave jî sedemek taybet ê xwe hebe. Ji ber ku ne helbestvan xwe di helbestên xwe nîşanê bi wî nasnavî kiriye, ne em jî dikarin ji ber helbestên wî derbirînê lê bikin. Me gelek hewl da ku bizanîn çima helbestvan navê xwe kiriye Nalî. Me gelek helbestên wê xwendin, belkî bikarîn ji ber beytek, fikrek an jî baldariyekê ve bigihîn wê rastiya wî nasnavî. Her wekî çawa lêkolînan negihîştine encamek yekcarî, bi heman awayî em jî negihîştin. Ji bilî vê yekê. "Berî em biçin ser helbestên Nalî, divê em wê yekê bizanin ku Mele Xidir ji ber zimanê Kurdî bûye helbestvan, lewra di nava helbestên xwe de navê xwe kiriye Nalî. Ev ji bo helbestvanek Kurd tiştê herî mezin e ku di wê serdemê de hest bi wê yekê bike ku navê helbestê Kurdî be!" (Elaedîn, 1952, s. 218) Ev zêdetir bûye sedemê nirxandina li ser nasnavê Nalî heyî. Ew jî ewe ku lêkolînan herweke çawa li ser dîroka dayîkbûn û wefata wî bûne çend beş, li ser nasnavê Nalî jî bi heman awayî dîtînen cûda hene. Gelek nirxandin derbarê Nalî de hatine kirine û "li pey xwe gelek pîrsgirêk anîne. Ev pîrsgirêkane heta niha jî berdewam in, ev yek bi dawî nayê ku gelek li ser wê fikrêne ku navê wî Naliye û bi tîpa 'L' ya sivik tê nivîsandin. (Binemaleya wî Mûderîs û hwd.. ne.) Ev peyvek Farisiye û ne Kurdiye, bi çend wateyên bilor an jî tîlên

zirav ên di nava pêûsa hibir de ne. Eniyek jî li ser wê fikrê ne ku navê Nalî bi ‘L’ ya stûr tê nivîsandin. (Mamosta Elaedîn Secadî û hwd...) Ev jî yek ji wan aloziyaneye ku ne gengaze bi hêsani zelal bibe. Gelo çima ‘Nalî’ ev nasnav hilbijartiyê? Heta lêkolînan jî ev ji çi hatiye? Kîjan wateyên vê rast in? Di nasnavê helbestvanên din de ti nezelaliyek nîne. Lêkolîn û şîroveyan cûda li ser nîne. (Eelî, 2013, s. 290-291)

Heta niha jî ti kesê nekariye tiştên Nalî yên veşartî eşkere bike û tiştek wisa derbikeve holê pêşkêşî gotinê bê kirin. Ji mirov bikare girêyên kor ên jiyana Nalî veke. Ev jî ji ber wê sedemê ye ku "Her yek ji van herdu desteyan dikarin di helbestên Nalî de dîtina xwe bînin. Tenê ev li dijî her aliyekê ye ku ege ev yek jî nebe, mirov her dikare li ser karê xwe berdewam be." (Mihemed M. K., 2009, s. 16) Ji bilî wê yekê ku neronî û nezelalbûn di nasnavê wî de heye, heta niha jî nehatiye zelalkirin ku ‘L’ stûre yan jî ya zirav e. Bi vî awayî jî eniyek din çêbûye. "Awayê bingehîn û resen ‘Neelî’ bû û bi rêya gûhertinan bûye ‘Nalî’" (Mihemed M. , 2007, s. 82) Bi awayê şîroveya zimanê behsa van gûhertinan tê kirin ku nasnavê Nalî ji peyva ‘Neelî’ çêbûye. Herwiha "Xudziko li sala 1853-1854) li bajarê Parîsê dengûbasên Nalî ji Ehmed Paşayê Baban bihîstiyê û di despêka lêkolîna xwe de wiha dibêje; zanayekî navdar ê Kurdistanê li bajarê Dîmeşqê yê welatê Şamê (Sûriye) dijî. Navê wî Molla Xizir (MOLLA –HEZI) e. Lê bi navê xwe yê wêjeyî weke ‘Neelî’ efendî hatiye nas kirin." (Eebdûlla, 2009, s. 30-31) Emê li vir hewl bidin ku behsa dîtina kesên li ser nasnavê Nalî axivîne bikin.

YEKEMÎN: (Nalî) Mamosta Elaedîn Secadî di wê baweriyê de ye ku nasnavê Mela Xidirê Kurê Ehmed (Nalî) ye. Bi ‘L’ mezin tê nivîsandin û niha di rêzimana Kurdiya Soranî de ‘L- ٠’ tê nivîsandin. Dibêje: peyva Nalî di zimanê Kurdî de sê wateyên wê hene û di hersêyan de jî ‘L’ stûr tê nivîsandin. Ya yekmîn armanca wî helbestvane ku Nalî ji nalê ve hatiye ji bo windabûnê. Ya duyemîn jî tê wateya ku ji nişka nayê gotin. Mele Xidir ji ber zimanekî sade û resen ê di helbestê de, bi berevajî navê xwe kiriye ‘Nalî-Yuskit.’ Ev tiştên bi vî awayî di zanista resenetiye deheye. Sêyem yan jî ‘Nalî’ ku peyvê hatiye, ango navê wî nabe Nalî û ew jî amraze! Nabe Mele Xidir mebest jê ne ji ber wê yekê ye ku li gor wî sivike xwe bike Nalî himbêza dilxwaziyê. Belkî lîstikê di vê yekê de bigire ku ev yek pê gelek xweşe. Ji ber ku ev bi wê razî be serê xwe dane li ser rêyek ku ji bo hinek caran ev yek çawa pê xweştir nebe ku xwe bike Nalî û hemû demê peyvên wî ligel be." (Elaedîn, 1952, s. 218-219) Vê helbestê tene ku ji bo vê belgeyê hêsane ku çima Nalî xwe bike nala di bin pêlava heskiriya xwe ku dibêje:

*Ser berdebazî rête, ten texte bendî cê te*

*Dil meylî xakî pête roh malî xote bîbe* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 395)

Wate: Min serê ji bo te kiriye pir, ji bo tû li ser re derbas bibî û derbasî cihê tû dixwazî biçiyê bibî. Laşê min qeryêle mana te ye, dil jî daxwaza xaka tû li ser dimeşîye. Bila xaka li ber piyê te, pêve bimîne. Giyan jî tû bi xweyî, tû çî lê dikî bi keyfa xweyî.

DUYAMÎN: Berevajî Mamosta Elaedîn, Mele Ebdûlkerîm Mûderîs di wê baweriyê de ye ku nasnavê Mele Xidirê kurê Ehmed (Nalî) tê wê wateyê ku 'L' wê 'L' ye sivike û niha di rêzimana Kurdiya Soranî de 'L- ل' bi vî awayî tê nivîsandin. (Mele Xidir xwe daye pişt Nalî, tê wateya 'Pênûs' an jî 'Nal' ku tê wateya bilor. Yan jî Nalî tê wateya têlên zirav ên di nava pênûsa hibir de. Yan jî Nalî tê wateya balindeya xweş tê. Nalî tê wateya 'Nalîn' yan jî 'Nale' Farisiye ku ew jî her tê wateya 'Nalînê.' Lê di vê rewşê de paldayîn li ser tedbîrên Erebi be. Ligel min nasnave Mele Xidir (Nalî) bi 'L' zirav tê nivîsandin û ev peyve.) (Ebdûlkerîm, 1976, s. 44) Herwiha di wê baweriyê de ye ku nabe kesek weke Nalî "Helbestvanek paye bilind ê bi xwe bibawere ku ji ber xwe ve nasnavek weke Mele Xidir di nava her çî nav, nasnav, dar û barên Kurdî de heye, peyva Nalî ya hesp hilbijartibe. Xwe dabe pal û xwe kiribe tiştek ku xistibe di bin piyê weke Nalî de." (Ebdûlkerîm, 1976, s. 44) Diyare li vir armanca wî bersivdayîna Mamosta Elaedîn Secadiye ku dibêje, ji 'Nalê' hatiye wergirtin. Lewra bal kişandiye ser wê yekê ku bi 'L' zirav tê nivîsandin û bi helbestekê wek mînak tene.

*(Nalî) meslî halî le eşkenceyî xem da*

*Wek nale le neyda wek û nalele qelem da* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 45)

Wate: Rewşa Nalî ji ber derd, xem û pirsgirêkên xem û xemgîniyê weke mînaka nala bilorê lê hatiye. Timî giliyê dûrîtiyê dike û ti carî gazindên wî bi dawî nabin.

Dr. Marûf Xeznedar jî di wê baweriyê de ye ku "Nasnavê Mele Xidir (Nalî) ango 'L' zirav, (Peyva Nalî û Nale). Wek nav an jî nasnaveke. Ji bilî Xidirê ji bajarê Şarezûr, çend kesên me yên din jî hene ku heman nasnav rakirine." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 62)

SÊYAMÎN: Neelî-Nalî Dr. Mihemed Mehwî: Berevajî herdu eniyan, di wê baweriyê de ye ku peyva bingehîn û resen " 'Neelî' bû. Heta astekê ew zarave weke xwe

maye. Lê bi gûhertinek pir kê, sedema vê yekê di wê yekê de dibîne ku peyv di teksta ayîn de heye, wateya peyv û derbirîna ayîn (ol) cihê xwe girtiye û nehatiye gûhertin.

Li ser vê yekê û bi vê rêyê jî ne bi naverok û ne jî wateya peyvê nayê zanîn. Lewra bingehe 'Nalî' her 'Neelî' ye û bi wê wateyê maye. " (Mihemed M. , 2007, s. 82) Ev jî ji ber wê yekê ku wê peyvê peywendiyek rasterast bi "Kesên oldar ên weke Sofî û Melayan veheye. Nasnav jî endamtiya xwe weke yek ji wan têne ziman ku peyv bi awayekê bêbiryarî û nerawesandin di nav de heye. Bi daxwaza xwe dixwaze ku bi wê rêyê diyar bike ku sofîyeke xwedaperest û timî girêdayîye. Nalî-Neelî ji peyva 'Neelî' hatiye wergirtin, naverok û wateya sfî û melayekî ji xweda tirse. Timî li gor gotinên Xweda tevdi gere. " (Mihemed M. , 2007, s. 92) Eger nasnav bi vî awayî be û xwe bi kê zanîna helbestvan, "Wê demê peywendiyek rasterast ligel ciwanî, jîrî û nejiyariya peyvên 'Nal, Nall û Nalle' ve nîne. Lewra Mele Xidirê Şarezûrî nasnavê Nalî ji xwe re hilbijartîye. Ji ber ku nekariye û nikare îspat bike ku ew nasnav ji ti peyvekê werbigire ku peyva bingehe û resen a Nalî dibe ku ji wî corî be ji bo kesek Xwedanas û Sofîyekî zimanzan digunce. Ev jî xwediyê naveroka kesekî ayîn û hem jî derbirîna hişyariya zimanê xwe be. Nediya û nezela jî bêne holê û di vê cîhana xwe ya berfireh dewek rûmetekê nasnav ji xwe re hilbijartîbe. Komkirina 'Neel' Erebiye û Nalî jî bi nasnavê wê ye bi wêjeya Kurdî di wê yekê de ye ku kariye peyvekê bi dû awayên (form) zimanên cûda û di heman demê de ji bo naverokê, ji bo neteweyên cûda yên Kurd, Faris, Erebi û Tirk di nava xezîneya peyvên wan ziman de bi cih kiribe." (Mihemed M. , 2007, s. 95)

### **1.1.2 Ligel Nalî Heskirin**

Nalî weke her mirovekê mafê wê yekê heye ku di jiyana de ji yekê hez bike û helbestên evîndariyê li ser binivîse. Ji ber ku "Nalî di pileya yekemîn de helbestvanê heskirin û jiyana ye. Ev jî di hemû helbestan de derdikeve ku ji bo mirov, xweza û tiştan nivîsiye." (Rêbwar, 2015, s. 265) Di helbestên wî yên evîndariyê de ji me re derdikeve holê ku girêdayî heskirinê bû, Di wê demê de li Qeredaxê bû. "Hebîbe navek hestê Nalî jê distîne û dilê wî dibe ser xwe, Nalî dixê di meydana wêjeyê de û îlhama helbestê didê. Dibe hevîna jiyana wî, lê wisa dernakeve ku Hebîbe heta roja dawiyê jêre mabe. Ji ber ku çûna wê ya ji bo Hîcaz, Şam û ji wir jî ji bo Stenbolê bêyî bê Silêmaniyê wisa nîşan bide ku dilê wî girêdayî dostê be bê Silêmaniyê. Herwisa belgeyek din nîne ku dema ji Silêmaniyê derketî Hebîbe ligel xwe biribe û belkî ew yek zêdetir diyare ku ne ligel be. Ji ber ku karwanek wisa dûr û dirêj her rojê li cihekê weke mêreke bi jinê ve

hatibe girêdan bê nas kirin. Herwiha zêdetir jî nehatiye Silêmaniyê, ew jî ji ber wê yekê bû temaşe kiriye Hebîbe nemaye." (Elaedîn, 1952, s. 215)

Tevî ku evîndariya Nalî evîndariyek paqije, di helbestên xwe de behsa ciwanî, reşbîn, negihîştin, hawar û nalînê dike. "Evîndarek bi girî û dil şewitîyê evîna Hebîbeye. Ev şewitîn jî encama cûdahî û karînên Nalî ya di ciwaniya wê de, evîndariya Nalî evîndariyek fîraq û cûda ye." (Sebah, 2009, s. 124) Ev cûdahî û reşbîniya Nalî ya di evînê de ji bo, "Hebîbe, eger navê keçek Şarezûrî, Qeredaxî yan jî Silêmanî be yan jî navek bi her awayî bûyîbe cihê bilindkirina hestê Nalî, ev jî bi rêya wê yekê ve bû derbirînê li dildariyek bingehîn dike. Hebûn û gerdûn bi yek carî bi cî hiştiye, lihev dide. Wisa diyar nabe ku Nalî, Hebîbe ji bo xwe anîbe. Ji ber eger odeyek li mizgeftê hebe û heta bi yekcarî ji Silêmaniyê derdikeve, her di wê odeyê de bû. Çawa dibe kesek jin û zarokên wî di nava mizgeftê de be. Em dizanin hinek caran mala melayan li kêleka mizgeftan e, lê odeyek bi vî awayî ji bo Nalî di nava mizgeftê de ne tişteke guncaw bû." (Dilşad E. , 2711, s. 5) Herwiha di helbestekê de bi awayek eşkere dibe ku Nalî negihîştîye evîndara xwe. Heta jin jî naniye û zarokên wî çênebûne. Lewra helbestên xwe weke zarokên xwe daniye û wiha dibêje:

*Şeirekanim, ke ciger goşî minin, derbederin*

*Dillî 'Nalî' çî reqqe qet xemî firzendî niye (Dîwanî Nalî, 1976, s. 596)*

Wate: Helbestên min weke zarokên min in, weke zarok û neviyên min in. Li cîhanê belav bûne. Ecêbe dilê Nalî çend reqqe, ne di xema derbideriya Ferzend û zarokên xwe de ye.

Mamosta Ebdülkerîm Mûderis ji bo van van hevokên helbestê, çend dîtinên xwe aniye û wiha şîrove dike: "Helbestên min çavkaniya fikir û mejîne, janek zêde ez girtime. Di wê baweriyê de ne ku heta ji dayîk bûn û weke parçeyekê ji cigera min in. Niha jî li cihê xwe nemame, ez derbider bûme û her yekê parçeyekê ji bo xwe biriye. Ey li mino ez çend bavekî dil hişkîm, ne di xema zarokên helbestên xwe me, di kolanan de min û wan belav dikin. Dibe ku hinek jî wan weke yên xwe nîşan bidin!

Mirov dikare çend tiştan ji vê helbestê wergire. Yekem: Nalî berî ji Kurdistanê derbikeve ev yek gotiye û derbarê ehlê cîhanê û ehlê ol de bêzar bûye. Awayê berpirsan, fikirîna feqetî, şêx û mela ne bi dilê wî bûn. Dûyemîn: Hinek kesan helbestên wî dizîne û kirine yên xwe. Yan jî di helbestên xwe de sûd ji helbestên Nalî wergirtine. Sêyemîn:

Nalî helbestên xwe kom nekiriye. Çaremîn: Nalî jin ne aniye û zarokên wî çênebûne. " (Ebdûlkerîm, 1976, s. 596) Eger li gor van tiştane be, Nalî negihîştîye Hebîbeyê. Ji ber ku "Nalî heta li Şamê jî bû, dilê wî ligel wê yarê bû ya negihîştîyê." (Dilşad E. , 2711, s. 5) Di name helbesta ku ji bo Salî şandî de, bi 'Hewayê' behsa yara xwe dike, silavan jêre dişîne û behsa dilreqiya xwe dike. dibêje:

*Hallî bike be xufye: Ke ey yarî seng dill*

*Nalî le şewqî toye denêrê selamî dur* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 197)

Wate: Bi dizî, bi hêdfî û li ser xwe bi yara dil hişk û bêyî agehdariya wê ji min hebe, bêje ez bi daxwaza hevdîtina te Nalî ji derve silavan dişîne.

Eger em bi başî temaşeyî helbestên dildarî yên Nalî bikin, "çend caran navê 'Hebîbe' bikaraniye û çend caran jî navê 'Mehbûbe' hatiye bikaranîn. Ev ji bo wê yekê jî dest dide ku mirov bêje, bi rastî navê evîndara Nalî, Hebîbe bû. Hinek caran ji bo ragirtina mezinahiya helbestê yan jî ji ber ku 'Mehbûbe' jî di warê manewî de weke 'Hebîbe' bû, jêre gotiye: Mehbûbe. Ev jî dest dide ku mirov bêje; Hebîbe û Mehbûbe herduk jî nasnav bin, navê rast ê evîndara wî tiştek din be. Lê tiştek wisa di helbestên Nalî de dernakeve ku wê yekê rabigihîne ku ev Hebîbeye yan jî ev Mehbûbeye anîbe." (Mihemed M. K., 2009, s. 28)

Kesên helbestên dildarî yên Nalî bixwîne, dibîne ku di dil de heskirinek dîname heye û keyfxweş bûye. "Tenê egerek heye ku dibe navê keçikê ne Hebîbe be û Nalî ev nav kiribe perjîna li derdora abrûya keçikê. Di heman demê de wateya wê ji bo wê yekê dest dide ku ji bo derbirîna hemû hest û sozok evîndariyane, bi diyarî Nalî ligel cih navê Hebîbe bikartîne. Nimêja agir a evîndariyê ligel dike. Hemû jî hevdeng û dengêkî hebûna evîndarek rast radigihîne." (Meseûd, 2010a, s. 38-39) Marûf Xeznedar jî behs dike û wiha dibêje: "Xezelên Nalî yên dildarî heskirina ji bo Hebîbe ye. Ew keç hebe yan jî na, bûka xeyalî be yan jî her tiştek din be, ne girînge. Wê keçê ji bo man û wêneyê ligel helbestê roleke bilind leyîstîye. Di hinek helbestên ku helbestvan behsa peywendiyên sozdarî û dildariya di navbera xwe û Hebîbe de dike." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 93)

Lê bi dîtina mamosta Ebdûlkerîm Mûdiris nabe û ne guncawe ku di wê serdema Kurdewarî de navê keçekê bînî, ligel xelkê eşkere bikî û bêjî, ew keçik evîndara mine. Lewra dibêje: "Çi Hebîbe û çi Mehbûbe, yek ji wan jî ne navên rast ên evîndara Nalî ne.

Ji ber ku di civakek weke ya wê demê ya Kurdewariyê de ne tiştek hêsan bû navê wê jinê bixe di nava helbestên xwe de. Ji bilî eger daxwaza wî li ser xwestina wê keçikê hebe." (Ebdûlkerîm, 1976, s. 33) Ji bilî ku Nalî bi xwe di helbestên xwe bi eşkere behsa evîndara xwe û Hebîbe kiriye. Herwiha behsa wê yekê jî dike ku dema Nalî ji bo xwendinê diçe Qeredaxê. "Li Tekyeya Qeredaxê jî destek din a wî peyda dibe û navê wê Eyšê bû. Eyšê timî xwe wisa nîşan dida ku ji Nalî hez dike. Vê Eyšêyê heta dawiya sedsala 19'an jî mabû." (Elaedîn, 1952, s. 217) Lê navê wê Eyšêyê di helbestên Nalî de nayê dîtin. Herweke me behs kirî navê Hebîbe û Mehbûbe di helbestên wî de heye. Emê li vir werin ser çend hevokên helbestên ku navê Hebîbe û Mehbûbe di nav de hene.

*Ax legel ême (Hebîbe) ser û peywendî niye*

*Ney şeker qedde, balla bendî heye, qendî niye (Dîwanî Nalî, 1976, s. 592)*

Wate: Ax dema ku Hebîbe ligel vê yekê Hebîbe ez kirim evîndarê xwe, rû nade min û gûh nade min. Bejna wê dirêj û şîrîne. Lê tişta dide min ne şîrîniya wê ye, bend, girê û zincîrên wê ye. Herwiha dibêje:

*Destim le gerdinî xot hellmegre ey Hebîbe*

*Wabzane xwênî xome, ya minetî Reqîbe (Dîwanî Nalî, s. 394)*

Wate: Min neçar neke dest ji te berdim, bila ez timî evdal, dîn û heyranê te bim. Bila ev yek ligel te ne giran be ez dildarê te bim û timî dest ji qirika te bernadim. Ji ber ku te ez kuştîme û mafê kuştîna min li stoyê te ye, weke minetê ku dixim serê te. Herwiha dibêje:

*Cenanî wek cînan kirdim be mawa*

*Hebîbey Mallyawa mallî awa (Dîwanî Nalî, 1976, s. 122)*

Wate: Hebîbeya malavayî, Xwedê mala te ava bike. Dilê wê weke biheştê ez ava kirim, kiriye mala xwe û ez pejirandim. Herwiha dibêje:

*Pêm dellên 'Mehbûbe' xêl û qîçe meylî şer deka*

*Xêl û qîçe ya terazwî nazî nextê ser deka (Dîwanî Nalî, 1976, s. 108)*

Wate: Mehbûbeya min çavê wê ne temame, ne tişteke ku hûn dibêjin; belkî herdu çavên naz jê dibarin car caran xwe giran dike û yek liber zêdetir nazdariyan dike!



Eger mirov bala xwe bide va herdu hevokên helbestê, diyare hinek kes hebûn rexne li wê yekê girtine û gotine, çavê Mehbûbeyê ne tamam in. Nalî li ser wê yekê ranewestiya ye ku bêje, çavê Mehbûbeyê min ne tamam in, bi awayekê behsa vê yekê kiriye û gelek bi ciwanî behsa çavên wê kiriye. Dibêje, çavên wê ne tamam in û di demek ku nazan dike. Temaşekirina yek ji wan kêmekê evîndartir radibe, xelkê ev kiriye weke ku çavê wê ne tamam be. Lê rastiya vê yekê ewe ku ez dibêjim, ev nazê dike nekû weke hun dibêjin çavê wê netemam in. "Nalî bi derbirînek ciwan daye nas kirin. Bi awayek fîlezofê diyar ê derûnnas bersiva wan kesan dide yên ku dibêjin, çavên Mehbûbeyê ne tamam in." (Ehmed Ç. , 2010, s. 111) Dîsa wiha dibêje:

*Xende û demî Mehbûbe kewa zor nimekînin*

*Bes xoşe eger xo nimekî zexim û birînin* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 337)

Wate: Herçendî pêkenîna Mehbûbe birîna dilê min dikelêne, hê jî ligel min her xweş û bi tam e. Nalî di vê hevokê de wêneyek pir nazik nîşan daye. Ew jî ewe ku evîndara wî timî li aliyekê bi pêkenîna bû û li aliyê din jî birîna wî dikelêne.

## **1.2 Rewş Civakî di Dema Nalî da**

### **1.2.1 Beşek ji Jiyana Civaka Kurdan**

Xêzan yek ji dahênanên (îcat) herî ciwan ên mirovatîyê. Ji ber ku xêzan yekemîn avakerê civakê ye ku di nav de mirov fêrî ziman, kevneşopî, çand, ol, tevger, exlaq û nirxên civakî dike. Herwiha xêzan di diyarkirina rêyên serekî yên jiyane alîkariya mirovan dike. Herwiha ji bo mayîna mirov û mirovatîyê alîkariya mirovan dike. Hinek caran jî gûhertinên civakî di nava jiyane de çêdibin. Diyare hemû gel û neteweyek xwediyê hinek taybetmendiyên xwe hene. Jiyana civaka gelê Kurd jî xwediyê hinek taybetmendiyên xwe yên taybet. Tevî wan cûdahiyên di jiyana civakî de ji navçeyekê ji bo navçeyek din hene, lê Kurd bi giştî dû beş in. "Koçerî, gundî û bajarî. Koçer hêdî hêdî kêmbûn û niştetih dibin. Mécerson jî di vê derbarê wiha dibêje: Yasaya mîrîtiyê her berdewam e. Axa, beg û seyîd-şêx, ligel şêxên terîqet (mezheb) gelek in. Zevî para axa û began in. Ji cotyar re dibêjin, 'Miskîn.' Ti zeviyên wan nîne. Eger li hinek cihan gelek bi kêmbûn hebin. Koçer jî, diçin jî zozan an." (Elaedîn, 1952, s. 56-57) Ev jî ji ber wê rewşa erdnîgariya Kurdistanê ya "Ji çiya, şiv, neqeb, şikeft, daristan, deşt, baran, serma, germa û hinek taybetmendiyên taybet di nava Kurdan de çêkirine. Ev taybetmendiyane jî di gelek waran de Kurdistanê ji cîranên wê cûda dike." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 69) Ev bûn sedemek ku "Jiyana civaka Kurdî di wê demê de bi wî awayî bû. Eşîr ji

koçer, niştecih û kesên bi karê ajaldariyê ve mijûl bûn pêk dihat. Berê ew jî berî girêdayî van eşîrane bûn. Lê rewşek guncaw ji wan re peyda bûye ku di zeviyên xebitîne de bi cih bibin." (Kamîran, 2006, s. 28)

Koçerî van kesan digire nava xwe; "Hoz û eşîrên ku zivistanan li dol û cihên şîv dijîn. Bizin, çadir û konên xwe dipênin, ji cihekê ber bi cihek din ve koç dikin. Dibe ku mirov çend zêde dûr temaşeyî dîroka Kurdan bike, di nava eşîrên Kurdevariyê de zêdetir rû rastî jiyana koçeriyê tê. Lê herçendî em ji bo xwartir temaşe bikin, jiyana koçeriyê kêmtir dibe. Heta piştî şerê cîhanê yê yekemîn û derdora şerê cîhanê yê duyemîn, niştecihî di nava Kurdan de peyda dibe." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 70-71)

Niştecihbûn vane digire di nava xwe de; "Di nava rûniştvanên bajar û gundan de cûdahiyek baş di navbera asoya fikir û pileya jiyana civakî di nava van herdu civakên xelkê de heye. Sedema vê jî ewe ku çavkaniya pêşveçûna jiyane li bajaran heye. Ew jî çavkaniyên weke, dibistan, namexwane (poste), moze, tîm, rêxistinên civakî û çapemenî. Lê li gundan tenê çend polên seretayî hene û li hinek gundan ew jînîne." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 71)

Di jiyana civakî de hinek tiştên bi xwe çêdibin dibin sedemê pêkanîna jiyane ya di civakê de rolekî bi berdewam hene. Ji bo kesan jî li gor kevneşopî, çand û ol, ev jî dibe nasnameya wî. Gelê Kurd jî xwediyê wan tabendiyaneye ku "Gelek kîna wan ji karên sivik dibe. Zû fêrî ziman û pîşeyê dibin. Gelek ji welatê xwe hez dikin. Dostên xizmayetiye ne. Ligel wî xweşe ku dibêje, ez Kurdim, evîndara wêje, helbest û mûzîkên gelek xweş in...Di nava Kurdan xwendekarî gelek kêmbû. Ligel vê nexwendewariyê jî gelek fêrî tiştan dibin. Keyfa wan ji kesên biyanî re tîn, ji kesên xerîb hez dikin. Di nava civaka Kurdan de giringiyek taybet ji bo jinan heye. Jin xwediyê malê ye û rêvebertiya malê dike. Dema mêr ne li mal bû, mêvandariya mêvanan dike û xizmeta wan dike. Mil bi mil ligel hevserê xwe di koçkirin, cotkirin, di bax, baxçe û xwedîkirinê de di nava hewldanan de ye. Jinên koçer û gundî, siwar û gifengçîne, jin di nava Kurdan de gelek dilpaqij in, eger xirabî jî li beramber bê kirin, kesê xirabî lê kirî dikûje." (Elaedîn, 1952, s. 57-58)

### **1.2.2 Beşek ji civakan Kurdevarî da Dema Nalî da Jiyana**

Demamirov ji dayîk dibe û tê ser dinyayê, di her qonaxeke jiyane de pêwîstî bi têgehiştinekê heye. Bi awayek giştî di karwanê jiyane de mirov dikeve di bin bandora dû

jîngehên (ekolojî) serekî de. Ew jî Jîngeha Xwezayî û Jîngeha Civakî. Pirsgirêk, diyarde û mijarên cor be cor, corên di nava van du jîngehan de, piştî jî di meseleya nebûna dadgeriya civakî û dijwariyên deshilata siyasî, ev hemû jî bi awayekê bi radeyek (asta) cûda kar li ser çawanî, rêjeya pêkhate û reftarên di nava mirovan de dikin. Ji ber ku her karek bertek (reaksyon) heye, kar û bandora herdû jîngehên me li jor behskirî ne bê bertek bûn û nabe. Bertek jî helwestên cûda, rewş û kesayetiyan tên. "Ji asta kesî vedigûhêzin asta civakî û mirov bi heman pîvanê behsa du corên civakê bike, di qonaxa hilberîna helbestê de civaka Nalî ango civaka Kurdî, civakek seretayî yan jî bi aliyê kêma civakek paşketî û paşguhîstî ya li derveyî nivîsînê bû. Ew jî qonaxa ciwaniya civakê ye. Ango civak li derveyî mejî û li deveyî fikirînê, ango civakeke tenê li ser bingehe hevesên taybetmendiyên civakbûnê hebûn. Di wî warî de civakbûn ji civak û bi hev re jiyana zindiyên a bi hev re pêk tê. Ligel mirovan jî di bin bandora pêdiviyên jiyân û tirsê tunebûnê de ne.

Ev asta jiyana civakê hevşeweye ligel qonaxa ciwaniya takekesî de, lewa dibêje; jêre bêjin qonaxa ciwaniyê. Li beramberî vê jî qonaxa pêgihîştina civakê heye. Ew jî jî qonaxên ku civak xwediyê hemû taybetmendiyên sazî û rêxistinên civakê pêktê. " (Eeta, 2006, s. 17)

Ji bo pêşvebirina civakê pêwîstî bi kesên pispor û bi ezmûn heye. Ji bo kesên di nava civakê de dest bi kar û çalakiyên civakê bikin, beşdarî pêşvebirina civakê bikin û rê nîşa nîfşên li pey xwe bidin. Lewra helbestvan hewl dide ku bi rêya helbestên xwe armanc û peyama civakî ragihîne û bibin rêyek ji bo encamdana çalakiyê mirovî. "Dema wêje weke sedemek bi bandor li dijî rewşa serdemê kar dike, ligel berjewendiyên kes û çînan rû bi rû bidin, bêgûman dibin cihê nefret, bêzarî û bandora wan li ser hev çêdibe. Di vî warî de bi ti awayî nabe ku çalakiyên wêjeyî ji çalakiyên giştî yên civakî bîna cûdakirin. Hinek hûnerên wêjeyê di rûyê rastiyê de zêdetir xwezayek civakî hene. Helbestên heves û olî, xwediyê jiyana civakîne û bêgûman xwezayek civakî hene. Pêsin û şînê jî xwedî armancek civakî ne. Armanca wan ewe ku di navbera çîn û beşên cûda yên civakê de daxwazan peyda bikin. Lêkolîn, guhertin û pêşketina şaristiyaniyan jî bandora jiyana civakî di çawaniya derketina helbest û wêjeyê de nîşan bidin ku gel û neteweyên di eniya jiyana cotyarî pêgihîştin, helbest û wêjeya wan jî jî ligel wan gelaneye ku yên hê jî di qonaxa şivantiyê de xwedî cûdahiyên in." (Hîmîdad, 2007, s. 97-98)

Nalî di demekê de jiyankiriye ku civaka Kurd di rewşek gelek xirab de dijiya. "Dema abûriya welat di destê dagirker, kêr û lewaz be; divê rewşa civakî perdeyê li ser rûyê xwe rake. Her ev jî weke kevneşopiyek xwezayî di nava civakê de deng vedide. Di wê serdemê de bi sedan corên nexweşiyên zarokbûnê hebûn." (Aware, 1985, s. 90) Ev hemû jî di kelepûra Nalî û Salim de ji me re îspat dikin ku hemû bi hev re çawa di dilê hemû rewşên serdema jiyana xwe de bi dawî bûne. Ji ber ku hêvênê pêgihîştina helbestên resen ên nemiran, timî karesat, nexweşî, tûşbûna feqîrî, çewisandinê, zilm, zordariya biyaniyan û jêrdestiya rejîmê bû...! "Ev herdu kesên jîr xwediyê hestên jîr ên di dilê sitema ramyarî û peywendiyên dîtina di nava civakê de û rewşa abûrî ya serdema xwe gelek bi başî dizanîn û bi awayekî hustayî di naveroka helbestên xwe bikaranîne." (Aware, 1985, s. 91) Her di wê serdemê de, "Di civaka Silêmaniyê de dû çînen serekî di warê deshilat û darayî ve hebûn. Ya yekemîn çîna jor, ew jî ji mîrîtî, mîr, paş, berpirs, bazirgan, dewlimendên di nava bajêr de pêk dihatin. Çîna duyemîn jî ji cotyar, paleyên hejar û bêkarên bajêr pêk dihatin. Ev ji bilî kar û kasibkariya xwe, hêza çekdarî ya mîrîtiyê bûn. Mîrov dikare bêje di nava vê çînê de xebata çîna dewlimend, navend û hejar nebû." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 26)

### 1.2.3 Jiyana Xwendekarî û Rewşenbîrî di Dema Nalî da

Di serdema ku Nalî jiyankirî li navçeyekê bû, heta astekê berevajî ligel navçeyên din ên Kurdistanê hinek azadî hebû. Ew jî ji ber milkê Baban ku "Ji mîrîtiyek nêzî 300 sal berdewam kirî û heta 1850'ê zayînê berdewam kir û hat rûxandin. Mîrên navdar ên weke, Feqê Ehmedî Darşimane, Mîr Bekre Sûr û Silêman Paşayê Gewre welatê Baban ê wê demê ji bajarê niha yê Silêmaniyê re tê gotin. Gul Enber, Helebce, Şarezar, Şarbajêr, Sirûçik, Mawet, Pişder, Qeredax û Pêncwîn diketin di nava sînorê welatê Baban de." (Emîn, 1983, s. 21)

Herwiha Emîn Fîzî dibêje: "Bingehê avakirina bajarê Silêmaniyê li sala 1784'an bû û hebûna mîrîtiya Baban jî piştgiriya bihêz bû. Ji bo teqandina jêhatiya helbestvaniyê jî Nalî rastî vê rewşa ramyarî, abûrî û civakî ya nû bûye û vê yekê jî nehiştiye ev jêhatiya Nalî hişk bibe. Herî dawî wan bi xwe jî desteyeke helbestvanên mezin avakirin. Ew jî weke; Salim, Kurdî, Mehîwî, Hacî Qadirê Koyî, Herîq, Şêx Reza û Keyfî şax û polên vê dibistana wêjeyî ne." (Emîn, 1983, s. 23) Di heman demê de xwendin û dana xwendinê weke awayekî din ê jiyanê li bajarê Silêmaniyê rastî gelek pirsgerêkan hat. Di wê demê de xwendekarî û rewşenbîrî di astek nizim de bû. Ji ber ku "melbenda fêrkirina zarokan her mal, deşt û derdor bû; mamosta jî dayîk û bav bûn.

Dayîk û bav jî ne xwenda û nezan bûn. Eger em wan çend mizgeftan cûda bikin ku çend mela an jî çend zana bi dehan kesî bigihînin pileya xwendina ayînî ya baş, ew jî bi tiliyên destan dihatin hêjmartin. Di nava bi hezaran Kurdan de jî piraniya wan xwendekaran bi melatîyê ve mijûl bûn û li pey zanyariyên din nediketin." (Aware, 1985, s. 86-87)

Ji ber ku di wê serdemê de "Yekemîn melbenda xwendekariyê di nava neteweyên Misilman ên Rojhilata Navîn de 'Mizgeft' bûn. Xwendin di wan dezgehan de bi awayek giştî bi zimanê Erebi, mijarên zanistî yên Erebi û ola Îslamê bûn. Li Kurdistan û welatên Misilman ên din 'Mizgeft' weke cih û navendeke perestî û îbadetê bû. Lê ligel vê yekê jî her mizgeft bû xwendekar mezin dikir û fêrî zanistê dikirin. Bi wî awayî giringî didan çanda xwe ya netewî. Ew jî ne şerte ku her kesê bixwîne bibe mela. Lewra mirov dibîne her bi mesta îbadet, xwendina zimanê Erebi û zanista Îslamî bû. Kesên nedibû mela dest bi armançek din dikirin û ew jî fêrkirina xwendekaran bû." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 29) Bi rastî mirov dikare bêje, pileya xwendekariyê li her welatekê li gor zorî û kêmiya mizgeftan berhev bikin. Her weke di serdema niha de dibistan nîşana xwendekarî û pêşketinê bi hêjmara xwendekaran tê berhev kirin. "Li bajarê Silêmaniyê gelek bîranînên binirx ên paşatiya Baban heta niha jî mane. Tê gotin ku ew bîranîn li mizgeftên ku di serdema wan de hatine avakirin tên dîtin. Her li mizgeftan de jî gelek helbestvanên Kurd hatine fêr kirin. Ev jî ne tenê li bajar bû, belkî li hemû navçeyên Silêmaniyê bû. Mizgeftên bajar û naçveyan ji aliyê paşayên Baban ve serpereştiya wan dihat kirin. Di xezîneya mîrîtiyê de çî pêwîst bûya, pêşkêşî mamosta û xwendekaran dihat kirin.

Bajarê Silêmanî yek ji wan bajarên Kurdistanê ye ku rûniştvanên wê bi heves û çav bi ken in. Herwiha ji mûzîk, stran, dem derbas kirin û şahiyên hez dikin. Gelek awaz û stranên Kurdî li wir serî hildane. Paşayên Baban giringiyek zêde didan mûzîk û stran, bi çavekî giring temaşe dikirin. Di dîwanên xwe de şahiyên mûzîk û stran çêdikirin, bangî rûspiyan dikirin û beşdarî wan şahiyên dibûn. Amêrên mûzîkî yên wê serdemê jî ji bilor, nay, def, derbûqe û hwd..pêk dihatin. Herwiha helbestvanê navîna yekemîn a sedsala 19'an Mistefa Begê Kurdî di qesîdeyekê de behsa hinek stran û stranbêjên wê demê dike. Hunerê şanogeriya li Silêmaniyê bi awayekî despêkê li navenda bajêr bû. Bêgûman ev jî pêşketinek bû di nava neteweyek Misilman de. Hinek hûner dihatin asteng kirin û pêşî li wan dihat girtin. Biharan heftane çîn bi çîn kes diçûn seyranan û çend rojan diman. Ew jî çînen weke, bazirgan, hêsinkar û sabûnker bûn. Van

çînan ji bo van çend rojan bernameyek ji bo xwe dirûst dikirin. Yek dibû, Paşa û cilên şah li ber xwe dikir. Wezîr û karmend ji bo xwe diyar dikirin. Wan jî cilûbergên xwe yê taybet ên wezîran liberxwe dikirin. Ji bo her rojekê seyranê bername û planek dirûst dikirin. Di civakê tawankirin çêdibûn, dadgeh ji bo wan dihatin avakirin. Li ser dikan, şano dihat kirin, jin anîn, govend û gelek tiştên din dihatin nîşan dan. Hunerê derxistina nivîsîna dest li Silêmaniyê di nava feqe û melayan pêşketî bûn. Li vir armanc ji nivîsa dest, ne tomarkirina zanista zimanê Erebî û zanista Îslamiye. Zanayên Kurd di vî warî de karên zanistî yê binirx hene. Belkî derxistina hûnerê nivîsa dest û bi taybet jî di pirtûka ku naveroka wan çend perawêz hene. Her perawêzek jî ji çend pirtûkên serbixwe pêktê." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 30-31)

#### **1.2.4 Di Serdema Nalî da Rewşa Abûrî**

Silêmanî di wê serdemê de bajarêk biçûk bû. Di wan rojan de bajarê gelek teng bû. Bazirganî gelek kêmtir û paşketî bû. Ligel vê yekê jî Silêmanî cihê bazirganiyê bû û hinek pêşketin lê hebû. "Rûniştvanên Silêmaniyê bazirganî bi tûtîn, mazî, hirî, ketîre, gezo, çerm, birinc, genim û ce dikirin." (Ako, 2008, s. 16) Bazara bazirganî û berhemê pişeyên dest li vî bajarî girêdayî gundên derdorê bû. "Zeviyên din ên mezin yê pembû, tûtîn û zeviyên birincê li her derê belav bibûn. Wekû zeviya navdar a Serçinar, ji milkên Yûnis Beg bûn û Mehmûd Paşayê Baban pêşkêş kiribû. Cotyar jî heta astekê xwediyê zeviyên xwe bûn, lê pir kêmtir bûn. Ev jî tenê li gundan wiha bû." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 27) Alogoriya bazirganiyê, kirîn û firotin, bazara "Silamênî zêdetir ligel bazara bajarê Kerkûkê bi germî dihat kirin. Kasibkarek Kerkûkî yê bi navê Selem Siwî ligel kasibkarek Silêmanî bazirganiya mîweyan dikirin. Li bajarê Silêmaniyê bi karwan ber bi Kerkûkê ve bi rê diketin. Hingvîne baş, goz, mazî, bero, çinar, gezo û hwd..ji Silêmaniyê bar dikirin û bi şev ber bi Kerkûkê ve diketin rê." (Aware, 1985, s. 78-79)

Derbarê pişesaziyê ve pêşveçûnek baş hebû; "Diyardeya herî girîng a li bajarê Silêmaniyê anîna berhemê sabûnê bû û heta niha jî li taxa Sabûnkeran a Silêmaniyê maye. Sabûnkeran, ew taxe ku di navîna yekemîna sedsala 19'an de û li her malekê karxaneyê sabûnê hebû. Ev karxane taybet ên malan bûn. Li tevayî Silêmaniyê di nava salê de 500 ton sabûn dihat hilberandin. Bazirganiyek berfireh û biberhem hebû. Ji bo Bexda, Kerkûk, Mûsil, Sine, Seqiz û gelek bajarên din ên welatê Osmanî û Eceman dihatin şandin. Salane nêzî 15-20 karwanên sabûnan li Silêmaniyê derdiketin. Her karwanek ji 90-100 ker, hesp, hêstir û mayînan pêk dihat." (Marûf X. , Mêjûy Edebî

Kurdî, 2010c, s. 28) Li Silêmaniyê hinek pîşesaziyên din hebûn. "Weke navçeyên din ên Kurdistanê ji bo bikaranîna rojane, hinek berhemên pîşesazî dihatin çêkirin. Ew jî, firax (Qap), kelûpelên di nava malan de, balîf, silêf, mehfûr, cilûber û hwd..dihatin çêkirin. Ev kargehan biçûk bûn û ji aliyê kesekê bi tenê ve dihat rêvebirin. Piraniya kargehan li mal an jî li dikanek taybet bû. Şagirtek zarok an jî kurek hosta, bi xwe alîkarî dikir. Pîşesaziya hûnera biçûk û sivik heta astekê pêşketî bû. Kêr û amêrên din ên birînê yên gundê Tewêle heta niha jî navdariya wan berdewam dike. Herwiha çêkirina xencerên Kurdî, çeqmeqsazên Silêmanî, tifeng, şîr û demance jî çêdikirin. Lê ne di asteke wisan de bû, bibe behemê pîşesaziyê. Heta astekê pêdiviyên di nava Silêmaniyê de dabîn dikir. Lê ligel vê yekê jî li derve û mala Etarî, qumaş, kelûpelên çayê, semawer û çaydank ji wan re dihatin. Ji bilî vê yekê jî navçeya Silêmaniyê dikarî goşt, mer û malat bide hemû cîranên Kurdan." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c)

### **1.3 Naveroka Helbestên Nalî**

Naveroka Helbesta Klasîka Kurdî di berhemên helbestên klasîk ên Kurdî de bi giştî sînorek berçav ji bo mijar û armancê tê dîtin. Em berhemê wan bixin di çarçoveyek taybet a di warê naveroka helbestê de; "Ji ber ku helbesta klasîzmê di warê naverokê ve taybetmendiyên netewî zêdetir xerîbî û dûrîtiya ji welat û wesifkirina taybet a xwezaya Kurdistanê ligel diyar dibe." (Hîmdad, 2007, s. 59) Ligel vê yekê jî; "Helbestvan behsa nexweşiyên di nava civakê de dikin. Fikra welat dikin. Xaka melbesta jiyana wan ji her tiştê xweştir û ciwantir e, ji her cihê zêdetir dil digire û biheştê ser cîhanê ye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 58)

Hemû pirsgirêk û nexweşiyên civakê di dilê helbestvan de xwediyê cihêk taybet in. Di encama hewara xwe gihandina ji bo; "Nexweşiya jiyana mirovan di civaka mîrîtiya kevin de timî helbestvan xistiye di nava derûnnasiyek reşbîn, dil û derûn dagir kiriye. Giringiyê nede siberojê. Herwiha tenê sozêna ayînî ligel bihêzdebîn. Rewşa abûriya civakê bandorek wisa li helbestvan dike ku bi çavekî bextreşiyê temaşeyî jiyane bike. Ev diyardeye di dildariiyê de zelal û eşkere ye, ji bo dema helbest di peywendiyên evîndariyê de serkeftî be; helbestên berevajî bêhêvîbûn di nav de diyar dibin." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 57-58)

Bi vî awayî naveroka berhemên helbestvan gelek aliyan digire nava xwe. Mirov dikare bi rêya şîrovekirina tekstê di pîvanên cor be cor de derbasî nava armancên wî yên veşartî û bibîne. Mirov dikare aliyên veşartî yên wê tekstê derbixe holê û heta em

digihin wê rewşa ku dibînîn; "Bingehê vane jî di mijarê de ye. Mijar jî weke mijarên melhemî (palewanî), netewî û mijarê şanoyê ku di acizbûna derûnî de, mijarên helbestî û wijdana stranê ya di wijdana helbestvan û acizbûna wî ve girêdayîne. Ev acizbûn jî çend awayên wê hene. Ew jî bûne sedemê cor bi coriya armanca helbestê û wijdaniyê, soz û awaz beşeke serekiye. Beş jî di warê armanc an jî taybetmendiye de evin. Pesin dayîn, şikandina mirovan, lorandin, serbilindî, wesfî, dildarî, nîştîmanî, helbesta siyasî, olî û civakî. Belê ev tiştên me li jor behs kirine di dilê helbestvan de derdikevin. Sozek zêde di nav de tê dîtin. Di çarçoveya behsên; Heskirin, rîq û kîn, tirs û bawerî, baş û xirab digire nava xwe. Bi awayek cor be cor xwe derdixê holê. Di encama van gûhertinan de mijara helbesta stranî serî hildide. Helbestvan di helbestên wijdanê de li cihê min diaxive, hestê di nava dilê mirov de û nikare derbixe, derdixîne holê. Hestkirina bi helbestvan jî yekser li wî aliyê din ê peyvan rasterast hest pê tê kirin û tê dîtin. Li vir egoîstiya helbestvan diyar nabe, belkî acizbûna rasterast a wijdana helbestvan di rojneya peyvan de hest pê dike." (Şukrîye, 1989, s. 27-28)

### **1.3.1 Naveroka Helbestên Nalî**

Nalî bi rêya helbestên xwe behsa gelek armancên giring kiriye. Hewl daye bi vê rêyê sûtê bigihîne zarokên neteweya xwe. Helbest ji bo gelek armancên giring û serekî nivîsandiyê. "Dibistana helbestana Nalî, hevalên wî û bi taybet jî dema Nalî hat holê, di nivîsandina helbest û zimanê Erebi be gelek jîr bû. Bi pisporiya di zimanê Kurdî û deshilata wî ya li ser awayên din ên rêziman Kurdî, hunerê girêdana zimanan bi endazeyek baş cihê tiliyên Nalî di diyalektîka jêr de gihiştîye sinorek ku bi xwe rewa bibîne. Mirov dikare ji vê diyalektê re bêje, zimanek Kurdî." (Mihemed H. , 2013, s. 216) Heta niha jî berdewam dike, navek diyar, mezin û diyar ê wêjeya Kurdiye. Stêrek geş û vekirî ya asîmanê dahênan û armanca helbestê ye. Di warê naverokê de xwe bi helbesta Kurdî ve westandiyê, ji bo bi awayekî herî baş derbikeve. Ji bo peyama xwe ragihîne. "Li gor serdema xwe helbestên Nalî di warê naveroka xwe de heta tû bêjî dewlimendin. Nalî berî helbestvanên sedsala 19'an tê û ji wan pêşketîtir e. Dema mirov were û dîwana wî bi dîwana helbestvanên din ve girê bide, mirov dibîne ji yê wan gelek zêdetir helbest di nav de hene. Ango di helbestên wî de nûbûnên rût û reha bûn." (Meseûd, 2010a, s. 61) Bêgûman her wisa bû, helbestên ku weke dirûşmeyekê bi awayek ciwan bikaraniye. Zaniye eger helbestên wî ne gelek baş bin, ciwanî di nava hevokên wê de dernakeve. Li gor helbestvanên din û bi taybet jî helbestvanên zimanên din, berevajî peyama xwe ye ku behsa ciwanî û jîrîtiya zimanê Kurdî ya ji bo



nivîsandina helbestan dike. Gelek ji xwe bi bawer bû, "Bi wan helbestên xwe cîhanek rengîn, teyîsin, ciwan û nazik ji bo me çêkiriye. Ti hevokeke helbestê nîne ku wêne û tabloyeke ciwan di nav de nebe û hestek ciwan nede mirov." (Eedûlla, 2012, s. 98)

Eger mirov bi hûrî naveroka helbestên wî bişopîne, ji mirov zelaltir dibe ku Nalî beşek giring, cihek diyar û berçav di nava wêjeya Kurdî de heye. Ji ber ku, "Naveroka helbestên Nalî bi giştî armancên ku di wêjeya klasîk a Îslamî (Xezel û qesîde) û neteweyên Misilman ên Rojhilata Navîn tê dîtin. Ligel helbestvan tişta dahênan û nû ewe ku li başûrê Kurdistanê helbestên ciwan û jîr nivîsandiye. Hê rastir jî zimanê Kurdî li wê navçeyê kiriye zimanê helbestek bilind û binirx. Xwezaya Kurdistanê bandorek mezin li helbestvan kiriye. Mezinahiya helbestvan di wê yekê de tê dîtin taybetmendî û formên nû aniye di nava wêjeya Kurdî de. Tevlî pêşvebirina helbesta Îslamî kiriye. Naveroka wê jî xwediyê taybetmendiyan xwe ye. Rûyê netewî jî di di helbestên wî de eşkere û diyar in." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 85) Em hewl didin naveroka helbestên Nalî li gor armancên berhemên wêjeyî eşkere bikin.

#### **1.3.1.1 Helbesta Evîndarî**

Beşa herî zêde ya helbestên Nalî evîndarîne. "Di warê heskirin û evîndariyê de hustayek jîr û şarezaye. Di vehûnandiyên xwe de wek evîndarek bêhempa, paqij û dilşewitî yê dûrî evîndara xwe, xwe nîşan dide. Heskirin û evîndarî rûpîvanek mezin û berfireh di vehûnandiyên wî dagirkiriye." (Mihemed H. , 2014, s. 8) Dema mirov balê bikişîne li ser helbestên wî, ji me re derdikeve holê ku helbestvan giliyê dilê xwe ji bo evîndara xwe vekiriye. "Gelek gilî û gazind ji bê kediya evîndara xwe kiriye. Diyarê zor bi vê nexweş bû. Di rastiye de jî bê kedî gelek nexweş û diltezîne, bi taybet jî ger ji aliyê dildara wê ve be." (Sidîq B. , 1370a, s. 54) Ji ber ku "Helbesta dildarî ew helbesteye ku derbirîne li hest û soza mirv dike, mêr bi jinê ve tê girêdan. Wêneyê heskirinê yê mêr di nav de ye, wesfê ciwaniya jinê, exlaq û heskirina di navbera wan de çêdibe dike." (Şukrîye, 1989, s. 40)

Nalî hewla wê yekê daye ku di vehûnandina helbestên evîndariyê de, dû wêneyên ciwan ên weke wêneyê xweza û wêneyê evîndariyê bi hev re binexşîne. Ji ber ku, "Xweza ji bo hemû naverokên evîndariyê çavkaniyeke bingehîn e. Nalî timî hewl daye ku bixe di çarçoveya helbestên xwe de. Ji ber vê yekê jî hinek caran helbestvan tevayî xwezayê dike evîndara xwe, lê bêguman yar ji xwezayê ciwantir e. Bi çî awayî be eşkere û diyare ku ne tenê di helbestên evîndariyê yên helbestvan de, belkî piraniya

berhemên helbestvan dagirkiriye. Ango reşbîniya Nalî ya di dildariyê de, di encama serneketina di ceribandina evîndara wî de bû." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 93) Di helbestên xwe de ji ber peyv û kelûpelên taybet, dîmenê girêdayî aliyan derbirînê li evîndara wî dike û "Hewara xwe digihîne ciwaniya xwezayê. Ciwaniya xweza û dîmenên rengîn ên di ciwaniya heskiriya wî de kom dike." (Şukrîye, 1989, s. 42) Weke di van hevokên helbestê de dibêje:

*To ke horît were nêw cenetî dîdem çî dekey*

*Lem dilley pir şerere û sîney sozanimda* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 91)

Wate: Tû hûriyî û divê cihê te biheşt be. Lê tû di nava dojeha dilê te jî pirîskên agir û agir berdayî di nava singê min de çî dikî. Were di nava biheştê çavên min, ya bi ji ber rondikan hemû bûyî bax, gul û gulistan.

Tiştê di helbesta dildarî ya Nalî de behs hatî kirin, di jiyana Nalî de bide ber tîrêjên eşkerekirinê, di vê çend bi peyvên nû, sade, dilrevîn û hest dixê tevgerê behsa heskiriya wî dike ku çend li dûriya wî perîşane û bêyî wî hest bi mirinê dike. Di vê helbestê de dibêje:

*Derunim pîrr kebab û derde bê to*

*Dillim germe û henasem sarde bê to*

*Xerîkî şeş derî hat û nehatim*

*Xelasîm qet niye lem nerde bê to*

*Libasim mateme, şîne le şîndam*

*Sirûşkim sure, rengim zerde bê to*

*Ezîzim dilli reqqe, û xom ferd û tenham*

*Detirsim bimkujê em derde bê to*

*Be bê dîdarî to xo lalle Nalî.*

*Eceb hestawe em çen ferde bê to* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 379-380)

Wate: Ji ber derdê dûriya te di nava dilê xwe dişewitim. Dil û derûnê min şewitiye, bêhna min bêyî tenge. Ji ber derdê hat û nehatina te, asê mame. Bi ti awayî bêyî te ji vî derdî rizgar nabim. Ji ber dûrîtiya, çi nîşanên xem û xeyalan di nava min de kom bûne. Cilên şîn ên taziyan li ber min in, bi girî û şîne ve mijûl im. Rondikên xwîne ji çavên min diçin, rengê min zer bûye. Ezîza min, dilê min reqe û nerm nabe. Ez bi xwe jî bi tenê me û nikarim keyfxweş bibim. Lewra ditirsim ku ger tu ne ligel min bî, ev derdê dil min bikûje. Eger hevdîtina te ne li ber çavê min be, zimanê min nagere û baxivim. Lewra serê min dizivire. Çawa ev hevok bêyî te ji bo min hatiye.

### 1.3.1.2 Helbesta Wesif

Wesif weke armanc, di naverokê de cihekî giring heye. Di helbesta Kurdî de helbestvan divê di warê wesifkirinê (pesindayîn) de xwediyê desteke baş û wênekeşe baş be. Bi zorê wêne û bûyer bandorê lê bikin û di helbestên xwe de bêne ziman. Ji ber ku "Texlîdkirin tişteke ji ber nîşandana sîfetane. Wesif behskirina tişteke weke xwe û di çi rewşekê de ye. Ji ber ku helbestvan zêdetir pesnê wan ketiye ser tiştên têkel. Di lihevdana wateya wan de wesfa herî baş ew bû helbestvan di helbestê de gelek wateyên wê ji bo tiştê pesnê wî didan, dianîn. Piştî vê jî derketin, nîşandan û giringîpêdana di helbestê de vedigere ji bo hestê bi rêya sîfetan de ye." (Şukrîye, 1989, s. 55) Eger wiha be, helbestvan di helbestên pesindayînê de dest ji wêne bernade yê di tiştên wesifkirî de sûd jê hatine wergirtin û ji pîroziya tiştan nîgariya hunerî dikêşe; "Em dikarin bêjin wesfên wêneyîne, ji ber ku zêdetir nêzî wênegirtinê ne, nivîskar xwe kişandina dîmenekê diwestîne. Rengkirina wê jî li gor kêma û zoriya beşan, peyker û awayên wê. Wêneyek wênekêşî ger wesfek wêneyî yan her tişteke ku me xwend, hest bi awa, xetên dûr, dem, cih, reng û beşên jê pêkhatiye, bikin. Eger mirov piştî xwe lihevçûnê girê bide, wê demê bi zorê hestpêkirin xwe nîşan didin. Ti tişteke nagihe vê bilindiya di wesif û di wênegirtina wênegiriyê de jî ne tenê tevgerkirin be, dibe ku nivîskar di nav de serbikeve." (Şukrîye, 1989, s. 57)

Mirov li vir dibîne ku wesifkirina xwezaya Kurdistanê cihekî bilind di helbestên Nalî de heye. Ji ber taybetmendiyên vê xwezayê hene, xwediyê ciwan û tamedek wisaye ku helbestvan nikare xwe jê dûr bixe, bi taybet jî ciwaniya demsala biharê. Dema xweza rengîn dibe û zevî berhem tîne, kanî derdikeve û befra li serê çiyên dihele, dawî li sermayê tê. Zevî dibe ferşeke rengîn. Ev bandorê li ser mirovan bi giştî û bi taybet jî li helbestvanan dike. Ji ber vê jî "Xweza û hestê derûn hev temam dike. Di xezelên Kurdî de ev corê helbestan bi giştî û ligel Nalî jî bi taybetî awayekî nazik ê romantîkiyê heye.

Ciwaniya xwezaya Kurdistanê hêvênêkî giring ê helbestên Nalî ye. Ev xweza dewlimend û rengîne. Helbestvan hinek diyardeyên xwezaya Kurdistanê di helbestên xwe bikartîne. Nalî gelek girêdayî xwezayê ye, bi ti awayê xwezayê bi hişkî binav nake û wernagire. Belkî hinek caran dîmenek rengîn û pir alî di nîgarekê de kom dike, bi hûrî wê xwezayê dixê tevgerê." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 97) dibêje:

*Gull tacî le ser nawe, çemen mexmellî poşî*

*Hat mujde xelet geyye ber be mubahat* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 142)

Wate: Gûl pişkiviye, erdê ferşê şîn li xwe pêçaye. Ev cil û ber weke diyarî pêşkêşî zeviyê hatine kirin. Ewqas ciwane, bi mezinahiya xwe, xwe nîşan dide.

Nalî hewl dide ku wesfê wijdana ku di dil, derûn û mejiyê wî de hest pê dike bike, wêneyan ligel dîmenên xwezayê lihev bide. "Endamên laşê heskiriyê ligel bûyera xwezayê beramber û berhev dike. Dibe ku hest bi wê yekê bike ku helbestvan hinek qalibên amadekirî wergirtiye. Ev yek raste ku helbestvanên mezin ên Rojhilat ji vî karî ne dûr in, lê her di van qalibên amadekirî de Nalî hinek hustayetî nîşan daye û wêneyên nû îcat kiriye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 97-98) Helbestvan di vê helbesta jêr de hûrîti di wê yekê de nîşan daye ku bi zorê di navîna hevoka yekemîn de bûyerek aniye, ji hestî wî yan jî evîndara wî pêkhatiye. Di navîna hevoka duyemîn de hinek karên xwezayî li beramber daniye. dibêje:

*Aşiqî bê dill denallê, meylî giryanî heye*

*Bê şike hewre tirîşqe tawî baranî heye* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 572)

Wate: Nalî di vê helbestê de dildarî şibandiye biharê. Hawar û nalîn şibandiye brûskê. Girî şibandiye tava baranê. Dibêje, dema dildariyê hest bi hawar û nalînê kir, divê bigirî jî. Ji ber ku pêwîste li pey brûskê baraneke tavî jî bibare.

Tevî ku hemû helbestên Nalî di wesfî de, di encamê de hewara xwe gihandiye amêrên xwezayî û hinek caran bi vê jî ranaweste; "Ji ber ku çêkirina wêneyê helbestan, berhevkirin û lihevçûna tiştan a ligel van stêran li cihê hevbeşê stêran û aliyên amajepêkirî yên Nalîne." (Rêbwar M. M., 2016, s. 135) Dema ji gula baxê cîhanê, barana di nava asîman û erdê helbestvan ber bi asîman ve bilind û dûr ji bo derxistina wêne û wesifkirina lîstikê temaşe dike. dibêje:

*Her kesê rûy to debînê xoy be qurbanî deka*

*Çûnke ebroy to hîlalî eîde qurbanî dewê* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 701)

Wate: Her kesê rûyê dilberê bibîne xwe dike qûrbanî, ji ber ku wekî asîmane. Di nava vî asîmanî de heyva nû heye, ev heyv heskiriye. Dema heyva nû derdikeve, dibe cejin. Diyare ji bo cejnê jî pêwîstî bi qûrbaniyê heye, qûrbanî jî dildar e.

### **1.3.1.3 Helbesta Nîştîmanî**

Nalî di vehûnandina helbestên nîştîmanî destekî diyar hebû. Deryaya dîtînen wî ji bo nîştîman bêsinor bû. Hewl daye ku bi rêya helbestên xwe bandorê li ser hest û soza ferdên Kurd êncivakê bike. Ji ber ku, "Helbesta nîştîmanî yanî zanistek berhemê qonaxa gûhertina civakî û berî peydabûna vê qonaxê nebûn. Lê her qasî zêdebûna vê qonaxa taybet a jiyana abûrî û civakî qonaxekî berî wî be, van jî her di vê qonaxê de hewla pêşvebirinê dane. Serhildana van helbestên netewperestî û nîştîmanperwerî bi Kurmanciya Jor a di helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî dederdikeve. Bi awayê Kurmanciya Jêr jî, di helbesên Nalî, Salim û Kurdî de diyar in. Nalî gelek helbest hene ku hest û sozên nîştîmanperweriyê di nav de hene." (Şukrîye, 1989, s. 85-86) Ji bilî ku Nalî helbestên nîştîmanî nivîsandiye, di wê serdemê de "Ger di alema helbesta klasîkî de ligel sezêlên Farisî û Osmanî bikeve pêşbirkê, ev karek mezine, ewqas jî karek nîştîmanperwerî û Kurdayetiye." (Marûf, Nalî le Defterî Nemrîda, 1981, s. 98) Herwiha li gor Ebdûlhemîd Hisînî; "Belgeya herî mezin a ji bo nîştîmanperweriya Nalî vedigere ji bo wê yekê ku Nalî bi zimanê Kurdî helbest nivîsandiye û gotiye." (Ebedelhemîd, 2013, s. 98)

Nalî di warê helbesta nîştîmanî de pêşketinek berçav dîtiye. Di dema jiyana xwe de gelek helbest nivîsandine, kesayetî û nîştîmanperwerî bi gelek diyar derdikeve. Heta niha jî bi awayek zindî dimîne, bandorek mezin li ser hest û soza kesên Kurd heye. Ji ber ku "Dema mirov di Erebi de tiliya xwe ji hinek parçe helbestên rengîn re dirêj dike, jêre dibêjin; Men Eyûn el-Şeeir, Îyon. Em jî dema timî behsa Nalî û helbestên Kurdî bikin, di rêzên pêş de em tiliyên xwe ji bo van herdu qesîdeyan dirêj dikin. Ew jî di dîroka wêjeya Kurdî de weke dû qesîdeyên Nalî û Salim an jû du nameyên Nalî û Salim an jî herdu çam hatine naskirin." (Eîzedîn, 2009, s. 67) Nalî bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Qurbanî tozî rêget bim ey badî xoşmirur*

*Wey peykî şareza be hemû şarî Şarezûr* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 174)

Wate: Bayeke bihêzek mezin nameyê digihîne û jêre dibêje, Xwedayo min bike qûrbane vê rêya ku tû li ser re diçî. Tû şarezayê hemû kûn û cihekî bajarê Şarezûrî, rê li te winda nabin. Here vê nameyê ji min re bigihîne, pirsê wê bike û ji min re ragihîne.

Nalî li vir hemû hest û heskiriyên xwe ligel nîştîmanîbûn û welatîyên welat bêhneke xwe dirijîne di nava hevokên helbestê de. Lewra Nalî di vî warî de diçe di çarçoveya nîştîmanperweriyê de, heskirina welat ligel Nalî warekî girînge. "Nalî di gelek vehûnandiyên xwe de behsa nîştîman, gel, heskirin, derûniya vê xakê, kunc bi kunca Kurdistanê kiriye. Nalî ji dûriya welat dinalêne û giriya evîndariya vê xakê di vehûnandiyên wî de derdikeve." (Mihemed H. , 2014, s. 9) Helbestên wî yê nîştîmanî hemû jî li ser hestek pak û paqij in. Nalî ewqas ji welatê xwe heskiriye ku "Dûriya ji welat weke dilreşî û kafiriyê bi nav kiriye." (Eebidelhemîd, 2013, s. 92) Lewra di van hevokên helbestê de wiha dibêje:

*Dill siyaseng nebê maîlî xakî wetene*

*Xalî Leelî Hebeşe, sakîni burdî Yemene (Dîwanî Nalî, 1976, s. 524)*

Wate: Eger dil ne hiş be, wê demê gelek ji welatê xwe hez dike, heskirina mal û welatê wî. Lewra dilê min jî ji welat hez dike, her cihekî nîştîman weke 'Hecer el-Eswed' ligel wî girînge.

Dûriya nîştîman Nalî wêran kiriye û dîn kiriye. Timî di fikra wî de bû vegere welat, çavê xwe li dar û barên welat bigerîne. Lê bi wê nexweşiyê serê danî û lewra dibêje:

*Dillî Nalî ke enîsî Qeredaxe êsteş*

*Daxî Serçawe û Dêwaneyî dar û dewene (Dîwanî Nalî, 1976, s. 527)*

Wate: Dilê Nalî niha, piştî wî temenî û ligel vê dûriyê jî dilê wî li Qeredaxe. Xerîbiya wê dike û di dilê wî de dijî. Ji ber dar û baxan pijiyaye, dîn bûye..

Bî vî awayî heskirina welat ligel Nalî gihiştîye wê astê ku bandorek zêde li ser jiyana wî ya li xerîbî û dûrîtiya welat hebû. Hewl daye bi rêya helbestên xwe tiştê di nava dilê xwe de derbixe. Ji ber ku "Helbestên nîştîmanî bi xwe heskirina vî welatîye û hestkirina bi vê peywendîya derûnê wê yekê digihîne ku welatîyan pêve girê dide, wisa lê dike pê serbilind be û ji bo wê qûrbaniyan bide." (Mhemed F. M., 1989)

#### 1.3.1.4 Helbesta Ayînî

Helbest û mûnacatî ayîn yek ji armancên din ên helbestên Naliye. Di vî warî de Nalî kesayetiyek oliye û weke 'Mela' dihat nas kirin. Xwediyê fikrekî Îslamî bû û di nava helbestên xwe de jî hewla dîtinên Îslamî daye. Ji ber ku "Pesnê ayînî, mûnacat û wesifkirina Pêximber (S.A.S) di vehûnandiyên Nalî de nexşên taybet ên xwe hene. Nalî vegûhandiya herî ciwan ji bo evîndariya Xweda û Pêximber (S.A.S) çêkiriye." (Mihemed H. , 2014, s. 9) Hevokên helbestên Nalî çavkaniyek dewlimend a ji bo tika (rica) û hewara li baregeha Yezdan bi tamamî diçe cîhana giyanî. Nalî li beramberî Pêximberê Xweda sinorek taybet heye, gelek bi soz û hestê ayînperweriyê ve pesnê wan daye. "Bi awayekê behsa Meke û Medîneyê kiriye. Tejî wêneyên nû ne, ji vir û pê ve wêjeya Kurdî tiştek wiha ne dîtiye. Dibe ku ew wêne di wêjeya ti gelekî din ê Misilman de neketibe ser kaxezê." (Mihemed M. K., Nalî Le Klaw Rojney Şerekanyewe, 2009, s. 39)

Ligel Nalî Pêximber û Medîne gelek giring bû û bi çavek pîroz temaşeyî Medîne dikir. Ji ber ku bajarê Pêximber û cihê aramiyê bû. Di parçe helbestekê de mûnacatek tejî soz dikeve ber çavan û derbirînê li ecêbmayîna xwe li beramberî deshilat, karê Xweda, pîroziya Medîne, bêhna xweş, ciwanî û rengîniya wî cihê nîşan dide. Awazek wisa taybet di nav de heye û sozek wisa pêşkêş dike ku ligel derûniya Nalî digunce û bi wê ecêbmayîna li beramberî wî cihê pîroz heyî. Wiha dibêje:

*Ey Sakînî Riyazî Medîney munewere*

*Lutfê bike û biferimû Medîney mine were*

*Erşî berîn ke daîreye, Rewze merkeze*

*Ferşî zemîn be ersey teyîbe mûcewhere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 415-416)

Wate: Ey rûniştvanên di nava gûlistana bajarê Medîne yê pîroz! Rehmê bi min bike û bêje, ev bajarê nûrê ye û ez jî bêm xizmeta te. Erşî pan û berfireh ê Xweda ku jûrekî mezine, li tevayî cîhanê heye, merqedê Pêximber weke nûner e. Gerdûn jî weke ferşekî girtî û weke meydana Medîne ciwanbûye.

#### 1.3.1.5 Helbesta Civakî

Helbestên civakî di naveroka xwe de zêdetir giringiyê didin şaşî û şermîtiyên (fedî) civakê. Herwiha behsa pirsgirêkên civakê dike û çareseriyê lêhatî pêşkêş dike. Bi wateya ku "Pirsgirêkên civakê yên di warê hejarî, nezanîn, nexwendekarî, nexweşî û

aliyên şaş ên civakê eşkere dike. Di heman demê de jî helbestvan hewl dide çareseriyekê ji van pirsgirêkên civakê re bibîne. Di nava helbestvanên Kurd de, di wêjeya kevin û serdemane de hin helbestvanên me yên wisa hene ku hest bi derd û xemên civakê kirine." (Şukrîye, 1989, s. 82) Lewra helbestvan, "Di çarçoveya civakê de temaşeyî helbestê dike û divê dengvedaneke rast a serdema xwe be. Xwediyê wan dîtinan jî xwe di teoriyan de dibînin ku yên helbest bi jiyânê ve girêdane." (Qûmrî, 2002, s. 22)

Ji ber ku helbestvanên Kurd zarokên vê civakê ne, zêdetir hest bi şermîtiyên civakê dikin. Her helbestvan li gor têgehiştin û baweriya xwe balê dikişînin ser pirsgirêkên civakê û dîtina rêya çareseriyê. "Despêka serhildana vî corê helbestê ya di Kurmanciya Jêr de vedigere nîva yekem a sedsala 19'an û ji aliyê helbestvan Nalî ve serî hilda. Helbestvan di serdema xwe de rexne li şêx, mela, zahîd û sofîyan digirt ku timî kar û kiryarên ne ciwan ên sofî û zahîdiyan derdixistin." (Şukrîye, 1989, s. 82) Bi vê rêyê hewl daye ji bo van paşketinên civakê çareseriyekê bibîne. "Helbestvanên Nalî jî bi rêya 'Ciwaniyê' ve xwestiye çareseriyekê ji pirsgirêkên civakê re bibîne." (Tehsîn, 2007, s. 261)

Civakên paşketî bandorek xirab li Nalî kirine, bi helbestên hestiyar kiriye hawar û hewl daye, "Hewl daye civakê rizgar bike û xwe weke berpîrs dîtiye. Herwiha asta nizim a gel fêh kiriye û Nalî xwestiye û hewl daye civakê ji vê jîngehê pakij bike." (Ibrahîm, 2010, s. 115) Rexne li karên ne di cih de yên sofîyan girtiye. Di van hevokên helbestê de wiha dibêje:

*Rîşekey pan û dirêje bo riya xizmet deka*

*Zahîre her kes be tûl û erzî rîşîda riya (Dîwanî Nalî, 1976, s. 128)*

Wate: Filan kesî riheke dirêj û pan heye. Lê xizmeta Xwedê nake, panî û dirêjiya rihên wî nayê wateya Xwedanas e, tê wateya nîşana derewan. Eger ev armanc peyrewa Pêximber (S.A.S) be, gelek bi kêmî rihên xwe hiştiye.

Nalî weke derûnasekî (pîskolog) jîr, kesayetiyek rast û derûniya encamên civakê nas dike. Lewra li gor rewş û radeya wan mamele ligel her keseke dikir. Di helbestekê de wiha dibêje:

*Le xellwet hate der sofî gill û berdî beserma da*

*Meken meneî le ber xellwe ewîş taze xurûrêke (Dîwanî Nalî, 1976, s. 459)*



Wate: Sofî bi dîmen destê xwe ji cîhanê hilgirtîye, ji xelwe derket derve, herî û berê di destê wî de li serê wî da û bêyî rêzê li min bigire temaşeyî min kir. Li wî kesî negirim nû ji xelweya xwe derketîye û xwe mezin nîşan dida. Wisa dizanî ku di vê cîhanê de ji wî zêdetir ti kesek nîne û ti giringiya mirovên din ligel wî nîne.

Nalî dibîne ku ji ber paşketina civakê û xirabiya rewşa serdema jiyana welatiyan di astekî pir xirab de ye. Wê demê ji ber hejarî û nexwendewariyê, gelek kêr kiryarên tiştên ferhengî, hûnerî û rewşenbîrîne. "Tiştên ne di xeyalê wan de helbest, ferheng û zanîst. Lewra helbestvanê gel piraniya temenê xwe ji bo berekat, jiyana xelkê, zanyarî dayîna ji bo xelkê veqetandiye. Ji ber nexwendekariyê civak gelek paşketî bû, ji helbest û helbestvanên xwe fêr nakin." (Ibrahîm, 2010, s. 117) Lewra di van herdu hevokên helbestekê de wiha dibêje:

*Eumrêke be mîzanî edeb tuhfe firoşim*

*Zorim wit û kes têy negeyî êste xemoşim* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 280)

Wate: Tekstek bû seng û hevsengiya helbesta min a ciwan, min di nava xelkê de belav dike û min di firoşt. Lê asta têgihîştina xelkê ewqas kêr bû, min çî tiştê got ji min fêr nekirin. Lewra ez niha wisa bêdeng bûm.

Li vir Nalî dike hawar, di warê civakî de ew civaka ji ber kûrbûna jiyana û paşketinê ne dikare hunera ciwan fêr bike û ne jî di asta wê yekê de ye ku qedrê hunermend bigire.

## **1.4 Zimanê Helbesta Nalî**

### **1.4.1 Zimanê Helbestê**

Zimanê helbestê yek ji wan corê zimananeye ku ji bilî helbestvanan hemû nikare nikare bikarbîne. Bêgûman hemû kesên ku di lêkolînên ziman de giringiyê didin zimanê helbestê, baweriyek yekcarî bi wê yekê hene ku zimanê helbestê cûdahiyek di awayê zimanê xelkê "Yek ji wan sîmayên (rû) ku dîtina îrfan bi kesek din diçe, ew e ku dîtina hunermend û wêjevanan dîtinek kûr û hûr a di wate û nirxên jiyana de heye. Dîtinek bi wateyek diyar û rûyê veşartî dibînin. Dîtinek bi kûrahiya regezêk asayî û dûbarekiriyan de jî nizim dibe, dîtinek ku wateyek nû dide amaje û hêmayan. Dîtinek ku bi wateyekê razî nabe û di nava bersivan de pirsyanan çêdike." (Fiwad, 2012, s. 6) Her dîtina jî wisa dike ku helbestvan xwediyê zimanek taybet be û herwiha xwediyê hinek taybetmendiyên wisa be ji zimane asayî (normal) ê civakê cûda bike. Ji ber ku "Helbest

coreke ji ziman û destê her kesê nagihyê. Ji bilî kesên ku jêhatiyek mînak hene." (Xanzad, 2012, s. 8) Ligel Arîsto jî wiha ye: "Eger hemû peyv xwezayî bin, dibin metel û eger hemû peyv wekhev bin, dibin alozî û bilozî." (Eezîz, 2011, s. 83)

Bêgûman helbest bêyî ziman nayê çêkirin, lewra pir girînge ferhenga helbestvan a peyvên dewlimend be. Ji bo bikare ziman bi awayekê bikarbêne ku bi bandor be, sûdê bigihîne û neteweyê. Ew bandor jî bi awayekê be nekû tenê ji bo serdema dayîkbûna helbestê be, belkî ew zimanê helbestê ji bo siberojê jî her zindî bimîne. Çi dema bikeve ber çavê xwendekaran, hest bi ciwanî û bandora wê helbestê bê kirin. Ji ber ku, "Ji ber ku berhemên wêjeyî ji bo civakê tîr vegûhestin, elbet jîrîtiya helbestvan, nivîskar û xwestek sedema herî bihêz a hilberîna wêjeyê tê hêjmartin." (Hîmdad, 2007, s. 96-97) Helbestvan hewl dide çawaniya derbirîn, dariştin û bikaranîna ziman bi awayekê bixe berçavan ku xwe ji kesên hêsan (normal) cûda bike. Li aliyekî din jî taybetmendiya awa û rêbaza xwe ji helbestvanên din cûda bike. Ji ber ku; "Ziman pergaleke serekî ya helbestê ye, yek ji pêkhate û regezên wêneyê hûnerê ye. Her helbest ji gelek peyvên pêk tê, ev peyv jî bi awayekê komek amajeyan bi hev ve hatine girêdan. Bi wateyekî din jî her helbestek ji ber yekhelweşene ji gelek peyvên pêkhatiye." (Hawjîn, 2009, s. 39-40)

Peyv di helbestê de tê bikaranîn û bi ti awayî wateya wê ya taybet bi tenê diyar nabe. Belkî wateyek kûrtir û efsaneyî heye. "Ji ber ku zimanê helbestê, zimanek bê kêmasiye. Ango peyv û biwêjên zêde di nav de tîr bikaranîn. Her peyv û wajojek ne di cihê xwe yê jêhatî de û tiştekê bi hev re neke, yan jî taybetmendiyeke dernexe, bikaranîna wê zêde ye û di helbestê de diyar dibin." (Cemal, 2013, s. 45) Helbestvan jî avakerên berhemekê ne, divê di bikaranîna zimanê helbestê de cûda bin. Ji ber ku "Di helbestê bikaranîn ziman ji her gotinekî derveyî helbestê cûda ye. Ji ber ku rolê ziman di wî karê hûnerî de gelek nazîk û bikaranîna wê hûnerê jî vedigere hunermendî, pisporî û jîrîtiya helbestvan. Ji bo bi vî zimanî bikare hestên xwe bigihîne xwendekaran. Ev kiryar jî vedigere ji bo hunermendî û deshîlata helbestvan a li ser ziman de." (Xanzad, 2012, s. 38) Eger helbestvan di berdestkirina ziman de ne lêzan û hunermend be, wê demê bi ti awayî wê karîna wê yekê jî nabe ku ziman bi awayekê bikarbêne û ji her gotinek ji derveyî helbestê cûda be. Li aliyekî din jî helbestvan nikare aliyê dengî û heya wijdana xwe jî bi awayekê eşkere bike û cihê pejirandina xwendekarên helbestê be. Dibe ku her yek ji me bi xwendina helbestekê fikra wî ji bo cihekê biçê, bêyî ku berê ew helbest bihîstibe. Ev jî ji ber wê yekê ye ku berê agehdariya wî ji awayê ziman û peyvên helbestên din ên helbestvan hebe. Bi awayekê ji helbestvanên din cûda dike. Agno ew

taybetmendiye helbestvan wisa dike ku ji helbestvanên din cûda bike û awayên taybet bideye, "Ji ber ku ger wêje zanist be, wê demê ceribandina helbestê jî ceribandinek zimaniye. Ger helbestvan karîbe ji bo armancên xwe birexsîne û bixemilîne, bêyî karîna dîtina xwe zimanê helbestê divê mûzîk û fikir di nav de hebe." (Xanzad, 2012, s. 38)

Lewra helbestvan dema xwesteka wî ji bo heskirinê biçê, piştê hewl dide û ya di mejiyê xwe de dinirxîne. Bi awayekî herî ciwan, zimanek herî nazik û teji peyvên bi awaz berhemtîne. Ev jî vedigere ji bo jêhatiya helbestvan û ji bo bikare bi awayê ziman bikarbîne ku xwendekar bizanin helbestvan zimanek mûzîkê bikartîne. Ev jî wisa dike ku "Helbestvan bi rêya ziman hewl dide ku cîhanek teji ciwanî bingeh dane û ji dilê tiştê mijarek din mîsoger bike. Hêvênê wê jî di helbestê de binirx dibe." (Azad, 2009, s. 8) Lewra, Poul Valery dibêje: "Helbestvan bi rêya ziman bingehê helbestê çêdike. Bingeh û regezên serekî yê din ên helbestê yê weke, 'Mûzîk û Wêneyê Helbestê' ji ber ziman tîncamdayî. Mînak; peyv kelûpela despêkê ya helbestê ye, yek ji sedemên ciwanî û bi bandor a di helbestê de ye. Ji ber ku mûzîk û awaza helbestê jî peywendî bi peyvên ku helbestvan bikartîne ve heye. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin, zimanê helbestê weke regeza serekî ya bingehê teksta helbestê tê danîn." (Cebar, 2008, s. 89)

Her peyv jî xweza û pêkhatiya xwe heye. Helbestvan di bikaranîna wê de gelek aghdare û divê bizane çawa û li kûderê çî aliyekê bikarbîne. Ji bo gihandina çî wate û armancekê destê xwe ji bo wê dibe. "Helbestvan di nirxandinê de ligel peyvê, divê her weke hûstayê dîwarek şareza reftar bike. Hûstayê şareza dizane çî berekê bikarbîne, çawa û li kûderê, bi çî awayî bikartîne; ji ber dîwarê wî rêkûpêk û ciwantir be. Helbestvanê zana û bi deshilat, peyvê bi wateyên wê yê ferhengê bikartîne, enerjî û hêzeke nû dideye." (Cemal, 2013, s. 45-46) Li vir armanc ewe ku ziman peyva ziman bingehê serekî yê helbestê bi giştî, xala destpêkirina mûzîk û wêneyê helbestê jî bi taybetî. Ji ber ku eger ziman û peyvên ziman nebe, wê demê helbest jî çênabe. Êdî bikaranîn û berdestkirina vî zimanê helbestê ji helbestvanekê ji bo helbestvanek din ji hev cûda ye. Helbestvanê rast jî ewe bi awayekê peyv û biwêjan bikarbîne ku timî hewla wê yekê bide dahênanên (îcat) nû di bikaranîna peyvên de bike. Ango asayîye helbestvan çawa destkariya peyvên bike, lê bi şertê ku ew destkarîkirin nebe sedemê aloziyên ziman. Herwiha peyvên di jiyana rojane de tîncamdayî û di nava civakê de diyar in, werin bikaranîn. "Ji ber ku helbest rabûna ser pê ya peyvane. Di nava zimanê rojane de peyv mirîne û ne baldarin, lê di helbestê de zindî ne, balkêşin û peyvên derdorê jî zindî dikin." (Ebdulselam, 2010, s. 52)

Bi vî awayî helbestvan di hewla wê yekê de ye ku peyvên di jiyana rojane de mirîne û di nava civakê de ne baldarin, zindî bike. Yakubsin dibêje: "Helbest berhemê jîrîtiya ciwaniya zimane." (Eebdulsalam, 2010, s. 53) Lewra mirov dikare wê yekê bejê ku zimanê helbestê heman zimanê wê civakê ye yê helbestvan helbestê jêre dinivîsîne. Lê helbestvan bi zimanek ciwantir û bi rûyekî din dihûne. Dixwaze, "Peyamekê bigihîne û bi armanca xelk jê fêhm bikin, lê têgihîştinek bi rêyeke cûdatir." (Mihemed E. E., 2012, s. 129) Weke me berê jî behs kirî, tiştek asayî hinek caran di helbestê de ziman bi awayekê were bikaranîn ku ew peyv û biwêj di jiyana rojane de nehatibe bikaranîn. Divê xwendekar zêdetir hewla wê yekê bide ku bigihe wê armanca helbestvan dixwaze û armanca wî li ser heyî. Lewra pêwîste xwendekarê helbestê heta wê asta têgihîştina her helbestekê bi hêsanî biryarê nede başe yan xirabe.

#### **1.4.2 Zimanê Helbestên Nalî**

Helbestvanê navdar ê Kurd Nalî pêşengê qonaxeke wêjeya Kurdiye, kariye bi awayek dahênan (îcat) helbestên xew bi peyv, enerjîyek bandor û baldar binivîsîne û lihev bêne. Karî helbesta Kurdî bigihîne lûtkeyê û weke stêreke dîtayî di wêjeya Kurdî de diyar dibe. "Her çendî mirov li ser Nalî binivîsîne, mirov nikare bigihe asta vehûnandiyên wî. Ji ber ku ligel navê wê, xeta klasîk weke tîrêjekê tarîtiyê ronî bike û dibe nîşan ronîbûna wê serdemê." (Kemal, 2003, s. 120) Ev jî bû rêberê wê tevgerê û kariye, "Ceribandina helbestên bi wî awayî bêne holê, di aliyê hunerî de di asta helbestên klasîk ên Farisî, Erebî û Tirkî de be." (Avan, 2013, s. 20) Bi xeyalek bilind fêrî, "Helbest ew hûnera mezine û dikare şan û rêzdariya Kurd û welat weke gelên din birêve bibe. Bi wê sedemê jî taca rûmetê li ser mile wî dane. Lewra bi awayek hişmendî û jîr berê xwe daye ceribandinek nû ya helbestê. Herwiha bi awayek jîrane karî di nava cîhana helbesta Rojhilatî de welatek helbestê bi zaraveyê Kurmanciya Jêr û zimanê Kurdî bingehê wê çêke û heta dawîya temenê xwe deshilatdar be." (Dilşad, 2004, s. 40)

Bi hostayî peyv hîlbijartiyê, piraniya peyvên xwe bi awayekê dariştîye ku di helbestê de yeke û çend wateyên wê hene. "Ji ber ku ewqas şîroveyên bê wate di nav de ne û şîrovekirina wan jî zehmete. Eger mijara wê jî ne kûr û berfireh be, cihê wan nake. Ji bilî vê yekê em gihişt textê jêr deryaya beytên wî. Tiştê rast ango encama helbestên wî pêwîstî bi alîkariya wêjevanan heye. Ji bo her yek ji wan di nehênîyên beyt û dû beytiyan de çî ji wan re eşkere dibe, bixin di nava xezîneya vehûnandiyan de." (Meseûd, 2010a, s. 73)

Bi awayek ciwan û bi bandor ji bo xwendekaran eşkere bibe, ji bo tamê ji peyv û mana wan wergirin; ji ber ku, "Helbestên Nalî tejî wateyên yek li pey yekê ne û hîlbijartina peyvan ji bo wateyên ku di armanca wî de bûn. Bi zanabûn û baldarî peyv bikartanî. Ev li aliyekê û li aliyê din jî bi wêneyê bi mamostayî û jêhatî peyv bi awayekê xistiye di qalibê helbestê de û mirov hest bi biyaniya wan peyvan nake." (Eebidelhemîd, 2013, s. 99) Yek ji rûyên ku Nalî şanaziyê (serbilindî) bi xwe dike û karîna gotina helbestan ewe ku bi Kurdî helbest nivîsandiyê û gotiye. Ji ber ku "Zimanê Kurdî di bin bandora wêjeya Erebi, Farisî û Tirkî de bû. Lewra di wê serdemê de wiha hatibû belav kirin ku kesên bi van zimanan nenivîse, nikare helbestan binivîsîne. Piraniya helbestvanan di nava hewldanan de bûn ji bo bikarin bi van zimanan helbestan binivîsîn." (Heme, 2011, s. 9) Tevî hemû astengiyên nivîsandina helbestan, ligel Nalî bi Kurdî û bi zaraveyê Kurmanciya Jêr ji bo wî ne îcatek mezin bû.

Di wêjeya Kurdî de ev rewş jî ne di bê karîna Nalî de bû, dema hatî û bi Kurdî helbest nivîsandî. Berekajî armanca wî dahênanek wisa bû ti kesekê berî wî ew tişt nekiribe. Berî wî hinek dîtînen wisa hebûn ku nikare bi vî awayî binivîsîne. Lewra Nalî xwe ji bo bersivdayîna wan kesan amade kiriye; "Di helbestên xwe de gelek bi hêsanî hestê xerîbiya helbestên wî ligel hinek helbestvan û nivîskarên di dema xwe de kiriye rastî. Bersiva kesên bi vî awayî dide yên ku heneg (laqirdî) bi Nalî kirine ku wî bi zimanê dayîkê bi zimanê Kurdî helbest gotiye." (Eebidelhemîd, 2013, s. 101) Ji ber vê yekê, "Berî Nalî zêdetir li xwendekarên serdema xwe yên ku ji helbestên bilind û tejî hûner tînegihin. Herwiha dibe ku xwezaya xwendekarên wê demê zêdetir meyla wan ne li ser helbestvan û wêjevanên Kurd be. Dibe bi çavekî nerênî temaşeyî wan kiribe û vê yekê jî wisa li Nalî kiribe rexneyan li wan bike." (Heme, 2011, s. 16) Bi helbestê behsa nivîsîna helbestê bike û bi zimanê Kurdî bersiva wan kesan bide yên ku di wê baweriyê de ne Nalî karek baş nekiriye. Di vê helbestê de wiha dibêje:

*Tebeî şekerbarî min, Kurdî eger însa deka*

*Îmtîhanî xoye meqsudî le 'Eemda' wa deka*

*Ya le meydani fesahetda be mîslî şehsiwar*

*Bê teemûl bew hemû newee zubanî radeka*

*Kes be elfazim nellê xo Kurdiye xo Kirdiye*

*Her kesê nadan nebê xoy talîbî meena deka (Dîwanî Nalî, 1976, s. 106-107)*

Wate: Zewqa şîrîniya min ku ligel wî de diçe û bi Kurdî helbestê bêje, ne ji ber wê yekê ye ku Kurdiyêk hêsane, deshilat li ser Erebi û Farisî naşkê; belkî ji ber wê yekê ye ku dixwaze xwe biceribîne û ji bo bizane tiştêk nû ji destê wî tê. Ji vir û pê ve ti kesê nekiribe ku gotina helbestan li ser erûzî Erebi bi zimanê Kurdî, yan na? Yan jî armanc ne xwe ceribandin e. Xwezaya helbestê ewqas siware, bêyî ku guh bide ew peyv Farisî, Erebi yan Kurdiye, lê wî hemû bikaraniye û xwe ligel hemûyan guncandiye. Bila ti kes gazindan ji min neke û bêje, helbestên wî Kurdîne û her helbestvanek bixwaze dikare bi Kurdî bêje. Belê raste gelek helbestvan hene dikarin bi Kurdî helbestan birêxistin bikin, lê helbest bi xwe ne tenê hevsengiya du qafiye û redîfane. Helbest berî her tiştî divê naveroka wê hûr, sade û bi wateyên kûr bê danîn, di helbestê de li pey wê yekê digerin û destê wî jî bigihe helbestvanên mezin û ji bo sûdê ji wan wergire.

Ev serbilindiya Nalî ya bi nivîsîna helbesta Kurdî, peywendî bi neteweyekê ve heye. Ne ji bo wê rojê, belkî ji bo piştî xwe jî cihê serbilindiyê ye; "Ev yek têrê diek ku ligel Farisî, Erebi û Tirkî zaniye, lê bi Kurdî helbest gotiye û nivîsandiye. Wekî hevîr lîstik bi peyv û hevokên Kurdî û peyvên zimanên cîran kiriye." (Ebdûlkerîm, 1976, s. 64)

Nalî her ligel wê yekê ranewestiya ye ku bi zimanê Kurdî helbest nivîsandiye, helbestên xwe ligel helbestên kesên din berhev kiriye. Helbestên xwe bi tallî evrîşemê datîne û helbestên kesên din jî weke petik "Helbestên ti helbestvanekê jî di warê hêz û cihê helbestê de nahiye helbestên min. Eger kesek bixwaze di vî warî de berheviyê bike, divê bizane ne jîrane û manewiye, werîsek ji bo barkêşana ji mûyê bizinê vedihûhand, ji mûyekê pûrê yan jî yê derziyê dinirxand." (Ebedelhemîd, 2013, s. 101) Lewra dibêje:

*Şeirî xellqî key degate şeirî min bo nazikî?!*

*Key le dîqetda petik deewa legel hewda deka (Dîwanî Nalî, 1976, s. 107)*

Wate: Helbestên xelkê bi ti awayî di nazikiya xwe de nagihin helbestên min. Li gor helbestên xelkê, wekî taya evrîşimê ye û diyare. Diyare werîs jî qet nikare di ziravî û nazikiyê de hevrikiyê ligel taya evrîşemê bike.

Nalî bi berhevkirina helbestên xwe ligel helbestên helbestvanên din ranaweste. Belkî dibêje, helbestên min bi awayekê ne ku ewqas binirxin, her kesê li pey tiştên binirx bigere, bila bê misodeyên parçe parçekirî yên helbestên min bibe. Li cihê wan misodan jî, bila rihê xwe bibexşîne. Di vê helbestê de dibêje:

*Bête hucrem parçe parçey mûsûdem bîkrê be roh*

*Her kesê kutall û parçey bê bedell sewda deka* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 107)

Wate: Yê li pey parçeyên binirx digere, bila were hucreya min. Bila reşnivîsên min ên parçe parçe bikire û li cihê wan canê rihê xwe dane. Bi vê yekê jî hê ew qezenc dike.

Nalî hêz û karîna tenê di Kurdîniyê de nabîne, karîna wî li ser zimanê Farisî û Erebi heye ku helbestan binivîsîne û cûda bike. Ji bo yên dibêjin, nikare bi zimanên din helbestan binivîsîne, lewra bi Kurdî helbestan dinivîsîne. (Jêhatiyên xwe nîşan dide, wê yekê ji me re diyar dike ku dikare bi sê zimanan helbestan binivîsîne." (Eîzedîn, 2009, s. 75) Di vê helbestê de wiha dibêje:

*Fars û Kurd û Eereb her sêm be defter girtûwe*

*Nalî emro hakimî sê mullke dîwanî heye* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 577)

Wate: Îro deshilata min li ser van hersê zimanan heye. Min bi hersê zimanan helbest xistine di deftera xwe de. Dîwana helbestên min bi van hersê zimanane heye.

Eger bi wî awayî be, Nalî dixwaze li vir bêje ku Zimanê Kurdî ji bo nivîsandina helbestan di asta zimanê Erebi û Farisî de ye û min hersê xistine di nava dîwana xwe de. Zimanê Kurdî di rêza zimanê Erebi û Farisî de daniye. Bi hersê zimanan ranaweste, di hin helbestên xwe de zimanê Tirkî jî dixwe di nava helbestekê de û bangî evîndara xwe dike. "Helbestên bi vî awayî ji zimanê filozofan derketine, ne ji zimanê helbestvan. Filozof giringiyê dide van û kakilê gotarê." (Sebah, le Mîhrabî Edebda, 2008, s. 53)

*"Gêl" Eger Turkî 'Teal' er Eerebî*

*"Bê" Eger Kurdî, eger Fursî "Bîya"* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 126)

Wate: Ji her neteweyekê bi zimanê wê neteweyê bang lê dikim û dibêjim, were.

Diyare ji bo wê demê zanîna zimanek din û di helbestê de bikaranîna wî zimanî, yek ji mercên serekî yê helbestvan bû. Bikaranîna peyvên biyanî di nava helbestan de yek ji taybetmendiyan serekî yê helbestvanan bû. Mercê wê jî tevî bi zimanê Kurdî nivîsîne, lê gotinên biyanî di nav de bikaraniye. Taybetmendiya Nalî di wê yekê de ye ku tevî di wê jîngehê de jiyan kiriye, lê li pey peyvên din û yên Kurdî geriyaye û di helbestê de bikaraniye. Lewra dibêje:

*'Nalî!' Zubanekey terr û parawî sewsent*

*Heyranî çawî nêrgise, wek lalle, nadwê* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 700)

Wate: Nalî zimanê dirêj, ter û sade weke pelkên sewsene, nikare helbestê bêje û ne hêjayî tiştekî mezin e. Heyranê çavê kesê çav li xewe, weke xewa wî tê û wisa hatiye serê wî. Lal kiriye û bêhêz bûye.

Li vir ew yek ji bo mirov derdikeve ku zimanê helbestê rolekî serekî di tekstên helbestê de dibîne. Helbestvan dikare bi peyvên pir ciwan, helbestek ciwanek binivîse û helbestek hestiyar be. Nalî kariye di helbestê de dahênanan (îcat) bike. Ji ber ku di dema Nalî bi Kurmanciya Navîn helbest nehatine nivîsandin. Her vê yekê jî wisa kiriye ku Nalî weke rêberê helbesta klasîkiya Kurdî yê zaraveyê Kurmanciya Navîn bê danîn. Di zimanê helbestê de rolek mezin leyîstiyê, dibistanek damezirandiye û gelek xwendekar li wir perwerde kiriye.

#### **1.4.2.1 Dûbarekirina Deng**

Dema xwendekar çavekê li helbestên Nalî digêrînin, encama wê bikaranîna berfireh a asta mûzîka di helbestê de zêdetir tamê ji helbestên wî werdigire. Ji ber ku "Di derbirîna wêjeyî de dûbarekirina danîna bawerî derbirîna de, bi aweyekê awazeke mûzîkê derdikeve ku daner armanc di helbest an jî pexşanan de çêdibe." (Nazdar, 2010, s. 85) Dûbarekirin bi yek ji bîngehên ciwaniyên awayê Nalî tê danîn, "Diyardeyek (fenomen) herî diyar a tekstên Nalî hevdengkirina zimanzanên hevok û beytên helbestan in." (Avan, Çinî Deq le Şeirî Nalîda, 2012, s. 110) Mînak, Nalî dibêje:

*Roxim rengînî rengî rumetî rengînte baza*

*Qedî serum kemanînî qedî şîrînte baza* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 95)

Wate: Ji ber rengê rûmeta te ya ciwan, rûyê min zer bûye. Vêca bila ji xema dûriya te ya ji ber şermezarbûna min a li ber çavê xelkê. Bejna weke ser û bilindiya



caran jî ji ber bejna te ya ciwan a weke tîran çemiya, ango were gel min û ji bo rewşa min jî weke berê lê were.

Em dibînin Nalî di hevoka yekemîn de 5 caran dengê 'R (Reya di soranî de Stûr)' dúbare kiriye û awazek ciwan daye helbestê.

#### **1.4.2.2 Dúbarekirina Peyvan**

Şêwazek diyar û eşkere ya Nalî, ji dúbarekirina peyvan a ji ber awazek hesteke xweş dide teksta helbestên Nalî. Mînak:

Sofi le feqir û faqe wekû faqe faqî da

Tesbîhî dam û daneye, rîşî du faqî faq (Dîwanî Nalî, 1976, s. 250)

Wate: Peyva Sofî ji ber hejariyê serê xwe netewandiyê. Lewra dest bi fêlan (hîle) kiriye. Tezbîhê wî yê ji vî alî ve weke bazin, weke davê ye û li wî aliyê din jî dengê wê weke yê ferxikane. Rihê wî weke vî alî û aliyê din ê davê ye ku xelk dikevin davê.

Di vê hevoka helbestê de bi dúbarekirina peyva 'Faqe' bi awayek asayî Nalî kariye awazek ciwan û nazik bide tekstên helbestên xwe.

#### **1.4.2.3 Paş û Pişt Xistin**

Helbestvan gelek caran ji bo ciwankirin û lihevkirina berhemeke helbestê, paş û pêşiyê ligel peyvan dike. Dixwaze karîna helbesta xwe nîşan bide ku çawa listikê bi peyvên ziman dike. Ji bilî vê yekê bandorê li xwendekar jî dike zêdetir hestê wan bixe tevgerê. Ev jî ji ber awaz û mûzîka wê ya di encama vê paş û pêş kirinê de derdikeve holê, ji ber "Mûzîk yek ji bingeheên herî diyar a helbesta Kurdî ya helbestên klasîkî ye. Bi taybet jî helbestvanên girêdayî vê eniyê karîne gelek teknîn û hunerên cûr bi cûr ên ziman ji bo bingehe mûzîka xort a ji bo başiyên zêde ye. Dema guhdariya helbestekê tê girtin, ligel te ciwan û xweş e. Tû balê dikişînî ser, sedema wê ewe ku tiştêk di nav de hatiye paş û pêş xistin, hêmaya wê ji cihekê ji bo cihek din biriye." (Nazdar, 2010, s. 134)

Helbestvan Nalî zû hest bi vê mijarê kiriye, gelek caran ji bo ciwankirinê helbestê û listkirina ligel peyvan, ev rêbaz bikaraniye. Mînak, di helbestekê de wiha dibêje:

*Herakatim sekenat û sekanatim herekat*

*Çuste sistî, qewîye zêif û, serîee keselim (Dîwanî Nalî, 1976, s. 290)*

Wate: Tevgerkirina min rawestiya ye û kes pê nizane. Lê di rastiyê de her di tevgerê de me û kar dikim. Timî di nava tevger û xebitînê de me. Sistiya min di asta xelkê de ye, ez di asta hêza wan de bêhêz im. Di asta lezkirina wan de tembel im.

Em dibînin di navîna hevoka yekemîn de, gelek bi ciwanî paş û pêşî bi peyvên 'Herekat û Sekenat' hatiye kirin. Carekê peyva 'Herekat' pêş dikeve û carekê jî peyva 'Sekenat.' Herwiha di hevoka helbestek din de gelek bi ciwanî ev hûner peyrew kiriye û dibêje:

*Keebe îşraqî wekû xurşîde, min çawim zeeîf*

*Lêm buwe roşin ke buedî qurbe qurbî bueede bom (Dîwanî Nalî, 1976, s. 301)*

Wate: Tîrêjên keebê weke rojê ne, ez jî mirovekim çavê dilê min kiz û kore. Kesek çavê wî kiz û kor be, heta ji xwe dûr be û neçe di bin sîberê de bimîne baştîre tû sûdê ji tîrêjên wê wergirî. Berevajî jî, bi çavê kiz û kor ve ev rastî ji min re zelal bûye. Ji min re derketiye holê ku heta ji tîrêjên keebê dûr bim, di rastiyê de nêzîktirim. Heta zêdetir biçim ber, kêmtir sûdê jê werdigirim.

Em dibînin Nalî di nîva hevoka duyemîn de bi awayek gelek lêhatî paş û pêşiyê di nava peyvên 'Weed û Qurb' de kiriye. Ango carekê peyva 'Weed' pêş dikeve û carekê jî peyva 'Qurb.' Ango mirov dikare bêje, paş û pêşxitina di helbestê de ewe ku helbestvan gelek caran di helbestekê de ji despêkê du peyvan bikartîne, paş û pêşiyê di nava wan de dike. Bi xwe spartina bi van mînakên jor, mirov dikare wê yekê bêje ku Nalî destekî bilind di vê hûnerê de hebû, gelek bi ciwanî û lêhatî bikaraniye.

## 2 PEYWENDIYÊN DI NAVBERA OL Û WÊJEYÊ DE

Mirov ji despêka dîrokê ve li pey zanyariyên jiyânê, li pey rastîbûn û nehênîyên (tiştên veşartî) jiyânê digere. Ev berhemê yekemîn ê gihiştina mirov û xwezayê ye. Eşkereye ku aliyê giyanê amadeyî di çalakiyên cor be cor ên weke; stran, helbest û efsaneyan de hebû. Peywendiyên di navbera ol, Îslam, helbestên cihê baweriyê û xort, ji ber ku Xwedayê mezin bi xwe behsa helbest û helbestvanan kiriye. Di ti serdemekê de nehatiye qut kirin, berî ola Îslamê û piştê jî. Ji ber ku helbest, "Di serdemên paşketî de cihêkî giring ê pêdiviyên civakan bû. Ligel warê ramiyarî, abûrî, ayîn û leşkerî peywendî hebû. Rolek giring leyîstiyê. Omerê Kurê Xetab wiha dibêje: Helbest pênaseya netewayetiye û ti pênaseyek jî ji vê pênaseyê baştir nîne. Hêz û bandora wê ya di wê serdemê de gelek ji ya şîr û tîran bibandortir bû, kûrahiya herî mezin a zanyariyên Ereban jî bû. Heta Pêximber (S.A.S) di got, Di gelek helbestvanan de pend û îmret hene.' Giringiya helbestvanan berdewam bû. Dema di nava eşîrên Ereban de helbestvanek derketiba, wê demê hemû rûspiyên eşîrên din dihatina serdana wê eşîrê û pîrozbahî lê dikirin." (Eelî S. M., 2010, s. 8-9)

Ji ber ku Îslamiyet ji dema serî hildayî ve xwediyê fikrek nû û xwediyê bangewaziyek ayînî, civakî û ramiyarî bû; li ser bingehe baweriyaya yekxwedayî û serşorkirina "Tenê ji bo Xweda, tenê û dûrketina ji çêkirina xirabkiriyê û avakirina civakek nû ya hevgirtî ya ji bo bihêzkirina peywendiyên mirovan di hemû warên jiyânê de. Di warê civakê de yekîtiya civakê çêkir, bingehe exlaq, heskirin û bi hev re jiyankirina encamên civakê bi hev ve girêda. Bi hemû karîna xwe hewl daye ku reyê netewperestî û demariya eşîrtiyê jinav bibe. Di encama van dîtinan de hemû hewldanek a Misilmanan ji bo gihiştina armancên wan bû. Ji bo bihêzkirina yekîtiya rêzên civakê û ev jî tişteke ji bo şoreşek mezin a di jiyana paşketinê de serî hilbide. Ev gotine berî Îslam rast bike, ev hemû guhertinane jî di wê qonaxê de karên mezin di naveroka helbestan de kirin. Bi dewle serê Pêximber (S.A.S) û xelîfeyên wî bi cih bûn." (Eelî S. M., 2010, s. 7-8) Her ji ber vê yekê jî helbestvanên rast, di civaka Îslameyetê rêz li wan dihat girtin. Êdî mijara helbestên wan çî be, ev yek ji nirxê wan kême neke. Eger hat û mijarên wê ji mijarekê derket, xwediyê wê tekoşer, xwedanas û bi ezmûn be. "Bê gûman ev merc tevî ku bi kurtî di Qur-ana Pîroz de hene, lê ligel me destûrê kûr, xort û saz dikin. Dîroknas û rexnegirên rast dikarin şîrove bikin, li pêşiya tîrêjên felsefeya ola Îslamî ya Pîroz li ser rêyên rexnegirên Yûnanî, Romanî, Ewrop û serdemane berhev bikin. Bigihe encamek zanistî ku dibêje, dirûşmeya (silogan) 'helbest' ji bo gel, 'helbestvan' ji bo bilindkirina

ala xebat û peyamnêran a di vehûnandina helbestê de ji bo tekoşîna li dijî stemkaran ji Qur-ana Pîroz destpê dike, ne ji cihekî din. Dirûşmeya peyamnêriyê di vehûnandiyê bi wî awayî re, bingehê dakatûna û di bin sîbera Qur-ana Pîroz de asoya (ufuk) pêşvebirinê saz kir." (Kamil, 1983, s. 43)

Li vir ji bo helwesta Îslamê ya li beramberî helbest û helbestvanan, pêwîstiya me bi çavkaniyek giring heye. Ji bo em zêdetir dîtîna û warê Îslamê ya li beramberî helbest û helbestvanan piştî xwe pê girêbidin. Ji ber ku serdema berî Îslamiyet û serdema serhildana Îslamiyetê jî 'Helbest' weke tekane amraza wêjeyî di berfirehiya mîlmilaneyê tekane siwar bû regezên din ên wêjeyê yan jî her nebûn, yan jî lewaz û kêmbûn. Lewra di mijarên peywendiyên ol ên ligel wêjeyê, behsa peywendiyên navbera ol û helbestê dikin. Belgeya herî mezin a ji bo dewrê helbestê ya di wê serdemê de ewe ku Qur-ana Pîro gelek caran behsa helbest û helbestvanan kiriye. Emê behsa wan jî bikin.

## **2.1 Helwesta Îslamiyetê ya Beramberî Helbest û Helbestvan**

### **2.1.1 Helwesta Qur-anê ya Beramberî Helbest û Helbestvan**

Eger cihê helbest û helbestvan bikeve di Qur-ana Pîroz de, di gelek cihan de hatiye û berî Qur-ana Pîroz hemû aliyên jiyana neteweya Ereb û neteweyên Misilman ên din girtiye stoyê xwe. Ji ber ayetên pîroz ve, destûra gihiştina armancên vê jiyânê, ji keyfxweşiya mirov û pêşketina civakê dariştine, awirek dane vehûnandî û helbestvanan. Vêca eger em ji vir ve li pey peyva 'Helbest' a di vê pirtûka Pîroz de bigerin û ji bo em bizanin beşa vehûnandiyê çiye? Ola Îslamê çawa temaşeyî helbestê dike û ew ayetên pîroz tene ku di xwezaya vehûnandî û cihê helbestvanan di civakê de behs dikin. Eger em di vê ayeta pîroz de hûr bibîn û çavekê bidinê, dû helwest ji bo me derdikevin. Ango tû beş ji bo me cûda dibin. Xwedayê Mezin di gelek cihan de behsa helbest û helbestvanan kiriye û bersiva kafîran daye. Kafîrên Qûreyş bi helbestva gotinên nexweş ji Pêximber (S.A.S) re di gotin, tohmetbar dikirin û di gotin, Pêximber (S.A.S) helbestvan e. Xwedayê mezin di sûreta 'El-Enbiyae' û di ayeta (5) de wiha dibêje:

"بَلْ قَالُوا أَضْغَاثُ أَحْلَامٍ بَلْ افْتَرَاهُ بَلْ هُوَ شَاعِرٌ فَلْيَأْتِنَا بآيَةٍ كَمَا أُرْسِلَ الْاَوَّلُونَ (5)" (Qur-an

Enbîya:5)

Wate: "Ne her ewqas li beramberî Qur-anê bêjin, belkî gotin ev Qur-an ne raste û valaye. Xewnew neraste. Na, belkî Mihemed (S.A.S) bi xwe çêkiriye! Belkî helbestvan û vehunandiyek be, bi xwe ev Qur-an vehunandîbe. Vêca eger rast dibêje û Pêximbere,

bila belge û nîşanek ji derveyî Qur-anê ji me re mûcîzeyeke weke ya Pêximberên berê bêne. Ji ber ku ew bi belge û nîşan hatine şandin." (Ehmed, 2012, s. 529)

Herwiha Xwedayê Mezin di sûreta 'Yasîn' û di ayeta (69-70) de wiha dibêje:

"وَمَا عَلَّمْنَاهُ الشِّعْرَ وَمَا يَنْبَغِي لَهُ إِنْ هُوَ إِلَّا ذِكْرٌ وَقُرْآنٌ مُبِينٌ (69) لِيُنذِرَ مَنْ كَانَ حَيًّا وَيَحِقُّ الْقَوْلُ عَلَى

الْكَافِرِينَ (70)"(Qur-an Yasîn:69-70)

Wate: "Xwedayê Mezin dibêje, me bi ti awayî helbest û vehûnandî fêrî Mûhemmed nekiriye, gotina vehûnandiyan ne hêjayî wî ye. Tişta ew jî dibêje, her pend û amojgarî (şîret) ne. Qur-anek zelal û eşkereye, nekû helbeste. Jib o kesên dilê wan zindî û bawermend bitirsîne, soza hatina cezayê Xwedê jî ji bo bêbaweran cîbicî bike. Ji ber ku çî tişta di nava dilê wan debe, veşêrin û her tişteke jî eşkere bikin; bêgûman em her tiştê dizanin." (Ehmed, 2012, s. 715)

Tiştê di van ayetên jor de behsa wan hatî kirin, behsa helwesta kafîran a li beramberî Qur-anê bandor li ser hestan û heta ji bo wan îspat bikin ku Qur-an ji aliyê Xwedayê Mezin ve ji Pêximber Mûhemmed (S.A.S) re hatiye şandin. Ji ber ku hemû ji bo parastina pakîtiya Pêximberê û ji bo nezanin ew helbestvane, weke ku wan behskirî. Qur-anê li vir behsa helbestê weke hunereke gotinê nekiriye. Ji bo Îslam bikare bikarbîne yan jî haram bike. Belkî me behs kir ku ji bo pakiya Pêximber û cûdakirina Qur-anê ya ji helbest, ji gotinên Erebb û anîna xwar a ji aliyê Xwedayê Mezin ve. Lewra Pêximber Mûhemmed (S.A.S) .

Di dawiyê de "Di tû ayeteke Qur-anê de behsa wê yekê nekiriye ku Qur-an weke helbestê ye û behsa wê yekê dike ku Pêximber (S.A.S) ne helbestvane. Qur-an jî gotinên Xweda ne û ne helbest in. Erebb ewqas bi zimanê xwe serbilindbûn û bi helbestên helbestvanan ev wêje digihandin çin û neteweyên derdora xwe. Qur-anê xwest gotina Xweda ji helbestên helbestvanan cûda bike." (Eelî S. M., 2010, p. 20) Lê li cihekî din di Qur-ana Pîroz de Xwedayê Mezin behsa helbestê kiriye, ya ku bûyî sedemê axaftinek zêdetir a ji bo berdewambûna helbestvanan a li ser gotina helbestê. Xwedayê Mezin di sûreta 'El-Şueera' û di ayeta (224-227) wiha dibêje:

"وَالشُّعْرَاءُ يَتَّبِعُهُمُ الْغَاوُونَ (224) أَلَمْ تَرَ أَنَّهُمْ فِي كُلِّ وَادٍ يَهِيمُونَ (225) وَأَنَّهُمْ يَقُولُونَ مَا لَا يَفْعَلُونَ

(226) إِلَّا الَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ وَذَكَرُوا اللَّهَ كَثِيرًا وَانْتَصَرُوا مِنْ بَعْدِ مَا ظَلَمُوا وَسَيَعْلَمُ الَّذِينَ ظَلَمُوا أَيَّ

مُنْقَلَبٍ يَنْقَلِبُونَ (227) " (Qur-an El-Şueera:224-225-226-227)

Wate: "Pêximber ne helbestvan e. Helbestvan kesên bi guman in û mirovan li ser rêya rast dibin. Gelo ma hûn nabînin ev helbestvanane li hemû niwal û şîvekê de serî radikin, behsa her tiştekê dikin. Îro pesnê kesekê dikin, sibehî jî tiştek din li ser dibêjin. Diyare ev yek belgeya wê yekê ye ku ew li pey rastiye nakevin, lewra bi vî awayî serûbin dikin. Bi rastî tiştekê dibêjin û bi xwe jî li gor wê kar nakin. Xelkê ji bo bexşîş û fedekariyê dixapînin, lê bi xwe jî vê yekê nakin. Ev jî pîşeya helbestvanên xirab bû. Lê yên bawerî bi wan anîne û karên baş dikin, Xweda li bîra wan, behsa Xwedaperestiyê dikin, behsa Pêximbertî û bangewaziyên wî dikin, bi karîna hene piştgiyariya bawermendan dikin. Eger hinek stem li wan bê kirin, tola xwe hildidin. Yê wisa stem jî kirine, piştî xwe dane Îslamê û dizanin wê di demek nêzîk de ji bo cihekê bîn vegûhestin." (Ehmed, 2012, s. 615-616)

Ev ayetane bûne sedemê wê yekê ku bandorek mezin li Ibnî Reşîd El-Endilûsî bike û wisa lê bê ku di pirtûka 'El-Emde' de beşekê binivîse. Ew jî bi navnîşana 'Dergehê ji bo bersivdayîna kesên kina wan li hemberî helbestan heye' gelek behsa gotinên Pêximber (S.A.S) û xelîfeyên wî dike ku gelek kina wan li hemberî helbestan nebû. Tiştî herî girîng ku behskirî û di wî dergehî de bûye bersivê, tiştî dîtî û sûretek bi navê 'El-Şueera' hat. Ibnî Reşîd dibêje: "Armanca vê beşê ew helbestvanên kafirên ên ku bi xirabî behsa Pêximber kirin. Berevajî her kesê ji Misilmanan bersiva kafiran dida. Pêximber (S.A.S) di derbarê yê weke Hûsan Bin Sabit, Keeb Bin Malik û Abdûllah Bin Riwahe de wiha dibêje: Ev hersê kesane ji hemû Qureyşiyên baştir in. Pêximber (S.A.S) ji Hûsan re di got, Êriş bike, ango Qureyşiyên. Ji ber ku zimanê te di tarîtiya şevê de ji tîrê bihêztir e û Cibraîl ligel te ye. Eger helbest gûnehbûya, wê demê Pêximber (S.A.S) helbest bikarnedî, ferman nedida û guh bide. Weke ku Pêximber (S.A.S) gotî, Her kesê dilê wî teji be, ji bo ji dîn meşxûl bike û dûr bixe, di ferzên xwe de nekare navê Xwedayê Mezin bêne û Qur-anê bixwîne, weke helbest an jî her tiştek din, her kesê li ser vê rêyê bimeşe weke strancê herame. Lê eger ji bo Xweda û Pêximber be, wê demê destûr tê dayîn ango ne herame." (Ibnî Reşîd, 1981, s. 37-38)

Lewra bi vî awayî helbestvanên Misilman bi her awayî li hemberî helbestvanên kafir radiwestiyên û di meydanên şer de helbestê bi awayek çalak karê xwe dikir. "Ligel vê yekê jî şer ne li ser helbestê bû, helbest jî ne mijara serekî ya vê hevrikiyê bû. Belkî milmilanê li ser Qur-anê bû, ji bo vê yekê jî Qur-anê karî asta zimanê sade li hemberî helbest vehûnandinê rawestîne. Ji bo hemû Erebiştana wê demê û Pakîstanê jî îspat kir ku gotin û peyvên Qur-anê di asteke bilind a zimanê sade de ye. Herwiha wê yekê ji bo

xelkê îspat dike ku ne gotinên îro ye û helbest qet nagihe vê astê." (Eelî S. M., 2010, s. 20) Ji ber vê yekê Îslam hatiye, "Şoreşek bû li hemberî hemû dîtin û ramanekê. Hemû kar, gotin, diyardeyên pîs, neciwan, zererê digihînin û vale rake, li cihê van tiştên paqij, rewa, şîrîn, bi sûd û biberhem bîne. Ligel helbestê jî heman rê bikaraniye, heman mamele kiriye û ji bo bi vê yekê bi bendên Xweda sûd ji dinya û axîretê wergirin." (Cemal , Derwazêî Şeir Nasîn, 2013, s. 277-278)

Divê em li vir wê yekê bêjin ku du corên helbestvanan hene. Yek ji wan helbestvanên rêbertiya zilamên xirab dikin, bi heman awayî dû rûyiyê nîşan didin, Qurana Pîroz bi navê 'El-Xawun' wesif dikin. Corê duyemîn jî di Qur-anê de pesnê wan hatiye dayîn. Ji ber kiryarên wan ên baş, ji hêlbestvanên baş cuda dikin. Helbestên wan weke bangewaziyeke ayîn a di xizmeta ol, gel û tekoşîna ji bo bi cih kirina bernameya Îslam dikin. Herwiha behsa Xweda û bîranînan be, behsa exlaqê baş û kiryarên baş bike. Cîbicîkirina fermanên Xweda û wan fermanan belav bike. "Hemû civakên bi sûd û zerermend hene. Her partiyek di nav de xirab û baş hene. Her yekê bername û bîrdoziyeke xwe ya taybet hene, armanc û arasteya xebata wan diyar dike. Heta rolê destûrê ji bo endam û alîgirên xwe bibînin. Yê bixwaze peywendiyê ligel wan dane, cara yekemîn temaşeyî wê bernameyê dike. Piştî eger pejirand û bawerî bi rastiyên wan anî, herwiha bi fikir û mejî pejirand, ti gumanek li ser wan nema û piştî dibin endamê wan komeleyan." (Eelî E.-T. , 2012, s. 37-38)

Li vir mirov dikare bêje Qur-anê helbest heram nekiriye, behsa başî û xirabiyên wê ya di bikaranîna de kiriye. "Dû grub ji bo helbestvanan daniye, grûbek ji bo dûrxistina li ser rêya Xweda bikardianî. Islûbê vê jî ew grûba xirabe ku Qur-an li hember rawestiya. Grûba din jî ji bo karê baş û ciwan hatiye çêkirin, ew jî ji bo serkeftin, xêr û başiyê. Ev jî bi her awayî piştgiriya wê hat kirin." (Samî, 1983, s. 45) Ji ber vê yekê di wê serdemê de helbest gelek belav bibû. Wate Ereban tehedê pê dikirin û heta ligel Qur-anê jî. Lewra; "Ya destûr dihat dayîn û ji bo helwesta Îslamê ya di serdema Pêximberê Îslamê de ji bo bikaranîna helbesta baş, ligel aliyê baş bê rêkûpêk kirin. Di wê demê de bangewaziya Îslamê di nav de dihat kirin. Helwesta Îslamî her ne ji ber xwe ve bû, belkî ligel rewşa wê demê guncawe." (Fayz, 1990, s. 87) Helwesta ciwan a Qur-anê di pêşketina helbestê û di serdema Pêximber (S.A.S) de rolê xwe leyîst. Ji ber ku nekarî bibêje, "Dema ola Îslamê li ser gotina helbest astengî çêkir an jî pêşî lê vekir, belkî divê bi awayê helbestê bê gotin. Berevajî yên kafiran bê gotin ku ligel Îslam, awayê xweza û

wê serdemê bigunce." (Yehya, 1964, s. 41) Ev jî bû sedemê wê yekê helbest bê gotin, ji bo rêya jiyane bi awayek nû û alîkariya bangewaziyên Îslamî yên di wê serdemê de kir.

### **2.1.2 Helwesta Pêximber (S.A.S) Beramberî Helbest û Helbestvan**

Xwedayê mezin Pêximbe ji helbestvan cûda kiriye, lê pêşî lê negirtiye ku guhdariya helbestan neke û giringiyê nede helbestan. Di wê serdemê de helbestvanên Îslam behsa yasayên Îslamê dikirin, bi helbestên xwe piştgirî didanê û rêyek bû ji bo xizmetkirina bangewaziya Îslamê. Ji ber giringiya vê rêyê, bandora helbestên helbestvanên Îslam, Pêximber çend helbestvanên Îslamê pejirand, giringî dayê û bi helbestên wan keyfxweş dibû. Ew jî evin, Hisan Bin Sabit, Keebî Bin Malik û Ebdûllah Bin Riwahe. Bi çavekî pîroz temaşeyî van helbestvanane kiriye.

"Di nava mizgeftê de ji bo Hisan mînberek danî bû. Hemû carê Hisan diçû li ser radiwestiya û bi pesindayîna Pêximber serbilind bû. Bi helbestan êrişî dijminên Pêximber dikir. Hz. Mûhemmed (S.A.S) di got, Heta Hisan bi vî awayî min biparêze ku ez Pêximberê Xweda me û bi pesindayîna min serbilind be Xwedayê Mezin ji ber Cibraîl ve wê piştî wî bigire û piştgiriye lê dike." (Mensur, 1999, s. 178-179) Pêximberê me gelek rêzdarî li helbestvanên îmandar girtiye, nirx û giringiyekî zêde daye helbestên wan. Herwekî dibêje: "Îmandar bi helbest û zimanê xwe cîhadê dike, bi wî Xwedayê ku rihê min di destê wî de; helbestên we ji tîran bihêztir in. Çi dema Pêximber (S.A.S) Keebiyê Kurê Zuhêr dîtiban, ebayê li ser milê xwe dixist ser milî wî û ew jî nîşana rêzgirtina ji bo wî bû. Ewqas ji helbestên Zeyd El-Xelîl dikir, heta navê wî kiribû Zeyd el-Xeyr (Zeydê Bixêr). Di derbarê vî helbestvanî de wiha di got: Helbestên ku Zeyd berî Îslamiyete di got, tû dibêjî qey îro ji bo Îslamiyete vehûnandiye." (Eelî S. M., 2010, s. 26-27)

Pêximber (S.A.S) giringî dida helbestên ciwan, cûdahî xistiye di navbera wan de. Derbarê Lebîd ê Kurê Rebîe de wiha dibêje: "Gotina herî baş a hunerê gotibe, gotinên Lebîd e." (Mensur, 1999, s. 173) Wiha dibêje:

ألا كل شيء ما خلا الله باطل

(Mensur, 1999, s. 174) وكل نعيم لا محالة زائل



Wate: Cîhan, naz, bereket û xweşiya cîhanê hemû vale ye û weke hewayê ye. Tişta rast û heta dawiyê bimîne, her Xweda ye.

Pêximber (S.A.S) guhdarvanekî baş ê helbestan bû, timî gotina wî li ser helbesta helbestvan, vehûnandina helbest û diyarkirina helbestên wan a ji bo çi armancekê dibêjin û çi ji wan di kîjan armancê de serkeftîne, hebû. Timî spasiya wan kiriye û dûa ji wan kiriye. Dema guhdariya helbesta 'Roj wê ji te re diyar bikevin' a" Turfeyê Kurê Ebid kir, wiha got: Ev helbestane weke gotinên Pêximberan in. Herwiha dûayên xêr ji bo Nabxiyê Ceedî dikir û wiha got, Xwedê devê te nerizîne. Pêximber (S.A.S) hewl dida ku helbestvanên bawermend, xwedaperest û rastbêj nêzî xwe bike. Daxwaz ji wan dikir ku ji bo serfiraziya Îslam û parastina ji êrişên dijminan, helbestên bihêz, rast û rewa vehûnin. Di dawiyê de jî bûn bangewaza fermî ya Îslamê. Her helbestvanekê ji bo tekoşînek taybet meydaneke xwe hebû. Mînak; Ji Ebdûllahê Kurê Rewahe re wiha di got; Tû helbestvanekî bilind û bexşindeyî (mîhrîbanî). Ji Keebê Kurê Malik re di got: Tû mijarên şer bi başî dizanî. " (Eelî S. M., 2010, s. 26-27)

Pêximber (S.A.S) li her cihek ku pêwîstî pê hebe, pêşî li helbestê negirtiye. Berevajî destûr daye ku helbestvanên Misilman li ser gotina helbestan ji bo tirsandin û têkdana moralê kafiran berdewam bin. "Enes Rezayê got, dema Pêximber (S.A.S) ji Emretul Qezada hat nava Mekkehê, Ebdûllahê Kurê Rewahe li kêleka wî diçû û helbest di got. Di helbesta xwe de di got, ev neviyên Kafiran! Rêya Hz. Ê rêya ola paqij berdîn. Îro yan sibe, li ser hatina vê Qur-anê ya ji bo ser dilê Muhemmed a ji aliyê Xweda ve bi derbeya şîr û tîr wê serê we ji laşê we cûda bike. Bi piştgiriya Xwedê emê şepirze bikin, bira nekeve ser bira, dost û hevalên we biraderên xwe nenasin.. Vêca Omer jêre got, ey Kurê Rewahe çawa di xizmeta Hezret de û di nava Mekkeha ku Xweda lê hatibûn qedexekirin, bi vî awayî helbestan dibêjî? Pêximber (S.A.S) jî jêre got, Omer dest jê berde, bêgûman ev helbestane ji barandina tîran zêdetir bandorê li wan dike." (Mensur, 1999, s. 179-180)

Qureyşiyên timî hewla wê yekê didan ku bi rêya helbestvanên xwe, helbestê ji îslam û Pêximber kêmbikin. Helbestvanên xwe pal didan û xelat dikirin, ji bo li hemberî Îslamê derbikevin û bi berdewamî dijberiya Îslamiyê bikin. "Ji bo tekoşîna li hemberî van helbestvanên bêbawer, Misilmanan jî gelek helbestvanên xwe yên jî pal dan. Lê piştî demekê ji pût perestan re eşkere bû, gelek helbestvan mijûlî wê yekê ku dibin Misilman û diçin rêza bawermendan de. Ji bo nebin Misilman, gelek pere û xelat pêşkêşî

helbestvanê xwe dikirin. Mînak; Ebû Sofyan xelatek baş pêşkêşî helbestvanê navdar Eeşa kir ku ji bo nebe Misilman." (Eelî S. M., 2010, s. 26) Lê her ku diçû, hêjmara helbestvanên Misilman zêde dibûn. Jin jî hatin meydana helbestê û dest bi nivîsandina helbestan kirin, ji bo Îslamiyet û Misilmantiyê biparêzin. "Ji bo bersiva êrişên li beramberî wan bidin. Ji wan jî Meymûne Bint Ebdûllah, Sefiyey Bint Ebdulmûtelîb û Xinsa..." (Cemal, Derwazey Şeir Nasîn, 2013, s. 285)

### 2.1.3 Pêximber (S.A.S) û Helbest

Pêximber (S.A.S) di nava malbatekê de mezinbûye ku di malbata wan de helbestvan hebûn. Helbestvan ji bo malbatê çavkaniya serbilindiyê bû. Ligel vê yekê jî ti bandor lê nekiriye, ne berî bangewaziyê û ne jî piştî bangewaziyê. Ligel vê yekê jî Qureyşiyên kafir bi wê yekê wesif dikirin ku helbestvan e û Qur-an a ji bo wî hatî xwar jî helbest e. Xwedayê Mezin ji bo bersivdayîna kafira di sûreta 'Yasîn' û di ayeta (69) de wiha dibêje:

" وَمَا عَلَّمَاهُ الشِّعْرَ وَمَا يَنْبَغِي لَهُ إِنْ هُوَ إِلَّا ذِكْرٌ وَقُرْآنٌ مُّبِينٌ (69)" (Qur-an Yasîn:69)

Wate: "Me qet helbest û vehûnandî fêrî Muhemmed nekiriye, gotina vehunandiyan jî ne hêjayî wî ye. Ya ew jî jî dibêje, bend, amojgarî (şîret), Qur-aneke zelal û eşkere ye, yanî ne helbest e. (Ehmed, 2012, s. 715)

Ango Xwedayê Mezin ji wan re ragihand ku Qur-an ne helbeste û ne jî Pêximber (S.A.S) helbestvan e. "Qur-an gotinên Xweda ne û ne gotinên mirovan e. Lewra ji bo tevayî gelên cîhanê ew dem û heta dawiya jiyanê jî Pêximberê şandiye û ew jî ne helbestvan e. Hemû dostên wêjeyê vê yekê dizanin ku mercên taybet ên helbestê hene, wê demê jêre helbest tê gotin." (Eelî S. M., 2010, s. 17)

Pêximber (S.A.S) bi ti awayî û çî demê nexwestiyê helbestê bêje, ji ber ku helbest gotin ne pêdiviyêke Pêximberan e. Ji helbestê giringtir heye, ew jî Qur-an e. "Bi ti awayî nedixwest bi mîzaniya helbestê bersiva helbestvanên bê bawer bide. Ji ber ku ligel wî Qur-an ji bo tekoşîna li hemberî hemû bêbawerekê bû. Gelek caran dema bi awayê helbestê dixwestin baxivin û ji bo bi helbestê bersivê wergirin, ji bo navên xirab li helbestvanan bikin. Ew dibêje, karê min ewe ku peyama Xweda belav bikim, ne helbestê bêjim û xwe di nava we de mezin bikim. Carekê şandeke 'Benî Temîm-Neviyê Temîm' bi serokatiya Zebirqan Kurê Bedir ku helbestvanekê vê eşîrê bû hat gel û dest bi xwendina helbestan kir. Piştî wan jî daxwaza ji Pêximber (S.A.S) kirin ku ew jî ji wan

re helbestekê bêje. Pêximber (S.A.S) dîsa wiha got, ez ne ji bo gotina helbestan hatime û ne hatime xwe li ser xelkê mezin bikim. Lê ligel vê yekê jî guhdariya helbestên we dikim." (Eelî S. M., 2010, s. 20-21)

Eger bi wî awayî be, divê em wê yekê fêm bikin ku çima Pêximber (S.A.S) helbest ne gotiye. Qur-ana Pîroz a ji bo Pêximber (S.A.S) hatî xwar, gelek ji helbestê mezintir e, êdî pêwîstî bi helbestê nîne. Kafiran gotin, ew helbestvane û bi vî awayî tometbar kirin. Lewra mezinahiya wî di wê yekê de ye ku helbestê nebêje. " Heta ger xwestibe tiştê jî bêje, ew gotin li ser qafiyeyekê jî be, ew gotin nekiriye û heta ew qafîye xirab nedikir. Xwedayê Mezin, Pêximber amadekiriye ku peyamekê bigihîne û ji bo bikare bi du awayan Qur-ana Pîroz û gotinên Pêximber (S.A.S) Qur-anê weke bingeh datîne û gotinan jî weke şîrovekirin û yasayên Qur-anê datîne. Herweke tê zanîn şîrovekirina tiştan, ne tamamkirina helbestan e." (Eewda, 1985, s. 30)

## **2.2 Ola Îslamê li Ser Helbestvanên Kurd Bandora**

Dema ola Îslamê di nava piraniya neteweyan de belav bibû, Kurd jî yek ji wan neteweyane bû ev ol di nav de belav bû. "Belavbûna ola Îslamê ya di nava Kurdan bi carekê û ne girê bû. Demek dirêj ajot, her ji despêkê ve hêdî-hêdî ola Îslamê zêdetir pêşket û olên berê jinav diçûn." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 62) Ji ber ku Kurd û civaka Kurdî "Xwediyê ol û çanda xwe ya taybet bûn. Lê weke her gelek bindest, beşek zêde ya kevneşopî û çanda Farisan ligel wan hebû, di arê ayînî de jî wekhev bûn. Ola Îslamê jî weke despêkê di nava Ereban de guhertinên bingehîn afirand, bi heman awayî yan jî kêmtir dema ji bo civakên din hat veguhestin, heman bandor û guhertin çêkir. Bêgûman Kurd di nava wan gelên bindest de bûn û ne xwediyê dewletê bûn, ji ber vê jî bandora Îslamiyê leztir û kurtir dibû. Ji ber ku hatine çewitandin û bê par hiştina wan a ji piraniya mafên wan, Kurd ji deshîlata Farisan bêzar biribûn. Lewra germtir pêşwazî li ola Îslamê kirin û di demek kurt de bandorek bingehîn di nav de rûda." (Tofîq, 2012, s. 22-23)

Bi taybetî piştî ola Îslamê di nava civaka Kurdî de belav bû, Kurd bi baweriyek paqij ev bawerî bi cih anîn û piraniya li gor wê tevgeriyan. Ji ber ku ev ol, olek giştî, tejjî û baş bû, ket di nava dilê Kurdan de. Bû çavkaniya bawerî û îbadetê. "Ev jî ne bi wî awayî be Ereba heta hetayê siwariyên vê meydanê bûn. Belkî eger di nava her cihek û di nava her neteweyekê de, ev ol serî hildaban; wê demê wêje û huner bi giştî û bi taybetî jî helbest weke sedemeke bandora serkeftin û bilez belav buye. Bi ciwanî derbirîne li

heskirina vê baweriyê ya li beramberî ola xwe kirine. Herwiha Kurd yek ji wan neteweyên zindiye ku ligel nasîna vê ola pîroz, hemû sedemek ji bo bilindgirtina vê baweriyê bikaranîne." (Eelî S. M., 2010, s. 112) Ev yek jî bû sedem ku Selam Nawxoş dibêje: "Klasîka Kurdî, ne wêjeya kevin a Kurdiye. Belkî wêjeya melayên Kurde û zêdetir wêjeyek Îslamiye. Her çi tişta wêjeya klasîzma nû ye, wêjeyekê netewî ya Îslama nû ye." (Selam, 2014, s. 29) Herwiha zêdetir behsê dike û wiha dibêje: "Wêjeya klasîka Kurdî xwediyê hest û sozên melayên Kurde, ew wêjeya Kurdî wêjeyek Îslamî bû. Herwiha xwediyê rûyek reftar û bihayê ayînîbûnê, reftar û bihayên olî bi ti awayî ji hunerê nayê cûdakirin. Ango bi wê pîvanê, pîvana melabûn û bangewazîbûn, melayên Kurd di wêjeya klasîk û nîv klasîk de wêneyê herî ciwan ê ol (ayîn) ji zakîreya wergirê Kurdî çêdikin." (Selam, 2014, s. 32) Helbestvanên Kurd ji bilî ku xwe weke kesên bawermend û mela hewl dane û "Bi berdewamî xwestine ji bo neteweyên din îspat bikin ku di warê hunera helbestê, heskirina wan a ji bo Pêximber (S.A.S) û ola Îslamê, ti tiştekê wan ji ya helbestanên neteweyên din ne kêmtir e. Belkî ji wan dilsoztir in." (Eelî S. M., 2010, s. 114)

Helbestên wan şahidiya wê yekê dikin ku çend girêdayî ola Îslamê ne, di nava dilê wan de kûrbûye, bandorek berçav û bihêz dibînin ku di helbestên olî de, "Xwediyê rêyek kur, xort û ji bo serdemek kevin a wêjeya Kurdî vedigere. Diyarê ev bawerî û derbirîna hestê ol a Misilmantiya helbestvanên Kurd timî di helbestên wan de berdewam bûye. Weke texlîdkirina rêya wêjeya Îslamî ya Qur-ana Pîrozbû. Ji ber ku bandoreke rasterast a Qur-anê li ser helbestvanan hebû. Lewra ne meseleyek xerîb bû gelek weke Kurdên Misilman Qur-an û peyrewên ola Îslamê derbeyek mezin di enî û jiyana rojane de serî hilde. Çavkaniya duyemîn jî bandora gotinên Pêximber (S.A.S) bû. Bi vî awayî herdu bi hev re ji bo berdestkirina pîvana ayîn û reftarên di helbesta Kurdî de çavkaniyek giring bûn." (Nesrîn, 2010, s. 170) Tevî ku piraniya gelê Kurd Misilman bû û girêdayî ola Îslamê bûn, helbestvanên wan bi awayek berçav helbestên Îslamî hebûn. Piraniya helbestvanên me mela bûn. Eger ne mela jî bin, di xizmeta melayan de bûn, li mizgeft û hucreyan fêrî xwedî û feqetiyê bûn. Li Kurdistanê mizgeft navenda xwendekarî rewşenbîriyê bû. Zana, helbestvan û kesayetiyên navdar ên Kurd di berdewamiya dîrokê de, perwerdeya li mizgeftê dîtine û li hucreyên mizgeftan mezin bûne. Lewra em pêwîst dibînin ku di vê beşê de berî ku bînin ser mijara helbestvan û helbestên wan ên ayînî, em behsa rolê mizgeft û hucreyan a di mezinkirina helbestvan û bandora wan a li ser hestê bawermendan û qonaxa di nav de jiyane bikin.

### 2.2.1 Mizgeft û Hucre Dibistana Helbestvanên Kurd Bûn

Piştî belavbûna ola pîroz a Îslamiyetê wekî me berê jî behs kirî, "Yekemîn melbenda xwendekariyê ya di nava neteweyên Misilman ên Rojhilata Navîn de, mizgeft bûn. Li wê dezgehê bi awayek giştî xwendin bi zimanê Erebi, mijarên wê jî zanistên Erebi û ola Îslamê bûn." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 29) Kurdan jî hespê xwe di nava wî karwanî de bezandine, "Eger mirov bi hûrî balê bikişîne li ser şûnwarên Îslamî, ji bo mirov derdikeve holê ku di berdewamiya dîroka Îslamiyetê de Kurdan ji neteweyên din zêdetir xizmeta Qur-an û zanistên Îslamê kirine." (Sidîq, 1370b, s. 721) Ji ber ku "Dema mirov bi çavek taybet temaşeyî tîpên zimanê Erebi kiriban, bi elfûbêyêk pîroz dihat nivîsandin. Ji ber ku ayetên Qur-anê bi wan tîpan hatibûn nivîsandin. Piştê zimanê Erebi bi xwe jî bû zimanek pîroz. Ji ber ku Xweda Qur-ana Pîroz bi wî zimanî jî mirov li ser erdê re şandiye. Êdî neteweyên Misilman ên Rojhilata Navîn bi armanca fêrbûna Qur-an û piştê jî fêrbûna zimanê Erebi, fêrî elfûbêya zimanê Erebi bûn. Vê yekê bandorek mezin li zimanê neteweyên ku bûne Misilman kir. Demek dirêj zimanê Erebi zimanê nivîsîn, zanist û zanyariyan bû. Diyare zimanê netewî jî ji bo axaftin û wêjeyê bû. Ola Îslamê ji despêkê ve giringiyeke zêde daye mizgeftan. Ji ber ku mizgeft ne tenê cihê nimêj, dûakirin û îbadetê bû, belkî cihê fêrkirina Qur-anê jî bû. Piştê jî fêrkirina hemû zanistên ku peywendî bi Qur-an û ola Îslamiyetê ve hene, di mizgeftê de dihat fêrkirin. Ji ber ku ligel belavbûna ola nû, mizgeft peyda bûn. Ligel vê yekê jî oldarên Misilman peyda bûn. Em ji wan re dibêjin, 'Mela.' Ji odeya melayê mizgeftan re jî 'Hurce' dihat gotin. Ev jî bibû cihê gotina waneyan (ders). Wateya peyva 'Hucre' peyveke Erebi ye û tê wateya xanî. Hucre weke zaraveyek li beramberî dibistanên mîrî yên niha ne." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 75-76) Ji ber ku xwendinên bi vî awayî berî her welatekê di nava, "Ereban de hebû û wan weke berê ji heman tiştê regotine 'Hucre'. Herwiha piştê hucre bû cihê perwerdekirina xwendekaran. " (Mistefa, 1382, s. 30) Hatina vê xwendinê ya di nava Kurdewariyê de weke xwe ma ye û destkarî nehatiye kirin. "Ji ber ku ew mijar û zanyariyên dixwendin, peywendî bi ola Îslamiyetê ve hebûn. Rêbaz û yasayên Qur-ana Pîroz û sunetên Pêximber dihatin şîrovekirin. Ji bo di dil û fikrê Misilmanan de bi cih bibe. " (Mihemed E. H., 2008, s. 38) Ji bilî vê yekê jî sûdek mezin gihandine gelê Kurd; "Dîrok şahide, xelkê dîtiye û dibînin ku hucreyên li Kurdistanê bi sedsalan weke dibistanên dîn û eniyên parastina dîn bûn. Ev jî binixtirîn û baştirîn destkeftiyên jiyana mirovan in. Ev cihên weke dibistan û zanîngehan bûn, çavkaniya zanist, zanyarî, cihê perwerdekirin, hilberîna zana û rewşenbîrên ji bo welat bûn. Kesên li vir dixwendin ji bilî karê xwe, xizmeta gelê xwe jî dikirin. Asta zanistî ya

di warê civakî, siyasî, abûrî û tendirûstî serxistine, ava aştiyê bi kîn û hevrikiya di navbera kesan û şer de kirine. Ber bi yekîfî û hevgirtinê ve paldane. Lewra di qezenc û zereran de her ligel xelkê xwe bûn. Jiyannameya tejî serbilindî û nivîskarên me yên dema borî, herwiha dîroka siyasî û wêjeya gelê me piştevan û şahid e." (Mistefa, 1382, s. 30-31) Çend kesên jîr û zîrek di nava hucreyê de hatine perwerdekirin, "Wêjeya Kurdî, melayê mezin dewir dike û navê wan di nava rûpelên zêrîn de tomar dike. Ew jî weke helbestvanên navdar ên weke; Mele Perîşan, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Nalî, Hacı Qadirê Koyî, Şêx Reza, Mehwi û hwd..." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 77) Ev hemû ji bo gelê Kurd cihê serbilindiyê ne, hemû jî li hucreyan perwerde dîtine û dane.

### 2.2.2 Feqe û Qonaxên Feqatiyê

Peyva Feqe, "peyvek Erebiye û ji peyva 'Feqe' û 'Feqye' hatiye. Wateya peyva Feqe eve; Rê, bingeh û destûra ola Îslamê. Kesên di vî warî de, wate di warê rêbaza ola Îslamê û bingehên wê de şareza be, jêre dibêjin Feqe. Ango çûye di nava kûrahiya ol de. Bawermend e û zanayê ku rê nîşan dide ye. Lê ev peyv hêdî-hêdî di nava Kurdan de bûye 'Feqê.' Ji ber ku gelek zimane li ser zimanê Kurdî bêjin, 'Feqye.' Lewra ev peyv hatiye kurtkirin û bûye Feqê. Êdî ew kes an jî ew ciwanê li ber destê mela û mamostayên olî dersên ayînî dixwend, Qur-an û gotinên Pêximber (S.A.S) dibûn pirtûkên ayînî û dixwendin. Ji van kesan re 'Feqê' dihat gotin. Ango hê jî xwendekar in. Dersên ola Îslamê, gotinên Pêximber, pirtûkên tefsîr û (feqe) Îslamê tamam nekirine û destûra melatiyê wernegirtine. Lewra xwendekarên bi vî awayî di gotin, em hê jî xwendekaran, dem maye ku em destûrê werbigirin û bibîn mela." (Eebid El-Kerîm, 2008, s. 133) Piraniya gundên Kurdistanê, bajar, navçe û qezayên Kurdistanê mizgeft, mela, hucre û feqe lê hebûn. Li "Gundan rûspiyên gund û felahan xizmet dikirin û birêve dibirin. Li bajar û bajarokan dikandar û dewlimendan xizmet dikirin." (Mihemed E. A., 2003, s. 23) Qonaxên xwendinê di serdema feqatiyê de, "feqê fêrî elfûbêya Erebi dikirin û piştê jî Qur-an xitim dikirin. Piştê hemû zanistên ku peywendî bi Qur-an û ola Îslamê ve hene, perwerde li ser didîtin. Ew jî yên weke, hedîs, tefsîr, fiqh, şerîet, mentîq, bîrkarî, destûra zimanê Erebi (Serf û nehû) ligel vê yekê jî ziman û wêjeya Farisî dixwendin. Helbestê Seedî û Xafir giringiyeke zêde hebûn, gihiştibûn pileya pîrozîyê. Herwiha hinek berhemên wejeyî yên destûra Gencewî, Celaledînê Romî, Ettar û Camîş jî dixwendin. Pir zehmet bû feqeyek hemû pileyên xwendinê li cihekê bixwîne. Ji ber vê ji navçeyekê ber bi navçeyekê din digeriyan, bi taybet jî eger navdariya melayek mezin bihîstiban; xwe digihandinê û dixwendin. Ev hatin û çûyîn di dibistanên kevin ayînî yên kevin de

bibûn exlaq, heta zarokên zarokên mela û şêxên mezin jî zarokên xwe dişandin dibistanên melayên din û ji bo bixwînin. Hinek caran xwendekarên Kurd ji bo xwendinê diçûn dibistanên li derveyê Kurdistanê." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 79) Pileyên xwendinê di serdema feqetiyê de bi vî awayê jêr bûn:

### 2.2.2.1 Pileya Xwendekariyê

Despêkê dema zarok li hucreyê dest bi xwendinê dikir, "jêre di gotin 'Xwendekar'." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 79) Angot qonaxa despêkê (seretayî) yanî destpêkirina "Zarok a di temenê 6-8 saliyê de dest bi fêrbûna elfûbê, yanî fêrbûn û nasîna wêne, navê tîpên xwendin û nivîsînê dibe. Di warê rêziman de xwendekar 'Qutabî-Xwendekar' ji peyva 'Kitab' a Erebi hatiye. Lê îro û di vê serdema zimanê Kurdî de, zana û pisporên di vî warê de li ser wê yekê lêkolînê dikin ku zimanê Kurdî sade bikin. Peyva 'Qutabî' ji bo peyva resen a Kurdî yê weke, 'Fêrxwaz-Xwendekar' guhertine. Wate yê bi xwendinê ve mijûl an jî karê xwendinê ve. Ev di warê rêzimanê de bû. Lê di warê zarava de 'Qutabî' çî li Kurdistana Iraqê yan jî li Îranê, ji despêka fêrkirina zarokan a ji bo fêrbûna wêne û fêrbûna elfûbêya Erebi. Ew jî ji tîpên 'Hirûfil El-Hîcahee el-Erebiye' pêk tê." (Mihemed E. H., 2008, s. 5)

Bi vî awayî dihatin fêrkirin û ji bo bi başî fêrî xwendina Qur-anê bibin; "Ev jî zarokên gund û taxên derdora mizgeftan ji bo xwendinê dihatin şandin. Ev zarok jî ligel feqeyên mizgeftan dixwendin. Yan jî ligel xwendekar an nîv melayek ku dikanek ji bo vê armancê dikanek danî bû û ji wê dikanê re 'Hucre' dihat gotin, fêrî xwendinê dihatin kirin. Zarok an jî xwendekarên jîr û navîn, di nava 8-12 mehan de Qur-an xitim dikirin û fêrî xwendinê dibûn. Hinekan jî ji salekê zêdetir dixwendin. Ev jî destûra xwendina zarokan bû. Despêkê peyv peyv dihatin fêrkirin, heta bi başî tîpên peyvan fêr dibûn. Herwiha fêrî wêneyê wan tîpan jî dihatin kirin. Hinek tîp di nava peyvê yan jî di despêkê û dawiya peyvê de guhertin bi ser wan de dihatin. Eger xwendina peyvekê ligel xwendekar giran bûya û nekarîba bi başî bixwîne, ji bo bikare bi hêsanî bixwînin, kite kite fêrî wan dihat kirin. Ji ber ku hemû peyv Erebi bûn û ne zimanê wan ê dayîkê bû, ligel xwendekaran gelek giran bû." (Mihemed E. H., 2008, s. 7-8)

Raste ev zarokane li mizgeft û hucreyan dixwendin û ji ber despêka xwendinê bû, lewra "Çî li Kurdistana Iraqê û çî jî li Kurdistana Îranê ji van re ne di gotin, 'Feqe' û li cihê wê di gotin 'Qutabî-Xwendekar.' Heman peyva 'Qutabî' jî tê wateya peyva 'Feqe.' Dema ji wan re di gotin, Feqe û piştî xitimkirina Qur-anê, destp bi xwendina

pirtûkên Îslamê dihatin kirin. Ev jî weke veguhestina qonax û pileya xwendekar a ji bo pileya ‘Sûxteyî’ û piştê ji wan re di gotin Feqê." (Mihemed E. H., 2008, s. 8-9) Ev jî di xwendinê de qonaxa duyemîn e.

#### 2.2.2.2 Pileya Suxteyî

Piştî fêrbûna tîp, xwendina peyv, xitimkirina Qur-ana Pîroz û xwendina pirtûkên Wirdela, derbasî qonax û pileya suxteyî dibûn. Di warê ziman û zara ve de ‘Suxte’ çiya û çawa ye? Peyva Suxte, diyare ji. " ‘Suxta’ Farisî hatiye. Li vir jî bi wate û armanca hîlbijartina, lezgîn û tund tê. Ji ber ku ev pileya feqîtiyê di hucreyan de pêwîstî bi lezgînî û jîrîtiyê heye. Timî ji bo raperînê amade bûn û pêşniyarên ji aliyê mamostayê (mutebîq) wan ve dihatin gotin amade bûn. " (Mihemed E. H., 2008, s. 9) Lê Mela Mihemed Elyaweyî dibêj: "Peyva Suxte Farisiye, tê wateya şewitî û suxte tê. Ji bilî xwendina wê, her karker, xizmetkar, westiyayî bû û di vê qonaxê de her navê suxtayetiye li pey bû." (Mihemed E. A., 2003, s. 24) Lê di ferhenga Xalda Şêx Mihemedî Xal dibêje: "Suxte, keseke nû dest bi xwendinê kiriye û ji bo li mizgeftê kar ji bo mamosta bike." (Mihemedî, 2005, s. 216) Eger bi wî awayî be, suxte "Her bi wateya wê ya Farisî yan jî şewitî be, armanca şewitînê evîndariya ji bo xwendinê be, yan jî gelek kar kiribe û westiya be, lewra feqeyan di wê serdemê de gelek kar kirine û di westiyên. Ji bo vê yekê jî ev nav li wan kirine. Suxte ji bilî karê xwe yê taybet ku ew jî xwendina dersê, vekirina kursan, mamostayî, karê dirûnê û karên bi vî awayî ligel karên di nava hucreyê cîbicî bike." (Mistefa, 1382, s. 33-34) Wek, "Peydakirina sutemenî, anîna avê, rêxistinkirina cihê mamosta, pîr kirina cerigê mamosta û weke din, eger karek hebûya pêwîst ‘Suxte’ ew kar kiriban." (Mihemed E. A., 2003, s. 24)

Di pileya suxte de xwendin bi awayekê zêdetir dibû, ji ber ku feqe fêrî xwendina Qur-an û Erebî bibû. Ji despêkê dest bi xwendina "Despêkên destûra zimanê Erebî (Serf û Nehû) û piştê suxte dest bi xwendina fîqihê dikir." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 80) Wek pirtûkên "Eewamîlî Curcanî û Tesrîfî Zincanî, ji vir ve ev dibe pileya despêka suxteya feqîtiyê û heta digihe dema xwendina pirtûka ‘Camî û Sîwîtî ya di zanyariyên Nehû’ û ev jî dibe despêkek ji bo pileya musteîyêfî. Suxte ji aliyê mûsteîyewe di hucreya mizgeftê de cihê xwendinê jêre dihat veqetandin. Wate, mûsteîfî bi awayek demkî weke xwendiyê hucreyê bû. Ji ber ku ew cihê xwendin û gotina dersan bû, li hucreyê ligel vê dixwend." (Mihemed E. H., 2008, s. 9)



### 2.2.2.3 Pileya Mûsteîdî

Ev piştî pileya feqêtiyê tê. "Di vê pileyê de mûsteîd dest bi fêrbûna zaravayê zanista kursê ya di her 12 zanistan de. Piştî wergirtinê bawerînameyê (Îcaze) werdigire û dibe mela." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 80) Wate zimanê zaraveya 'Mûsteîd' "Peyvek Eerebiye û navek biker (Fiîl) e. Di peyva ferhenga Erebi de tê wateya saz û amade û guncaw pêkhatiye. Lê di zaraveya feqêtiyê de ji wî feqeyê ku di xwendinê de gihiştibe 'Pirtûka Camî' re tê gotin." (Mistefa, 1382, s. 56) Ji ber vê yekê pileya dawî ya feqêtiyê ye û xwe ji bo pileya melatiyê amade kiriye. "Ligel melayên baş û mamostayên mizgeftên taxên li bajar dixwend. Yan jî li dibistanên li gundên mezin ên ku melayên dersên baş û mûsteî xwînê hebûn, dixwendin. Despêkirin û despêka pileya mûstehîdî jî di xwendina pirtûka 'Camî û Sîwdî' nehû de bû. Yan jî hinek caran li gor cih û zanyariyên mamosta yê di pirtûka 'Fennarî' yê di zanista mantiq û di pirtûka 'Mûxnî Muhtac û Îlane' ya şerîetê de destpê dikir. Heta digihiştin pileya dawiyê, xwendina pirtûkan û maddeya dawî ya xwendinê ku hatiye diyarkirin û navê wê kiribûn pirtûka 'Tehzîb.' Piştî van mûsteiyane hemû zanyariyên ayînî tamam dikirin û dawî bi xwendina derve dianîn û bi xwendina vê pirtûka 'Tehzîbe' hatibû danîn. Hewl dida ku ligel melayek baş û gotarbêjek navdar destûra melatiyê werbigirin û bibin melayên 12 zanist." (Mihemed E. H., 2008, s. 13-14) Ango dihişt pileya dawî ya xwendinê û ji wan re mela dihat gotin. "Peyva mela ji 'Melae' ya Erebi hatiye û bi Kurdî tê wateya 'Pire-Zêdeye.' Lewra ji ber ku mela fikir û mejiyê wî teji zanîn û zanyarî, hemû zanyariyên olî dixwîne, dizane û têr zanyarî bû. Ji ber vê yekê jî jêre mela tê gotin." (Mihemed E. H., 2008, s. 18)

### 2.2.3 Feqe, Helbest û Helbestvanî

Herwekî me berî niha jî behs kirî di hucreyan de ligel pirtûkên ayînî, feqe pirtûkên wêjeyî û helbestan dixwendin. Ew jî yê weke "Helbestên Seedî û Hafîz xwediyê giringiyek zêde bûn û hemû jî bûne xwediyê pileyên pîroz." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 79) Ev jî bû sedem ku "Beşek ji feqeyan hestê wan ê helbestvaniyê bihêz bibe û eger li pey biçin, wê gelek serkeftî bin. Wê demê dibînin ku piraniya helbestvanên kevin û beşeke herî zêde ya helbestvanên ciwan û nû, di hucreyan de serî hildane. Hinek ji wan bi çar zimanên weke, Kurdî, Erebi, Farisî û Tirkî helbest nivîsandine. Hinek feqe eger hestek zêde jî nebin an jî nexwestibin bibin helbestvan, herî kêr hinek vehunandiyên mezhebî, siyasî, civakî yan jî ji corên din hene. Eger tiştêk jî nenivîsandibin, jiyana xwe ya zor û zehmet bi vehunandî nivîsandine û bi vî awayî gazind ji jiyana xwe kirine. Hinek caran jî nivîsandin an jî xwendina helbestan di

hucreyan de wisa pêşketejiye ku di warê ciwanîyê ve helbesta Şêx Reza Talabanî ji hev re xwendine. Ew jî dibêje: Çunke Şaeir zor buwe lem Eesreda- Bote heşrî Nêreker lem Hucreda." (Mistefa, 1382, s. 69) Wate: Ewqas di vê serdemê de helbestvan zêde bûne, di nava hucreyan de zira zira guhdirêjan (ker) tê.

Ev yek wê yekê digihîne ku di serdema feqetiyê de gelek caran bi nivîsan û xwendina helbestan ve mijûl bûne û xwe weke helbestvan danîne. Dibe ku helbestên hinek ji wan ne di astek bilind de bin, kesek helbestvan be hest bi wê yekê kiriye ku helbestên hinek ji wan lewaz in. Lewra ew ew hevoka helbestê ji bo henek kirinê gotiye. Divê em wê yekê li vir bêjin ku hûcre cih û dibistan bûne cihê mezinbûna helbestvanên me. Lewra nivîskarê pirtûka ‘Feqe û Feqetî li Kurdistanê ‘ Seyd Mistefa Mehmûdî di helbestekê tê ser mijara feqe û perwerdekirina feqeyan a di hucreyan de çend zana û helbestvan lê perwerde dîtine. dibêje:

Zanay be nîrx û pîspor û hozan

Gewre piyawanî helkewtuwî hozan

Her çî hemane huner û nuser

Giştyan le hucre seryan hênader

Melay Cezîrî û Ehmedî Xanî

Salim û Mehwî hem Bêsarî

Şêx Reza û Zêwer Sey Yaqo û Mecdî

Ehmed Mûxtar Herîq û Hemdî

Salimî Sine û Melay Cebârî

Kurdî û Pîremêrd Mewlewî û Narî

Nalî şarezay deştî Şarezûr

Hacî Qadirî Qebir pir le nûr

Ew estêraney ke geşanewe

Be asmaney edebmanewe

Deyanî tirîş ke weku Merdan

Nexşandyan mêjûyî edebî Kurdan

Rajey ayîn û gelyan girte ber

Her çî piyawetyan bedest birdeser

Hemû be nanî hucre bêgeyn

Le dîn û jîn û dinya tê geyîn (Mistefa, 1382, s. 47)

Wate: Zana, kesên şareza, helbestvan û kesên navdar, hunermend û nivîskar hemû jî di hucreyan de pêşketine. Di hucreyan de bûn, ji wan jî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Salim, Mehwî, Şêx Reza, Sey Yqo, Mecdî, Ehmed Muxtar, Herîq, Hemdî, Salimê ji Sine, Melayê Cebarî, Kurdî, Pîremêrd, Mewlewî, Narî, Naliyê şarezayê deşta Şarezûr, Hacî Qadirê gora wî tejî nûr be, ev stêrane asîmanê wêjeya Kurdî geş dikin. Gelekên din ên weke vane dîroka wêjeya Kurdî, rêya ol û gelê xwe nexşandine. Hemû jî hucreyan de perwerde dîtine, fêrî ayîn, jîyan û cîhanê bûne.

#### **2.2.4 Perwerdeya Ayînî Ligel Hinek Helbestvanên Kurd**

Me di despêkê de jî behsa cihê ol yê di berfirehiya wêjeya Kurdî de kiriye. Despêka destpêkirina xwendina helbestvanan a li hucre û mizgeftên Kurdistanê bu. Ew jî ji aliyê hinek mela û zanayên Kurd ve ders (wane) dîtine û heya hinek ji wan destûra melatîyê jî wergirtine. Sedema wê jî ewe ku di hucre û mizgeftan de xwendine û zanista ayînî baş fêrî kirine. Zanyariyên wan li ser helbestên olî heye û bandora ol bi awayek rasterast li ser wan diyare. Me di helbestekê de bal kişandiye ser wê yekê ku piraniya helbestvanan li hucreyan perwerde dîtine. Lewra em baş dibînin ku behsa helbestvanan ligel hevokê helbestên olî bi awayekî kurt bikin. Ji ber ku em li vir nikarin behsa hemû helbestvanan bikin û weke pêwîst maf bidinê.

- Babe Tahîr

"Baba Tahîrê Uryanî, navê wî Tahîre. 937-1010" (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 205) Helbestvanek Xwedanase û bi "Uryan navdar e. Yek ji Xwedanasên herî mezin ê xul (dewre) û zimanê xwe ye." (Sîdîq B. , 1370a, s. 86) van helbestê de berê xwe dide Xweda û wiha dibêje:

*Ez an ro çî ke mara aferîdî*

*Be xeyrez meesiyet ez ma çi dîdî*

*Xudawenda be heqîqî heşt û çiwart*

*Zi mû biguzer şitr dîdî nedîdî (Marûf, 2010a, s. 235)*

Wate: Ji wê roja ku we em çêkirine ve, ji gunehbûnê zêdetir we tiştêk ji me wernegirtiye! Bi 84 û 12 îmaman, me efû bike û gunehên me efû bike.

Baba Tahir di vê helbestê de daxwaz ji Xweda dike û hawara xwe digihêneyê, jêre dibêje; gunehên me efû bike. Ji ber ku ji dema em çêbûyîn ve, me her guhdariya Xweda nekiriye. Daxwaz dike ku bi awayekê min wî efû bike ku ti tiştêk nekiriye.

- Melayê Cizîrî

Navî wî rast "Şêx Ehmedê Kurê Şêx Mihemedê, di navbera salên 1407-1481 li Cizîra Botan ji dayîk bûye û li wir jî koça dawî kiriye." (Elaedîn, 1952, s. 155) Wî jî weke helbestvanên din, li mizgeft û hucreyan xwendiyê. "Şêx Mihemedê bavê wî mela bû û ji binemala Şêxê Bermalî bûn. Li gor exlaqê wê demê, ji xwendinê hez kiriye. Despêkê wî bi xwe ders dida kurê xwe Ehmed, piştê bo xwendekar û ji wir jî bûye feqe." (Elaedîn, 1952, s. 162) Di vê helbesta jêr de Mela spasî û pesnê Xweda dike. Nikare û destûrê nade xwe û bi çend peyvyan behsa mezinahiya Xweda bike. Dibêje, tû gelek ji wê mezintirî ez bikarim wesfê mezinahiya te bikim.

*Ya reb ji çi rû le bi bi senaya te guşayem*

*Sibhanek len Ehsa fî şaenake hemda (Dîwanî Melay Cezîrî, 1393, s. 10)*

Wate: Xwedayo dive ez çi bikim, çawa destûrê bidim xwe û pesnê te bidim. To gelek ji wê yekê mezintirî ku spasî, behsa kar û kiryarên te yên ciwan bikim. Bi ti awayî nikarim li beramberî mezinahiya te, tiştêkê bêjim ku ne hêjayî mezinahiya te be.

- Ehmedê Xanî

Yek ji helbestvanên din ên navdarên Kurd Ehmedê Xaniye. Navê wî yê rast "Ehmedê, kurê Ilyase û nasnavê wî Xaniye. Yek ji helbestvanên herî bilind ên Kurd tê bi navkirin. Di navbera salên 1061-1119'an de jiyan kiriye." (Sidîq, 1370b, s. 415) Eşkereye ku eger her tiştêk em behs dikin, divê em navê Xwedê bênin. Ligel Ehmedê

Xanî jî "weke Misilaneke Sunne, Despêka nameya wî bi Xweda destpê dike. Behsa mezinahî, jîrîtiya wî û pesnê wî dide." (Fehmî, 2009, s. 228) Xanî wiha dibêje:

*Ser nameyê name namê Ellah*

*Bê namê wî natemame Wellah* (Cemal S. , 2007, s. 35)

Wate: Despêka nameyê navê Xweda ye, nameyek bêyî navî wî nîvçoye.

- Salim

Salim helbestvanek paye bilind ê serdema Naliye. Navî wê yê rast, "Ebdûlrehmanê Kurê Mihemed Beg ê Qere Cehenemî Kurê Ehmed Bege. Ew ji binemala Sacêbqirana ye û di navbera salên 1805-1865'an de jiyaye. Salim weke hemû xwendekarên serdema xwe, li hucreyê xwendiyê. Lê ji ber ku nexwestiyê bibe mela, xwendinê tamam nekiriye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 155) Di van hevokên helbestê de berê xwe dide Xweda û wiha dibêje:

*Rebena Sakîni kotin, çi xulam û çi emîr*

*Weku yek ehli niyazin, çi xenî û feqîr* (Dîwanî Kurdî, 2015, s. 355)

Wate: Xwedayo çi xizmetkar, çi emîr û çi jî fermanîdar li ber dergehê we rûniştine. Çi dewlimend û çi jî hejar weke hev çavê wan li dergehê we ne.

- Mewlewî

Di himbêza Kurdistanê de gelek wêjevan û kesên paye berz hatin perwerdekirin. Navê Mewlewî yê tamam, "Ebdulrehîmê Kurdê Mela Seîdê Tawegoziye. Di navbera salên 1806-1882'an de jiyan kiriye. Despêkê ligel bavê xwe dest bi xwendinê kiriye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 433) Helbestvanek Xwedanas bû, "Bi xwe bi ola Îslamê ve mijûl bû. Behsa Xweda, Pêximber û oldarên mezin dikir." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 442) Weke helbestvanek Xwedanas, "Ol di fikir û ramanên Mewlewî de deng vedaye. Mirov gelek çar dibîne ku Mewlewî, ayetên Qur'anê wergirtiye û tevî vehunandiyên xwe kiriye." (Selam, 2014, s. 39) Di vê helbesta jêr de behsa mezinahiya Xweda dike û dibêje; Çi tişt heye Xweda daye û çêkiriye. Tişt rast be her tûyî, ji bilî te her tişt weke sîberê ye. Mewlewî dibêje:

*Ey gird mewcûde ce to girt maye*

*Mewcûd her tonî, masîwa saye (Dîwanî Mewlewî, s. 31)*

Wate: Ey Xwedayê ku her çi tiştê heye ji we çêbûye, tiştê di rastiyê de hebe her hûn in. Ji bilî te, hemû weke sîberê ye.

- Mehwî

Mehwî helbestvanek Xwedanas û sofîye. Navê wî yê rast, "Mihemedê Kurê Mela Wesmanê Balixiye. Di navbera salên 1830-1904'an de jiyaye. Di temenê 7 saliyê de dest bi xwendinê kiriye û berî xwendinê ligel bavê xwe dest bi hînbûna ola Îslamê bûye. Piştê ji bo feqêtiyê çûye Sablax û ligel Mela Ebdûllahê Pîre Bab." (Elaedîn, 1952, s. 328) Berê xwe dide Xweda û daxwaza alîkariyê jê dîke ji bo xizmeta ola Îslamê bike û serbikeve. Evin helbestvanên li hucre û mizgefên Kurdistanê perwerde dîtine û hewl dane bi rêya helbestên xwe xizmeta ola Îslamê bikin. Mehwî dibêje:

*Mesulime îhane le wehhabî musteean*

*Her lew dekem sual û dekem hemdî ew be can*

*Tewfîqî lê teha le bme bikem xidmetê be dîn*

*Meemulme xulasey Emalî bikem beyan (Dîwanî Mehewî, s. 367)*

Wate: Ez daxwaza alîkariyê ji Xwedayê mîhrîban dikim, bi dil û can tenê daxwaza alîkariyê ji wî dikim. Ez spasiya wî dikim. Daxwaza min ji wî ewe ku ji bo ez bikarim xizmeta ol bikim, alîkariya min bike. Xizmet jî ewe ku hêviyek min heye û ji bo bênim cih. Ew jî ewe ku kurtiya pirtûka 'Emalî' bi helbestan ji bo Kurdên nexwendekar eşkere bikim û bi vî awayî jî ew fêrî rêbazên ol bibin.

## **2.3 Perwerdeya Ayînî y Nalî**

### **2.3.1 Kurd û Ola Îslamê**

Ligel belavbûna ola Îslamê, beşdarbûna wê ya ligel civaka Kurdî û çûna di nava dilan de, di warê fikir û ramanê de bandorek bihêz bi xwe re anî. Ev yek jî gihişt wê astê ku di nava civak, xêzan û her ferdeke Kurd de ti beşek nemaye ku cihê taybetmendiyên Îslamê pê ve diyar nebin.

"Piraniya Kurdên Misilman ji mezheba Sunnîne û li şopa Îmamê Şafîî ne. Beşek din a Kurdan girêdayî mezheba Şîe ya 12 îmamîne." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 63) Dilsoziya Kurdan a ji bo ola Îslamê û hestê olperweriyê wisa kir ku "Di nava

Kurdan de gelek zanayên ola Îslamê peyda bibin û xizmeteke mezin a ola xwe bikin. Bi rêya nivîsandina pirtûkên li ser destûra Îslametî û zanistên Erebi. Ev jî di encama baweriyek kûr a bi îradeya ola Îslamê ziman û wêjeya xwe paşguh xistibûn. Piraniya berhemên wan bi zimanê Erebi bûn û ti giringiyek nedidan zimanê xwe. Ji ber ku di nava Îslamê de heliyane û gelek ji zimanê Qur-anê hez dikirin. Bi taybet jî bi kom mezheba Îmamê Şafî girtibûn. Ji gund û her derê, hemûyan berê xwe dida ola Îslamê û baweriyaya xwe pê dianîn. Ev jî bi bîr û baweriyek paqij û dûrî berçavgirtina ti başiyeke kesek taybet, li gor ola Îslamê tevdigeriyan, ligel jiyana xwe ya rojane xebat ji bo jiyandî dikirin." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 63) Xwendin jî meydana zanistî, sedemek serekî yê ji bo nasandina ferdên xwendekar ên Kurd a ji bo xizmetkirina ola Îslamê bû. "Pêwîst bû ev jî bi zimanê Erebi, Farisî û kêmtir jî zimanê Tirkî di nav de bû. Ji ber ku zimanê mîrî, dû dewletên mezin bûn. Ji bilî vê yekê dewlimendî û wêjeya wan a klasîkî, bi taybet jî Farisî di dibistanên ayînê de cihê xwe girtibûn. Tevî ku di bingeh de ev yek di bernameya xwendinê de nebûn. Dibe ku mezhebî Şîe li Îranê û henîfî di nava Tirkên Osmanî de hinekê rê ji bo Farisî û Tirkî xweş kiribin ku biçin di nava bernameyên ayînî de. Sedema herî giring jî deshilatîya du dewletan bû. Dergehê dibistanên ayîn hatin vekirin û ji bo zimanê Farisî û Tirkî di nava civakê de bêt bikaranîn." (Marûf, Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 80) Ev jî bû sedem ku zimanê Farisî û Tirkî dengvedanek baş di nivîsîn û vehunandina helbesên helbestvanên Kurd de. Nasîbûna helbestvanên me ya bi wêje û helbestên helbestvanên Faris û Tirk, herwiha sûdwegirtina ji wan li vir pêwîst dibînîn ku bêt ser perwerdeya ayînî ya Nalî.

### 2.3.2 Perwerdeya Ayînî y Nalî

Nalî weke her ferdeke Misilmanê Kurdistanê di nava netewe, jîngeh û xêzanek Misilman de ji dayîk bûye. Piştî xwendin li hucre û mizgeftan qedandiye. "Her ji zarokatiyê ve guhên wî teji zaraveyên weke, Qadirî, Neqşî, Şêx, Bezince, Mewlane, Derwêş, Sofî, Tekye, Xaneqa, Terîqet, Tube, Arîf, Salêk, Xelwen Zikir û Xelqe. Em bêt ser jiyana Nalî ku behsa mezinahî, biheşt, dogeh û rûspiyên di vî warî de dikin. Di nava jiyana xwe de weke feqeyekê li gelek hucre û mizgeftan geriyaye û xwendiyê. Heta herî dawî li bajarê Silêmaniyê bi cih dibe." (Eebdûlla X. M., 2007, s. 89-90) Eşkereye ku "Hemû şahidê wê yekê ku berê hucre, mizgeft, mela û feqê cewherekî çanda Kurdistanê bûn. Kesek ku pisporî di jiyana û çanda Kurdistanê û çanda Îslamiyetê de hebe, dizane ku melayên Kurdistanê di vê meydana de li gor cih û serdema xwe gihiştine çî astekê. Ji bo em bizanin ku ev mela û feqeyên Kurdistanê ku Nalî jî yek ji wan e, di çî

rewşekê de xwendine. Di di serdema feqêtiyê de jî yek ji feqeyên ku herî zêde xizmet dikir bû." (Mihemed M. K., Nalî Le Klaw Rojney Şerekanyewe, 2009, s. 23-24)

Dilsoziya ji bo ayîn û xwendinek zêdetir a ji bo zanyariyên ayîn, "Di despêka ciwanîyê de li pey xwendinê ketine. Bi baweriyek kûr û zêde xwe fêrî xwendin, pirtûkên olî, Qur-an û hedîsan kiriye. Lê berevajî gelek seyîd, mela û şexan, bawerî bi kesên xelkê dixapînin nedikir. Belkî gelek bi jîrî li hemberî wan rawestiyaye, şermezarkirin û rexne li wan girtiye." (Eebidelhemîd, 2013, s. 104) Ji bilî ku Nalî ew pirtûkên ayînî yên kar li ser kirî, bû sedemek din a ji bo perwerdekirina Nalî. Weke xwendekarek baş pisporî di zimanên cîran de hebû. Bandora helbestvanên berê û yên di serdema wî de li ser hebû. Vê yekî jî bandor li kar û kesayetiya wî kiriye û ev yek di helbestên wî de jî diyar e. Ji ber ku "Nalî, kesek xwendekar û mela bû, agehdariya wî li ser wêjeya Farisî hebû û wêjeya Erebi jî baş fêm dikir. Serdema ku Nalî di nav de jiyayî, wêjeya Farisî di nava Kurdan de gelek belav bibû. Herwiha wêjeya Erebi û zimanek sade hebû. Eger em temaşeyî helbestên Nalî bikin, di warê bikaranîna peyv û ziman de ji me re derdikeve holê ku helbestên wî gelek peyvên Farisî û bêyî destkariya wan bike, di nav de hene. Herwiha gelek peyvên Erebi, zaraveyên ayînên Feqêti, yasayên dîn, mantiq û feleknasî di nav de hene. Bi awayek baş bikaraniye." (Mihemed H. , 2014, s. 97-98) Nalî berhemê gelek helbestvanên weke, "Mewlanayê Romî, Hafîz, Seedî Şîrazî, Kilîmî Hemedanî, Xaqaî Tewrêzî, Şewketî Farabî, Muhteşemî Kaşanî, Saî Esfehanî, Bêdill, Nizamî Gencewî û hwd... xwendiyê. Ji ber ku berhemên van gelek belav bûne. Ango xwendina berhemên van helbestvan û wêjevanane di wê demê de, di hucre û ji ber kirina tekstên berhemên wan bandorek mezin li ser Nalî çêdikir. Bêgûman berhemê van wêjevanane, hemû yan jî hinek ji wan bandor li mejiyê Nalî kirine. Nalî kariye sûd ji fikir û ramanên wan wergire. Bi rêya hunera wan di helbestên xwe de bikarbîne û sûd jê wergire. Ev jî ji bilî fikrê eniya Kurdewarî, karasata li navçeyê û dîmenên li welatê wî jî bandor lê kirine. Herwiha di wêjeya Farisî de ji Mewlanayê Romî û heta digihe Hafîzî Şîrazî felsefeya derwêşiyê hebûn. Lê wan jî sûd ji kesên li pêşiya xwe wergirtine." (Mihemed H. , 2014, s. 98-99)

Nalî weke helbestvanek mezin di wê serdemê de li Kurdistanê bû, "Ji nêz ve agehdarî û pisporîbûna wî li ser eniya soffigeriyê hebû. Ew jî çî bi xwendinê be, çî bi dîtin û çî jî bihîstinê be. Rojane li tekuye û xaneqeyan bû, peywendiyên rasterast li ser zikir û dûakirinê hebû... Serdemên ku bajarê Silêmaniyê teji tevger bûn û xelk jî di hemû aliyan de berê xwe dabûnê. Vê yekê jî di birin û anîna dîtin, ramanan û aramiyê de



bingeh xweş kiribû." (Eebdûlla X. M., 2007, s. 90) Perwerdeyek tendirûst di ayîn û baweriya ayînî de ligel Nalî peyda dibe herwiha "Xwendina destnivîs, pirtûk, name, mijarên li ser sofîgerî yan jî felsefeya îrfanî hatîne nivîsandin ku behsa jiyan, dîrok û xalên giring ên van navan dike. Ew jî bûne sembola mezinahî, rewş û meqaman. Xwendina hucre û guftûgoyên dîwanên şevane, geşt û gera feqêtiyê, musteîdên wê demê ji bo şarezabûnek zêde û wergirtina zanyariyan de rolek serekî leyîstine. Wê serdemê xaneqa û tekye peywendiyên rasterast bi civakan ve hebûn. Gelek gûhertin û biryarên giring li wan cihan dihatin dayîn û kar bi wan biryaran dihat kirin." (Eebdûlla X. M., 2007, s. 91) Ev tiştane hemûyan jî bandorek baş li perwerdeya Nalî kiriye. Ligel bandora van kesayetî û mamostayên di serdema xwendinê de bûne sedemek serekî ku Nalî bi awayek wiha ciwan û rêkûpêk hatibe perwerdekirin. Mamostayên ku Nalî ligel wan xwendî, "Li Qeredaxê ligel Şêx Mihemedê Îbnûl Xeyat xwendiyê. Li tekyeya Qeredax jî bîrkarî ligel Şêx Elî Mela xwendiyê. Li Silêmaniyê û li mizgefta Seyîd Hesen ligel Mele Ebdûllahê Reş bû. Herî zêde rolê mûsteîdî li xaneya Mewlana Xalid derbas kiriye. Herwiha gelek li Helebce û Silêmaniyê ligel Şêx Eewlay Xerpanî xwendiyê." (Ebdûlkerîm, 1976, s. 24)

Nalî ji nêz ve bi çavê xwe hemû pîrsgirêk û hevrikiyê di navbera, "Mezhebên Qadirî û Neqîşbendî de dîtîye. Bi awayek ku mirov bêje, li dijî hev bûn. Lê di armanc û naverokê de herdu jî hewl didan ku dîtînen xwe belav bikin. Eger rojek ji rojan li dijî hev bûna, armanca wan ew bû ku qezenca wan zêdetir be; serkeftina her aliyek ji wan ji bo gelê Kurd wekhev bû." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 88) Lê ne diyare ku Nalî girêdayî kîjan ji van mezhebaneyê. "Wisa tê dîtîna ku Nalî hê feqe bû yan jî nû dest bi xwendinê kiribû. Dema Mewlana Xalidê Neqîşbendî ji Hindistanê vegeriya Kurdistanê, mezhebê Neqîşbendî bi naverok û awayek nû li navçeya Silêmaniyê zindî kir." (Mihemed M. K., Nalî Le Klaw Rojney Şerekanyewe, 2009, s. 82) Tenê ev yek heye ku Nalî ne bi başî û ne jî bi xirabî navê Mewlana ne aniye. "Herçendî ji çend aliyan ve ligel Mewlana hevgerîye û herdu jî ji herêma Şarezar in. Herwiha herdu jî ji eniya Pîrî Mîkaîl û eşîra Caf in. Di dema xwendinê de gelek nêzî hev bûn û ligel zanayên navdar ên Kurdistanê xwendine. Xwediyê giyanekî Kurdewarî de û gelek nêzî Mîrên Baban bûn. Diyare Nalî di nava dilê xwe de gelek ji Mewlana hez kiriye. Her wê heskirinê jî wisa lê kiriye ku biçê li ser xaneqaya Mewlana rûne û dersê bêje. Nalî 7-8 salan li ser xaneqaya Mewlana rawestîya ye û ders gotiye. Nalî gelek ji xaneqayê hes kiriye." (Eebidelhemîd, 2013, s. 28-29) Mihemed Mela Kerîm tekeziyê li wê yekê dike

ku "Naliyek li xaneqaya Mewlana jiyana kiriye û odeyek di nav de hebû, herçendî em nizanin weke melayek bê jin û zarok di wê malê de jiyana kiriye. Yan jî melayê wê xaneqayê bû. Em Nalî ne bi başî û ne bi xirabî navê Mewlana nayne. Helwesta xwe li ser pirsgerêkên mezin ên wê serdemê nîşan nade." (Mihemed M. K., Nalî Le Klaw Rojney Şerekanyewe, 2009, s. 82) Tenê ew yek heye ku "Helwesta Nalî ya li beramberî Mewlana ne xirab bû û bi çavê xirab temaşe nekiriye. Herwiha bi başî jî behsa wî nekiriye. Ji ber ku bi xwe di derûnî, dilê wî ne ligel sofîyetiyê bû. Bi hemû hêza xwe li hemberî wê yekê rawestiya ye. Dijî wê yekê bû sofî hinek tiştan li derdora xwe kom bike. Bi hikmê ku ew yek ji mirovên rûspiyên derdora Baban bû. Baban û Mewlan, belkî Baban û hemû bawermend peywendiyek wisa hevgirtî di navbera wan de nebû, lewra bi başî behsa wan nekiriye." (Mihemed M. K., Nalî Le Klaw Rojney Şerekanyewe, 2009, s. 83-84) Li aliyek din jî Mihemed Heme Baqî di wê baweriyê de ye ku "Nalî ji du aliyan ve alîgirê Mewlana Xalid û xaneqeya wê ye. Aliyê din ê Nalî ewe ku Mewlana Xalid rewşenbîrek ewqas mezin û jîr bû, xwediyê helbest camêraneye. Aliyê din ê xaneqaya Mewlana Xalid, ev jî ji ber jîrîtiyê û jêhatiya Mewlana Xalid bûye navend û cihê fêrbûna gelek xwendekar û kesên cûda yên navçeyên Kurdistanê. Vê yekê jî wisa kiriye ku rêya dûr û navçeyên cûda yên Kurdistanê ji bo Nalî nêzî hev kiriye. Ji ber ku beşdariya çandên cûda, xaneqa bi xwe weke Kurdistanek biçûk bibîne û di nava de bi xewnek mezin tevî daxwaza û minaqeşeyên germ ên ewqas rewşenbîr û zanayan bibe. Piraniya wan jî bi sedan kîlometreyan dûr bûn. Kesên dihatin xaneqayê, piraniya wan ji bo fêrbûn û wergirtina zanyariyan dihatin." (Mhemed H. , Zimanî Nalî ne Zimanî Paşaye û na Zimanî Reeîyet, 2011, s. 180)

Nabe kesek zana û helbestvanek mezin ê weke Nalî di wê serdemê de xwediyê dû mezhebên weke Neqşibendî û Qadirî be. Li dema jiyana xwe helwestek eşkere û zelal li ser van mezheban nebe. "Ji ber ku Nalî teoriyên sofîzmê baş fêm dikir, yek ji wan sofîzman Îslamî. Eger weke teorî li dijî derwêşîzmê be, sûd ji sofîzmê wergirtiye û bal kişandiyê ser aliyê giyanî yê baweriyê." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 88) Dibe sedema vê yekê ew be ku Nalî zû zaniye ku "Herdu rêbazên Qadirî û Neqşebendî du rêbazên ayînî yên girêdayî şerîeta Îslamê ne. Di bingehe xwe de dewletên Îslamî û ne Îslam ên di serdema xwe de, li gor berjewendiyên xwe destê wan di damezirandin û alîkirina wan an jî dijberiya wan kiribe." (Letîf, 2009, s. 141-142) Lewra Nalî xwe di van herdu mezheban de nabîne, ji ber ku "Sofîgerî ne tişte wisaye ku mirov an jî ti aliyek tişte cîhanî nebe, ne kesê bike evdê xwe û ne jî bibe evdê ti kesekê." (Letîf, 2009, s.

143) Lewra em pêwîst dibînîn ku behsa mezhebên Qadirî û Neqîşbendî bikin û ev herdu mezhebane li Kurdistanê belav bibûn.

### 2.3.2.1 Mezheb (Terîqet)

Despêkê ji ber derketina gelek rê û şewazên ji bo xweparastina ji mezhebiyê derketin derve. Ji ber ku "Mezhep ji şewazeke pratîkî rênîşandayîna bi armanca dîtina rêbazek ku çend pile û qonaxên cûda derbas dike, pêk tê. Bi rêya fikir, hest û kiryar a ji bo çawaniya hewara xwe gihandina ezmûna Yezdanê rast e. Yasayên mezhebên sofîzmê ji komên ku rêbazên xwe ji perwerdekirin, perwerdekirina derûnî, xwedaperestî û derbasbûna di qonaxên paqijkirina (Purifications) bidestxistina meerîfetê pêktê. Baweriyên van bi wî awayî bû dikarin bi perwerde û perwerdeya derûnî bigihin rastiyan." (Ceefer, 2008, s. 39) Herwiha ji bilî vê jî "Mezheb tê wateya pêngav avêtina ber bi rêbaza Rohaniyan, kontrolkirina derûn, xwesteka kakesî, paqijkirina hundir û jiyaneke aram. Piştê jî ew zarava hat guhertin û derbasî dibistanek fikrî bû." (Ceefer, 2008, s. 39)

Lewra terîqet serî hilda. Raste hemû xwediyê rêbaz û rêyekê bûn, ew jî pejirandina Xweda bû. Lê di warê awa û peyrewiya Xwedaperestiyê de cûdahiya wan jî hebû. "Her yek ji van mezheban, li cihê taybet, cûda û li cihê yê din Xwedayê mezin zilamek muteserîf û sofîyek xwedanas ji bo damezirandinê afirandiyê... Piştê weke îmam, rêber û pêşengê wê mezhebê ye. Ev xwedî ji bo sûd û qezenca mirin û nemana Îslam û Misilmanan... Ji bo pêşketin, serkeftina ola Îslamê, peyrewkirin amojgariyên şerîet û terîqetên din bi rê ve biriye... Piştê rûspî û navdarên ji pîran û zilamên wê terîqetê çî weke rûspiyê terîqeta xwe û çî jî weke zana, xwediyê zanyarî û zanistan jêre çêbûn. Damezirandina terîqetan an jî pêşveçûna vî kesî, mezinahiya "Ewliyayê Ewliyayan Hz. Şêx Ebdûlqadirê Geylanî, Seyd Ehmed Refaî, Seyd Ehmedê El-Barî, Seyd Îbrahîmê el-Desûqî û Şahî Neqîşbend." (Eumer, 2012, s. 39) Piştî koç û damezirandina terîqetan "Ji aliyê xelîfet û mirîdan ve ev rêbaz dihat berdewam kirin. Her terîqetek zincîriyek nesebî rohanî ya taybet girêdayî wan hebû. Endamên terîqetê bi damezirîner ve girê dide. Em zincîra nesebî navdar û nasnameya nasîna pile û payeya terîqet û damezirînerê wê bû." (Ceefer, 2008, s. 39-40)

Kurdistan jî weke gelek Misilman ji van terîqetane bêpar nebûye. Di van terîqetan de gelek şêx û kesayetiyên mezin ên li Kurdistanê rêbertiya van terîqetan dikirin. Ji ber ku "Bi sedan sal bû şêxên terîqetan di nava Kurdan û derveyî wan de

deshilat peydakiribûn. Dîroka terîqetan û bingehê wê vedigere berî sedsala 18 û 19'an. Şêxên Kurdistanê tenê hinek kes bûn piştî rûxandina mîrîtiyên Kurd û alozbûna rewşa siyasî, civakî û abûrî ya Kurdistanê bikarin xelkê li derdora xwe kom bikin. Civaka Kurd jî carek din û ji nû de birêxistin bikin. Ev şêxane ji du terîqetên cûda û sofîgerî yên weke 'Qadirî' û 'Neqîşbendî' pêkhatibûn." (Ceefer, Nasyonalîzîm û Nasyonalîzmî Kurdî, 2004, s. 151-152) Tiştên mijara gotinê ewe ku li Kurdistanê ev herdu terîqet herî zêde belav bûne. Ev terîqetane bandorek zêde li fikir û ramanên xelkê kirine. Para herî zêde ya gelê Kurd, girêdayî rêbazên terîqeta Qadirî û Neqîşbendî bûn. Lewra emê werin ser mijara van herdu terîqetan.

### 2.3.2.2 Mezheba Qadirî

Yek ji wan terîqetaneye ku heta niha jî giranî û bandora wê berdewam dike. Bi navê Şêx Ebdûlqadirê Geylanî hatiye naskirin. Damezirînerê terîqeta Qadirî "Navî wê Ebdûlqadirê Kurê Ebî Salih Kurê Cengî Dost e û ji Geylanê ye. Li sala 488'ê koçî û di temenê 18 saliyê de hatiye Bexdayê. Li sala 471'ê koçî ji dayîk bûye û şeva şemiyê li sala 561'ê koçî li Bexda koça dawî kiriye." (Eebdûlrezaq, 2003, s. 76) Di derbarê gelo bi eslê xwe ji kûderê ye gelek "Cûdahiyên kêr hene. Hinek dibin ser nîşê Hesênê Kurê Elî, hinek kêr jî dibin ser Hûseyînê Kurê Elî. Bi her awayî bi eslê xwe girêdayî Eliyê Kurê Ebû Talib û Fatîmeya Zehra." (Eebdûlrezaq, 2003, s. 78) Li gel vê yekê jî ev kesayetiye ji binamelek mezin û navdar ya ola Îslamiyê ye. "Nedixwest behsa eslê xwe bike yan jî şanaziye pê bike. Herwiha ji zarokên xwe re jî di got ku şanaziye bi eslê xwe nekin. Ev jî bi taybet ji bo wê yekê bû xwe mezin nîşan nede." (Eebdûlrezaq, 2003, s. 80) Ji ber ku "Di serdema wî mezinî de, ew terîqet gihiştîye asta herî bilind... Ev terîqet bi navê wî hatiye naskirin." (Eumer, 2012, s. 68)

Timî hewl dida ku Îslamê ji dûbendiyê dûr bixe. Ji ber ku hemû Îslamê armanceke wê heye û ew jî bidestxistina pejirandina Xwedayê mezin e. Her ji ber vê yekê "Şêx Ebdûlqadir rêzdarî li mezheben ehlî sunet û cemaetan digirt. Daxwaz dikir ku rêzê li dîtinên wan bigire, ji nexweşî û dûbendiyê dûr bikevin. Ji ber ku hemû çavkaniya xwe ji cihekê digirin. Hemû jî çeqên darekê ne." (Eebdûlrezaq, 2003, s. 188) Lewra timî hewla navbeynkariyê di navbera du aliyên dijberî hev dikir. Bi vî awayî "Şêx navbera fiqih û sofîgeriyê rêxist, zana û sofî kir bira û rastî xist di bin banê şerîetê de. Sofîgerî jî di wê bîde (Derveyî Îslametiye) û nerastî paqij kir. Bi vî awayî şerîetnas û sofîyên di serdema xwe de nêzî hev dibûn." (Eebdûlrezaq, 2003, s. 196) Ev jî bû sedem ku "Li

hemû welatên Îslamê belav bû û di belavbûna Îslamê ya li Efrîqa de rolekî gelek giring hebû. Herwiha li Kurdistana Iraqê jî berî Neqîşbendî belav bû." (Biraîm, 2001, s. 60)

Ji bo biçê di nava terîqeta Qadirî, gelek bingeh û rêbaz hebûn ku "Şêx Ebdûlqadirê Geylanî çend bingehên giring ji bo terîqeta xwe danîne. Ew jî, cîbicîkirina tevahiya Qur-an, hedîs û parastina berhemên Îslamê.. Eger derwêş bixwaze bigihe asta herî bilind a sofîgeriyê, pêwîste xwediyê van taybetmendiyane be. Nabe sond bi Xweda bixwe, bi ti awayî derewan neke, sozên xwe bêne cih, nalet li ti hebûnekê neke, dûayên xirab ji bo ti kesê neke, daxwaza alîkariyê ji kesê neke, temaiyê li destê kesê neke û hwd..." (Biraîm, 2001, s. 76) Vê terîqetê dewrek bi bandor di belavkirina ola Îslamê û rakêşana xelkên ne Misilman a ji bo sêwana Îslamê hebû. "Pîrê Geylanî di serdema xwe de rolekî mezin di warê civakî û ayînî de hebû. Li ser destê wî zêdetirî 5 hezar Fileh û Cihû bûn Misilman. Zêdetirî 100 hezar kesên xirab, li ser destê wî tobe kirine." (Biraîm, 2001, s. 73)

Dîroka terîqeta Qadirî li Kurdistanê "Li sedsala 19'an gihiştîye sînore deshilata Mîrîtiya Baban û Şêx Marûfê Nûdehî yê rêber û serok." (Ceefer, Sofizim û Karîgerî le Bizutnewey Rizgarî Xazî Neteweyî Gelî Kurdda, 2008, s. 42-43) Ev kesayetiye weke Xwedanasekê, "Terîqeta Qadirî cara yekemîn weke rêxistinekê li Kurdistanê damezirand. Ev zanayê mezin, navê wî Mihemedê Marûf û ji nifşê Şêx Mihemedê Nodêyiye. Bapîrê 13'mîn ê Seyîd Îsa Berzinciyê kurê Seyd Baba Elî Hemedaniye. Ji wir hatine û Şarbajêr jiyane. Şêx Marûf li sala 1766'ê zayînî li gundê Nûdîcî yê girêdayî Şarbajêr ji dayîk bûye. Zanistên Îslamê li ser destê Mele Mihemedê Îbnûl Ac wergirtiye. Li sala 1836'an li Silêmaniyê koça dawî kiriye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 36-37)

Destekî bilind ê vî zanayî di terîqeta Qadirî ya li Kurdistanê de hebû û ber bi pêş ve biriye. "Em dikarin bêjin Şêx Marûfê Nûdehî li Silêmaniyê weke damezirînerê yekemîn ê terîqeta Qadirî tê danîn. Di warê pratîkî de li pişt wî rêxistina Qadirî bûye dezgehek ji bo lêkolîna şerîet û terîqetê, gelek kes li derdora wî civiyane. Şêx Marûf ev serwetane hemû û giyanê rewşenbîrî ji bo kurê xwe Kek Ehmedê Şêxê hiştîye. Ev jî hevdem ligel jîriya wî, kek Ehmed bû mezintirîn rêberê terîqeta Qadirî li Kurdistanê. Pile û rêzdariya wî gihişt pileya Ebdilqadirê Geylanî yê damezirînerê terîqetê." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 37) Lewra heta niha jî ev terîqet li Kurdistanê maye û berdewam e.

### 2.3.2.3 Terîqeta Neqîşbendî

Herwekî çawa mezhebê fiqheyîyan li gor dîtina zanayan gelek dîtin û cûda ne, bi vî awayî jî rêbaz û dibistanên sofîgeriyê li gor dîtina oldaran cûdane û bingehê herduyan yek e; ew jî Qur-an û ayet in. "Ev terîqet di nava terîqetên din de, li gor hebûn û damezirandina wan weke terîqetek nû û kêmtir temen tê danîn... Lê ligel dirûstbûn û damezirandinê, karî bingehê li gelek welatên Îslamê belav bike." (Eumer, 2012, s. 72) Navê vê terîqetê ji peyva 'Neqîşbend' Tê "Peyvek Farisiye û ji du beşan pêktê. 'Neqîş' wêneyê wê morêye ku li ser mûm û tiştên din tê danîn. 'Bend' tê wateya îspatkirin û nevimirandinê. Ango peyv bi tevayî tê wê wateyê ku zikrê Xweda bandorê li dil dike û di dil de tê çandin." (Biraîm, 2001, s. 77) Marûf Xeznedar jî dibêje: "Ji ber ku nasnavê Neqîşbendî wergirtiye, ji ber ku di warê hêza rih ve karîna wê yekê hebû ku wêneyê belgeyên zanistî yên îlahiyetê bikêşin. Ango wê belgeyê di nava dil de binexşîne." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 38) Damezirînerê terîqeta Neqîşbendî "Şêx Mihemedê Kurê Mihemed Behaedînê Bûxariye. Şêx Mihemedê Neqîşbendî weke şah hatiye naskirin û li sala 1317'an (zayînî) li gundê 'Koşkî Hîndiwan' li nêzî bajarê Buxara ji dayîk bûye. Li sala 1388'an jî koça dawî kiriye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 38-39) Hinek kesên li ser vê terîqetê nivîsandine, "Despêkê vedigerînin Ebûbekirê Sidiqî. Navê wê kirine 'Sidiqîye.' Di wê baweriyê de ne ku Ebûbekir damerandiye. Vedigerînin ser Pêximber (S.A.S) ku belgeya wê jî ewe ku Ebûbekir cîgirê Pêximber bû. Di koça ji bo Medîneyê ligel bû." (Biraîm, 2001, s. 77) Lê pîranên vê terîqetê hewl dane ku zindî bikin û navek din jêre hilbijartine û kirine Neqîşbendî.

Li gor pîrana vê terîqetê, sedemê dirûstbûna terîqeta Neqîşbendî bû ji wê yekê bû berdwama terîqetên din be. Tiştê ku wan nekirî, ew bikin. "Hemû kêmasiyên terîqetên din temam bikin û yên nekarin bikin, temam bikin. Ango terîqeta Neqîşbendî bi giştî zindî bikin... Terîqeta Neqîşbendî di hemû waran de berdwama karkirina terîqetên din e. Ji weke şêwe û naverok bi temamî ji wan cûdaye. Vê terîqetê karî ku dîtina hemû îmamên "Şafîî, Henefî, Malikî û Henbelî." Heta hinek caran ji bo karên pêwîst û rewşa sûd ji dîtinên îmamê Cehferî Saqîd Cefherîyan wergirin. Her têkilkirina dîtina îmamên mezin, li meydana sofîgerîyan de bigihin çend armancên rast, paqij, zindî û resen." (Eumer, 2012, s. 73-74) Cûdahîyeke din a vê terîqetê ji terîqetên din "Bi wê yekê navdare ku ji hemû rêyên din hêsantir ku werziş giran û xwe êşandin di nav de nîne. Di vê derbarê de damezirînerê wê dibêje, despêka terîqeta me dawîya terîqetên din e. Rêbaz di vê terîqetê de ji ber sozê ve digihe armancê, nekû bi werziş giyanî û laşê

giran. Yê ji ber wê sozê bigihe qonaxa xwe, piştî nîstî digihe agehdariyên rast. Lê ya ji ber sedema werzişê bigihe nîstî (fena) bi dawî tê û di wê demê de jî di berjewendiya wî de ye û ne jî di ya xelkê de." (Birahîm, 2001, s. 79-80)

Hemû çavkanî li ser wê yekê hemfikirin ku "Şêx Xaliqê Şarezûrî Neqîşbendî kesê yekemîn bû, terîqeta Neqîşbendî weke rêxistinekê aniye Kurdistanê. Şêx Xalidê damezirînerê vê terîqetê li navçeya Silêmanî û hemû Kurdistanê, kurê kesekê ye ku ji binemala Mîkaîlî ya eşîreta Caf e. Nasnavê wî Ziyaedîne û li sala 1779'an ji dayîk bûye û li sala 1813'an jî koça dawî kiriye. Zanista ayînê li zanayên mezin ên wê serdemê, li Qeredax, Silêmanî û bajarê Sine yê Erdelan wergirtiye. Li sala 1807'an çûye Hindistanê û ligel Şah Ebdûllahê Dihlewen. Ev li Hindistanê yek ji şêxên mezin ên terîqeta Neqîşbendî bû. Şêx Xalid salekê ligel Şah Ebdûllah dimîne. Di wê demê hemû pêdiviyên wergirtina terîqetan wergirtiye. Li ser destê şah Ebdûllah, terîqeta Neqîşbendî wergirt û rê jêre xweş bû bibe mirşîd û Şêxê terîqetê û li Kurdistanê terîqeta Neqîşbendî damezirîne. Di dema veqerê ji Silêmaniyê, Şêx Xalid çû bajarê Sine û demekê bi belavbûna terîqeta xwe ve mijûl bû. Karî mamostayê xwe, Şêx Mihemed Qesîm bêne ser terîqetê û li wê navçeyê bike mûrşîd. Piştî jî hat Silêmaniyê." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 39-40) Dema gihîşt Silêmaniyê, "Wê demê serdema mîrîtiya Baban bû. Wisa rê dibe ku Şêx Marûfê Nadehî li wê demê dibe rêber û belavkerê terîqeta Qadirî. Herçendî Qadirî berî Neqîşbendî belav bû, lê dema Mewlanayê Xalid bû rêberê Neqîşbendî, li wê navçeyê êdî xelkê bi her awayî berê xwe dayê. Li ser destê wî, terîqet wergirtin. Nabe em wê yekê ji bîr bikin ku navenda serekî ya terîqeta Qadirî, li bajarê Silêmaniyê bû. Lê ya Neqîşbendî li Biyare û Şarezûr bû." (Birahîm, 2001, s. 80)

Bêgûman serhildan û peydabûna fikir û rêbazek nû, dibe sedemê komkirina xelkê ya li derdora wê. Lewra "Dema di navbera salên 1811-1820'an weke salên herî bi berhem ên Neqîşbendî tê hêjmartin. Li Kurdistanê hêjmarek zêde ya xelkê bi veqerê Mewlana ya ji bo Silêmaniyê tevî dijminatîya berdewam a Qadiriyan, hinek caran jî mîrên Baban hatin ser vê rêbazê." (Cefer, Sofîzim û Karîgerî le Bizutnewey Rizgarî Xazî Neteweyî Geli Kurda, 2008, s. 52) Terîqeta Neqîşbendî di demek kurt û neçaverêkirî, karê cihê xwe di nava dil û derûna xelkê de çêbike. "Vê yekê jî wisa li terîqeta Qadirî kir ku xwe di nava cihekê teng de bimîne û hest bi lewazbûnê bike. Li vir hevriqî bi eşkere serî hildide. Rêberê Neqîşbendî Mewlana Xalid û rêberê Qadirî Şêx Marûfî Nûdehî." (Birahîm, 2001, s. 81) Lewra em baş dibînin ku bîr ser hineke xalên hevbeş û cûdahiya di navbera van herdu terîqetan de.

### 2.3.2.4 Xalên Hevbeş, Wekhev û Cûdahiyên Terîqeta Qadirî û Neqîşbend

#### 2.3.2.4.1 Xalên Hevbeş û Wekhev

Eşkereye ku herdu terîqet çî Qadirî û çî jî Neqîşbendî, herdu jî Misilman in. "Li ser bingehe Qur-an û gotinên Pêximber (S.A.S) hatine damezirandin. Di despêkê bi qasî misqalekê li ser rêya Îslamê neçûne." (Birahîm, 2001, s. 83) Baweriyek baş bi "Yasayên destûra asîman û erdê ya ji bo pêşvebirina dînê Îslamê yê pîroz ku ew jî dengvedana xwe di wateyên pîroz ên Qur-ana Mezin de belav bûne. Herwiha baweriya wan ne tenê Pêximber hebû, baweriya wan bi hemû pêximber û dostên wan hebûn. Ew kesên mezin ên 'Resûl' an ku kesên ji aliyê Xweda ve hatine dizanin û nardina wan jî hemû ji Îslamkirina mirovatiya di dema xwe de bûn. Herwiha di danîn û peyrewkirina terîqetan de, terîqetan bi hev ve girê didin, lêkolînên şerîet û herwiha şerîetên îmaman ji bo peyrewkirina Misilmanan danîne. Ji ber vê yekê sofiyek Neqîşbendî bi wê dîtinê temaşeyî derwêşek Qadirî, şêx û pîran dike. Diyare ew jî xwediyê heman dîtinê ne. Bi vê dîtinê temaşeyî hev kirin." (Eumer, 2012, s. 75)

Herdû terîqet şevên îniyan ji bo zikirkirinê bikartînin. Ji ber pîroziya wê "Derwêşên Qadiriyan ku timî li ser wê zikirkirinê berdewam in. Timî zikirkirin dixistin şevên îniyan, ew jî ji ber pîroziya mirûd û derwêşan. Li ser sekoyek ku bazinekê rûdiştin, "Şêx an jî seyîd" li serê dîwanê û li cihek bilindtir rûdinişt. Cûbeyek (Hîcab) spî ya wekî firîşteyan dikir ber xwe, komek kesk li ser serê xwe datîna. Ev jî ji bo wê yekê bû, seyîd xelkên asayî cûda bike." (Eumer, 2012, s. 83)

Herwiha bi heman awayî, "Zikirê Neqîşbendiyan jî her di şevên îniyan de rûdiniştin. Sofî li ser sekoya xaneqayê bi awayekê girover rûdiniştin. Şêxê terîqetê jî her di rêza wan de rûdinişt. Li her aliyekê wî xelîfeyek rûdinişt. Şêx bi vê yekê ji sofiyan tê cûdakirin ku kefiyek spî û tenik li ser rûyê xwe datîne, cûbeyek ne zêde stor û ne jî tenik girê dide. Ji vê re 'Xerqe' dihat gotin. Şêx bi xwe yan yek ji herdu xelîfeyên li derdora Şêx, ji bo despêkirina civînê û dabarekirina zikir, şîrovekirin bi dengê bilind ku hemû aliyek ji sofiyan gûh bidin. Dibêje : 'Tefekkerû Fîl Mewt' ango 'Fikrê mirinê bikin' û hûnê hemû bêdeng dibin. Fikra wan diçe ji bo gor, qiyamet, roja hesap û lêpîrsînê." (Eumer, 2012, s. 84)

#### 2.3.2.4.2 Xalên Cûda

Hinek cûdahiyên biçûk di navbera van herdu mezheban (terîqet) de heye û erkê dûrxistina wan a ji hev digêrin; "Di warê civakî de rêxistinên mezhebî yên Qadirî li



Kurdistanê bi zehmetî di nava bajaran de tîn dîtin. Berevajiyê mezhebê Neqşebendî, zêdetir li gund, mezra û navçeyên çandiniyê tê dîtin. Herdu mezheban zaraveyên xwe yê taybet ji bo navê perestgeh û navê endamên rêxistinê heye. Ji bo belge, ligel Qadiriyan ji cihê civînan re dibêjin, 'Tekye.' Lê ji endamên rêxistina mezhebî re dibêjin, 'Derwêş.' Neqşebendî ji cihê civînan re dibêjin 'Xaneqa' û ji endamên rêxistinê mezheba xwe re ji dibêjin, 'Sofî.'" (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 43)

Herdu mezheb hinek aliyên xwe yê taybet ên civakî hene. "Her bi wî awayî Qadiriyan li civînan zikir û şîrovekirina wan bi deng û hewarê encamp didin... Ev jî di demekê de ye ku di terîqeta Neqîşbendî û sofîyên nexşê berevajî dibe. Zikir û şîrovekirina wan, berê xwe dide bîdengî û aramiyê. Tevî ku zikir dikin, tiştên di nava dilê wan de rû bi rûyê Xwedayê Mezin, Pêximber û dostên wan dikin. Gelek caran jî ji bo wî zikir û şîrovekirinê, hê zêdetir diketin di nava bîdengiyê de û berê xwe didin bîdengî û fikirkirinê, dûr radiwestin." (Eumer, 2012, s. 80) Herwiha kesayetiyên zana û rêberên terîqeta Qadiri, "Xwe bi şêxên resen û zindî binav dikin. Lê ev diyardeye ligel Neqîşbendîyan parçe dibe, xwe bi şêx û şêxên di nava malan de binav dikin. Ji ber vê yekê ji despêka şêxên Qadiri ve ev cûdahî ji wê rojê ve di nava van herdu terîqetan de tê dîtin û berdewam e." (Eumer, 2012, s. 78)

Cûdahiyek din jî heye ku bi awayek eşkere û vekirî di navbera van herdu terîqetan de dîtin. Ew jî ewe ku "Qadiri li gor Neqîşbendîyan, zêdetir berê xwe didin tiştên ron û eşkere... Ango giringî û mezin bi awayê şêkil didin, naverok û forum ligel wan ne zêde girînge. Ev jî di demekê de ye ku ligel terîqeta Neqîşbendîyan bi temamî berevajîye." (Eumer, 2012, s. 79) Ji bilî van jî di şêwe û heta çawanîya bikaranîna rêyên ku armanca wan ewe bigihinîn, mînak, "Baweriya Qadiriyan bi zirk (Navê kesan xirabkirin), şîr avêtin, şûşe û xwarina agir heye. Lê Neqîşbendî berevajî ne. Qadiri pûr, rih û simêlên xwe dihêlin, lê Neqîşbendî berevajî ne. Eger rih jî bihêlin, ligel simêl gelek tenik e." (Eumer, 2012, s. 81) Ev tiştên ku me behs kirine hinek cûdahiyên di warê şêwe, uslub û kiryarên wan a di gihandina terîqetan de ji bo mirûd û alîgirên xwe, sofî û derwêş digihînin fikir û ramanek bilind û pîroz.

#### **2.4 Bandora Nalî li Ser Helbestvanên Serdema Xwe û Yê Piştî Wî**

Di hemû serdeman de bandora helbestvanan li ser hev heye. Di nava tekstên helbestan de bandor li ser hev kirine û bi ti awayî dest ji hev bernedane. "Helbestên helbestvanên berê corê rûbarek berfirehe ku hemû jiyanê tê av dike... Lewra divê

helbestvanên nû, pêşî li vî rûbarê mezin negirin. Belkî pêwîste carek din zindî bikin." (Ferhad, Wêne le Şeirekanî Hemdîda, 2008, s. 55) Bêguman helbestvanên jîr û serkeftî, sûd ji helbestvanên berî xwe werdigirin. Ji bo karîna wan a dahênan û ciwaniya helbestê dewlimend be û asoya (ufuk) helbesta wan berfireh be. Lewra helbestvanan nekarîne xwe ji hev bandorkirinê dûr bigirin. Hinek caran sûdwegirtin bû û hinek caran jî bi awyaek baş bandor li ser kiriye û weke xwe texlîd kiriye. Ango helbestvan û helbestên wê serdemê yan jî yên berî wan, bandorê li helbestvanê duyemîn dike. Weke baxçeyek teji gûl bûye û ji bo bêhnkirinê li ber destê wan bû.

Li vir armanca me ewe ku helbestvanên me peywendî ligel helbestvanên din hebû, sûd ji helbestvanên din wergirtin. Vekirî û zelale ku agehdariya helbestvanên me ji helbest û dîwanên hev hebûn. Ango helbestvanên baş zaniye helbestvanê berê wî çî kiriye, çî hest û sozeke dostaniya ligel helbestan hebû. Timî li pey geran û xwendinê bûn, ji bo bêhnê li gûla helbestvanên din bikin; "Ev bi xwe jî diyardeyeke cihê keyfxweşiyê ye helbestvanên me yên jîr ewqas helbestên bihêz û nazik wisa ji nişkan ve ji wan re nehatine. Bi belaşî tekane peyvek çiyê, ne nivîsandine... Eger na ew koşk, sera û dîwan çawa wisa taqeta germa, serma û reqîbiyê digirin." (Eedûlla, 2012, s. 43-44)

Dema navê Nalî tê, di piraniya çavkaniyên wêjeyî yên Kurdî de Mele Nadirê Xidirî Nalî bi rêber û damezirînerê wêjeya Baban tê danîn û weke sêkoçka Kurdî tê danîn. Heta niha jî cihê tiliyên wî li ser helbesta Kurdî diyare. Armanca ji sêkoçkê jî Nalî, Salim û Kurdî ne. Eşkereye ku hersê rêber di damezirandina dibistana wêjeyî de, gelek xwendekar perwerde kirine. Bandorek rasterast a wê dibistanê yan jî wan rêberan li ser heye. Herwiha helbestvanên vê serdemê jî nekarîne xwe ji bandora Nalîyê Rêber dûr bixin. Ji ber ku "Bandora berhemên Nalî bi awayek eşkere û zelal di helbestên Kurdî de diyar dibe û di çend astan de derdikeve. Divê berî her tiştî ev yek ligel me zelal bibe ku Nalî di warê însiyatîf û dahênana di bikaranîna ziman de xwedî karîna bû. Ew jî şoreşa ziman a ku di Kurmanciya Jêr de li Silêmaniyê encam da, anga di zimanê de hemû helbestvanan ketine di bin bandora Nalî de. Di ziman de ji bo helbest û berhemên xwe, li ser şopa wî meşiyane." (Mihemed H. , 2014, s. 55)

Nalî di dîrokê de weke helbestvan, wêjewan, dîroknas û hwd..tê binavkirin. Ji ber ku "Hewldanên Nalî û hevalên wî ku rêber û desteya yekemîn a vê dibistana wêjeyî bû, di xaleke serekî de derdikevin. Ew jî guhertina wê peyrewa di dîroka wêjeya Kurdî de bû. Ew jî ji nivîsîna bi zimanê neteweyên din ên cîran pêktê. Helbest û dîwanên

helbestan bi zimanê Kurdî rêbaza xwe girt. Desteya duyemîn a ji helbestvanên derdora Silêmanî û navçeyên din ên Kurdistanê li pey vê tevgera wêjeyî hatin." (Hemenurî, 2008, s. 50)

Herwiha ev jî bû sedemê wê yekê ku "Ji bilî bandora ziman û şopandina li ser rêya Nalî ya ji aliyê helbestvanan ve, divê em vê yekê jî bêjin ku ev bingehê Nalî piştê bû sedemê çêbûna zimanê wêjeyî yê hevgirtî ku ew jî Kurmanciya Jêr e." (Mihemed H. , 2014, s. 55) Niha di helbestê de awayek taybet e, "Şêweyê zimanê ku helbestvanên damezirînerên vê dibistana wêjeyî kirine zimanê xwe, zimanê helbestê yê li piştî wan bû, li ser wî zimanê berdewam bûn û heta niha jî berdewam e." (Hemenurî, 2008, s. 50) Li vir emê li gor karîna xwe hewl bidin ku behsa çawaniya bandora Nalî û sîdwergirtina Nalî ya li ser hinek helbestvanên serdem û piştî wî bikin. Gotin, peyv, hest û sozên Nalî bi awayekê bandor li helbestvanan kiriye û ber bi cîhana xwe ve biriye. Ciwankirina tekstên helbestan, dergehê li pêşiya helbest û ziman vekiriye. Em nikarin bi tezeke wisa kurt bi başî maf bidinê. Lewra pêwîste em bandora Nalî ya li ser helbestvanan bikin dû beş:

#### **2.4.1 Bandora Nalî li ser herdu heval û hevserdemên xwe yên**

- Salim:

Nalî bandorek mezin li Salim kiriye. "Salim di navbera salên 1800-1866'an de jiyaye." (Elaedîn, 1952, s. 228) Di berhemên vî de jî bi eşkere derdikeve holê ku "Salim şanazî (serbilind) bi Nalî kiriye û gelek jê heskiriye. Weke 'Hezret' navê wî aniye. Bersiva name helbesta Nalî ya bi navê 'Şarezûr' daye. Encama vê jî ew bû, helbestên Nalî bandorekî zêde li helbestên Salim bike. Ev bandor jî di warê giranî, qafîye, peyv, rewanbêjû hwd.. Ji bo belge du xezelên Nalî bandore li Salim kirine." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 163) Ya yekemîn, Nalî wiha dibêje:

*Derûnim pir kebab û derde bê to*

*Dillim germ û henasem serde bê to* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 379)

Wate: Ji ber agirê girêya bêyî te, dil û derûniya min di hundirê xwe de weke kebabê şewitiye. Dilê min germe û agir pê ketiye, bêhna min bêyî te sar e. Bêhna min hê zêdetir agir coş û xirûş (heyecan) kiriye.

Dûyemîn: Dîsa Nalî di xezelek din de bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Nemirdim min eger emcare bê to*

*Neçim şerte heta ew xware bê to* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 381)

Wate: Belê ez vê carê bêyî te nemirim, lê min ewqas êşa bêyî te kişand. Tobe bi wê yekê li min kir ku bêyî te biçim ti cihekê, şert bêyî te carek din heta vê jêrê jî neçim.

Van herdu xezelên Nalî bandorek mezin li Salim kiriye. "Tenê di warê rû de mora Nalî li ser nîne, belkî di warê naverokê de jî wêne di nav de heye. Di yên ligel Nalî xwediyê heman dîtîne yan jî berdewam wan in." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 163) Wate bi awayekê wisa bandor li Salim kiriye, helbestên wan hem di warê rûxsar û hem jî di warê naverokê de gelek nêzî hev bûn. Bi heman awayî Salim jî bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Le Sînem da seday nallîne bê to*

*Dillî zarim besê xemgîne bê to* (Dîwanî Salim, 2015b, s. 727)

Wate: Dema ez bêyî te me, di sînemê de dengê nalîne bilind dibe. Dilê min ê ne aram, bêyî te gelek bi xem e.

Salim li cihekî din texlîdê xezelek din ê Nalî dike û Nalî di despêkê de dibêje:

*Tebeî şekker barî min Kurdî eger însa deka*

*Îmtihanî xoye meqsudî le eemda wa deka* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 106)

Wate: Zewqa min a şîrîn ber bi aliyê wê ve diçe ku bi Kurdî helbestê bêje, ne ji ber ku Kurdiya wê hêsane, deshilata wê li ser Erebi û Farişi de nîne; belkî ji bo wê yekê ye ku dixwaze biceribîne. Ji bo bizane dikare tiştêk nû weke helbestê li ser Erebi û bi zimanê Kurdî bike yan na?

Herwiha Salim bi rêya rengdayîna vê xezela Nalî, helbestekê dinivîse, bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Katîbî fikrim le dillda dîqetî însa deka*

*Cust û ço bo setirbendî kaxezî mîrza deka* (Dîwanî Salim, 20015a, s. 96)

Wate: Fikra pênûsê di destê min de ji dil dixwaze biwêjek hûr, xort û teji wate dane, li pey peyv û hevokên bihêz digire, ji bo hevok bi hevok rêz bike û ji Mîrza re bişîne.

- Kurdî

Bandoreke berçav a Nalî li ser helbestvan Kurdî tê dîtin. Kurdî di navbera salên "1812-1850'an de jiyaye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 215) Bandora Nalî ya li ser Kurdî di helbestên wî de diyar dibe, lê ev bandor ji bandora li ser Salim heyî cûdatir e. Ji ber ku Salim navê Nalî dibe û bi çavekî mezin temaşe dike. Di heman demê de "Tevî ku Kurdî navê Naliyê naniye, lê naskiriye û helbestên wî xwendiyê. Ji bilî vê yekê kar li ser helbestvaniya Nalî kiriye û di hinek helbestên Kurdî de hunera xebitîna Nalî li ser diyar e." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 245) Herwekî me berê jî bal kişandî ser, dû xezelên Nalî hene û bi vî awayî destpê dike. Di xezela yekemîn de wiha dibêje:

*Derûnim pir kebab û derde bê to*

*Dillim germ û henasem serde bê to* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 379)

Wate: Dil û hinavê min ji ber agirê girêya bêyî te, weke kebabê şewitiye. Dilê min germe û agir pê ketiye. Bêhna min bêyî te sar e, bêhna min vî agirî hê zêdetir coş û xurûş dike. Di xezela dûyemîn de jî wiha dibêje:

*Nemirdim min eger emcare bê to*

*Neçim şarte heta ew xware bê to* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 380)

Wate: Ez vê carê bêyî te nemirim. Lê ewqas min derdê bêyî te kişand, ji wê demê ve min tobe kirk u bêyî te neçim ti cihekê. Şert be carekî din bêyî te, heta wê jêra he jî neçim.

Kurdî helbestek li ser giranî û qafiyeyên Nalî daniye, bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Derûnim zamdar û dill xemgîne bê to*

*Serim gêje û leşim bê tîne bê to* (Dîwanî Kurdî, 2010a, s. 456)

Wate: Derûnê min ji hundir de birîndar e û dilê min bêyî te tenge û bi xem e. Serê min gêje, agehdariya min nîne û hemû giyanê min bêyî te bêhêz bûye.

Kurdî ewqas nêzî helbestên Nalî bûye, "Eger ew helbestên Nalî ne di dîwana wî de bin û nasnavê xwe di nav de nenivîsandibe, mirov dikare weke yên Nalî binav bike. Ev diyarde tenê peywendî bi helbestên sivik û wateyên Nalî ve heye. Helbestvanên bi vî awayî di dîwana Nalî de kêr in. Weke eşkereye, helbestên Nalî hemû jî giran û girtî ne." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010c, s. 247)

#### **2.4.2 Bandara Nalî li Ser Berhemê Helbestvanên din ên li navçeyên din ên Kurdistanê yê**

Piştî Salim û Kurdî, desteyek din a helbestvanan di qonaxek din de ketine bin bandora Nalî de û zimanê wêjeyî yê Nalî bikaranîne. Ji wan jî:

- Mehwî

Di navbera salên "1830-1904'an de jiyaye." (Elaedîn, 1952, s. 328) Bandora Nalî li ser wî diyar e û Mehwî di helbestekê de "Ne tenê di giranî û qafiyeyan de texlîdê Nalî kiriye, belkî di wate, wêne û hevokê de jî li derdora dahênanên (îcat) Nalî dizivire." (Marûf X. , 2010ç, s. 216) Nalî wiha dibêje:

*Ella ey nefsi bum asa, heta key hirsî wêrane!*

*Legell em eeqbazane biro bazane azane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 482)

Wate: Ey nefse ji avakirinê hez nekirî, weke kundê wêran rûniştî Ev cîhan li gor wê cîhana din, weke cihek wêran e. Ma tu wê kengê dest ji vî cihê wêran berdi! Bi jîrî rabe, weke baz fikire. Ligel evîndarên rêya rast berê xwe bide avakirin û evîndara ji bo Xwedê.

Herwiha Mehwî jî bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Xuda le zikir û fikrim qet neka xafill zuban û dill*

*Heta xunçe dill û sewsen zubanî bax û bustane* (Dîwanî Mehwî, 1985, s. 427)

Wate: Xwedayo heta di baxçeyê jiyane de ez bikarim, dilê min weke gulek nû pişkiviya ye, zimanê wê weke gule sewsene, tere, bi ti awayî ziman û dilê min ji behskirina Pêximber û fikirîna wê bê agehdarî nabe.

- Herîq

Yek ji xwendekarên din ên jîr yên Naliye. "1851-1907" (Dîwanî Herîq, 1369, s. 1) ku bandorek zêde li ser hiştiye. "Dema mirov berê xwe dide dîwana wî û helbestên wî ligel yên Nalî bînin beramberî hev, bandora Nalî û awayê helbestên Nalî di helbestên wî de diyar e. Heta astekê ku em bêjin Herîq yek ji xwendekarên jîr ên Naliye, em ne şaş in. Ji ber ku zimanê wî yê wêjeyî, hûrîtî, kûrahiya wate û bikaranîna mijarên rewanbêjîyê de li ser şopa Nalî çûye." (Hemenurî, 2008, s. 52) Ewqas ketiye di bin bandora Nalî de, Marûf Xeznedar di derbarê wî de wiha dibêje: "Gelek helbestên Herîq ketine di bin bandora helbestên Nalî de. Ew helbestên ku bêhna Nalî jê tînin, dema mirov guh dide hewa, qafiyê û awazên wê tê bihîstin. Mirov naveroka wan baş fêhm dike. Ji ber ku berî wî helbestên Nalî di nava mejî û dilê xwendekaran de hebûn. Ev jî bandora beşeke din a helbestên Herîq weke berdewamiya helbestên Naliye û xwe li ser dibistana Nalî nîşan didin." (Marûf X., 2010ç, s. 463-464) Mînak: "Dema mirov temaşeyî vê bandora Nalî ya li ser Herîq bikin, bizanîn çawa Herîq ketiye li ser şopa Nalî." (Dîwanî Herîq, 1369, s. 8) Nalî bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Çaw le biro yeenî le jêr taqî nezaret*

*Bê perde eeyan dête kelam be îşaret* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 145)

Wate: Çaw bi eşkere, bêyî zirivîn û hewara xwe bigihîneyê, di bin sîbera wezîr de ku birhên te, bi îşaretan daxive. Herîq bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Em xusrewî xubane kewa dête nezaret*

*Şîrîne eger dill birifênê be îşaret* (Dîwanî Herîq, 1369, s. 9)

Wate: Ev yara ciwan a weke paşayekê derdikeve, ewqas şîrîne dilê mirov direvîne.

Eger mirov temaşeyî herdu qesîdeyên 'Keç' a Nalî û 'Kur' a Herîq bidin, "Mirov dibîne ku Herîq çawa li ser şopa Nalî meşiyaye. Heta di giranî û qafiyeyan de jî weke Nalî tevgeriyaye. Cihê wê yekê girtiye ku Nalî li cihê nazik û ciwanîyê, behsa evîndariya mecazî dike." (Necmedîn, 1369, s. 10) Nalî Bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Eîşq ke mecazî bê xwahîş meke îlla kiç*

*Şîrîn kiç û Leyla kiç, Selma kiç û Erza kiç* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 157)

Wate: Dema te ji bo evîndariyê rêya evînê ya mecazî şopand, her keça tû bixwazî; ji ber ku her taybetmendiyek ciwan di evînê de hemû di keçê de kom bûye. Şîrîn, Leyla, Selma û Erza, hemû jî keçan in.

Herîq jî behsa evîndariya rast dike, bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Eîşqit ke heqîqî bê talîb mebe îlla kûr*

*Hem hezretî lewla kûr hem Yûsif wella kûr* (Dîwanî Herîq, 1369, s. 10)

Wate: Di vê hevokê de Herîq di wê baweriyê de ye ku divê dildarî (evîndarî) ji bo kûr be. Ji ber ku Mihemed Pêximber û Yûsif Pêximber kûr bûn, rastî û maf di Pêximberan de ye, ew jî hemû kûr bûn.

Raste gelek bandora Nalî li ser Herîq hebû, lê di vê hevokê de wê yekê radigihîne ku evîndariya ligel wî pêwîste rast be û berevajî dîtina Naliye. Li gor Nalî evîndarî mecaziye. Nalî behsa keçê dike û Herîq behsa kûr dike.

- Edeb

"1859-1916" (Marûf X. , 2010ç, s. 383) Ev jî weke helbestvanên din bandora Nalî li ser heye. "Gûman di wê yekê de nîne ku Edeb helbestên Nalî xwendiyê û tam jê wergirtiye, piştê jî îlham dayeyê. Bi vî awayî Edeb hewldaye ku texlîdê Nalî bike." (Marûf X. , 2010ç, s. 514) Herwekî me despêkê behsa wê yekê kir ku Nalî helbestek heye û bi vê hevokê destpê dike; "Eîşq ke mecazî bê xwahş meke îlla kiç." Di vê helbestê de hest bi evîndariya mecazî tê kirin. Lê piştî Nalî, Herîq di helbestekê de di bin bandora Nalî bi xwe rû bi rû dide. Rolê keçê di dildariyê de nameîne, kur ji bo evîndariya rast aniye. Li gor wî kur hêjayê evîna raste. Ji ber ku Pêximber kur bûn. Di dawiyê de wêje di bin bandora Nalî, "Weke navbeynkarek di navbera Nalî û Herîq de, helbestek vehunandiye. Herçendî qafiya wê ya dawî 'Keç' e, lê aliyê herduyan digire û ti ji wan red nake." (Marûf X. , 2010ç, s. 522) Edeb bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Ew kes eîşqî bê ferqî nîye kur û kiç*

*Herçende ke meelume ferqî çîye kur û kiç* (Dîwanî Edeb, 1966, s. 29)

Wate: Kesê evîndar be, ferq nake ger eşqa keç an jî kur be. Tevî ku eşkereye cûdahî di navbera kur û keçê de heye, lê kesek evîndar be, ferq nake keç an jî kur be.



- Exter

"1839-1888" (Marûf X. , 2010ç, s. 57) Exter jî yek ji wan helbestvanayaneyê ku di bin bandora Nalî de maye. "Bi giştî hest bi şêwaza Nalî ya di berhemên helbestên Exter de tê kirin." (Marûf X. , 2010ç, s. 64) Exter pir hewldaye ku di helbestê de, "Di qafiyê û redîfan de texlîdê Nalî bike. Ji bilî vê yekê jî hewl daye ku tiştê Nalî ne gotibe, ew di nava vî qalibê de bêje. Herwiha wêneyê Nalî jî di vê helbestê de derdikeve ber çavan, lê Exter bi awayekî din têne ziman." (Marûf X. , 2010ç, s. 64) Mînak, Nalî bi vî awayî destpê dika û dibêje:

*Nemirdim min eger emcare bê to*

*Neçim şerte heta ew xware bê to* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 380)

Wate: Ez vê carê bêyî te nemirim. Lê ewqas min derdê bêyî te kişand, ji wê demê ve min tobe kirk u bêyî te neçim ti cihekê. Şert be carekî din bêyî te, heta wê jêra he jî neçim.

Exter jî weke Nalî fikiriye, di helbestekê de bi vî awayî destpê dika û dibêj:

*Serim gêj û dillim biryane bê to*

*Le dûrît pîşekem giryane bê to* (Marûf X. , 2010ç, s. 396)

Wate: Serê min gêj, bêhêz û bê taqete, dilê min bêyî te şewitiye. Li dûriya te kar û pîşeya min her giriye.

- Wefayî

"1844-1902" (Marûf X. , 2010ç, s. 369) Yek ji wan helbestvanayaneyê ku Nalî bandorek mezin li ser hiştiye. Di berhemên helbestên Wefayî de ew bandor bi eşkere tê dîtin. Ji ber ku bi helbestên "Nalî hogir bû, gelek caran wateyên wê aniye û bi xwe bergek (cil) nû liber kiriye." (Mihemed E. Q., 1978, s. 35) Ji ber di helbestên Nalî de hinek caran peyv girtîne, ne zelal in û şêlûbûn di nav de diyar e, "Awayekî giran e, wateyên girtî yê Wefayî bi awayek hêsan dariştina wan çêdika û cihê peyvên Nalî digûherîne." (Marûf X. , 2010ç, s. 389) Bi awayek hêsantir diyar dika. Mînak Nalî dibêje:

*Dill muşebbek bû le ber êşanî nîşanî mujet*

*Heyfe qurban! Axir em nîşaneyî şanî heyê* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 576)

Wate: Ezîza min, ez dibêjim ji ber êşên nîşan mîjelangên te bû, weke pencereyê ewqas kûn tê de hebûn. Mixabin tû wisa lê dikî, ez dibêjim ne ewqas bê giringiye, gelek mezin û birûmet e. Ji ber ku tû di nav de yî, ewqas êşan nede.

Herwiha Wefayî hatiye û di bin sîbera vê helbesta Nalî de, helbest din nivîsandiye, bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Dillî pir êşî min boye weha xunabî giryane*

*Hemû sînem weku nîşane cêgay nîşî mujgane* (Dîwanî Wefayî, 1978, s. 143)

Wate: Dilê min ê pir êş û azar bi vî awayî bi girî ve mijûle. Li cihê rondikan xwîn ji çavên min tên. Hemû rûyê min kûn-kûn bûye û bûye cihê nîşana mîjelangên min.

Bi xwendina vê helbesta Wefayî, bêhna Nalî têne nava hişê xwendekaran. Ev helbest di warê wateyê de hêsane, hinek wateyên şêlû yên Nalî eşkere dike û zelal dike. Wateya wê ligel ya Nalî wekhev in, ya Nalî tarî û mije, ya Wefayî jî hêsan û zelal e. Dîsa Nalî dibêje:

*Toke xorît, were nêw cenetî dîdem çî dekey*

*Lem dilley pir şerawe û sîneyî sozanim da* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 91)

Wate: Tû hûriyî ey yar, pêwîste cihê te bihşet be. Ango tû di nava dojeha dilê te jî Were di nava biheşta çavên min de, ew jî ji ber rondikan hemû bûye bax, gul û gûlistan. Wefayî di bin sîbera ev helbesta Nalî de wiha dibêje:

*Çît le dill dawê eezîzim were nêw dîdey min*

*Dill hemû awire çaw menzerî dû deryaye* (Dîwanî Wefayî, 1978, s. 162)

Wate: Evîndar û heskiriya min, tû di dil de çî dikî. Dilê min hemû agirê evîna te ye, were di nava çavên min de. Ew jî ji ber rondikên min bûye dû derya û dîmenek ciwan çêkiriye.

- Seyd Yaqûb

"1088-1906" (Hemenurî, 2008, s. 57) Yek ji helbestvanên din e ku bandora Nalî û awayê dibistana Nalî bandorek zêde li wî kiriye. Tevî ku ev helbestvan, "Yek ji

helbestvanên awayê Kelhûrî, zaraveyê Lûrî, bi awayê xwe û herî zêde bi Hewramî helbest nivîsandiye. Bandora ziman û wêjeya Nalî û van dibistanên nû di hinek helbestên wî de diyar dibe. Ew jî çî di warê bikaranîna awayê zimanê wî û li jî di warê awa û forma helbestên wî de gelek ji Nalî bibandor bûye." (Hemenurî, 2008, s. 57) Mînak Nalî despêka helbesta xwe bi vî awayî destpê dike û dibêje:

*Gullbinî qeddit le qubbey sîne xunçey kirduwe*

*Xunce bem şîrînîye qet ney şeker neykirduwe* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 544)

Wate: Bejna wê weke gulebaxê ye, li ser serê memikên te, vebûye ku serê memikên te ewqas bi tam, xweş û şîrîn kiriye; ligel vê yekê jî hê xave ku şekir jî nagihe şîrîniya te. Seyd Yaqûb di bin bandora Nalî de destpê dike û dibêje:

*Herkesê lew libîde tamî cureey mey kirduwe*

*Xizir Aşa xoy le mirdin ta ebed hey kirduwe* (Marûf X. , 2010ç, s. 96)

Wate: Her kesê tama avê weke meyê ji lêvên şîrîn ên yarê kiribe, weke Xidir zindiye, namire û wê bijî.

Eger bi vî awayî be li vir ji me re derdikeve holê ku bandora Nalî li ser piraniya helbestvanan hebê. Ne tenê helbestvanên Kurmanciya Xware, heta bandor li ser helbestvanên zaraveyên din jî hebû. Mînak; Seyd Yaqûb bi xwe helbestvanê navçeyekî din a Kurdistanê ye, helbestvanên bi zaraveyek din jî hebûn. Lê bandora Nalî û dibistana Nalî li ser wî hebû. Bi zaraveyê Nalî û sûdwegirtina ji Nalî, helbest nivîsandiye.

#### **2.4.3 Bi Dîtina Helbestvan Nalî**

Nalî damezirînêrê dibistana nû ya helbesta klasî ya Kurdî ya di Kurmanciya Jêr de ye. Di wêje û ferhenga Kurdî de cihek wisa heye ku ji bo Kurdan cihê serbilindiyê ye. Ji ber ku peyama Nalî ya di helbestê de peyamek nemire. Ev jî behs û daxwazeke ligel her ferdekî Kurd, ligel helbestvanan çend bi awayek mezin navê wî hatiye bikaranîn. Dîtinên wan ên beramberî Nalî û helbestên wî, çend ji bo dewlimendkirina wêjeya Kurdî û pêgehandina çend xwendekarên li ser rêya Nalî bi bandor in. Ji ber ku di wêjeya her gelekê de helbestvanek an jî çend helbestvan dibin lûtke (gimik-zîrve) û nemir. Di wêjeya Kurdî de jî Nalî lûtkeya herî diyare, ji ber vê yekê helbestvanê welatparêz Hêmin wiha gotiye; "Cihê Nalî ligel me Kurdan weke ya Hafiz Şîraz a ji bo wêjeya Farisiye. Tişteke başe ku di her maleke Kurdan dîwaneke Nalî hebe." (Hesen , 2009, s. 368) Ji ber

vê yekê Nalî ligel helbestvanan weke helbestvanek rêber bû û ji ber vê yekê tê dîtîn ku helbestvanên me di helbestên xwe de navê Nalî bikaranîne. Em bî ser hinek helbestvanên ku behsa mezinahiya Nalî dikin.

- Salim

Helbestvanê serdama Nalî, Salim bi xwe gelek di bin bandora Nalî de maye. Herweke me behskirî, weke 'Hezret' bi nav kiriye û "Yekemîn helbestvane ku navê Nalî di helbestên xwe de bikaraniye. Herçendî ti serdavek wiha di destê me de nîne, lê dibe ku Salim gelek nêzî Nalî be, pênaçe ne dost û xizmên hev bin." (Eedûlla, 2012, s. 100) Bi vî awayî behsa Nalî dike:

*Ke Nalî tewsenî tebeî be terzî germ cesten bû*

*Be çawganî xîre digoy danşî derkird le meydana* (Dîwanî Salîm, 20015a, s. 132)

Wate: Eger ev yek tenê li Nalî bê ku xwediyê wê mezinahiya xwezaiye. Piştî bi wê zanîn û marûfeta xwe nîşan daye ku tekane siwarî û jîrîtiya siwariyê ji bo wî baş e. Bi taybet jî guhê hûnerê li meydana bifirîne û ti kes jî nekarî kêmekê jî bişkîne.

Li vir gelek bi fikir û dîtinek hûr behsa mezinahiya Nalî dike, weke siwarekê baş ê di meydana hûner û wêjeya hespê xwe de bi nav dike.

- Hacî Qadirê Koyî

"1816-1897" (Marûf X. , 2010ç, s. 131) Yek ji wan helbestvananeye gelek navê Nalî aniye. "Gelek nêzî rih û jiyana Nalî bûye û weke delîlê di nava hevokên wî de reng daye." (Eedûlla, 2012, s. 99) Bi çavekî mezin navê Nalî aniye û weke mamostayekê bi nav kiriye. "Gelek bi başî û ji nêz ve agehdariya wî ji Nalî û helbestên wî hebû. Bi başî dîwana wî xwendiyê û nasandinek rihê ligel wî girêdaye. Lewra bi wî awayî kariye pile û asta Nalî bi rast û dirûstî destnîşan bike." (Eedûlla, 2012, s. 83) Ji ber vê yekê di van hevokan de bi başî pesnê Nalî dike û wiha dibêje:

*Nalî ostadekî gelê ça bû*

*Xizrî abî heyatî meena bû* (Dîwanî Hacî Qadirî Koyî, 1390, s. 217)

Wate: Nalî mamostayek gelek baş bû, Xidirê ava jiyana zindî bû.

Hacî Qadir sifatek ciwan li Nalî kiriye û weke 'Mamosta' bi nav kiriye. Ji ber ku "Zaniye peyva helbestvan, mezin, zana yan jî her peyvek din nikare li beramberî navê Nalî raweste. Lewra vegeyriyaye peyvek ku mafê Nalî bideyê, wî jî ew yek ji peyva 'Ostad' ditiye." (Eedûlla, 2012, s. 84) Derbirînê li mezinahiya wî dike. "Armanca ji Xizir jî hem navê Naliyê helbestvanê mezin ê Kurd û hem jî Hz. Xizirê navdar 'Xidirê Zindî' ye. Ji ber ku ava jiyanê vexwariye û her bi zindî maye." (Serdar, 1390, s. 217)

- Narî

"1874-1944" (Eusman, 2010, s. 13) Yek ji wan helbestvanên din e ku gelek bi mezinî behsa Nalî dike. Ligel wî ti helbestvanek bi qasî Nalî di warê serwet û xezîneya helbestên xweş de dewlimend nîne. Heta helbestên xwe li gor helbestên Nalî girîng nabîne, weke feqîr û nexwediyê tiştêkê bi nav dike. Di asta dewlimendiya helbestên Nalî de, wiha behsa Nalî dike:

*Le genc û dewlletî nezim û xezelda*

*Weku Nalî xenî Narî geda bû* (Dîwanî Nerî, 2010, s. 182)

Wate: Min di warê serwet, ciwanî û xezîneya helbestan de ti kesek din weke Nalî dewlimend û xwedî deshilatdar nedîtiye. Ti kes nîne mil bi milê wî be. Li beramberî Nalî dikare hemû tiştêkê bike, ti kes ji wî destvaleti nebû. Vaye li cîhanê weke kesek ji xwe re bigire ku nekare ti tiştêkê bike.

- Esîrî

"1895-1962" (Kurdistan , 2006, s. 18) Helbestvanek din ê gelek bi mezinahî behsa Nalî kiriye. Di nava hemû helbestvanên Kurd de navê Nalî aniye û weke "Helbestvanê Elmanî Gote bi nav kiriye." (Eebdûlla X. M., 2008, s. 69) Gote helbestvanek mezin û navdar ê Elmaniye û çawa ji bo welatê xwe cihê serbilindiyê ye, Nalî jî ji bo gelê Kurd cihê serbilindiyê ye. Ji bo welat û neteweya Kurd di astekî bilind de ye. Wekî esîrî behsa helbestvanên Kurd dike û wiha dibêje:

*Şaeîran bijmêrim hemû nabin kote*

*Nalî hawşane legel şaeîrî Elman gote* (Dîwanî Esîrî, 2006, s. 215)

Wate: Eger ez behsa helbestvanên Kurd bikim, ewqas zêdene nikarim navê wan bêjim û bigihînim dawiyê. Ev yek tenê bese, Nalî hevşane ligel helbestvanê Elmanî Gothe.

- Zîwer

"1875-1948" (Mehmud, 2003, s. 10) Yek ji wan helbestvanên dine ku bi çavekî bilind û mezin temaşeyî Nalî kiriye, weke helbestvanek navdar bi nav kiriye. "Derdikeve ku Zîwere gelek girêdayî hewa, xeyal û tama Nalî bû." (Marûf X. , Mêjû Edebî Kurdî, 2010d, s. 249) Ligel wî helbestên Nalî weke şekir şîrînin, dikare hemû talî û nexweşiyên jiyên rake. Di van hevokên helbestê de wiha dibêje:

*Şaeîrî meşhur ke Nalî nawe*

*Em şeire ciwaney boman danawe* (Eedûlla, 2012, s. 111)

Wate: Helbestvanek navdar heye û navê wî Naliye. Ji bo me helbestên ciwan û binirx nivîsandine.

Herwiha di hin hevokên din ên helbestekê de bersiva helbestvan Şêx Nûrî Şêx Salih dide, daxwaz jê dike û wiha dibêje:

*Bixwênerewe guftay wek şekkerî Nalî*

*La ba le mezaqa ke bibê tirşî û talî* (Dîwanî Zîwer, 2003, s. 71)

Wate: Gotinên Nalî yên helbestan weke şekir şîrînin, tama hemû talî (tehlî), tirşî û nexweşiyên radike.

- Xadîm

"1895-1971" (Marûf X. , Mêjû Edebî Kurdî, 2010e, s. 331) Tevî ku Xadîm ne di serdema Nalî de jiyan kiriye, lê bi fikir û raman ligel Nalî û helbestên wî jiyaye. Di xem û xerîbiya jiyana Nalî, şev heta sibehê ji ber Nalî dinalêne. Di helbestekê de wiha dibêje:

*Denalênê dillim her şew le bo Nalî û qisey xoşî*

*Ewîş lem rêgeye we royî libasî xurbetî poşî* (Dîwanî Xadîm, 1980a, s. 150)

Wate: Ji dema ku Nalî jiyana xerîbî, dûrî, dûriya welat û derbideriyê hilbijartî ve ti şev nîne ji bo wî xem û êşan nekêşim û ne nalînim.

- Kanî

"1897-1957" (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010e, s. 433) Ev helbestvan helbestên Nalî weke nemir binav dike. Ligel wî tevî ku Nalî koça dawî kiriye, lê berhemên nemir ên Nalî nîşan didin û "Vê yekê têne fikra xelkê ku helbestvanên weke Nalî û Salim her çendî ji nav me barkirine, lê nav û kiryarên wan helbestvanan mane û namirin." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010e, s. 437) Kanî wiha dibêje:

*Hunermendanî zorman mird bellam namrê qise û nawyan*

*Qisey Nalî qisey Salim heta denyaye her maye* (Dîwanî Kanî, 1980, s. 29)

Wate: Kurdan gelek kesên zana, helbestvan û navdar winda kiriye û koça dawî kirine, lê kesên berhemên baş li pişt xwe hiştine heta dawiya cîhanê wê navê wan jî bimînin. Gotin û helbestên Nalî û Salim jî her mane û wê her bimînin.

### **3 AYÎNA ÎSLAMÊ Û CIHÊN PÎROZ DI HELBESTÊN NALÎ DE**

Ola Îslamê yek ji çavkaniyên ku Nalî di helbestên xwe de pišta xwe pê girêdayî, ango ola Îslamî, mijar û aliyên cihek zêde taybet di helbestên Nalî de cihê xwe girtine. Diyare Nalî bi xwe zêdetir giringî daye van aliyane. "Ji ber ku Nalî ji xêzanek Misilman ji dayîk bûye, girêdayî navçe û eşîretekê bû, sedî sed yasa û rêbazên Îslamê bi rê ve biriye. Piştî xwendin li hucreyên mizgeftan qedandiye û bûye rewşenbîrek baş ê Rojhilata Îslamiyê bû. Lewra gelek alî û mijarên ayînî yên weke bîr, bawerî, felsefeya Îslamê, rawestgeh, dîroka bûyer, xalên giring, kes, pend, îbret û hêma xistiye di nava helbestên xwe de. Ev jî di çîrokên pêximberên di nava Qur-ana Pîroz an jî weke amojgarî û pêşandana ayetên Qur-anê hatine wergirtin." (Ebdûlla X. M., 2007, s. 29-

30) Van tişane hemûyan bandor li ser Nalî kirine û ev jî di nava helbestên Nalî de derdikevin. Bi wateyekî din tekstên ola Îslamê çavkaniyek giring bû, rasterast bandor li ser kiriye. Sûd jê wergirtiye. Ji ber ku "Erkê tekstên ayînî, amojgarîkirin (şîret), dariştana bernameyan a ji bo rê nîşandayîna mirovan a ber bi rêya xêr û li ser rêya xirab rakirin e." (Tofîq, Karî Gerî Islam le Ser Kelturî Kurdî, 2015, s. 131)

Lewra Nalî bi sûdwegirtina ji wan, hewl daye ku bi rêya helbestên xwe rasterast balê bikişîne ser corên hemahengiya di navbera helbestên wan amojgarî û sûdên wê ji gel re bêne ziman. Bi helbest van amojgariyan weke helbestvanên klasîk ên Rojhilat ragihîne. Eşkereye ku Qur-an û amojgariyên Îslamê, bandorek zêde li ser asta hizrê hemû gelên ola Îslamê pejirandine, hebû. Nalî bi vê rêyê hewl daye ku bandora zimanê helbestên xwe zêdetir bike erkê derbirîna ol û baweriya Misilmantiyê, bi vê yekê xwe derxîne holê. Ji bo derfetên zêdetir bide helbestvanên li pey xwe. Lewra emê li vir werin li ser mijara çavkaniyên ku ola Îslamê yên bandor li ser Nalî çêkirine. Ji wan jî ayetên Qur-ana Pîroz, gotinên Pêximber (S.A.S), bûyer, kesayetiyên oldaran û demên ola Îslamê ya pîroz.

### **3.1 Qur-an Weke Çavkaniya Helbestê Ligel Nalî**

Nalî her weke helbestvanên klasîkên Rojhilat, Qur-an û şîroveiyên cor be cor xwendiyê, weke çavkaniyekî serekî ji bo bidestxistina zanyariyên di derbarê çîrokên Pêximberan, cihên pîroz, amojgarî û kesayetiyên ayînî bikaraniye. Ev hemû jî di Qur-ana Pîroz de hene. Bandorek zêde li Nalî kiriye, xezîneya helbestên Nalî ewqas zêde bû, bi dawî nabin. Bingehê helbestên xwe pê avakiriye. Ayet û dîtinên wê bi awayek pir ciwan di helbestên wî de derdikevin holê. Ji ber ku Qur-an "Pirtûka ola Misilmanane, bi zimanê Erebi bi awayek parçe parçe, bi awayê ayet ji Xweda ji bo Pêximber (S.A.S) hatiye şandin. Cibraîlê Milyaket wehî ji Pêximber re anî. Qur-an, behsa eqîdeya ola Îslamê dike û jiyana exlaqê ya civakî birêxistin dike.

Ji bilî vê yekê ji bo îcatkirina wêjeyê çavkaniyek gelek girîng û bandorek mezin li rewşenbîr, çand, wêjeya Erebi û hemû neteweyên Misilman ên din kiriye. Ji bilî ku Qur-an di warê dariştina wêje û hunerî de gihiştîye zîrveyê, gelek wêneyên helbestê belav kiriye." (Marûf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010a, s. 173) Lewra Mihemed Kehlawî dibêje: "Têgihiştina Qur-an û nivîsîna helbestê, du tiştên herî giring ên teoriyê bûn û şoreşa fikra sofî di nav de serî hildaye." (Mihemed, 2015, s. 20) Ji ber ku çîrok û serpêhatiyên Qur-anê, behsa ferd û baweriyên berî Îslamê dikin û ji bo me vedigêrêne. Bi awayekî



berfireh di sûretên Qur-anê cihê xwe girtine. Ji ber vê tekstên "Qur-anê bersiva pirsyarên hebûn, encam û çarenivîsê dide. Bi awayek ciwan û hunerî bersiv dide. Ji ber vê yekê mirov dikare bi teksteke zimanî binav bike." (Edonîs, 2008, s. 8) Qur-ana Pîroz ji aliyê Xwedayê Mezin ve hatiye şandin. "Qur-an ji 114 sûretan pêk tê û di dema xwe de tenê çend kopiyên Qur-anê hebûn. Osmanê Kurê Effan hemû şewitandine, tenê yek hiştiye. Ji ber ku rênivîsa Erebi ya wê demê, xal û tevger nebûn. Gelek zaraveyên Erebi hebûn, 10 corên xwendinê ji wan re hatine kirin.

Tekstên Qur-anê parçe bi parçe, di nava 23 salan de ji asîman hatiye xwar. Li gor bûyer û pêdiviyên derfet, berî bê nivîsandin, di dema nivîsandinê de û herwiha berî vê nivîsînê jî, forma xwe ya dawî ji Meshefê Osmaniyê xelîfeyê Sêyemîn wergirt û di bîranînên xwe de parastiye." (Salar , 2013, s. 77) Li vir tiştê giring ewe ku Nalî ligel xwezaya vê tekstê hewl daye ku di helbestên xwe de ayet û peyvên Qur-ana Pîroz bixe di çarçoveya helbestên xwe de. Lewra emê li vir werin li ser wan hevokên ku Nalî sûd jê wergirtî. Di despêkirina helbestê de û di despêka dîwana xwe de, berê xwe dide Xweda û wiha dibêje:

*Ey cîlwe derî Hûsin û cillewkêşî temaşa!*

*Ser riştey dîn bê mededî to nîye, haşa* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 75)

Wate: Ey Xwedayê ku ciwanî û peyvên dide, bala xelkê dikêşe ku temaşeyî wê ciwaniyê bike tû her bi xwe ciwaniyê pêşkêş dikî, her bi xweyî dibî sedem ku ew ciwanî ciwantir bibe. Ciwaniya xwe di kiryarên seyr de derdixî, fikir û mejî didî mirovan. Bala wan dikêşî li ser mezinahiya xwe. Nekû her karûbarên cîhanê, belkî despêka ayîn an jî despêka dîtinê, bi ti awayî bêyî alîkariya te nabe. Herwiha ev hevoka helbestê balê dikişîne ser hedîsa jêr:

"كل امر ذى بال لم يبد أفيه بأسم الله فهو أبتى" (Slêman, 1984, s. 15)

Wate: Her karek giring ku bi navê Xweda destpê neyê kirin, wê bê encamp be.

Ji vê jî derdikeve ku Nalî bi xwe parçeya helbestê kiriye despêka dîwana xwe. He wekî me gotî, Nalî weke helbestvanek Misilman hawara xwe gihandiye bi dehan ayetên Qur-ana pîroz. Helbestên xwe pê dewlimend kiriye, huner jê wergirtiye û 'îqtîbasî' bikaraniye. Hûnera sûdwergirtin ji "Anîna hinek ji tekstên ji bo nava tekstên din, ji bo ciwanî, pîrozî û bêyî ku navê wê çavkaniyê bê nivîsandin. Tiştê ku pêwîste em

balê bikişînin ser, ev jêwergirtin bi zorê ji Qur-ana Pîroz û gotinên Pêximber tên wergirtin" pêktê. (Muhsîn, 2013, s. 301) Nalî dibêje:

*Herçî mehbûbem debînê wa teheyur deygirê*

*Swên dexwa be xwa dellê, "Bîlahî ma haza beşer" (Dîwanî Nalî, 1976, s. 203)*

Wate: Her çi kesê yara min Mehbûbe dibîne, ewqas ciwane matmayî dimîne. Sond dixwe û dibêje, son bi xwe Xweda ev ne mirove û firîşteye. Nalî di vê helbestê de balê dikişîne ser ayeta:

(Qu-an "فَلَمَّا رَأَيْنَهُ أَكْبَرْنَاهُ وَقَطَعْنَ أَيْدِيَهُنَّ وَأَقْبَنَ حَاشَ اللَّهُ مَا هَذَا بَشَرًا إِنْ هَذَا إِلَّا مَلَكٌ كَرِيمٌ"

Yusif:31)

Wate: "Piştê dema Yûsif hat û dîtî, bi tişteke bê hempa û dilrevîn bi nav kirin. Êdî matmayî man, mest û bûn heyranê wê. Her temaşê dikirin, agehdariya wan ji wan neman, destê xwe birîn û gotin, paqijî her ji bo Xwedaye. Bê guman ev ne mirove ku ewqas ciwane. Weke firîşteyek ciwan û rêzdar e." (Ehmed, 2012, s. 393)

Ev ayet behsa Hz. Yûsif û dêrên Zûleyxaya hevjiîna Ezîzê Misrê dike. Dema Hz. Yûsif dît, ji ber ciwaniyê destê xwe birîn û gotin, sond bi Xwedê ev ne mirove û ciwaniya wî weke ya firîşteye. Nalî sûd ji vê ayeta Qur-anê wergirtiye, ciwaniya evîndara xwe li ciwaniya mirov bilindtir nirxandiye û gihandiye ciwaniya firîşteyê. Nalî dibêje:

*Rojî qiyametî 'Feîza hûm qîyam'û şexis*

*Qaîm çeqîwe, kêle, le ser xakî mehfere (Dîwanî Nalî, 1976, s. 439)*

Wate: Roja qiyamet tê, pif dike Şeypûr. Ji ber Îsrafil hemû hebûnek dimirin. Piştê carek din pih fike, ew mirî hemû dîsa zindî dibin. Temaşê bikin hemû ditirsin, li piyan rawestiyane. Tû dibêjî kêle li ser xaka goristanê hatiye danîn, agehdariya wê ji ti tişteke nîne.

Nalî di vê beytê de behsa tirs û matmayîna roja qiyametê dike. Dû hunerên zimanê sade bikaraniye, yek ji wan bale dikişîne ser ayeta:

(Qur-an El-Zemir:68)"لَمْ نُفِخْ فِيهِ أُخْرَىٰ فَإِذَا هُمْ قِيَامٌ يَنْظُرُونَ"

Wate: "Piştire carek din dema pif kirî, wê demê ji nişkan ve hemû tiştên hatine çêkirin ji gorên xwe radibin û li benda fermana Xwedê ne." (Ehmed, 2012, s. 745)

Ya duyemîn jî hunera îşaretpê dayîn (Temlîe) ku bale ji 'Kes' û ew jî ji vê ayetê wergirtiye.

"وَلَا تَحْسَبَنَّ اللَّهَ غَافِلًا عَمَّا يَعْمَلُ الظَّالِمُونَ إِنَّمَا يُؤَخَّرُ لَهُمْ لِيَوْمٍ تَشْخَصُ فِيهِ الْأَبْصَارُ" (Qur-an

Ibrahîm:42)

Wate: "Xwedayê mezin kiryarên stemkaran efû nake û agehdariya wî li ser her tişteke heye. Ji bo demekê dem dideyê, piştire wan digre û tolê jê distîne. Her wê rojê paşve dixê û dihêle, ewqas girane hemû çav ji tirsan zîq dibin û êdî nikarin tevgerê bikin." (Ehmed, 2012, s. 426) Nalî dibêje:

*Sehra be teclilî dekene wadîyî eymen*

*Qamet şecer û mezherî elltafi îlahin* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 342)

Wate: Ciwanên ku dikevin der û deştê, xwe bi ciwanî dixemilênin. Bejna wan weke daran bilind in, Xwedê rehim li wan kiriye. Ew cih jî weke geliyê Eymen e ku nûra Xweda di nav de ji bo Hz. Mûsa derdikeve. Nalî di vê helbestê de ji bo ciwankirina helbesta xwe sûd ji Qur-ana Pîzor wergirtiye. Bal kişandiye ser ayeta:

"فَلَمَّا أَتَاهَا نُودِيَ مِنْ شَاطِئِ الْوَادِ الْأَيْمَنِ فِي الْبُقْعَةِ الْمُبَارَكَةِ مِنَ الشَّجَرَةِ أَنْ يَا مُوسَى إِنِّي أَنَا اللَّهُ رَبُّ الْعَالَمِينَ"

(Qur-an El-Qises:30)

Wate: "Dema Mûsa nêzî agir bû, temaşe dike ku ne agir e. Belkî 'Nûreke' û wê demê li aliyê rastê yê cihê pîroz ji darekê ve ji aliyê Xweda ve bang lê tê kirin. Ey Mûsa, bi rastî ez Xwedayê te me. "Allah" Xwedayê hemû cîhanan im." (Ehmed, 2012, s. 637) Nalî dibêje:

*Le qurbî 'Qab Qewsîn' î dû ebrot*

*Minî 'Ednî' çi dûr û derbeder mam* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 262)

Wate: Qasî ku ez nêzî te me, pîvana di navbera me de qasî pîvana dû kevanên biroyên te ye. Dûr û derbider ketim, destê min nagihe te.

Nalî di vê hevokên helbestê de giliyê yara xwe dike ku çend nêzî wî ye. Lê ji ber ku evîndara wê ti hesab jêre nake, xwe dût û derbider dizane ku çend nêzî wê ye jî. Hatiye sût ji ayeta jêr wergirtiye:

" ثُمَّ دَنَا فَتَدَلَّى (8) فَكَانَ قَابَ قَوْسَيْنِ أَوْ أَدْنَى (9) " (Qur-an El-Necim:8-9)

Wate: "Dema ku Cibraîl hat û xwe bi awayê mirov nîşanî Pêximber (S.A.S) da, piştî nêzî Pêximber (S.A.S) bû, ewqas nêzîk bû qasî dû kevanan an jî nêzîktir bû." (Ehmed, 2012, s. 834) Li vir eşkereye ku Nalî sût ji Qur-anê wergirtiye û ayetên ku tevî helbestên xwe kiriye, sût jê dîtiye û helbestên xwe pê xemilandiye. Nalî dibêje:

*Eşxasî xase 'Teşexesu Ebsaruhum' hemû*

*'Wa Nefsî' yane her yek bo xoy Mûheyere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 442)

Wate: Roja qiyametê ew roja zehmete ku heta mirovên taybet jî çavê wan zîq dibe. Her kes ji bo xwe dike hawar. Nizanin çi bikin. Nalî di vê helbestê de balê dikişîne ser ayeta jêr:

"إِنَّمَا يُؤَخِّرُهُمْ لِيَوْمٍ تَشْخَصُ فِيهِ الْأَبْصَارُ" (Qur-an Ibrahîm:42)

Wate: "Her wê rojê paşve dixê û dihêle, ewqas girane hemû çav ji tirsan zîq dibin û êdî nikarin tevgerê bikin." (Ehmed K. M., 2012, s. 426)

Nalî sût ji vê ayetê wergirtiye û helbesta xwe pê xemilandiye. Nalî dibêje:

*"Berqe El-Beser" le ber berq telewiî le alî*

*"Xesîfe El-Qemer" le îşraq qiyametî cemalî* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 657)

Wate: Ji ber şewq dayîn û birîsqîna didan a weke mirariyên yar, çavê temaşevanan zîq bû. Ji ber derketina roja ciwaniya ku weke derketina roja qiyametê ye. Di vê hevokê de Nalî balê dikişîne ser ayeta jêr:

"فَإِذَا بَرِقَ الْبَصْرُ (7) وَخَسَفَا الْقَمَرُ (8) وَجُمِعَ الشَّمْسُ وَالْقَمَرُ (9)" (Qur-an El-Qîyame:7-8-9)

Wate: Dema di roja qiyametê de çav zîq bû, di wê roja giran de dibiriqe. Ji ber tirsê wê rojê, jiyan radiweste, heyv jî tarîk dibe. Roj û heyv hatin komkirin. Ango helwerîna xwar û yasaya hebûnê têkçû. (Ehmed, 2012, s. 925)

Nalî di vê hevokên helbestê de wisa baldariyek ciwan û hûr bikartîne, weke derdikeve ku Nalî ‘Feîza’ rakiriye û herdu ayet li ser nîva hevoka yekem û duyemîn parve kiriye. Ji bo her ayetekê wateyê taybet jêre hilibijartiye. Herî dawî jî herdu rewş ji bo armanca serekî komkiriye, ew jî girêdayî ciwaniya evîndara wî ye. Rewşa yekemîn behsa roja qiyametê ya bi hemû tirs û lerizînekê, veguhestina wê rewşê ya tirs ji bo rewşa mîhrîbaniya jinê û perde rakirina li ser rûyê wê. Ango bi tenê biriqîna didanên wê yên mirarbûyî, weke brûskê Nalî dixê di cîhana tirs, lerizîn û çavzîqbûnê de. Herweke ji roja qiyametê reviya be. Rewşa duyemîn jî girtina heyvê ya ji ber revîna rûyê rojê ye. Nalî dibêje:

*Yek nîn rexit ‘Elestu mînkum bibeedî’*

*We in nîm dîgir ‘Inne ezabî lişedîd’*

*Birgird rexit nuşte ‘Yûhî we yumît’*

*‘Min mat mîn el-eîşiq, feqed mat şehîd’* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 716)

Wate: Nîva rûmeta te ya ku tû digirî, ligel wê yekê ku tû nêzî me yî, wisa diyare tu ji me dûrî. Dema tû rûyê xwe digirî, te nedihîşt em bibînîn. Bi nêz nayê dayîn û nîva tû derdixî jî, agir berdide dilê me û weke wê yekê ye ku tû bêjî cezayê min ê ji bo we ye. Cezayekî girane li ser rûyê te nivîsandiye, te dide jiyakkirin û te dimirêne. Eger tû maçekê bidî kesekê, tû wî zindî dikî. Eger tû pişta xwe jî didî kesekê, di dil de dikûjî. Her kesê ku bi derdê dildarî bimire, şehîd e. Nalî di van çarîneyan de bale dikişîne li ser vê ayetê:

"وَإِذْ تَأَذَّنَ رَبُّكُمْ لَئِن شَكَرْتُمْ لَأَزِيدَنَّكُمْ وَلَئِن كَفَرْتُمْ إِنَّ عَذَابِي لَشَدِيدٌ" (Qur-an Ibrahîm:7)

Wate: "Dema ku Xweda ji we re ragihand, eger hûn li beramberî nîmetan spasdar bin, wê demê ezê nîmetdayîna xwe pêşkêşî we bikim. Eger bêbawer û bêwefa nezan bin, wê demê bi rastî cezayê min giran û tunde." (Ehmed, 2012, s. 420) Herwiha balê dikişîne ser vê ayetê:

"إِنَّ اللَّهَ لَهُ مَلِكُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ يُحْيِي وَيُمِيتُ" (Qur-an El-Tewbe:116)

Wate: "Bi rastî deshilata temam a asîman û erd her ji bo Xwedaye, kê xwest dide jiyankirin û yê xwest jî jiyanê jê distîne." (Ehmed, 2012, s. 344)

Nalî di vê balkişandinê de wateyek gelek hûr û ciwan bikaraniye. Di ayetekê de dibêje, eger rastî bê veşartin, hûn rastî îşkenceyên giran bên. Nalî jî dibêjî, derxistina ciwaniyê nîva rûyê û ne hemûye. Eger bi ciwanî û rastî bibînî, tû wê zêdetir êşên wê bikişînî. Di hevoka sêyemîn de dibêje, li ser rûyê wê 'Yûhî we Yûmît-Jiyan û Mirin' hatiye nivîsandin. Ango mirin û jiyan tenê di destê Xweda de ye. Ev mirin û jiyan kiriye helwesta evîndara xwe. Eger bixwaze dimirêne û eger bixwaze jî dide jiyankirin. Nalî dibêje:

*Le Qur-an de be 'Ma exfî lehûm' Mektum û mextume*

*Beyan nabê be tefsîrî dused 'Keşaf' û 'Beyzawî' (Dîwanî Nalî, 1976, s. 688)*

Wate: Xwedayê ku kes nagihe diyariya wî, ger tû rastiyeke veşêrî û dergehê gihiştina rastiye mor kiriye û 200 tefsîrên Qur-anê ji corê 'Keşaf' û 'Beyzawî' nikar eşkere bikin. Ti ji van zilamên baş çî ji bo wan li vê cîhanê hatiye hilgirtin. Nalî di hevokê bal kişandiyê ser vê ayetê:

(Qur-an El-Sicde:17) "فَلَا تَعْلَمُ نَفْسٌ مَّا خَفِيَ لَهُمْ مِنْ قُرَّةِ أَعْيُنٍ جَزَاءَ مِمَّا كَانُوا يَعْمَلُونَ"

Wate: "Ti kesek nizane çî diyariyek baş jêre hatiye danîn. Ji ber sedemên xweşî, şadî û aramiya dil a di diyariya karên ku encamdayî û xwe pê westandî." (Ehmed, 2012, s. 671)

Nalî di vê çavkaniyê de behsa mezinahiya Xweda dike ku mirov bi hêsanê jê fêhm nake. Bi 200 tefsîrên keşaf û beyzawî yê tefsîrên Qur-anê ne. Diyare Naliyê helbestvan û zanayê mezin, agehiya wî ji kûrahiya ravekirina Qur-anê jî hebû. Mirov bi hêsanî ji ravekirinên wê fêhm nake. Li gorî mezinahiyên ku Xwedayê Mezin daniyî.

Naî ji bilî hûnerê îqtîbas ê ji bo sûdwegirtina ji Qur-ana Pîroz, hunerê îşaretdayînê (Telmîe) bikaraniye.

Hûnerê îşaretdayînê ewe ku "Dema huner di vehonandiyê de îşaretê bi destan, karesat, pendeke pêşiyar an jî ayeteke Qur-anê bike." (Eezîz, Rewanbêjî le Edebî Kurdîda, 1975, s. 103) Lewra huner hewl dide îşaretdayînê bikarbîne û ew jî bi awayekê bikarbîne ku "Ligel beşa tekstê hevbigire." (Muhsîn, 2013, s. 334) Di vehonandiyên Nalî de gelek îşaretdayîn hene. Ew jî yê di warê dîrokî, coxrafi, zanistên niho, kelam û mejî de. Ji ber vê jî karê me girêdayî Qur-anê ye. Lewra di vî warî de mînakekê dike. Nalî dibêje:

*Qurban mehale pêkewe bin sebir û îştîyaq*

*Xarîc le nesisî ayeye teklîfî 'Layetaq' (Dîwanî Nalî, 1976, s. 248)*

Wate: Riha min bi ti awayî nabe kesek soza te di dil de be, piştgiriya xwe ji bo te rawestîne, tişteke wisa ku bi tişteke ne di karîna wî de bê danîn. Ev hevoka helbestê hêmaye ji bo ayeta:

"لَا يُكَلِّفُ اللَّهُ نَفْسًا إِلَّا وُسْعَهَا" (Qur-an El-Beqere:286)

Wate: "Xwedayê Mezin ti erkekî giran naxe ser milê kesekê û eger ne di karîna wî de be." (Ehmed, 2012, s. 92) Nalî dibêje:

*Lem xakî 'derî rehmetî' bê zehmete Nalî*

*Fîrdewse mealî*

*Haşa ke lemêda bibme 'saîlî mehrum'*

*Her çende le eusatim (Dîwanî Nalî, 1976, s. 270)*

Wate: Li vê xaka ku dergehê rehmetê bi hêsanî û bêminet ketiye destê Pêximberan, Nalî di encamê de wê li biheştê bê girtin. Herçendî ku ez gunehbar jî bim, ez bi ti awayî jî vî cihê bêpar nabim. Nabim kesek ku ji bo xwe li bêhêvîbûnê bigere. Nalî di hevoka "Derî Rehmet" bal kişandiye ser vê ayetê:

"وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا رَحْمَةً لِّلْعَالَمِينَ" (Qur-an Enbîya:107)

Wate: "Lera me tû şandî, ji bo tû rehmet, mîhrîbanî û dilnermiyê ji bo hemû cîhanê bibî. Heta destê min ê temam ber bi hîdayet û rêya bexteweriyê bigire." (Ehmed, 2012, s. 542) Di 'Saîlî Mehrûm' de bal kişandiye ser ayeta:

"وَفِي أَمْوَالِهِمْ حَقٌّ لِّلسَّائِلِ وَالْمَحْرُومِ" (Qur-an El-Zaryat:19)

Wate: "Di wê xalê de jî timî di mal û serwetê wan de, beşek diyar û berbiçav ji bo wî kesî dixwaze. Herwiha beşa wî kesî jî didin ku bi xwe nîne û daxwazê ji xelkê nake." (Ehmed, 2012, s. 836) Nalî dibêje:

*Wefay 'ehde' le min roh û le to maç*

*Çîya çarey 'emanet' xeyrî teslîm (Dîwanî Nalî, 1976, s. 312)*

Wate: Guftûgoyek di navbera min û te de ye, ez canê xwe fedayî te dikim û tû jî maçekê bide min. Dema kesekê soz da, ew soz weke emanetekê û li ser wî dibe erk. Ji ber ku em herdu neçarîn, divê em sozên xwe bênin cih û emanetên hev bidin hev. Di vê hevokê de ji peyva 'Eehd' bal kişandiye ser ayeta jêr:

"إِنَّ الْعَهْدَ كَانَ مَسْئُولًا" (Qur-an Îsra:34)

Wate: "Peymana xwe ya ligel Xweda, ligel mirina min bi encamp bikin. Ji ber ku bi rastî xwediyê peymanê, di roja dawiyê de hesap jê tê pirsîn." (Ehmed, 2012, s. 466) Ji peyva 'Emanet' wergirtiye û bi ayeta:

"إِنَّ اللَّهَ يَأْمُرُكُمْ أَنْ تُؤَدُّوا الْأَمَانَاتِ إِلَىٰ أَهْلِهَا" (Qur-an El-Nîsa:58)

Wate: "Bê guman Xweda fermanê dide ku hemû emanetan bide destê xwediyê wan." (Ehmed, 2012, s. 161) Nalî dibêje:

*Layek 'Zebanîye' le ser û karî nare, nar*

*'Hel min mezîd' zûbanîye wek marî ejdere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 441)

Wate: Li aliyekê berî xizmetên dojhê, bi agirê serê dojhê ve mijûlin. Pêl bi pêl xweş dikin û agir jî weke marê ejdere. Zimanê xwe anî der û pirîskên agir belav dibin, dibêje; yên din jî hene û bênin. Nalî di hevokê de, di peyva 'Hel min mezîk' bale dikişîne ser ayeta:

"يَوْمَ نَقُولُ لِجَهَنَّمَ هَلْ امْتَلَأَتْ وَ تَقُولُ هَلْ مِنْ مَزِيدٍ" (Qur-an Qaf:30)

Wate: "Wê rojê bibîrbêne ku ji dojhê re dibêjin, gelo ma tejî bûye? Emê ji vê hemû xelkê, qefte bi qefte ji we re bînin? Ew jî dibêje, gelo ma zêdetir jî hene?" (Ehmed, 2012, s. 823) Nalî dibêje:

*Ney ke sahib sîrre, sertapa be emirî 'Kin' kune*

*Batîni 'Qîf qîf Eela Sirî' be zahîr qef qefe* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 451)

Wate: Bilor ji qamîşê hatiye çêkirin. Dîtineke wê heye û di dema lêdanê radigihîne. Hemû bi fermana Xweda kun-kun bûne, lê derbirîna xwe jî têknade. Dîmen parçe parçe ye. Ev bi wî aliyê hundir band dike û jêre dibêje, were bila agehdariya te ji niyeta min hebe. Nalî di hevoka helbestê de ji peyva 'Kun' bal kişandiye li ser du ayetên Qur-anê. Ya yekemîn:



"خَلَقَهُ مِنْ تُرَابٍ ثُمَّ قَالَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ" (Qur-an Al Ewman:59)

Wate: "Her mirovek qalibeke wê heye û piştî Xwedayê mezin jêre got bibe! Bi awayek lezgîn ew jî çêbû, ger bi vî awayî bû; rewşa Îsa ji ya Adem ne gelek matmayîtir (ecêbmayîn) e. Ji ber ku ger dayîka Îsa hebe, lê ji xwe ne bav û ne jî dayîka Adem hebû. Belkî ji heriyê hatiye çêkirin. Gelo ew minaqeşeya we çiyê?" (Ehmed, 2012, s. 104) Ayeta duyemîn jî eve:

"إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ" (Qur-an Yasîn:82)

Wate: "Bi rastî her çi dema xwest tiştêkê çêbibe, her wekî pêyî ku ferman bide, çêdibe! Ew jî di cih de çêdibe" (Ehmed K. M., 2012, s. 725)

Herdu ayet hêz û karînen Xweda nîşan dide, di fermana bikaranîn û cîbicîkirina ku wate beyte dewlimendtir kiriye. 'Kun' Erebiye, tê wateya 'Kune' ya Kurdiye û arman jê kunkûnbûna 'Neye' yê ye. Nalî dibêje:

*Sahêbî 'Eilim El- Kitab' û mûtribî hud hud nefes*

*Ya suleyman le 'Exwan El-Sefa' asef sefe* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 453)

Wate: Rahêner dev û dû, weke teyrê Silêmane ku Nalî bi xweye. Bi dîmen sadeye, bi xwe weke wî teyrê biçûk ku ti tiştêkê nizane, bi vî awayî jî bû xwediyê zanîn û pirtûkan. Silêman Paşa ligel dost û hevalên xwe birayek bê erk û teklîfe. Nalî di vê hevokê de peyva 'Eilim El- Kitab' ji ayeta jêr wergirtiye:

"قَالَ الَّذِي عِنْدَهُ عِلْمٌ مِنَ الْكِتَابِ" (Qur-an El-Nemil:40)

Wate: "Yek ji kesên ku şarezayî di pirtûkên asîmanî de hebû, êdî Silêman bi xwe yan jî zilamek din ê salih bûbe yan jî zanayek be." (Ehmed, 2012, s. 631) Nalî dibêje:

*be weqtî telbîye mestî şuhudî 'Subxetû llah' bê*

*Be gahî terwîye sîrrî 'Yedûllah' destyarî bê* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 634)

Wate: Xwediyê vî dostî di demê 'Lebeyk... Lebeyk' kirinê de, mestê rewşa şahîd be û ji nûra kiryariya paqij a Xweda, di roja heşt a qurbanîyê de niqûm bibe. Xweda dest bide milê wî, alîkariyê bike û kar jêre hêsan bike. Nalî di vê hevokê de ji peyva 'Subxetûllah' bal kişandiye ser ayeta jêr:

"صِبْغَةَ اللَّهِ وَمَنْ أَحْسَنُ مِنَ اللَّهِ صِبْغَةً" (El-Beqere:138)

Wate: "Ev ayîn û bernameya Xweda ku niha tû li ser dimeşî, reng û nexşeke Xweda bi destûra xwe nivîsandiye. Ma kî dikare ji Xweda ciwantir û rengîntir binivîse?" (Ehmed, 2012, s. 41) Ji peyva 'Yedûllah' jî bal kişandiye ser ayeta jêr:

"يَدُ اللَّهِ فَوْقَ أَيْدِيهِمْ" (Qur-an Fetih:10)

Wate: "Destê Xweda li pişt wan e, ev jî belgeye li ser piştgiriya Xweda ya ji bo wan. Wekî ku destê wan di destê wî de be." (Ehmed, 2012, s. 809)

Nalî dibêje:

*Xarayî sewz û şînî leber kirduwe cebel*

*Damênî werdî sure ke destim be damenî!*

*Wadî buwe be wadîyî pir nûrî 'Tur' î 'Nar'*

*'Neeleyn' le pê firê bide 'Nalî' be 'Eymenî'* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 666)

Wate: Çiya xwe bi giya û pelkên şîn û kesk pêçayî reng dide. Jêra çiya jî hemû bi gulên sor xemilandiye. Eger destê min jêra çiya be, ji xêr û bereketa wan gulên sor bê girtin. Dul û şîvî ji ber biharê weke şîvî, tejî nûr bûye û agir girtiyeyê. Ango jî Nalî tû jî weke Mûsa, pêlavên xwe jê pê bike; hêdî û bi piyê rût, li ser wan gul û giyayan bimeşe.

Nalî di vê helbestê de ji peyva 'Neelîn' bal kişandiye ser ayeta jêr:

"إِنِّي أَنَا رَبُّكَ فَاخْلَعْ نَعْلَيْكَ إِنَّكَ بِالْوَادِ الْمُقَدَّسِ طَوًى" (Qur-an Teha:80)

Wate: "Bêguman ez Xwedayê te, vêca tû jî ji ber edeb û rêz cihê xwe, pêlavên xwe ji pê bike. Ji ber ku bi rastî tû di dola pîroz a 'Tur' dayî." (Ehmed, 2012, s. 515)

Herwekî di peyva 'Eymen' de jî bal kişandiye ser du ayetên din. Her du jî vedigerin bo çiyayê 'Tur.' Ya yekemîn bal kişandiye ser ayeta jêr:

"وَمَا دِينَاهُ مِنْ جَانِبِ الطُّورِ الْأَيْمَنِ وَقَرَّبِنَاهُ نَجِيًّا" (Qur-an Meryem:52)

Wate: "Li aliyê rastê yê çiyayê 'Tur' me bang kir, bêyî ti sedemekê me guftûgo ligel kiriye û me nêzî xwe jî kiriye. Ji bo bi awayek veşartî axaftin û guftûgoyan ligel bikin." (Ehmed, 2012, s. 508) Ya duyemîn jî bal kişandiye ser ayeta jêr:

"يَا بَنِي إِسْرَائِيلَ قَدْ أَنْجَيْنَاكُمْ مِنْ عَدُوِّكُمْ وَوَعَدْنَاكُمْ جَانِبَ الطُّورِ الْأَيْمَنِ" (Qur-an Teha:80)

Wate: "Ey neviyên Yaqûb, bêguman me hûn ji destê dijminên we rizgar kir. Me soz da ku li aliyê rastê yê çiyayê 'Turr' pirtûka Tewratê bidin we." (Ehmed, 2012, s. 520)

Li vir Nalî xwezaya Kurdistanê weke biheştê nîşan dide, çiya, deşt û niwalan jî ewqas bi pîroz dibîne û dixê asta wî awayê pîroz û nîrxê ku Hz. Mûsa bi pê û bê pêlav çûyîyê. Diyare Xwedaye Mezin ew ferman dayeyê. Nalî jî bi awayek nerasterast xwe şibandiye Hz. Mûsa, ewqas çiya û deştên Kurdistanê ligel pîroz bû, dixwest ji ber rêz û nîrxê çiyayên Kurdistanê, bi piyê rût di nav bimeşe. Mirov dikare wê yekê jî bêje ku Nalî weke hesteke netewî yê Kurdistanê, di asta çiyayê Turr de daniye ku Xweda di Qur-anê de sond pê xwariye. Nalî dibêje:

*Lew kêşe kêşedaye kewa reş spî debê*

*Lew kêşe kêşedaye kewa ehmer esfere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 445)

Wate: Di wê pîrsgirêk û hewara roja piştê de, mûyê reş ê ciwan spî dibe. Rûyê geş û sor, ji tîrsa zer dibe û xwîn di nav de namîne. Tîştên nayê zanîn, hemû derdikeve û ronî dibe. Tîşa xwe pê mezin dikir, rûreş û rû zer dibe. Nalî di vê hevokê de balê dikişîne ser ayeta jêr:

"فَكَيْفَ تَتَّقُونَ إِنْ كَفَرْتُمْ يَوْمًا يَجْعَلُ الْوِلْدَانَ شِيبًا" (Qur-an El-Muzemîl:17)

Wate: "Eger hûn bêbawerên Quresyê, her wiha Kafir bimînin; gelo ma hûnê çawa xwe ji cezayê rojek ewqas giran, zarokan pîr dibe û ti kes piştgiriya nake, biparêzin." (Ehmed, 2012, s. 919) Nalî dibêje:

*Em ferşe xakîye detekênn le toz û gerd*

*Em eerşe no sehîfeye deyken be yek pere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 438)

Wate: Roja qiyamet ya ku ev rûyê xakê dibe corekî din ê zeviyê, toz, dar û ber li ser namîne. Her 9 parzemînan (Qite) dipêşe, weke pereke qaxezê yê pêçayî lê dibe.

Di vê hevokê de Nalî bal kişandiye ser çend ayetên ku behsa roja qiyametê dibe. Di peyva 'Ferşî' de bal kişandiye ser vê ayetê:

"وَالْأَرْضَ فَرَشْنَاهَا فَنِعْمَ الْمَاهِدُونَ" (Qur-an El-Zarîyat:48)

Wate: "Me zevî ji jîyanê amadekir, em çend dizanin bi ciwanî amade bikin." (Ehmed, 2012, s. 828) Herwiha ji peyva 'Eerş' jî bal kişandiye ser vê ayetê:

"ثُمَّ اسْتَوَىٰ عَلَى الْعَرْشِ يَعْلَمُ مَا يَلِجُ فِي الْأَرْضِ وَمَا يَخْرُجُ مِنْهَا" (Qu-an El-Hedîd:4)

Wate: "Piştê çû ser erdê xwe, bi çûyînek hêjayî wî kesî be. Dizane çi diçe di nava zeviyê de. Di baran, candar (heywan) û çi jî berhemên weke, giya û mêve jê derdikevin." (Ehmed, 2012, s. 854) Ji peyva 'Sehîfe' jî bal kişandiye ser ayeta jêr:

"وَإِذَا الصُّحُفُ نُشِرَتْ" (Qur-an El-Tekwîr:10)

Wate: "Demê name û perên kiryarên te ji bo lêkolînkirin, tolhildan û xelatên te hatiye valakirin." (Ehmed, 2012, s. 943) Ji bilî vane jî baldariyek veşartîtir kişandiye ser vê ayetê:

"يَوْمَ نَطْوِي السَّمَاءَ كَطَيِّ السِّجِّيلِ لَكُتُبٍ" (Qur-an Enbîya:104)

Wate: "Behsa wê rojê bike ku asîman weke pêçana tomara kaxezê jib o nivîsandinê hildigirin, çawa nivîskar wî perî li ber destê xwe hilo dike û dipêçe." (Ehmed, 2012, s. 542)

Li vir tiştê hêjayî gotinê ye, karîna Nalî di wê yekê de ye ku ev her çar ayet, di hevokekê de û ji bo armancekê nivîsandiye. Ew jî ji suretên, 'El-Zarîyat, El-Hedîd, El-Tekwîr û Enbîya' wergirtiye. Ev jî wê yekê radigihîne ku mirov dikare bêje, Nalî piraniya Qur-anê ji ber kiriye. Ne tenê ji ber kiriye, belkî bi têgihiştin ji ber kiriye û ji bo di her warî de sûd jê wergire. Nalî dibêje:

*Ew rojey axîrey ke çî rojî le du niye*

*Rû tirş û qemterîr û eebûs û xezenfere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 437)

Wate: Roja piştê ya roja dawî ya cîhanê ye, ti rojek din li pey nayê û timî û nayê birîn e. Rojek rûtirş û girane. Mirov gelek jê ditirse. Di vê hevokê de ji herdu peyvên 'Qemterîr û Eebus' bal kişandiye ser ayeta jêr:

"إِنَّا نَخَافُ مِنْ رَبِّنَا يَوْمًا عَبُوسًا قَمْطَرِيرًا" (Qur-an Însan:10)

Wate: "Bi rastî em di rojek gelek giran, nexweş û tal de dijîn, em ji Xwedayê xwe ditirsîn." (Ehmed, 2012, s. 928) Nalî dibêje:

*Heta şeqqey felek nebûwe be kafûrî kifin, heste*

*Ke emşew firsete, hêştâ felek mawî, etoş mawî (Dîwanî Nalî, 1976, s. 684)*

Wate: Heta Xweda asîman weke parçe xavên spî yê weke kifin nepêçayî û Îsraffil pif nekirî, heta hemû xelk nemirî; were ser riya rast û fikra siberoja xwe bike. Hê jî derfet di destê te de heye û dergehê tobeyê nehatiye girtin. Hê jî asîman şînek vekiriye û tû jî li jiyane yî, berevajî eger qiyamet hat an jî tû mirî, meyda tobekirinê namîne û dergeh li pêş te tê girtin. Ev hevok jî bal kişandiye ser vê ayetê:

"يَوْمَ نَطْوِي السَّمَاءَ كَطَيِّ السِّجِّيلِ لَكُتُبٍ" (Qur-an Enbîya:104)

Wate: "Behsa wê rojê bike ku asîman weke pêçana tomara kaxezê jib o nivîsandinê hildigirin, çawa nivîskar wî perî li ber destê xwe hilo dike û dipêçe." (Ehmed, 2012, s. 542)

### **3.2 Gotinên Pêximber û Pêximber Weke Çavkanî Ligel Helbestên Nalî**

Gotinên Pêximber (S.A.S) bi çavkaniya duyemîn a ola Îslamê tê danîn ku weke ereke Xwedayê Mezin ji bo eşkerekirina peyama wî û zêdetir nasandina xelkê Misilman ji bo bernameyên jiyane ji çarçoveya ol de dernekevin. Hedîs ji van gotinên jêr pêktê: "Gotin û hewldanên ayînî yan jî ne ayînî. Piştî jî wateyek taybet wergirt û ew jî ji gotinên Pêximber pêktê. Ew jî bi kiryarî yan jî axaftinê be, dîtibe yan jî bihîstibe û pejirandina xwe nîşan da be. Yan jî Misilmanekê jêre vegevandibe." (Mehmudî, 2009, s. 830) Gotin û sunetên Pêximber (S.A.S) tevî bilindahiya naverok û fikrên wê. "Rolê wan gotinan ji yên Qur-anê kêmtir di avakirina bingeh û destûra jiyana Misilmanan de nayê hêjmartin. Sunet jî bi awayek giştî weke gotinên Xweda tên hêjmartin ku pêşkêşî Pêximber kiriye. Pêximber (S.A.S) ew kese ku kiryarên Yezdan dike û pêşanî hemû Misilmanan dike. Lewra vegêrandina kiryarên Pêximber (S.A.S) li gor Xweda aniye ziman û weke gotinên Yezdan jî tên binavkirin. Gotin û tevgerên Pêximber (S.A.S) ji bo wê yekê hatiye ku hê zêdetir baweriya mirov bi Xweda were." (Ehmedî, 2013, s. 168-169)

Ji ber ku Pêximber (S.A.S) ne mirovek sade ye, li ser erdê projeyên Xweda nîşan dide. Li ser erdê gotin û kiryarên wî li ser tekstên Qur-ana Pîroz piştgiriya wî dikin û ji bo bingehê Îslamê çêbikin. Ji ber ku kesayetî û kiryarên Pêximber (S.A.S) bandorê li fikrê Misilmanan dike û ev jî wisa dike "Misilman di wê baweriyê de bin ku hedîs çî dema hat gotin, gotinên Pêximberin. Ev dibe belgeya ayînî û bingehê hikmê şerîet,

pêwîste bê cîbicîkirin. Bibe çavkaniya şerîet û yasayên jiyânê. Qur-ana Pîroz di gelek cihan de behsa wê yekê kiriye ku hedîsên Pêximber (S.A.S) çavkaniya şerîetêne û divê bikin bernameya jiyânê." (Mehmudî, 2009, s. 830) Vaye Xwedayê mezin di sûreta 'Heşir' û di ayeta 7 de wiha dibêje:

"وَمَا آتَاكُمُ الرَّسُولُ فَخُذُوهُ وَمَا نَهَاكُمُ عَنْهُ فَانْتَهُوا" (Qur-an El-Heşir:7)

Wate: "Tişta Peximber pêşkêşî we kir û ji we re got, dersan jê wergirtin. Tişta heram jî kir, guh bidinê û dest jê berdin." (Ehmed, 2012, s. 868) Herwiha Xwedayê Mezin di sûreta 'Nehil-Hingvîn' de wiha dibêje:

"وَ أَنْزَلْنَا إِلَيْكَ الذِّكْرَ لِتُبَيِّنَ لِلنَّاسِ مَا نُزِّلَ إِلَيْهِمْ" (Qur-an El-Nehil:44)

Wate: "Me ev Qur-an ji we re şandiye, xezîneya tomara diyariyên ciwan e. Heta tû jî bi reftar, kiryar û di pratîkê de van yasayên ciwan ji xelkê re eşkere bikî." (Ehmed, 2012, s. 446) Herwekî me got, gotinên Pêximber duyemîn çavkaniye ji çavkaniyê yasayên şerîetê. Ew jî çî yasayên pratîkî bin an jî yên ramanê bin. Ji ber wê yekê ye ku "Hedîs giringiyek zêde di derbarê têgihiştin, wateyên Qur-ana Pîroz û derxistina hikmên di nava tekstan de hatine pêçan, pêktê. Yasayên giştî digire nava xwe. Gelek wateyên ravekirina Qur-anê hene. Eger ne ji ber gotinên Pêximber bûya, bêgûman wateya wan nedihat zanîn. Bêguman hêjmara ayetên Qur-anê nêzî 6 hezar ayet û 200 ji wan jî peywendî bi yasayên şerîetê ve heye. Lê hêjmara hedîsên yasayên şerîetê digire nava xwe, digihe nêzî 4 hezar hedîsan." (Mehmudî, 2009, s. 831-832) Mînak. "Qur-anê nimêjkirin ferz kiriye, lê behsa dem û hêjmara nimêjan, dem û çawaniya kirina rikaet, sucde û etehiyatû nekiriye. Hedîsên Pêximber ev tiştan hemû bi kiryar û axaftin eşkere kiriye. Pêximber (S.A.S) li pêşiya Misilmanan nimêj dikir û di got, ez çawa li ber çavê we nimêj dikim, hûn jî wisa nimêj bikin." (Mehmudî, 2009, s. 832)

Helbestvan Nalî jî herwekî "Helbestvanên klasîkî yên Rojhilatî di xalekê de hevbeş in. Ew jî sûdwegirtina ji hinek gotinan e." (Salar , 2013, s. 89) Di helbestên xwe de bikaraniye, sûd jê wergirtiye; ew gotin û heta xwediyê wan gotinan ku Pêximber (S.A.S) e, ji bo dewlimendkirin û bingehe helbestan ligel Nalî bûne çavkaniyek din. Emê li vir hew bidin nêzî wan hevokên helbestan ên Nalî di nav de sûd jê wergirtî û bal kişandî ser, bibin. Di vê hevokê de wiha dibêje:

*Ey cîlwe derî husn û cilew kêşî temaşa!*

*Ser rişteyî dîn bê mededî to nîye haşa* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 75)

Wate: Ey Xwedayê ku ciwanî û gotinan pêşkêş dike, bala xelkê radikêşe û ji bo temaşeyî wê ciwanîyê bikin. Ango tû bi xweyî ciwanîyê didî û vê ciwanîyê pêş dixî. Fikir û mejî didî mirovan û bala wan dikêşî li ser fikirîna ji bo mezinahiya xwe. Nekû karûbarên cîhanê, belkî despêk ayîn an jî despêka dîtinê bi ti awayî bêyî alîkariya te nabe. Nalî di vê hevokê de bal kişandiye ser gotinê:

"كل أمر ذي بال لم يبدأ فيه باسم الله فهو أبثد" (Slêman, 1984, s. 15)

Wate: Her karek giring ku bi navê Xweda destpê neyê kirin, wê bê encamp be.

Nalî hewl daye ku bi rêya vê hevoka helbestê sûd ji vê gotinê werbigire. Mirov dikare di nava xetên vê gotina jor de peyamekê bigihîne. Behsa wê yekê bike ku hemû karek baş bi navê Xweda destpê bike. Eger ew kar çend bi sûd û giring be û navê Xweda ligel nebe, wê bê encamp be. Nalî dibêje:

*Her çende ke eumrî xizir û camî cemit bu*

*Çunke emelit zore, çi eumrêkî kemit bu* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 367)

Wate: Herçendî temenê Xidrî Zînde ji bo te binivîse, weke Cemşîd xwedî pile û rumet be, timî hêvî û daxwaz zêdene. Bi ti awayî hemû nayên cîbicîkirin. Temenê te temenek kême, hemû hêviyên te bi cih nayên û qet rûnadin. Nalî di vê hevokê de bal kişandiye ser vê hedîsa Pêximber (S.A.S).

"يشيب ابن ادم ويشنبيه خصلتطان الحرص و طول الأمل" (El-Mehtal, 2005, s. 347)

Wate: Dema mirov pîr dibe, lê pêngav bi pêngav ligel pîrbûnê de dû taybetmendiyên wê her di nav de dimîne. Ew jî temae û hêviya ji bo temenek dirêj.

Nalî di vê hevokê de giyanê gotinê wergirtiye û xistiye di nava helbestên xwe de û bi hêviya temenê Xidrî Zînde hebe. Ew jî bi wê yekê hatiye naskirin ku ava heyatê vexwariye, namire û wê heta qiyametê bimîne.

Nalî behsa mezinahiya Pêximber (S.A.S) dike û sûd ji wê gotina Pêximber dîtiye ku dibêje, min ji ber xatirê Pêximber asîman çêkiriye. Nalî dibêje:

*Çi nûrêke le hucrey rewze da wa qaîme qubbey*

*Qewamî eers û fer û qelbî îns û qalebî cane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 501)

Wate: Maşellah ev nûrek çawa ye di merqetê Pêximber de weke sêwanê hatî vedan. Erşê Xweda, giroviriya cîhanê, dilê mirov û firiştiyan hemû li ser wê ye.

Nalî di vê de bal kişandiye gotina Qudsî ya Pêximber:

(Ehmed H. M., 1995, s. 152) "لولاك لولاك لما خلقت الأفلاك"

Wate: Mihemed eger tû nebûya Pêximber, min asîman çenedikir. Nalî dibêje:

*Ay sakînî rîyazî Medîney munewere*

*Lutfê bike bifermû Medîney minew were* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 415)

Wate: Ey rûniştvanên di nava gulistana bajarê Medîne yê pîroz! Bila dilê te bi min bişewite û bêje, ev bajar bajarê min e û were vir. Ji bo ez jî bêm xizmeta te.

Nalî di guftûgokirina ligel Pêximber (S.A.S) ku jêre dibêje, 'Sakîn' dixwaze wê yekê nîşan bide ku Pêximber ne di rêza miriyan de ye. Di peyva 'Riyaz' de jî bal kişandiye ser gotinek Pêximber (S.A.S) ku dibêje:

(El-xeda, 1998, s. 247) "ما بين بيتي و منبري روضة من رياض الجنة"

Wate: Navbera min û mînbera mizgefta min ku niha goristanek di nav de ye, yek ji baxçeyên biheştê ye. Nalî dibêje:

*Ew babe ke fetih û zeferî qeleeye qeleî*

*Ba qeleî bika zelzeleyî hazîmî le zizat* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 141)

Wate: Bav an jî dergehê ku armanc jê bav e, erdhejê mirinê yan jî hewayê erdhejê mirinê li bin piyê wî bixî.

Diyare di vê hevokê armanca Nalî bavê wî yê jê hez dikir, miriye. Di wê demê heskirina Nalî zêde bûye û dibêje; bes jêre bigirî, ew bû perde û dergehê di navbera min û te de, nehişt em bigihin hev. Bê baviya te dibe bibe sedemê em bigihin hev. Pêwîst bû bavê te, bîranînên xwe yê nexweş bibîranîban. Ew jî mirine û hemû xweşiyên ligel xwe dibe Nalî di vê hevokê ji peyva 'Hazim El-Lezzat' bal kişandiye ser gotineke Pêximber ku dibêje:



"أكثر وا ذكر هاذم اللذات" (Eebdulla, 2001, s. 301)

Wate: Bila timî mirin li bîra we be, ew jî mirin e.

Ji bilî sûdwegirtina ji gotinên Pêximber, kesayetiya mezin a Pêximber (S.A.S) çavkaniyek din e ya ji bo xemilandina helbestên Nalî. Ji ber ku Pêximber (S.A.S) pileyek taybet û bilind heye, timî ew kesayet di fikir û mejiyê wî de bû. Bi çavek pir pîroz temaşe kiriye. Ji ber, "Sedemê bidestxistina gerdûn û bidestxistina bexteweriyên herdu cîhanan e. Heskirina ji bo Xweda, hemû cîhan e." (Seeîd, 1383, s. 509) Kesê herî rêkûpêk û diyar di navbera anîna Xwedayê Mezin e û rehmete ji bo hemû cîhanê. "Xwedayê xwediyê ciwaniya birûmet a ji bo heskirina ciwaniya xwe, ji Mihemed jî gelek hes kir. Ew jî xwediyê neynika herî rêkûpêk a wê ciwaniyê ye. Herwiha ji ber heskirina di hundirê ciwaniya Mihemed jî (S.A.S), hes jê dike û neynika herî ciwan e ku ew nav di nav de derdikeve. Herwiha yên ji Pêximber jî hez dikir, her yek ji wan li gor pileyên xwe ku li ser şopa Pêximber diçin û tiştên ew dibêje, bicihtînin." (Seeîd, 1383, s. 511) Nalî di behsên di derbarê Pêximber de, bi awayekê wesif dike ku heskirina Xwedaye, pile û mezinahiya wî ewqas bilind e, eger bimire jî mirov di bin sîbera wî de hest pê dike. Nalî dibêje:

*Peyxamber û hebîbî Xuda, 'Xatime El-Resûl'*

*Rewzey le erz û saye le ser çerxî exzere (Dîwanî Nalî, 1976, s. 423)*

Wate: Pêximber ew kese ku nameya Xweda ji bo mirovan aniye. Heskirina Xweda ye û Pêximberê dawiyê ye. Tevî ku bi eşkere ji te re dibêjim, serê wî ewqas bilind e sîbera wî li ser asîmanê kesk çêbûye.

Nalî fikra vê hevokê ji wê gotinê wergirtiye ku dibêjin, Pêximber ew dara xurmeyê ye ku di erşê Xweda de ewqas pileya wî bilinde, heta 'Darên Tûbî' biheştê jî di bin sîbera wî de ne. Eger pileya wî ewqas bilinde be û çawa divê sîbera wî li vê cîhanê nebe. Divê sîbera wî hebe, diyare sîbera wî heye û dema erd ji nav çû, wê demê sîbera wî jî ligel namîne. Diyare armanca Nalî ewe ku sîbera Pêximber ewqas mezin, li ser hemû asîman û erdê belav bûye. Sîbera wî ne weke sîbera mirovek asayiyê. Lewra di pirtûkên "Jiyana Pêximber de hatiye nivîsandin ku sîbera Pêximber nebûye." (Ebdülkerîm, 1976, s. 423)

Dîsa di derbarê sîbera Pêximber (S.A.S) de Nalî di wê baweriyê de ye ku hemû sîbera li ser erdê, ronahiya stêr, roj û heyvê ji tîrêjên ronahiya Pêximber peyda bûn. Lewra Nalî dibêje:

*Ew sêbere ke ealemî euluy le nûrîye*

*Şems û nicûm û herçî lewaneda muqerere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 424)

Wate: Sîbera Pêximber (S.A.S) ew sîbere ku roj û stêr ji tîrêjên wî peyda bûne. Sîber çend ciwane ku bi xwe nebûna ronahiyê ye û bibe çavkaniya hemû ronahiyên.

Nalî her di derbarê nûr û sîbera ciwaniya Pêximber de, bi heyv û stêran ranaweste ku ronahiya xwe ji Pêximber (S.A.S) wergirtine, heta Pêximberên din ên li pêşiya wî jî derketine, ciwanî û nûr Pêximber (S.A.S) wergirtine. Yûsif Pêximber jî weke mînak têne û dibêje:

*Meelume çunkî cemeî resûl muqtebîs lewin*

*Yûsif yekê lewane ke ser lewhî deftere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 426)

Wate: Raste û eşkere diyare hemû Pêximberan nûra xwe ji Pêximber wergirtine. Yûsif ku navê wî di rêza pêş a pirtûka ciwaniyê de hatiyê nivîsandin, yek ji wan pêximberane ye.

Diyare û eşkereye ku Pêximber Yûsif ciwaniyek bêhempa hebû, Xwedayê Mezin jî di Qur-anê de behsa ciwaniya Yûsif kiriye. Nalî ev ciwaniya Pêximber Yûsif ji nûra mezin a Pêximber (S.A.S) de dibîne. Her di derbarê mezinahiya Pêximber (S.A.S) de tê heskirina wî ya mezin a ligel Xweda ku çend li gel Xweda mezin û tê heskirin e.

Her ji ber xatirê Pêximberê gunehê ûmeta wî efû dike. Ji ber ku Pêximber (S.A.S) daxwaza şefaet û efûkirinê ji Xweda dike. Lewra Nalî rehmet dişîne bo Pêximber ku li vê dinyayê û li wê dinayê ji bo me çi rehmeteke.

Nalî dibêje:

*Rehmet be husnî sûretî Însan zihûrî kird*

*'Xeyril Beşer' leqebe be şefeet mubeşşere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 430)

Wate: Rehmeta Xweda ji bo mirovan bi awayê ciwaniya mirovan derket ku Pêximber e. Pêximberê ku navnîşan herî ciwan û mirovê herî baş heye. Mizgêniya wê yekê wergirtiye ku şefaetê ji bo gunehbarên umeta wî dike û Xwedayê Mezin jî wan efû dike. Nalî bi hevokê sûd ji vê ayeta jêr wergirtiye:

"وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا رَحْمَةً لِّلْعَالَمِينَ" (Qur-an Enbîya:107)

Wate: "Me tû ne ji bo çi tiştêkê şandiyê, tenê ji bo wê yekê nebe ji bo hemû cîhanê rehmet bî." (Ehmed K. M., 2012, s. 542)

Pêximber (S.A.S) bi xwe dibêje, "Ez şandiyê Xwedayê yê ji bo tevahiya cîhanê me. Belgeya min a li ser vê gotinê jî ewe ku dema hewara xwe digihînim Xweda û dûayan jê dikim, Xweda yasayên xwe yên asayî diguherîne... Temaşeyî tiliyên min bikin, bi wêneyê pênc çavkaniyan av jê derdikeve. Temaşeyî heyvê bikin, çawa Xweda tenê bi balkişandinek li ser tiliyên min, heyv kiriye dû parçe. Temaşeyî vê darê bikin, çawa tê gel min û şahidiyê li ser Pêximbertiya min dike. Ev kulma zad a têra du-sê kesan jî nake, lê wisa lê tê ku têra 200-300 kesan dike." (Seeîd, 1383, s. 151-152)

Nalî ji wê rojê ve tê li ser wesfa Pêximber (S.A.S) ku bangewaziyê ji bo baweriya yek xwedayî dike, mizgêniya bexteweriya timî li vê cîhanê û li cîhana din radigihîne. Ewqas exlaqek bilind heye, çi di gihandina peyama wî de, çi jî di şerîet û ayînê de, ligel Xwedayê Mezin radigihîne. Çend ji yên li ser şopa wî diçin, mizgêniyek xweşe. Herwiha ji bo kesên li ser vê rêbazê nameşin jî çend bi tirs e. Bi mêhvanek heskirî û bilind zaniye, cihê bexteweriya herdu cîhanên mirovatiyê ye. Em hemû li ser sifreya wî ne û wî sifreya Xweda ji bo me hemûyan raxistiye. Lewra dibêje:

*Çi mîwanêke? Sahêb cê û cah û eîzzet ûe ezme*

*Ke dû ealem tufeylî deewetî, û ew sahêbî xiwane!*

*Mûhemmed, Ehmedî Mursel, Mûnîrî Mînber û Mehfel*

*Beşîrî Axîr û Ewel, Nezîrî xwêş û bêgane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 504)

Wate: Pêximber (S.A.S) mêvanek çawa ye? Mêvanêke xwediyê tedbîr, xwediyê rûmet û mezinahiyekê ye, îradeya wî bi ti awayî kêr nebûye, tevî li wî cihî bûye mêvan; lê li herdu cîhanan em mêvanên wî ne. Her ew sifre û xwarin ji bo hemûyan raxistiye. Mûhemed, Ehmed şandiyê Firyardires û ronîkirina mînbera cihê civîna xelkê û

mizgêniya ji bo hemû nifên mirovan e. Ji serdema hatina Pêximber û heta roja qiyametê, tirsê di dilê neyarên Îslamê de ye.

Bi rastî pesindayîn bi vî awayî ye. Nalî zaniye yê pesnê wî bê kirin, kiye û lewra gelek taybetmendiyên ciwan ên Pêximber nîşan daye. Ligel van taybetmendiyên behsa hinek tiştên wisa kiriye ku hesab taybet ji bo mezinahiya Pêximber gerandiye. Du navên Pêximber bikaraniye, ew jî 'Ehmed û Mihemed'e. Herdu nav jî di Qur-ana Pîroz de hatine. Li vê cîhanê bi Mihemmet hatiye binavkirin. Li wê cîhanê yan jî roja dawiyê, bi Ehmed tê binavkirin. Nalî sûd ji van herdu navan dîtiye. Ji ber ku li vê cîhanê ji bo hemûyan rehmete û li wê cîhana din jî ji bo me şefaete. Her di derbarê navên Pêximber (S.A.S) de, Xwedayê Mezina wiha dibêje:

"وَالَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ وَآمَنُوا بِمَا نُزِّلَ عَلَى مُحَمَّدٍ وَهُوَ الْحَقُّ مِنْ رَبِّهِمْ كَفَّرَ عَنْهُمْ سَيِّئَاتِهِمْ

وَأَصْلَحَ بِأَلْفِهِمْ" (Qur-an Mihemed:2)

Wate: "Yên ku bawerî bi Pêximber anîne û karên baş kirine, bawerî bi Qur-anê anîn ku ji bo Pêximber (S.A.S) hatiye şandin. Ev maf ji aliyê Xweda ve hatiye. Bi bernameya jiyana wan, Xweda di dîn û cîhanê de gunehên wan efû dîke û rewşa wan baş dîke." (Ehmed K. M., 2012, s. 801) Ji bo binavkirina Pêximber (S.A.S) bi navê Ehmed, Xwedayê Mezin wiha dibêje:

"يَا بَنِي إِسْرَائِيلَ إِنِّي رَسُولُ اللَّهِ إِلَيْكُمْ مُصَدِّقًا لِمَا بَيْنَ يَدَيَّ مِنَ التَّوْرَةِ وَمُبَشِّرًا بِرَسُولٍ يَأْتِي مِنْ بَعْدِي اسْمُهُ

أَحْمَدُ" (Qur-an El-sef:6)

Wate: "Li bîra wan bêne, dema ku Îsayê Kurê Meryem got, ey neviyên Yaqûb! Bê gûman ez Pêximber û şandiyê Xweda yê ji bo we me. Ez li ser vê Tewrata li ber destê xwe mikûr tîm. Mizgêniyê bi hatina Pêximberê li pişt xwe didim ku navê wî Ehmed e." (Ehmed K. M., 2012, s. 877) Herwiha di gotinekê de hatiye ku yek ji navên Pêximberê Îslamê, Ehmed e. Ew jî:

"ان لي اسماء أنا محمد، و أنا أحمد و أنا الماحي الذي يمحو الله بي الكفر، و أنا الحاشر الذي يحشر الناس

على قدمي و أنا العاقب" (Sileyman, 1983, s. 121)

Wate: Min çend nav hene, ez Muhemmed im, ez Ehmedim û ezê kafiran jinav bibim. Min ew nav heye ku dema roja qiyametê lêpirsîna ligel xelkê destpê dîke, ji ber daxwaza min, ez pêximberê duyemîn ê Xweda me. Nalî di vê helbestê de bal kişandiye ser vê ayetê:

"يَا أَيُّهَا النَّبِيُّ إِنَّا أَرْسَلْنَاكَ شَاهِدًا وَمُبَشِّرًا وَنَذِيرًا (45) وَدَاعِيًا إِلَى اللَّهِ بِإِذْنِهِ وَ سِرَاجًا مُنِيرًا (46)" (Qur-an Ehزاب:45-46)

Wate: "Ey Pêximber, me tû ji bo mizgênî û tirsandinê şandiyê. Ango şahiyê li ser xelk û mizgênîyê ji bo bawermendan bibî, herwiha bêbaweran jî bitirsênî. Ango bibe şahiyê parastina yekxwedayî, kar û kiryarên baş. Mizgênî û diyariyê bidî bawermendan, bêhediyê jî bidî dijminên Xweda û bi siberoja giran wan bitirsênî. Ger bi vî awayî be, divê hûn Misilman jî mizgênîyan bidin." (Ehmed K. M., 2012, s. 685)

Di derbarê hatina Pêximber (S.A.S) ji aliyê Xwedayê Mezin ve, ji bo rizgarkirina mirov, anîna li ser rêbaza rast û serfiraziyê. Nalî dibêje:

*Mujde le easîyan ke ew îqbalî rehmete*

*Îsmî rehîm û xews û şefîe û mûxeyere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 431)

Wate: Ji gunehbaran re ragihênî ku hatina Pêximber, ango hatina rehmeta Xweda ye. Pêximber ji ber ku rehmeta Xweda ya ji bo Misilmanane, navê wî jî bi rehim, firyadres û şefaetkarê roja qiyametê ya ji bo rizgarkirina kesê bixwaze ye.

Her di derbarê ciwanî û nûra rûyê Pêximber (S.A.S) xwe di asta wesifkirinê de kêr dibîne. Ji ber ku nizane bişibîne çi tiştê, ti tiştê di asta wî de nîne. Lewra dibêje:

*Teşbîhî husnî faîqî, axir, be çi bikem?*

*Nûrî sunuhî deha teleetî sed lewhî enwere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 426)

Wate: Ez nizanim ciwaniya Pêximber bişibînim çi. Tenê tîrêjên aliyekê rûyî wî, bi qasî sed textên zor ronî roniye.

Nalî li vir gelek bi ciwanî hewla wê yekê daye ku behsa Pêximber bike, tiştê bibîne û nêzî wê ciwanî û nûra Pêximber; nekarî tiştê bibîne û di asta nûra Pêximber de be. Lewra bêhêvî nebûye, fikra wê yekê kiriye ku raste nikarim wesfê ciwaniya rûyê wî bikim; lê bi aliyekê Pêximber dikarim tiştê li ser wî zatî bêjim. Ew jî ewe ku her bi wî aliyê wî, dizanim qasî sed textên fireh, ciwan û ronî, ronîtire.

Her di derbarê mezinahiya Pêximber (S.A.S) de, Nalî tê ser wê dema ku hemû Pêximber kom dibin û ji bo ligel Xwedayê Mezin baxivin, Mûhemmed wê mezinahiyê

werdigire ku pile bilindiya wî ya ligel Xwedayê Mezin dikeve berî hemû Pêximberan. Ji bo axaftina ligel Xwedayê Mezin, Nalî dibêje:

*Efradî murselîn hemû yek raze am kelam*

*Lem cêgada bizane muqedem muexere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 428)

Wate: Yek bi yek Pêximber, hemû xwediyê heman gotinê û hevdeng in. Ango divê bê zanîn ku hemû Pêximber li wî cihê dicivin. Pêximber Mihemed (S.A.S) dikeve pêşiya hemûyan û li pişt hemûyan jî hatiye.

Her di derbarê amojgariyê Pêximber (S.A.S) de, fermanê dike ku başiyê bikin û tiştên xirab heram kiriye. Nalî dibêje:

*Le sayey emr û nehî, heqiq û batîl bû be dû firqe*

*Be mîslî ferqî roj û şew ke fariq nûrî îmane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 506)

Wate: Ji ber fermandayîna ji bo tiştên baş û heramkirina tiştên xirab ji aliyê Pêximber ve, tiştên rast û nerast hatine zelalkirin; kesên bawermend û bê bawer ji hev cûda bûne û bûne dû beş. Weke roj û şev, ronahî û tarî ku ji hev cûdane, cûdakirina du beşên ji hev jî ji nûra îman a di nava beşek ji bo beşek din diyar pêktê. Ew beş jê bêpar e. Nalî tê li ser mijara gora Pêximber (S.A.S) û dibêje:

*Çi hucre? Hucreyî eulya, ke wa neeleynî Xudadimî*

*Durî tacî serî qutb û welî û sultane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 502)

Wate: Hucreya gora Pêximber, huncreyek çawa ye? Ew hucre bilinde, pêlava li piyê xizmetkarên wê jî, ji bo wê yekê digunce bibe dûrî taca serê mirovên herî mezin ên cîhanê. Gelo xizmetkar dikarin bibin paşayên welatan. Paşayê welatan jî dikarin bibin dergehvanê wê gorê.

Herçendî ku Nalî wesif û pesnê Pêximbe (S.A.S) dike, xwe di asta mezinahiya wî de bi xemsar dibîne. Dibêje, ez çime û çawa bikarim bi çend peyvan behsa mezinahiya we bikim. Tû ewqas mezinî, Xwedayê Mezin bi xwe wesfê we kiriye û ez çime. Lewra Nalî dibêje:

*Mûradim zîllet û paranewey hale, ne weke neete*

*Be çend beytêkî Kurdane, ke Qur-anit sena xwane (Dîwanî Nalî, 1976, s. 517)*

Wate: Ango armanca min ji van çend beytên Kurdî yên min ji bo we nivîsandî, ne ewin ku ez bi van gotinên xwe we mezin bikim. Ji ber ku Xweda bi xwe pênaseya we kiriye. Ji we re gotiye, êdî divê pênaseya min ji bo we (Pêximber) çî be. Ez dixwazim di baregeha we de behsa bextreşîya xwe ya ji bo dûakirinê bikim.

Nalî di hevokê de tê mijara xwe û daxwaz ji Pêximber (S.A.S) dike û dibêje, di roja dawiyê şefaetê ji bo min bike, belkî Xweda min efû bike. Ji ber ku ez gelek gunehbarim. dibêje:

*Rojî ceza rica bike bo 'Nalî' yê derbeder*

*Çun lem cîhan gunahî gelê zor û eksere (Dîwanî Nalî, 1976, s. 447)*

Wate: Ey Pêximber di roja xelat û cezakirina mirovên baş û yên tawanbar de, şifaetê li vî Naliyê derbider bide. Belkî Xweda min efû, ji ber ku min li vê cîhanê gelek gunehên zêde kiriye. Pêwîstî bi şifaeta te û rehma Xweda heye.

### **3.3 Kesayetiya Bawermendan Weke Çavkaniya Helbestan Ligel Nalî**

Behskirina kesayetiyan olî, lêkolînek giring û pêwîstin. Di helbestên Nalî de, ev kesayetiyan tevî dewlimendkirina helbestên wî û di heman demê de alîkariya dîtinên taybet ên Nalî bi xwe ya ji bo cîhana wan kesane ye. Ji ber ku taybetmendiyên diyar ên tekstên Nalî, ji çend lêkolîna pêktên û ji bo helbestên wî çavkaniyên giring in û dike hîmên bingehîn ên helbestên xwe. Ji vê yekê jî derdikeve holê ku gelek bi wan kesayetiyan ecêbmayîye. Ji ber vê yekê ji bilî kesayetiyan xwe yên bilind, sedema wê jî ewe ku behskirina vî zatê pîroz, di nava du çavkaniyan de behsa wan hatiye kirin. Ew jî ji bo Nalî gelek giring in. Ew jî Qur-an û gotinên Pêximber in. Yan jî ew kesên ku "Tenê bi boneya perwerdeya bilind, amojgariyên şerîeta rast a Pêximber (S.A.S) gihiştine wê pileya ku bidestxistine. Ji ber ku her Pêximber rêber û pêşengê mezinan e. Wan rêyek şopandine, mamostayê wan ew rê şikandiye. Dergehê wê li ser piştî wan e û bi vekirî li ser milê wan maye. Piştî wan jî bi vê rêyê rastî dîtine û bidestxistin." (Seeîd, 1383, s. 315) Ev jî wê yekê digihîne ku kesayetên mezin ên ku Nalî xistine di nava helbestên xwe de, ne efsanene. Belkî ev rastîne, xelîfeyên Pêximber (S.A.S) yan jî ew kesin ên li ser şopa Pêximber diçin in. Lewra Nalî pesnê wan dide, di dem û cihê wan ê çaverêkirî

de hatin jiyane û li ser şopa Xweda û Pêximberê wê çûne. Ew hewldana ku ketî ber çavê wan, encamdaye.

Ligel vê dilgiraniya di jiyana wan de rastî wan hatî. Nalî di hevokê de tê li ser mijara her çar xelîfeyên Raşîden û dibêje:

*Legel al û legel sehebî, xususen çar yarî dîn*

*Ebûbekir û Omer û Osman û Heyder Şêrî Yezdane (Dîwanî Nalî, 1976, s. 517)*

Wate: Pêximber ligel Misilmanên eşîra Benî Haşim û Bîn Mûtelîb, bi taybet jî 4 kesên dostên dîn û Îslamê; Ebûbekir, Omer, Osman û Heyderî Şêrî Xweda de, armanc jê Îmamê Eliye û ez qurbana wan bibim. Nalî di vê hevokê de heskirina xwe ya ji bo Pêximber û herçar xelîfeyên Misilmanan û hemû Misilmanan nîşandaye. Çend dilsoz û evîndarên Îslamê bûn.

Nalî di helbestekê de ser mijara dayîka bawermendan, xêzana Pêximber (S.A.S) 'Aîşe'ku çawa bi xirabî behsa Aîşe kirine. Ji ber vê yekê Nalî behsa pakîyê dike û dibêje; vê Qur-anê behsa pakîyê kiriye. Ew pakî weke heyva şevê ronî nîşan daye. Yê behsa nepakîyê (Qirêjî) dike jî şibandiye seg. Dibêje, her ji xwe re bikin hep hep.dibêje:

*Eaciz mebe hergîz le diro û îfkî hesûdan*

*Dunyaye, debê seg biwerê, şîee bika seb (Dîwanî Nalî, 1976, s. 134)*

Wate: Ev cîhane, dema mirovek baş hebe, hinek kesên xirab peyda dibin û hesûdiya wan dikin. Vaye em hemû dibînin, heyva çarde şevî çawa cîhanê ronî dike. Lê seg dikin hepe hep. Bi başî di Qur-anê de behsa Aîşeya dayîka bawermendan hatiye kirin, lê Şîe her buxtanan (gotinên nexweş) jêre dikin û weke segan direyîn.

Nalî di hevokê de tê ser mijara oldarên ku heval û heskirinên Pêximber (S.A.S) Bîlalî Hebeş, Weysiyê Qeranî û Selmanê Farisî. Navê hersêyan di ola Îslamê de bilind tê nirxandin. Nalî bi wan serbilinde. Ligel Nalî tevî ku ev ne ji Mekke û Medîneyê ne, heta ne Erebin jî; lê ji ber heskirina wan a ji bo ola Îslam û Pêximber (S.A.S) bûne mirovên paye bilind ên di dîroka Îslamiyetê de navdar bûne. Ji ber ku "Bîlal hevlekî heskirî û rêzdar ê Pêximber (S.A.S) bû. Ew kole bû. Ango bêbaweran bi pereyan dikirîn û kar pê dikirin. Heta mirinê nedikarî bêyî wan ti tiştê bike. Bîlal bi awayek veşartî û bêyî aghdariya bêbaweran (Kafir) jê hebe, Misilman bû. Dema kafiran ev yek zanîn,



zilim li Bîlal kirin û bi werîs li erdê kaş dikirin. Berên germ û mezin dixistin ser sing û zîgê wî, digotin divê dúbare bibî kafir û wê demê emê dest ji te berdin. Lê Bîlal dest ji Îslamiyetê berneda, lewra li ser destê Ebûbekirê Sediq hat azadkirin. Ango Bîlal kirî û azad kir. Bi vî awayî Bîlal ji wê nexweşiyê rizgar bû ." (Nîhad, 2013, s. 58) Weysî Qerenî yek ji heskiriyan Pêximber (S.A.S) bû û Nalî di helbestên xwe de bal kişandiyê ser. "Ew zatê pîroz bû, Pêximber Behs kiriye û gotiye: Weys Qerenî îshabiyê min ê herî baş e. Gelê caran berê xwe dide welatê Yemen û di got; Ez bêhna rehmet, bereket û bêhnvedana baweriya yekxwedayî ya rast û rehmeta Xweda li Yemenê dikim. Ji ber yek ji ewliyayên umeta min, ku ew jî Weysî Qeraniye." (Mihemed Ş. , 1991, s. 27) Her weke me behskirî, ev zatê he heskiriye Pêximber (S.A.S) bû. Dema "Pêximber (S.A.S) nexweş ket, xelkê ji Pêximber re got, eger Xwedê neke eger hûn wefat bikin; cubeya te ya mûbarek hêjayî kê ye û bidin kê? Di bersivê de Pêximber (S.A.S) got; bidin Weysî Qeraniye." (Mihemed Ş. , 1991, s. 29) Selmanê Farisî jî yek ji heskiriyan Pêximber (S.A.S) e û Nalî di hevokeke helbestên xwe de navê wî aniyê. Pêximber (S.A.S) gotiye: "Selman jî weke me ye, Eliyê Kurê Ebû Talib jî weke Lûqmanê Hekîm bi nav dike. Di serdema xelîfetiya Omerê Kûrê Xetab de, bi serdan hatin Medîneyê. Omer karek jêre kir, guman li ser nîne ku karek bi vî awayî ji bo ti kesek din kiribe. Hevaokên xwe kom kir û ji wan re got, werin em biçin derve û pêşwaziya Selman bikin." (Xalid, 2008, s. 53) Herweke me gotî, ev hersê kesayetiyan Îslamî xistiye di navahelbestên xwe de û dibêje:

*Seadet bu be nûr û saeîdî zerwey hîdayet bû*

*Eelamet nûrî îmanî 'Bîlal' û 'Weys' û 'Selman' e (Dîwanî Nalî, 1976, s. 506)*

Wate: Ji wê rojê ve Pêximber hatiye û keyfxweş bûye. Çûne ser çile pope û amojgariya vê belgeyê jî Misilman bûn, bexteweriya Bîlalê Hebeşî, Weysiyê Qeran û Selmanê Farîsiye. Ligel vê yekê jî ne rûniştvanên Mekke û Medîneyê, heta ne Erebbûn.

Nalî di hevokeke helbestê de behsa Mensûrî Hellac dike û ew jî yek ji xwedanasên sedsala 3'mîn a koçiyê. Hellacî Mensûr "Di hemû şev û rojekê de 400 rikaet nimêj dikir." (Mihemed Ş. , 1991, s. 134) Ev xwedanase, gelek caran di got: "Enal Heq, angoo ez gelek mafdar im. Hinek zanayên wê serdemê wateya wê gotinê wisa lihev dane û gotine, Mensûrî Hellac gotiye, ez Xweda me û bûye kafir." (Mihemed Ş. , 1991, s. 145) Lewra biryar girtin ku li dar bidin, dest û piyê wî jê bikin. Wê demê,

"Herdu dilopek xwîn a di ket ser erdê, bi eşkere guhê gelek kesan lê bû û wê dilopa xwînê di got, 'Enal heq, ango ez mafdar im.' Dema ew dilop diket ser erdê jî, weke bi pêûsê bê nivîsandin, Enal Heq dihat nivîsandin, Ango ez mafdar im." (Mihemed Ş. , 1991, s. 148) Lewra Nalî xwe dişibîne rewşa Hellacê Mensûr û di vê helbestê de dibêje:

*Sirûşkim neqşî çawî to dekêşê*

*Cêgem serdarekey 'Mensûre' em şew (Dîwanî Nalî, 1976, s. 389)*

Wate: Bi awayekê gihiştîme rewşa yekitîbûnê (Wehdel wicûd), ligel te bûm û em weke hev bûn, ey heskiriya min. Rondik ji çavê min dibarin, nexşê çavê te çêdike. Weke çawa xwîna Mensûrê Hellac, hevoka 'Enal Heq, ez mafdarim' dinivîsand. Wisa diyare encamê min jî wê wisa be. Çawa ew li ser yekitîbûna ligel Xweda li ser text rakirin û bi dar lêdan, dest û piyê wî birîn. Wê her wisa li min jî bikin.

Nalî di vê hevokê de heyraniya xwe ya ji bo Hellacî Mensûr nîşan dide, lêdan bi daran a wî jî dike şahid û sembola heskirina nemir. Hevoka 'Enal Heq, ez heqim' di helbesta xwe de bikartîne, lê bi awayek cûda. Nalî digihe wê astê ku ji bo heskiriya xwe dinivîsîne, 'Enal Heq, ez heqim' a Mensûrî Hellac. Lê nivîsandina xwîna Nalî yekbûna ligel yara wî, ango dinivîsîne; 'Ez û yar yekin.'

Ji bilî kesayetiyan olî yê Îslamê, hewl daye ku Pêximber û kesayetiyan din cihê daxwaz û hêviyan Îslamê ne û ji aliyê Xwedayê Mezin ve hatine hilibjartin. Di Qur-ana Pîroz de behsa wan hatiye kirin. Nalî wan dixê di nava hevokên helbestên xwe de. Weke çavkaniya helbestan sûd ji wan wergirtiye. Ji ber ku her Pêximberê, parçeyeke heqîqetê ber dikeve. Ji aliyê xwe ve wê heqîqetê ji xelkê re radigihîne. Lewra li vir emê bi hûrî nêzî helbestên Nalî dibîn û ji bo em bizanin, çawa behs dike.

Nalî di helbestekê de behsa evîndariya mecazî dike, ligel wî ev heskirin di navbera keç û kûr de ye. Ji ber ku em hemû neviyan Adem û Hewane, ew jî kur û keç bûn. Lewra dibêje:

*Babêkî heye dunya bo eeşqî mecazî, bes*

*Nalî çîye ew babe Adem kur û Hewa kiç (Dîwanî Nalî, 1976, s. 162)*

Wate: Dergehekê heskirina mecazî heye û mirov bikare di wî dergehê de biçe hundir. Ew jî ewe ku di navbera nêr û mê de be. Ji ber ku em hemû neviyan Adem û

Hewa ne. Adem kur û Hewa jî keç bû. Ango dive evîndariya mecazî bi keç û kuran bê kirin, nekû bi kur û kur bê kirin.

Nalî di hevokeke helbestê de behsa rêya Mekkehê dike û tê ser Hz. Suleyman ku çawa zimanê ajalan dizanî. Nalî dibêje:

*Serîrî cunbuşî text û mehfe Fey mexmelî sewzî*

*Delêy tesbîhî murxane, le ser textî Suleymane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 499)

Wate: Sîre sîra ji ber tevgerkirina text û darqetkên (şixre, kejawe) ji mexmel hatine çêkirin, li ser piştê hêştiran û li ser rêya Mekkeyê; weke li ser ajalan sûbhanallah bike, weke wê yekê bike ku li ser textê Hz. Suleyman e. Di ayeteke Qur-anê de tê gotin ku Hz. Sûleyman zimanê ajalan dizanî, diyare timî hemû corên ajalan li derdora wî kom dibin.

Nalî di hevokeke helbestê de tê ser mijara mezinî û rastiya Hz. Yûsif û Meryema Dayîka Mesîh. Herdu jî di Qur-anê de behsa wan hatiye kirin ku çend paqij û rastbêj in. Yûsif weke mirovê rastbêj hatiye naskirin. Xwedayê mezin dibêje:

"يُوسُفُ أَيُّهَا الصِّدِّيقُ" (Qur-an Yusuf:46)

Wate: "Yûsif, ey zilamê rastbêj." (Ehmed K. M., 2012, s. 396)

Di derbarê pakîtiya Meryem ango Dayîka Mesîh, dema Xwedayê Mezin Cibraîl şand ligel û guftûgo ligel kir; di derbarê zarokbûna wê de. "Dema firîşte Cibraîl hat gel Meryem û mizgênî dayê ku wê zarokeke wê pak çêbibe. Meryem matmayî ma, gelo çawa wê zarokeke wê çêbibe û di demek ku hê jî keç e. Cibraîl jêre got, zarokeke te wê çêbibe û ev kar ji aliyê Xweda ve tiştê hêsane. Xweda jî dibêje, berî niha min tû ji tûnebûnê çêkirî." (Silêman, 2008, s. 399) Xwedayê Mezin dibêje:

"قَالَتْ أَنَّى يَكُونُ لِي غُلَامٌ وَلَمْ يَمْسَسْنِي بَشَرٌ وَلَمْ أَكُ بَغِيًّا" (Qur-an Meryem:20)

Wate: "Meryem got, çawa wê kurekê min çêbibe û min heta niha mêr nekiriye û tû kes nêzî min nekiriye. Bi ti awayî ez ne mirovek xirab bû." (Ehmed K. M., 2012, s. 504) Lewra Nalî di derbarê pakî û rastiya van herdu zatên Xweda de dibêje:

*Sidîq û Eezîz her wek Yûsif ke nebî bû kur*

*Sîdîqeyî meesûme wek daykî Mesîha kiç* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 162)

Wate: Eger di derbarê kuran de kesên weke Hz. Yûsif bûbin ezîzê Misrê, Zûleyxaya hevjinê Ezîzê Misrê dildarê Yûsif bûbe, ev nabe belgeya wê yekê ku timî kur ji keçê paqijtir e. Di nava keçan de keçên weke, Dayîka Mesîh rabûne.

Ji bilî ku Hezretî Yûsif bi awayê pak û rastbêj hatiye naskirin, ciwaniya wî jî bûye mijara di wêje û folklorê millî de. Nalî di derbarê Pêximber Mihemed (S.A.S) di biheştê de dibêje, ciwaniya wî weke ciwaniya Yûsif e. Lewra dibêje:

*To Yûsifî new Husnî le ser Mîsrî cînanî*

*Min pîrim û fanî*

*Lem kulbey ehzane ne zîndum û ne mirdûm*

*Herwa be tematim* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 265)

Wate: Ey Pêximber hûn di welatê biheştê de weke Yûsifê ciwan ê li Misrê û ez jî kalek ketî û ji xeman tejîme. Ne ewqas zindîme ku bikarim ji xwe bijîm û ne jî bimrim û ji xwe rizgar bibim.

Nalî di vê hevokê de berhev ligel karînen Pêximber û bêdeshilatiya xwe dike. Wisa dibêje ku çend pêwîstiya wî bi rehma Pêximber (S.A.S) heye. Dibêje, tû di ciwaniyê de weke herdemê ciwaniya te weke ya Yûsif ciwane û jinav naçe. Kêm û zêde nayê gûhertin. Yûsif li welatê Misrê û tû jî li bax û baxçeyên biheştê. Ez jî çawa jî hebûnek im, pîr, bihêz im û ber bi nemanê ve diçim. Ewqas bê sûdim, nayê zanîn em dijîm an jî mirîme. Tenê ev qas heye, heta ez li dinyayê bim, ez bê hêvî nabim. Her li bendê me ku bi dewle serê te, Xweda rehmê li min bike.

Nalî di hevoke helbestê de tê ser mijara Hezretî Mûsa dike û xwe dişibîne wî. Nalî rondikên çavê xwe dişibîne behra ku Hz. Mûsa lê derbas bûyî. Agirê dilê wî jî weke agirê nûra Xweda ya ji bo Hz. Mûsa derketiye. Mûsa daxwaz kir ku Xweda bibîne, Xwedayê Mezin jî li çiyayê Tur xwe nîşan da. Ewqas nûra Xwedayê Mezin zêde bû, çiyayê Tur xwe li ber negirt û şewitî. Nalî dibêje:

*Be nawî eişq û awî dill cesed wek Hezretî Mûsa*

Wate: Bi vî agirê evînê û bi ava çavê ku ji kûrahiya dilê min derdikeve. Laşê min weke yê Hz. Mûsa lê hatiye. Divê li ser cûya rondikên çavê xwe re derbas bibin, ew jî weke behra Fîreewn e. Ligel agirê derûn (nefs) berbibeyê ku weke agirê çiyayê Tur e.

Di vê 'Behra Fîreewn, agirê Tur' e. Îşaret ji bo wê yekê hatiye kirin ku bi ti awayî nagihe encamê. Ji ber ku Mûsa derya derbas kir û rizgar bû, lê deryaya rondikên min bi ti awayî bi dawî nabin û jê rizgar nabim. Agirê çiyayê Tur jî, nûra Xweda bû derket. Ew jî nîşana wê yekê bû Hz. Mûsa nekare Xweda bibîne. Kete agirê heskirina wî û ev jî timî ligel wî dibe nîşana wê yekê ku bi ti awayî nagihe yara xwe.

Nalî di hevokeke helbestê de behsa şeva Mîracê Pêximber dike. Wê şevê weke wê rojê bû ku Mûsa li ber Fîreewn destê xwe dixist berîka wî û derdixist, weke çiraya vemirî, cadokerên (Sîhirbaz) Fîreewn nedikarîn li beramberî Mûsa rawestin. Nalî dibêje:

*Şewemma kewkebey her kewkebî Nîlî felek detgut*

*Le Mîsrî rojî zînet destî Mûsay ibnî Eîmrane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 510)

Wate: Raste şeva Mîracê şev bû, lê şevê bû weke rojê ronî bû. Weke roja ku Hz. Mûsa, kûrê Îmran destê xwe dixist berîka xwe û derdixist, destê cado û cadogeran jinav dibir.

Di hevokek din de di derbarê şeva Mîracê ya Pêximber (S.A.S) de tê ser mijara Hz. Yaqûb û Hz. Yûsif. Çawa Hz. Yaqûb ji dûriya kurê xwe Yûsif, çavê wî kurr dibe. Ewqas giriya, çavê wî hemû spî bû. Şeva ku Pêximber (S.A.S) wefat kir, asîman û stêr spî bûn û weke çavê Hz. Yaqûb lê hatin. Nalî dibêje:

*Le hîcrî Yûsifî Mîracî, Yaeqûbî felek çawî*

*Nicûmî bû spî hêştaku her heyran û sehrane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 511)

Wate: Herwekî çawa çavê Hz. Yaqûb ji ber dûriya Hz. Yûsif kurr dibe û spî dibe, asîman jî ji ber dûrketina Pêximber (S.A.S) di şeva Mîracê û di nemana wî de kurr dibe. Asîman spî dibe û vaye stêr spî bûne, weke çavê ku ava spî jê bibare. Nalî di vê beytê de asîman şibandiye Hz. Yaqûb û şeva Mîracê jî şibandiye Hz. Yûsif. Stêrên li asîman jî

şibandiye çavên Hz. Yaqûb. Ev şibandin jî li ser wî bingehî daniye ku çavê Hz. Yaqûb ji ber dûriya Hz. Yûsif kurr û spî bûye.

Ji bilî van kesayetiyan Nalî, Xidirê zindî yê nayê dîtin dixwe nava helbestên xwe de. Ne yekem kese ku di derbarê Xidirê Zindî de zanyariyan bide me. Ji ber ev kesayetiye di mejiyê piraniya gelên Misilman de cihek diyar heye. Navek taybet e, lê di sûreta 'Kehif' û di ayeta 65 de behsa kesek naskirî dike, ku peywendî ligel Mûsa çêdike û dibêje:

"فَوَجَدَا عَبْدًا مِّنْعِبَادِنَا أَنْتَيْنَاهُ رَحْمَةً مِّنْ عِنْدِنَا وَ عَلَّمْنَاهُ مِمَّا لَدُنَّا عِلْمًا" (Qur-an El-Kehif:65)

Wate: Piştî li nêzî berekê bendek ji bendên me nas dike, me ji ber rehim û mîhrîbaniya xwe zanyariyên taybet fêr kiribû." (Ehmed K. M., 2012, s. 494) Lewra "Zana dibêjin, ew bende Xidir bû û Nebî (Pêximber) bû. Lê gelo heta niha zindiye û li ser erdê dijî, weke ku dibêjin Xidirê Zindî? Gelek kes bi belge di wê baweriyê de ne ku niha ne zindiye û nemaye." (Ehmed K. M., 2012, s. 494) Lê Seeîdî Newresî di wê baweriyê de ye ku dijî û nemiriye. Jiyana kiriye pênc pile, Xidirê Zindî di pileya duyemîn a jiyane de daniye û dibêje: "Hz. Xidir dijî, lê divê bê zanîn ku pênc pileyên jiyane hene û ew di pileya duyemîn de ye. Her ji ber vê yekê jî hinek ji zanayan gumana wan li ser jiyana Xidir hene. Çîna yekemîn a jiyane, ev jiyana me ye ku girêdayî gelek derfet û mercên taybet in. Çîna duyemîn a jiyane pileya duyemîn, Xidir û Îlyas in. Bi tevayî ne girêdayî merc û derfetên jiyana me ne û hinek azadî di nav de heye. Wate, dikarin di demekê de li gelek cihên jiyane amade bibin. Di warê xwarin û vexwarinê de jî çî dema bixwazin, serbest in. Ango ew weke me ne girêdayî pêdiviyên mirovan ên jiyane ne." (Seeîd, 1383, s. 5)

Qasî ku heye di mejiyê gelên Rojhilata Navîn de, di nava taybetmendiyên wan de ji nifşekê ji bo nifşek din hatiye veguhestin; "Ligel Tirk, Kurd û gelên Îranê cihekî wan ê diyar heye. Ligel Tirkan, ev kesayetî peywendî ligel cejnek netewî ve heye. Dema Xidirê Zindî serî hildide û birê dikeve, gij û giyayê hişt ê di bin piyê wî de şîn dibe. Destê xwe li çî bide, kesk dibe, xêr, xweşî û bereket li wî cihî belav dibe. Ligel Farisan û bi taybet jî ligel Şîeya, kesayetiya Xidirê Zindî ligel Îmamê Xayîb tevlihev dibe. Di nava tiştên ne diyar de jî, mizgêniya serdemek serfiraz ligel xwe tene. Ligel Kurdan weke kesî alîkar ê di şert û mercên taybet de tê danîn. Alîkariya feqîr, hejar û rêwiyên rêyên dûr dike. Yan jî her tê û weke îşaretekê tê, ava dibe û tenê armanca wî ewe ku Xweda bêne fikra wan ên ku ew ji bîr kirine. Herwiha emê fikra reng û rûyê wî yê di kelepûra

wênesaziyê de bikin, em xezîneyekê dibînin ku li beramberî wî wêneyî radiweste. Ew jî weke mirovekek baş ê Pêximber, weliyekê Xweda, rih spî û bi temen, rûyek nûranî, bi hêsanî jî rengê wî yê kesk li xeyalê me de dimîne." (Ehmedî, 2013, s. 225-226)

Naliyê helbestvan berhevkirin û xwe weke Xidir dîtin, dike taybetmendiya tekstên helbestên xwe. Bi wateya ku navanîna Xidirê Zindî, tenê ji bo wê yekê ye ku bigihe evîndara xwe, xwediyê heman deshilat û payeyê be ya ku Xidirê Zindî heyî. Lewra dibêje:

*Lêwî to hawî beqa min Xizirim*

*Feyzî to rehmet û min sewze giya* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 125)

Wate: Yara min a navdar, lêvên te kaniya ava heyatê ye. Ez jî Xidirê Zindî me û hatime min li ser av vexwariye. Bi ti awayî namirim, mîhrîbaniya te ligel barana rehmetê ye û ez jî giyayê kes kesk ê bûyera wê barana rehmetê me.

Di vê hevokê de bi eşkere, lêvên yara xwe weke ava heyatê dibîne. Biha û nirxê wê ava ku heyî ku Xidirê Zindî vexwarî, başbûna yara wî ya ligel wî weke giyayê kesk ê Xidirê Zindî ligel xwe tîne ye. Bi hatina wê jiyana ku Nalî behs dike, ligel yara xwe ne jiyaneke asayîye. Belkî armanca wî nemiriya ligel yara xwe ye. Nalî di kesayetiya Xidirê Zindî ya ku sembola nemiriyê ye, rê ji bo xeyalên xwe xweş dike, xwe di nav de bibîne û bi hêviya bigihe evîndara xwe. Lewra dibêje:

*Şikencî eerz û tulî pêçî zulfî bê serencame*

*Mesel tulî emel, eumrî Xizir, zincîrî sewdame* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 470)

Wate: Aloziya zulfî çeb bi çep û di aliyê panî û dirêjiyê de tişteke ku serî mirov ji nav dernakeve û di vî warî de nagihe encamekê. Lê ez jî hêviya xwe jê qut nakim û timî li benda wê yekê me di vî warî de tişteke bikeve destê min. Eger temenê Hz. Xidir bidin min ku dibêjin wê heta qiyametê bijî, tevî vê hêviyê jî weke zincîrê wê her min bi xwe ve girê bide û ji astengiyan dernakeve.

Nalî di hevokek din de dixwaze zûlfa evîndara xwe bike xwediyê heman deshilat û pileyê ya ku Xidirê Zindî heye. Ev jî wê yekê nîşan dide ku Nalî zêdetir derbirînê li rewşa veşartî dike. Bi kurtî armanca wî çêkirina rewşek helbestiyê û lewra dibêje:

*Serî zulfî ke rîştey eumrî Xizire, nîwe hedaye*

*Çi hewdaye? ke her helqey dû sed zincîrî sewdaye* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 556)

Wate: Serê zulfên te di dirêjîya xwe de weke temenê Hz. Xidir dirêje. Ewqas tenike û tû dibêjî nivê ta ye, ji tayê ziravtir e. Lê niv tayek çawa ye, niv tayek wisaye ku her badanekê karê du sed zincîrên dildariyê bandorê li dil dike.

### **3.4 Cih, Dem, Vexwarin, Kereste û Kelûpelên Ola Îslamê Weke Çavkaniya Helbestên Nalî**

Cih, dem, vexwarin, kereste, kelûpel û dirûstbûna pîroziyên ola Îslamê û Xwedayê Mezin e. Bi taybet jî yên xistine di nava kelûpelên Îslamê de, di berhemên Nalî de çavkaniyên giring in û tevî helbestên Nalî bûne. Ji bilî ku pîroziyên xwe ji bo dîtînen taybet xwe jî heye, ji ber cîhana van pîroziyan nîşan didin. Eger çavekê lez di hevokên helbestên Nalî de bigerînin, emê zû hest bi wê yekê bikin ku ev pîroziyên Îslamê cihek zêde di helbestên wî de girtiye. Armanca serekî ya ji vê sûdwergirtinê, van pîroziyane bibîrtîne, amojgarîkirin, pend wergirtin û nêzîkbûnê ku armance ji bo aqil, nîşan dana mijarên di warê fikir û ramanê de ye. Ji ber ku tiştên hest pê hatî kirin, baştir û zûtir di mejiyê mirovan de bi dih dibe. Zûtir wijdana mirovan pê aramtir dibe. Emê li vir werin ser hevokên ku Nalî sûd jê wergirtî û tevî helbestên xwe kirî.

Nalî tê ser mijara dû cihan û cihê pîroz ê Mekke û Medîne, ligel Misilmanan li ser erdê cihê herî pîroz e. Ji ber ku "Xwedayê Mezin Mekkeya Pîroz ji bo bingehdanîna mala xwe û cihê dayîkbûna Pêximberê dawî yê cîhanê hilbijart. Xwedayê Mezin li ser evdên xwe ferz kiriye Mekke û Medîne weke cihê îbadetê bibînin, ji dûr û nêzîk serdanê bikin. Pêwîste serşûrî, ser rûtî, xwe derxistin cilên cîhanê bên nav." (Mihemed E. E., 2009, s. 12) Bajarê Medîne yê Pîroz taybetmendiyên xwe yên taybet hene. Pêximber (S.A.S) dûa jêre kiriye û gotiye; "Ey Xwedayo ez daxwazê ji we dikim ku dû qasî Mekkehê bereket û xêrê birijîni ser Medîneya Nûranî de, bikî cihek pîroz." (Eebid El-Rehman, 2010, s. 490) Ev bajar pîroz e, timî cihê keyfxweşiya Pêximber (S.A.S) bû. "Dema ji geşteke vedigeriya, temaşeyî dîwarên bajarê Medîne dikir û hêştirên xwe leztir dikir. Eger siwarî hesp bibûya, ji bo heskirina Medîne zêdetir lez dikir û ji bo zûtir bigihe Medîne, leztir dikir." (Eebid El-Rehman, 2010, s. 491) Nalî derbarê van herdu bajarên pîroz de wiha dibêje:

*Wey ke rûzerdî Medîne û Ru syahî Meke xom*



*Derkiraw û derbeder, ya reb dexîlî eefûy tom (Dîwanî Nalî, 1976, s. 299)*

Wate: Hewar ji bo min rûzeriya Medineya bajarê goristana pîroz a Pêximber û rûreşiya Mekke, ez nikarim di nav de bijîm û ezê jê derbikevim. Ji xwe ez li van herdu bajarên pîroz namîn û ezê jê derbikevim. Ez derbider im. Divê li min biborî û li benda lêborîna te me.

Di vê hevokê de gelek bi ciwanî rewşa derûn û corê fikirîna Nalî ya di derbarê pîroziyên van herdu bajarên de derdikeve. Dema bi cih hiştî jî, xwe weke derkirî, aware, rûzer û rûreş dîtiye. Daxwaza bexşandinê dike ku nikare di nav de bimîne. "Ji ber ku Xwedayê Mezin, çend taybetmendî pêşkêşî bajarê Medîne kiriye. Bi awayek wisa ku xêra xwedaperestiya di van herdu mizgeftan de ji ya bajarên din zêdetir e." (Eebid Ei-Letîf, 2009, s. 87)

Nalî jî di hevokekê de tê ser Mekke û Medîne û dibêje, eger çi temenê te maye here li Medîne derbas bike û li Medîne bimre. Ji bo ew temenê te yê ji destê te çûyî û kêmasî di nav de bû, li van herdu bajarên jî îmanê te jî bike. dibêje:

*Baqîyey eumrî zaye ger muradit pê tedarek bê*

*Heyatî Mekke û Mewtî Medînet Cebrî nuqsane (Dîwanî Nalî, 1976, s. 484)*

Wate: Eger tû dixwazî bigihî wê dema ku temenê te mayî ku vaye hêdî-hêdî ji destê te diçe û hê bi temamî ji destê te neçûye, here wî temenî li Mekke derbas bike. Piştî jî here li Medîne bimre. Bi vê yekê hemû kêmasiyên îmana xwe te jî bike.

Di hevokek din de tê ser mijara bajarê Mekkeya Pîroz û bi awayekê dilhedîniya (dilnewayî) xwe dike. Dema ji wî cihê pîroz vedigere, ew kesek gunehbar e û li wî cihê pîroz gunehên te zêdetir û gunehbartir dibî; tû vegeerî baştîre. Lewra dibêje:

*Xewfî min lêre leber zorî gunahê yek be sed*

*Gerçî e asî û muznîmbim emma muqeyerr û bê dirom (Dîwanî Nalî, 1976, s. 304)*

Wate: Ez derewan nakim, ez îspat dikim ku ez gunehbar im. Eger tû gunehê li Mekkehê bikî, ligel Xwedaweke sed gunehan tê hêjmartin. Ez gelek ji gunehên xwe ditirsim û nikarim li vir bimînin.

Di hevokek din a helbestek din de tê ser mijara Medîne û goristana Pêximber (S.A.S). dibêje:

*Ey qubbeyî teybe ke dellêy huqqeyî teybî!*

*Meewayî hebîbî!*

*Miskênim û bo xakî eetr nake ke hatûm*

*Bew bonewe hatim (Dîwanî Nalî, 1976, s. 266)*

Wate: Ew gumeziya (tabût) goristan û mizgefta Pêximber a li bajarê Medîne ku tû dibêjî sindoqa bêhn xweşiyê ya laşê Pêximber a di nava xakê de. Tû cihê heskirina minî ku Pêximbere, ez jî feqîrek bê xak im. Ez ji bo vê xaka bêhnxweş hatime, bêhna vê xakê bala min kêşaye û ji bo vê xaka etrawîhatime. Di hevokek din de tê ser mijara mijara Mekke û dibêje:

*Çi cezbe? Cezbeyî zewe le qîndîlî heremda, wa*

*Debê însan le tewafîda bisutê mîslî perwane (Dîwanî Nalî, 1976, s. 501)*

Wate: Ev çi hêzeke ku Mekke heyî û bala xelkê dikêşe? Hêza balkêşan wê balkêşanê di çiraya herem de heye. Karekê dike, mirov li derdorê bizirin û weke perwaneyê bizivire.

Nalî behsa dû cihên din ên pîroz dike. Ew jî Sefa û Merwaye. Meşîna di nav de "Ruknê (erkê) pêncemîn ê hecê ye, heft caran li derdora Sefa û Merwe de Pêximber (S.A.S) gotiye, ev xelkîno çûyîne hatinêa di navbera Sefa û Merwe bikin. Ji ber ku Xwedayê Mezin li ser we ferz kiriye." (Eebid El-Rehman, 2010, s. 326) Xwedayê Mezin jî dibêje:

"إِنَّ الصَّغَا وَالْمَرْوَةَ مِنَ شَعَائِرِ اللَّهِ" (Qur-an El-Beqere:158)

Wate: "Sefa û Merwa yek ji dirûşmeyên ola Xweda ne." (Ehmed K. M., 2012, s. 46) Nalî jî dibêje:

*Fuyuzatî (sefa) û (merwe) her wek naw dan dem dem*

*Le yenbuey dillî pir zemzemey mîzabeî carî bê (Dîwanî Nalî, 1976, s. 635)*

Wate: Ya Xwedê lehiya bereketa 'Sefa' û 'Merwa'pêl bi pêl weke derketina ji ava kaniyan dilê tejî nûr û soza nûra rûbar de biherike.

Di peyva 'Zemzeme' de bal kişandiye ser ava Zemzemê kiriye ku bîreke li Mekkeye û "Ava wê ava herî baş a li ser erdê ye. Ji ber Hz. Cibraîl ew av derketiye û li cihê herî pîroz li ser zeviyê derketiye. Herwiha ji carekê zêdetir dilê pîroz ê Pêximber pê şûştiye." (Eebid El-Rehman, 2010, s. 315)

Nalî tê ser mijara cihek din ê pîroz ku ew jî mizgeft e; "Ligel Xwedayê Mezin mizgeft li ser erdê cihê herî pîroz û heskiriye. Kelha îmanê ye. Fêrgeha yekemîne ku Misilman di nav de perwerde dibînin û digihin armanca xwe. Ew jî bi bidestxistina îmanê ye, cih û menzîla xweparastinê ye. Cihê civîn û kombûna rojaneye. Cihê şîret û guhertina dîtinane. Navenda nasîna hev, heskirin û birayetî di nav de tê peyrew kirin. Li ser karên xêr hemfikir in." (Xeyr El-Dîn, 2007, s. 11) Yek ji taybetmendiyan ku Xwedayê Mezin pêşkêşî umeta Îslamê kirî, ewe ku ev zevî ji bo paqijî û xwedaperestiyê kiriye mizgeft. Yekemîn mizgefta hatî avakirin jî mizgefta Ebû Zer e. Dibêje: "Min ji Pêximber pirsî, kîjan mizgefte yekemîn car li ser rûyê erdê hatî çêkirin? Got, 'Mescîd û Leheram ango Mekke' ye. Min gotê, gelo piştî wê kîjan mizgeft hatiye çêkirin? Gotî, Mescîdul Eqsa." (Zekî El-Dîn, 2010, s. 305)

Di Îslamê de sê mizgeft hene ku taybetmendiyan xwe hene ku nimêj û îbadet di nav de cûda ne. Pêximber (S.A.S) derbarê mizgeftên herî baş a ên li ser rûyê erdê jî wiha dibêje: "Barge ji bo sê mizgeftan nayê pêçan, ew jî mizgefta Heram a li bajarê Mekke, mizgefta Pêximber a li bajarê Medîne û mizgefta Eqsa ya li bajarê Qudsê. Nimêjek di mizgefta Heram de bê kirin, ji nimêjek di mizgefta min de bê kirin sed caran baştir e." (Seyid, 2007, s. 406)Nalî tê ser mijara Mizgefta Pêximber (S.A.S) û dibêje:

*Ey Mescîd û mîhrabgeht qibley hecat*

*Bo ehli munacat*

*Mehbubî hewam û emete meşhedî meelum*

*Bo rahî necatim (Dîwanî Nalî, 1976, s. 269)*

Wate: Ey Pêximber ew kesên ku pêwîstiya wan bi mizgeft û mîhraba te hene, ji hemû aliyan ve berê xwe didinê û di nav de duayan ji Xweda dikin. Ez jî yek ji wan im û şermizarê hêviya nefsê me û hatime vir, vir ewcihe ku rêya rizgarî û serfiraziyê lê dîtin e.

Di hevokek din de tê ser mijara mizgeftan û dibêje, ev cîhan cihê kiryara mirovan e û mirov tenê dikare bi kiryarên baş serbikeve. Dema tû di hundirê mizgeftê de bî, ji ber ku "Ligel Xwedayê Mezin li cîhanê cihê herî zêde tê heskirin mizgeft in. Herwiha ligel Xwedayê Mezin cihê herî nexweş ê welat jî bazar in. Ji ber ku wir cihê fêl, derew û sondên derew e." (Zekî El-Dîn, 2010, s. 309) *Nalî jî dibêje:*

*Em erze mezreey eemele û kulxenî emel*

*Hendî buwe be mescîd û hendî be mezbele* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 467)

Wate: Ev cîhan cihê kiryarane ku mirov di nav de ji bo hêvî û daxwazên xweperestiyê serbikeve, hinek cihên weke mizgeftê wisa pîroz hene û hinek cihên weke zibilxane jî hene ku gelek pîs in.

Nalî di derbarê cihên pîroz ên li ser erdê ranaweste, tê ser dû cihên din ên Xwedayê Mezin li ser vê cîhanê çêkirî. Diyarî dide kesên baş û dike xwediyê pileyên timî. Yê xirab jî ceza dike û li dojhê bi cih dike. Biheşt "Naveke taybet ê wî cihê tejt mezinahî û xweşî heye ku Xwedayê Mezin ji bo mirovên baş çêkiriye." (Mihemed F. Ş., 2009a, s. 6) Pile û dergah ji bo çûyîna hundir û niştecihbûna kesên ku li gor kiryarên xwe yê hêjayî wê yekê ne heye. Nalî behsa biheştê dike, dixê di nava helbestên xwe û sûdê jê dibîne. Di derbarê sîhbera Pêximber (S.A.S) de dibêje:

*Ew sêbere ke qurbbeyî fîrdewsî baqiye*

*Ew sêbere ke xêwetî sehray mehşere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 424)

Wate: Sîhbera Pêximber ew sîhbera ku bûye gumeza li ser biheştê, bû sêwanek li ser hemû xelkên li sehraya mehşerê di roja qiyametê de kom dibin.

Di vê hevoka jor de behsa fîrdewsê hatiye kirin ku yek ji navên biheştêye û Xwedayê Mezin dibêje:

"إِنَّ الَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ كَانَتْ لَهُمْ جَنَّاتُ الْفِرْدَوْسِ نُزُلًا" (Qur-an El-Kehif: 107)

Wate: "Bêguman ên ku îman û bawerî pê anîne û karên baş kirine, me ji zû de baxçeyên fîrdews kirine cihê hewandina wan." (Ehmed K. M., 2012, s. 501) Di hevokek din de jî dibêje:

*Layêkî keş le cenet û rîzwan tedareke*

*horî awa be mûntezîrî dêne menzere* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 442)

Wate: Li aliyekê li biheştê ji bo pêşwazîkirina kesên tên biheştê, dergehvanê biheştê amadeye û dergeh vedike. Hûrî jî benda xwediyên xwe ne û ji bo bi hev keyfxweş bibin.

Di hevokek din jî rumeta (Berçavê) evîndara xwe weke biheştê binav dike û nîşanên li rûyê wê jî wi libên genim daniye yên ku Hz. Adem li biheştê xwarî û li ser wê ji biheştê hatî derxistin. Di vê hevokê de sûd ji serpêhatiyên Hz. Adem wergirtiye û dibêje:

*Xalit çiyê? Daney genimî cenetî rûte*

*Çawit çiyê? Fîtney heremî qibley ebro* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 386)

Wate: Rûmeta te biheşte û nîşana te jî serpêhatiya genimê ku Hz. Adem li biheştê xwarî û li ser wê ji biheştê hatî derxistin e. Lewra her kesê destê xwe bavêje ser xala li ser piştê memikên te (gona) tû derdixî, ji hevdfîtina biheştê xwe bêpar dikî û dixî di bin piyê xwe de. Birhên te jî qible ye, çavên te ji bo kesên tên serdana te dibe sedem ku mirov li ser dînê xwe biçê. Divê agehdariya wan ji wan hebe ku çavên te wan mest û serxweş neke.

Di hevokek din de jî evîndara xwe şibandiya hûriyên biheştê. Dema ew bibe nesîbê yekê, wê dest ji dinyayê berde. Wekî çawa kesên ji bo biheştê û hûriyan, dest ji cîhana demî berdan û hemûyan dest ji vê cîhanê berdane. Nalî dibêje:

*Bo to ke bîkir û taze, weku horî cenetî*

*Qeydî çiyê eecuzeyî dunya bidem tellaq* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 249)

Wate: Tû ji bo min beramberî hemû cîhanê yî. Ma çi di nav de ye eger ji bo keçek weke te weke hûriya biheştê û dest ji cîhanê berdim, ligel min weke pîrejinekê ye. Di hevokek din de dibêje:

*Ger ab û tabî cenetî û dozexît dewê*

*Binware nêw çawanî be şuş û birooy eebus* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 240)

Wate: Eger tû bixwazî çavê te li nav çavê hênîk ê mirovên biheştî û nav çavê mirovên dogehê bikeve, temaşeyî mirovên nav çavê wan keyfxweş û mirovên rûtirş bike. Rûxweşî nîşana biheştî û rûtirşî jî nîşana dozexiyê ye.

Weke me behs kirî, Nalî di hevokên helbestên xwe de behsa dogehê kiriye û ew jî ji aliyê Xwedayê Mezin ve hatiye çêkirin. "Ji dûr ve weke deryayek paqij û fireh diyar dike, pêlên wê li ser pêlan de tîn. Lê dema nêzîk dibî, wê demê dizanî ew ne pêla deryayê ye, belkî pêla agir e." (Mihemed F. Ş., Dozex le Que-an û Fermude Sehîhekanda, 2009b, s. 9) Xwedayê Mezin jî dibêje:

"إِنهَا تَرْمِي بِشَرِّرٍ كَالْقَصْرِ (32) كَأَنَّهُ جِمَالَتٌ صُفْرٌ" (33) (Qur-an El-Mursilat:32-33)

Wate: "Ew agir wisa pirîskan tavêje, tû dibêjî koşk û avahiyên mezin in. Tû dibêjî hêştirên berg zerin, dema dikevin rêzê û yek li pey yekê li ser rê dimeşin, ew pirîsk jî her wisa li pey hev rêz dibin û berê xwe didin dogehê." (Ehmed K. M., 2012, s. 932) Nalî agirê dilê xwe weke agirê dogehê dibîne, tevî ku digirî û rondik ji çavên wî dibarin, ev rondik agirê dilê wî venamirîne. dibêje:

*Aw le çawanim be xurr dê agirî dill nakujêtewe*

*Wek cehenem em tenure awî tofanî dewê* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 702)

Wate: Timî çavên min li rojê ne û rondik jê dibarin. Ligel vê yekê jî agirê dilê min venamire. Wisa diyare tenezûliya dilê min ewqas bi têhne, di asta agirê dogehê de bi girî û rondikan çareser nabe. Pêwîstî bi tofaneke weke tofana Nûh heye ku rabe û vemirîne. Di hevokek din de dibêje:

*Melên kelkî nebû roy cehenem*

*Serim qelxane bo tîrî qezatan* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 318)

Wate: Nebêjin ti sûdê Nalî nebû û divê biçe dogehê, tevî ku ligel min xirab bûn û li benda çûyîna min bûm, ez her dilsozim û ezê serê xwe ji bo tîra qeza û qederê neyê we, ezê xwe bikim mertal.

Nalî behsa demên pîroz ên di ola Îslamê de dike û di helbestên xwe de bikaraniye. Weke çavkaniya helbestê sûd jê wergirtiye. Di mijara hatina ola Îslamê û Pêximber (S.A.S) de dibêje:

*Le ser ew zulmet abadî şewî kufre ke talîe bû*

*Sella hesta le înis û can ke rojî nûrî îmane (Dîwanî Nalî, 1976, s. 505)*

Wate: Di tarîtiya şevê kafirî de nûra Pêximber derket, bangewaziya şandmanî ji mirov û perên ber bûye. Îro roja nûra îmanê ye û vaye roja Misilmanan derket.

Nalî di vê hevokê de sûd ji wê yekê dîtiye ku Pêximber (S.A.S) ji bo hemû mirovatiyê rehmete. Xwedayê mezin jî dibêje:

"وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا كَافَّةً لِّلنَّاسِ بَشِيرًا وَنَذِيرًا وَلَكِنَّ أَكْثَرَ النَّاسِ لَا يَعْلَمُونَ" (Qur-an Sebei:28)

Wate: "Ey Mohemmed me tû kirî Pêximber û me tû ji bo hemû mirovatiyê şandiye. Rêya rast û baş nîşa wan bidî û mizgênîyê bidî, ji bo xiraban jî tirsîner bî. Lê piraniya wî xelkî ji ber bê mejîtiya xwe, ji rewşa te bê agehîne." (Ehmed K. M., 2012, s. 697)

Nalî behsa demek din a pîroz dike, ew jî şeva mîracê ya Pêximber (S.A.S) di wê demê de di rewşek nexweş de bû. Ji ber "Hevjîna wî Hedîce koça dawî kiribû û Mamê wî Ebû Talib ê piştgirî û alîkariya wî jî dikir, koça dawî kir. Herwiha li taîfê jî ew ceza û îşkence dît, gelek dilgiran bû. Di wê rewşê de Xwedayê Mezin xwest dilxweşiya Pêximberê xwe bike û wisa lê bike ku zêdetir li ser banga xwe germ û berdewamtir be. Ji bo vê armancê jî Xwedayê Mezin, Cibraîl şand pey û ji bo di şevê de ji Mekkehê bêne Qudsê û ji wir jî bibe asîman. Ji bo xizmeta Xwedayê mezin û mîhrîban. Ji bo nîşan û ayetên Xwedayê Mezin zêdetir jêre derbikevin." (Hesen E.-M. , 1999, s. 45)

Di hevokekê de tê ser mijara ku şeva Pêximber (S.A.S) sefera ji bo aliyê Xwedayê Mezin kirî. Hûrîtiyek gelek ji bo wê dema pîroz kiriye. Ji ber ku Qur-an bi xwe mûcîzeyê û mîrac jî her mûcîzeyê. Behsa mûcîzeyê di nava mûcîze û wê dema pîroz de dike. Nalî dibêje:

*Le cumley muecîz ender muecîzî ehkamî qur-ane*

*Ke mîracî bulindî ew welî ayetî 'Subhan' e (Dîwanî Nalî, 1976, s. 508)*

Wate: Yek ji mûcîzeyên Qur-anê ewe ku behsa mîraca bilind a Pêximber û çûna wî ya ji bo asîman dike. Ayeta yekemîn ji sûreta 'Esrî' bi 'Sibhan Ellezî Esrî' destpê dike.

Di hevokek din de di derbarê şeva pîroz a Mîhracê ya Pêximber (S.A.S) roja cejna Qurbanê ya di ola Îslamê de cejnek pîroze û qurban di nav de tê kirin. Demek cûda ye û her wê demê qurban tên kirin, "Şerte ku qurban piştî nimêja cejna Qurbanê bê serjêkirin. Her kesê berî nimêja cejna Qurbanê serê qurban jê bike, jêre nayê hesibandin." (Mihemed E.-R. L., 2005, s. 18) Nalî jî behsa wan demên pîroz dike û dibêje:

*Şewemima, şew çiraxî cedî û sewr û merteeî şamî*

*Dû sed qernî xezale û qoçî subhî, eîdî qurbane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 509)

Wate: Şeva ku Pêximber çûyî Mîracê, raste şev bû, lê çawa şevê bû stêra şevçiraya weke 'Cedî û Sewr.' Li vir 'Sewr' tê wateya 'Ga' ku şîroveya şaxê qurban û cejna Qurbanê, xweşî û stêran di asta ronahiyê de wê şeva mîhracê dused caran bûn qurbanî.

Nalî di vê hevokê de behsa sê demên pîroz kiriye ku şeva Mîracê Pêximber (S.A.S) roja cejna Qur-anê û qurbanîkirinê jî demeke xwe ya diyarkirî heye. Mirov dikare di rojên cejna Qurbanê de sûd ji van demên pîroz wergire. Di hinek peyvan de du wateyên armanc bûn, di peyvekê de hatiye bidestxistin.

Di hevokek din de behsa du demên din dike, ew jî şeva Qedir û roja Cejna Qur-anê ne. Şeva Qedir di şevên salê de şeva herî pîroz e. Xwedayê Mezin wiha dibêje:

Qur-an El-) "إِنَّا أَنْزَلْنَاهُ فِي لَيْلَةِ الْقَدْرِ (1) وَمَا أَدْرَاكَ مَا لَيْلَةُ الْقَدْرِ (2) لَيْلَةُ الْقَدْرِ خَيْرٌ مِنْ أَلْفِ شَهْرٍ (3)"

(Qedir:1-2-3)

Wate: "Me Qur-an di şeva Qedir de şandiye jêr. Ey Mohemmed tû nizanî şeva Qedir çiyê? Xêra şeva Qedir ji xêra hezar mehan giringtir e. Di wê şevê de karên pîroz ên weke, nimêj kirin, Qur-an xwendin û zikrê Xweda tê kirin." (Ehmed K. M., 2012, s. 967) Nalî sûd ji van deman wergirtiye û rûmeta evîndara xwe bi wê mumê datîne ku di şeva qedir de pêkirî. Zilfa wê jî şeva Qedire, singê wê weke minareya Mekke ye û xwe jî weke qurbanê wê daniye. Nalî dibêje:

*Rûmetit şemeî şewî qedre, dillim perwaneye*

*Nehrî mînay rojî eîde, rohekem qurbanîye* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 590)



Wate: Rûmeta te weke momê ye û di şeva Qedir tê pêxistin. Şeva Qadrê jî rûyê te ye, dilê min jî perwaneye û di derdora moma rûyê te de dizivire. Singê te weke mîna Mekkeye û di roja cejna Qurbanê de heywan tên serjêkirin. Ji bo qurbaniya min jî ya di mîna singê te de, ezê bibim qurbanî.

Di helbestên Nalî de bi awayek baldar sûd ji kereste, kelûpel, vexwarin û pîrozên ola Îslamê werdigire û bikartîne. Nalî qedrê bikaranîna wan tiştên bikaranîyî dizane û nikare xwe bêdeng bike. Dixwaze bi wê rêyê behsa giringî û mezinahiya Îslamê bike. Di hevokekê de tê ser mijara Medîne ku çend bajarek pîroz e, xaka wê weke gulê ye û ava wê weke ava kewserê ye. "Ji hingvîn şîrîntire, ji şîr spîrtire, bêhna wê ji ya miskê xweştire û her kesê firekê jê vexwe, bi ti awayî têhn nabe." (Mihemed F. Ş., Beheşt le Qur-an û Fermude Sehîhekanda, 2009a, s. 82) Nalî dibêje:

*Teybe ke yeenî teyb û tahîr be rewhî roh*

*Ferqî elên gillî le gull, awî le kewserê* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 418)

Wate: Barê Medîne bajarek paqije, heta navê wê jî wê yekê radigihîne ku ji bereketa Pêximber ve paq û paqije. Cûdahiya wê ya ji cihên din ewe ku xaka wê weke gulê ye û ava wê weke hewza Kewserê ye. *Di hevokek din de wiha dibêje:*

*Be nehrî kewser û şîr û eesel çend tînûwe softî*

*Lebî Nalî dû çendan bo lebanî leelî mûştage* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 457)

Wate: Sofî çend têhniya ava xewza Kewserê, şîr û hingvîne biheştê ye. Lêvên Nalî du caran bi qasî vê têhniya lêvên sor ên yarê ye.

Nalî ji bilî ava kewserê behsa ava zezemê jî dike. Ew jî bîrek li Mekkeyêye ku xelk ji ber pîroze, avê wê vedixwe û hecî wê avê tînîn welatê xwe. Ji ber ku "Ava zezem çavkaniya avane, ya herî birêze û ji hemûyan jî giringtir e ji hemû nefsan heskirîtir û binirxtir e. Ji hemûyan zêdetir ligel xelkê zêdetir cihê rêzdariyê ye. Cibraîl piyên xwe bilind kir û li erdê da, ava zezemê derketiye. Ew av bû ya Xwedayê Mezin ji bo vexwarina Îsmâil derxistî." (Ibin Qeyim, 2012, s. 587) Bi baweriya zanyaran. "Eger ava zezem ji bo welatek din bê veguhestin, bê dayîna nexweş û kesên din, ji ber ku Pêximber (S.A.S) ava zezem veguhestiye û dida xelkê, bi taybet bi serê nexweşan de fikir û dixist nava devê wan de." (Eebid El-Rehman, 2010, s. 320) Nalî dibêje:

*Saf û rewan û nerme wekû Zemzem û Furat*

*Nek rengî Nile yeenî ke hat û gerayewe (Dîwanî Nalî, 1976, s. 554)*

Wate: Çavkaniyên teqiyane, ava wan zelal û ji bo gedeyê bi sûde; weke ava Zemzem û Firatê pîroz û paqij e. Ne weke ava Nîlê şêloye. Dema tê hildiçe, piştire rûdine û vedigere rewşa xwe ya berê.

Di hevokê din de jî tê li ser gunehbariyên xwe yên dema li Mekkeyê. Di wê baweriyê de ye ku ewqas gunehbar e, ava sed bîrên zemzemê kêmek ji gunehên deftera wê naşo. Lê li aliyekî din jî bi wê yekê keyfxweşe ku dilopeke rehma Xweda têra rakirina hemû gunehên wî dike. Di vê hevokê de çend hûrîtiyên biçûk kiriye û dibêje:

*Defterî eemalî min, bê qetreyêkî rehmetit*

*Key be sed zemzem sîyahî nuqtayêkî lê deşom (Dîwanî Nalî, 1976, s. 300)*

Wate: Xwedêyo çima li Mekkeyê bimînim! Deftera kiryarên min teji guneh e, bi sed avên zemzemê nayê paqijkirin. Hemû tişt girêdayî rehmeta we ye, rehmeta te jî çi li vir ku Mekkeye û çi jî li her cihekî din wekheve. Di hevokê din de wiha dibêje:

*Be melahetî tekellum hemû zemzem û melîhî*

*Be fesahet û tebesum hemû kewser û zulallî (Dîwanî Nalî, 1976, s. 660)*

Wate: Devê yarê di warê xweşî û tama gotinan de, tû dibêjî ava Zemzemê yê di nav de. Di derbarê gotinên sade, nasik û dev bi ken ve, lîwa wî weke kenarên hewza Kewserê ye.

Nalî behsa 'Buraq' dike, piraniya şîretvanan dibêjin, hespekî bi bask bû. Pêximberê (S.A.S) di şeva Mîracê de pê çûye Qudsê û li wir jî ji bo xizmeta Xwedayê Mezin çûye asîman. Lê ligel hinekan firîşteyek bi bask bû; "Dema Pêximber (S.A.S) li mal bû û Cibraîl hat gel, jêre got ku divê bi tenê bêyî û em biçin Qudsê. Ji wir jî biçin welatê Xwedayê Mezin. Cibraîl û Pêximber (S.A.S) bi tenê neçûn, belkî firîşte jî ligel wan bûn û baskên wan hebûn. Pêximber (S.A.S) siwarî firîştî bû, ew firîşteyê rêzdar navê wî Buraq bû ku Pêximber (S.A.S) biribû Qudsê û ji wir jî biribû asîman." (Nîhad, 2013, s. 77-78) Nalî di behsa Buraq de dibêje:

*Ke Medeuy lazeman û lamekan û qurbî bêçûnî*

*Siwar be lem biwareqe barîqe, lem rexşe rexşane* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 514)

Wate: Ey Pêximberê Xweda, hûn ji aliyê Xweda ve hatine bangkirin, ne di dem û ne jî di cih de nêzîkbûnek we ya wiha nîne. Ango fermû siwarî baskê Buraq bibe.

Nalî behsa "Lewh el-Mehfuz- لُوْحَالْمَحْفُوزِ " dike û ew textê ku her çî tiştê di cîhanê de çêbibe, bi zanista Xweda di nav de hatiye nivîsandin. Xwedayê Mezin bi xwe wiha dibêje:

"أَلَمْ تَعْلَمْ أَنَّ اللَّهَ يَعْلَمُ مَا فِي السَّمَاءِ وَالْأَرْضِ إِنَّ ذَلِكَ فِي كِتَابٍ إِنَّ ذَلِكَ عَلَى اللَّهِ يَسِيرٌ" (Qur-an El-

Hec:70)

Wate: "Te nezaniye ey mirovê jîr, her çî tiştê li asîman û li erdê ye, agehdariya Xweda jê heye û dizane? Ango her ew bi tenê ji wan tiştan agehdare û cûdahiya we ji wan heye. Ji ber ku bi rastî ew tişt hemû di 'Lewh el-Mehfuz' de hatine tomarkirin û bê guman ev kar jî ji bo Xweda gelek hêsane." (Ehmed K. M., 2012, s. 557) Nalî di derbarê 'Lewh el-Mehfuz' de wiha dibêje:

*Zahîr û batîn le ser lewhî heqîqet ya mecaz*

*Aşnay sîrrî qellem bê xeyrî Nalî kes nema* (Dîwanî Nalî, 1976, s. 131)

Wate: Yê bi eşkere yan jî veşartî agehiya wî ji niyeta pêûsê be, navê wî li ser textê rastî yê tomarkirinê hatiye nivîsandin û di zanista Xwedê de heye. Li ser textê vê cîhanê jî, ji Nalî û pêve ti kes nemaye agehiya wî ji wê yekê hebe ku çawa hinek karên ne di cih de û belav dikin.

Nalî behsa darên îrak dike ku ji baskên darên sîwakê tê çêkirin: "Ev dar li navçeyên sehrayan gelek zêde hene û li navçeyên çiyayî pir kêmtê dîtin. Hewaya germ ji bo van daran ciheke guncaw e. Dara îrak weke dara hinarê ye û di hemû werzan de şîn e. Yek ji darên kurt e û bilindahiya wan di navbera 2-5 metreyan de ye. Şaxên wê zirav û girover in." (Ehmed H. X., 2008, s. 12) Pêximber (S.A.S) di derbarê dara sîwak de wiha dibêje: "Eger li ser ûmeta min ne giran be, minê ferman daba ligel her dest nimêj girtinê de bikarbînin." (Ehmed H. X., 2008, s. 10)

Nalî jî dibêje:

*Darî îrak û darî Hind her dû ke eude îsmyan*

*Hemdemî sunnete ewem meylî Ebû leheb deka (Dîwanî Nalî, 1976, s. 98)*

Wate: Temaşeyî dara îrak û dara Hind bikin, herdu jî darên adetîne. Yek ji wan sunneta Pêximber pê tê cîbicîkirin, ya li aliyê Ebû Leheb ve diçe jî dişewitîne û ji bo êşkişandina Misilmanan tê bikaranîn.



## Encam

Em di encama lêkolîna xwe de gihiştine van encamên jêr:

Xidrî Kurê Ehmedê Şawey Nalî Begê Nalî Begê Mîkayîlî yek ji cemserên wêjeya klasîkiya Kurdî ya bi zaraveyê Soranî li navçeya Silêmaniyê ye. Nasnavê wî Naliye. Li gundê Xak û Xolî yê navçeya Şarezûr di derdora sala 1979'ê zayînî ji dayîk bûye.

Wêjeya klasîk a Kurdî bi awayek berfireh di bin bandora ola Îslamê de bû. Ji bo vê armancê jî gelek wêne û taybetmendî ji ola Îslamê wergirtiye û di bingehe tekstên helbesta klasîkî de hatiye bikaranîn.

Nalî kesayetiyek ayînî bû û ji bo xwendinê ligel navçeyên Kurdistanê geriyaye. Herwiha welatên li derdora Kurdistanê yên weke; Îran, Şam, Tirkiye û Erebiştana Siûdî dîtiye. Vê yekê jî wisa kiriye ku zêdetir bikeve di bin bandora ola Îslamê ya Pîro de.

Nalî di naveroka helbestên xwe de gelek mijarên cûr bi cûr şîrove kiriye. Ji wan jî; “Evîndarî, wesfî, ayînî, niştîmanî û civakî.”

Zimanek regeeke serekî ya helbestan e. Nalî jî di peyrewkirin û bikaranîna ziman de, awayekî wî yê taybet hebû. Tevî ku zimanên weke; Farişî, Erebi û Tirkî di bingehe tekstên helbestên xwe de bikaraniye ligel vê yekê jî timî şanazî (serbilind) bi zimanê xwe kiriye.

Di warê rêbaza helbestê de sûd ji qafîye û redîfên Erebi wergirtiye. Wate li ser qafîye û redîfên Erebi bingehe daniye û giringiyek zêde daye peyvan. Vê yekê jî di qafîye û redîfên Erebi de giringiya xwe heye.

Helbestên Nalî xwediyê awazek ciwan in, bi endazeyek giring a bi peyv û xemilandina awazên helbestan daniye. Ew jî bi rêya çend teknîkên weke dûbarekirina deng, peyv, paş û pêşxistina peyvan. Lewra tiştêk asayîye bê gotin ku Nalî pêşengê helbestvanên klasîkiya Kurdî bû.

Peywendiyên navbera ol û wêjeyê de peywendiyek aloz e, di berdewamiya dîrokê de cihê gotin û behsan e. Bala gelek kesan kêşaye ser xwe. Ji ber ku berî Îslamiyetê jî helbest hebû. Eşîrên Erebi bi helbestvanên xwe serbilind bûn. Di wê serdemê de jî helbest weke çekek bibandor a di şer û hevrikiyan de hatiye bikaranîn. Bi hatina ola Îslamê re jî zêdetir axaftin li ser hat kirin. Helwesta Îslamê jî li ser hebû, heta

Xwedayê Mezin di Qur-anê de behsa helbestê kiriye. Pêximber (S.A.S) jî gotina wî li ser helbest û helbestvanan hebû.

Di wêjeya Kurdî de ola Îslamê cihek giring û diyar hebû. Ev jî ji bo wê yekê vedigere ku xelkê Kurdistanê girêdayî ola Îslamê bûn. Helbesta klasîka Kurdî jî xwediyê hizir û fikirîna wan helbestvananeye ku mela bûn, perwerdeya mizgeft û hucreyan dîtine. Herwiha zêdetir bandora fikra Îslamî li ser hebû.

Taybetmendiyan ku di helbestên Nalî de tên dîtin, weke xwedî, rêbaz û dibistanekê tên binavkirin. Ji ber ku piraniya helbestvanên mezin ên Kurdî yên di dema Nalî û piştî wî jî di helbestên wan de rengê helbestên Nalî cih girtiye. Wate, Nalî ji bo wan çavkaniyek bû û ev bandor jî di wêjeya Kurdî bi mezinî tê dîtin. Ev bandor jî bi belge û mînak ligel helbestvanan diyar e û di helbestên xwe de behsa Nalî kirine.

Nalî weke her helbestvanek klasîk ên Rojhilatî, Qur-an bi giştî, gotinên Pêximber (S.A.S) û kelûpelên ayîn ji bo wan çavkaniya îlhamê ne û di helbestên xwe de bikaranîne

## Çavkanî

Qur-anî Pîroz

Ako, Ş. (2008). *Şarî Slêmanî* (Yekemîn ed.). Slêmanî: Tîşk.

Avan, E. M. (2012). *Çinîni Deq le Şeirî Nalîda*. Slêmanî: Kemal.

Avan, E. M. (2013). *Ferhengî Şeirekanî Salim Leber Roşnayî Edebî Farsîda*. Slêmanî: Kemal.

Aware. (1985). *Namey Jyan Dû Çamekey Kemalî û Natq le Jêr Tîşkî Dû Çamekey Nalî û Salmda*. Baxdad: Îrşad.

Azad, E. M. (2009). *Bunyatî Zimanî le Şeirî Hawçerxî Kurdîda* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Hacî Haşm.

Birahîm, E. Ş. (2001). *Sofîgerî* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Wezaretî Perwerde.

Cebar, E. H. (2008). *Îstatîkay Deqî Şeirî Kurdî*. Slêmanî: Serdem.

Ceefer, E. R. (2004). *Nasyonalîzim û Nasyonalîzmî Kurdî*. Slêmanî: Renic.

Ceefer, E. R. (2008). *Sofîzim û Karîgerî le Bizutnewey Rizgarî Xazî Neteweyî Geli Kurdda*. Slêmanî: Tîşik.

Cemal, H. (2013). *Derwazey Şeir Nasîn* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Narîn.

Cemal, H. (2013). *Derwazey Şeir Nasîn* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Narîn.

Cemal, M. (1980a). *Dîwanî Xadîm* (Vol. I). Bexdad: Dar El-Hrîye Liltbaee.

Cemal, S. (2007). *Mem û Zînî Ehmedî Xanî* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Aras.

Cemel, S. (2007). *Dîwanî Ahmedî Xanî*. Hewlêr: Aras.

Dilşad, E. (2004, Huzeyranî). Nalî le Baziney Taqî Kirdnewe Şeirîyekey Kirmancî Xwaruda. *Zankoî Slêmanî*(14), 39-62.

Dilşad, E. (2711, Newrozî). Nalî Xorêk Hemîşe be Ser Sermanewe. *Rovar*(64), 2-7.

Ebdûlkerîm, M. (1976). *Dîwanî Nalî*. (E. Fatîh, Dü.) Bexdad: Korî Zanyarî Kurd.

Edonîs. (2008). *Deqî Qur-an û Asokanî Nusîn* (Yekemîn ed.). (E. Omêd, Trans.) Dihok: Xanî.

Eebdûlkerîm, M. (1378). *Dîwanî Mewlewî*. Kurdistan.

Eebdûlkerîm, M. (1985). *Dîwanî Mehwî* (Duyemîn ed.). (K. Mhemed, Trans.) Ofistî Hisam.

Eebdûlkerîm, M. (20015a). *Dîwanî Salîm* (Vol. I). (F. Eebdûlkerîm, Ed.) Slêmanî: Jîn.

- Eebdülkerîm, M. (2015). *Dîwanî Kurdî* (Vol. I). (E. Fatîh, Ed.) Slêmanî: Jîn.
- Eebdülkerîm, M. (2015b). *Dîwanî Salim* (Vol. II). (E. Fatîh, Ed.) Slêmanî: Jîn.
- Eebdulla, E. M. (2001). *Mesned Imam Bin Henbel*. (E.-M. E.-T. Eebdulla, Ed.) Muesese El-Risale.
- Eebdûlla, H. (2009). Jyanamey Nalî. *Nalî Her le Lutkedaya*, 25-46.
- Eebdûlla, X. M. (2007). *Lêkolîneweyek le Şeire Aynî û Sofîgerî û Felsefîyekanî Nalî* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Aras.
- Eebdûlla, X. M. (2008). Şeirekanman Çon Basî Nalî Dekan. *Raman*(130), 62-71.
- Eebdûlrezaq, E.-G. (2003). *Şêx Eebdûlqadrî El-Geylanî* (Yekemîn ed.). (E. Ş. Birahîm, Trans.) Hewlêr: Tefsîr.
- Eebdulselam, N. E. (2010). *Şîkirdneweî Deqî Şeirî le Ruy Zmanewanyewe* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Hacî Haşim.
- Eebid Ei-Letîf, E. M. (2009). *Hec û Eemre* (Pêncemîn ed.). Slêmanî: Sîma.
- Eebid El-Kerîm, M. E. (2008). *Helwêstêk le Ser Hendêk Wşe û Destewaje le Zimanî Kurdîda* (Yekemîn ed., Vol. I). Kerkuk: Zana.
- Eebid El-Rehman, T. E. (2010). *Mewsueey Fiqhî Hec û Eemre* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Roşinbîrî.
- Eebidelhemîd, H. (2013). *Nalî le Rûwangey Sepan Kurdîyewa*. Slêmanî: Bînayî.
- Eedûlla, X. M. (2012). *Ela Ya Eyhaelsaqî û Dwazde Babetîtr*. Hewler: Roj Helat.
- Eelî. (2013, Hawînî). Ew Grêkwêraney le Jyanî Nalîda Nakrênewa. *Koç*, 287-308.
- Eelî, E.-T. (2012). *Aynî Islam* (Yekamîn ed.). (M. E. Behre, Trans.) Slêmanî: Ara.
- Eelî, S. M. (2010). *Peywendî Nêwan Ayîn û Edeb* (Yekemîn ed.). Slêmanî: Ara.
- Eeta, Q. (2006). *Geran be Dway Manakanî Serda*. Slêmanî: Hemdî.
- Eewda, M. E.-Q. (1985). *Tecarib Fî El-Neqid Edebî El-Tetbîqî*. Eeman: Dar Beşîr.
- Eezîz, G. (1975). *Rewanbêjî le Edebî Kurdîda* (Vol. II). Hewlêr: Şarewanî.
- Eezîz, G. (2011). *Hunerî Şeir Eristo* (Duyemîn ed.). Slêmanî: Genc.
- Ehmed, Ç. (2010, Kanunî Dûwemî). Nalî û Çawekanî Hebîbe. *Raman*(152), 110-113.
- Ehmed, H. M. (1995). *El-Şêx Mihemed Bin Eebid El-Wehab El-Meceded El-Miqrî* (Vol. I). Imarat: Dar El-Fetih.
- Ehmed, H. X. (2008). *Sîwak le Nêwan Zanist û Aynda*. (T. E. Behcet, Trans.) Sîma.



- Ehmed, K. M. (2012). *Tefsîrî Raman le Mana û Mebestî QUR -AN* (Sêyemîn b.).
- Ehmedî, M. (2013). *Mehwî le Nêwan Zahîryet û Batînyet û Ser Çawekanî Eîşq û Wêmeî Meeşuqda* (Duyemîn ed.). Hewlêr: Roj Helat.
- Eîzedîn, M. R. (2009). Dû Çamekey Nalî û Salim. *Nalî Her le Lutkedaye*(6), 64-80.
- Elaedîn, S. (1952). *Mêjûy Edebî Kurdî*. Mearf.
- El-Mehtal, E.-S. (2005). *Bexîye Eyzah Liltaxîs El-Miftah Fî Eilum El-Belaxî* (Vol. II). Mektebe Adab.
- El-xeda, I. E. (1998). *El-Camie El-Mesanîd we Sinne El-Hadî Equm Sinne* (Vol. V). (E. Eebilmelîk, Ed.) Beyrut: Dar Xizir.
- Emîn, F. B. (1983). *Encûmenî Edebyat*. Bexdad: Korî Zanyarî Eêraq.
- Eumer, E. M. (2012). *Miştê le Mêjey Earîfî û Kirdey Eîrfanî Mewlena Mehwi* (Yekemîn ed.). Slêmanî: Ezmer.
- Eusman, E. N. (2010). *Dîwanî Nerî*. Slêmanî: Baban.
- Fayz, T. (1990). *Islam we El-Şeir*. Beyrut: El-Fîkr El-Lubnanîya.
- Fehmî, Ş. E. (2009). *Netewe û Dewlet û Aîn le Hzrî Ehmedî Xanî*. Hewlêr: Zankoî Selahedîn.
- Ferhad, Q. K. (2008). *Wêne le Şeirekanî Hemdîda*. D Têz, Zankoî Slêmanî.
- Fiwad, R. (2012). *Deqî Edebî EdgarÇêj Beha* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Aras.
- Gîw, M. (1966). *Dîwanî Edeb* (Sêyamîn ed.). Hewlêr: Hewlêr.
- Hawjîn, S. E. (2009). *Bin Yatî Wêney Hunerî le Şeirî Şêrko Bêkesda*. Slêmanî: Serdem.
- Hebîb, C. (2013, Hawînî). Têramanêk Le Jyannamey Nalî. *Koç*(18-19), 230-234.
- Hejar. (1393). *Dîwanî Melay Cezîrî* (Ewel ed.). Tehran: Daleho.
- Heme, M. (2011). *le Medresey Nalîda* (Yekemîn ed.). Kerkuk: Karo.
- Hemebor, M. M. (2010a). *Dîwanî Kurdî* (Yekemîn ed., Vol. I). Hewlêr: Aras.
- Hemenurî, E. K. (2008). *Şêwaz le Şeirî Kilasîkî Kurdîda* (Yekemîn ed.). Slêmanî: Tîşik.
- Hesen , T. H. (2009). Çend Tabloy Xeyalî le Jyan û Şeirî Nalî. *Nalî Her le Lutkedate*, 367-377.
- Hesen, E.-M. (1999). *Pêşewaî Mirovayatî Mihemed* (Yekemîn ed.). (E. Hemekerîm, Trans.) Slêmanî: Peyv.
- Hîmdad, H. (2007). *Rêbaze Edebîyakan* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Aras.

- Ibin Qeyim, C. (2012). *El-Tib El-Nebewî* (Yekemîn ed.). (H. Nurî, Trans.) Narîn.
- Ibnî Reşîd, E.-E. (1981). *El- Eemde* (Vol. IIIII). Beyrut: Dar El-Cîl.
- Ibrahîm, I. P. (2010, Temuzî). Nalî û Bîrî Komelayetî. *Raman*(158), 114-117.
- Kamil, H. B. (1983). *Rexnesazî Mêjû û Peyrewkirdin*. Bexdad: Korî Zanyarî Eêraq.
- Kamîran, E.-H. E.-D. (2006). *Kurdistan Fî El-Eehid El-Eusmanî Mîn El-qirn Tasiê Eeşir* (Vol. I). Beyrut, Libnan: Dar El-Eerebîye El-Mewsueat.
- Kemal, M. (2003). *Edebyatî Klasîkî u Nwêxwazî Kurdî* (Yekemîn ed.). Slêmanî: Jîn.
- Kurdistan , M. (2006). *Dîwanî Esîrî* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Aras.
- Letîf, H. (2009). *Karîgerî Hiz û Keltûre na Islamyekan le Ser Sofî û SofîgeretîIslamî* (Duyemîn ed.). Saye.
- Marûf, X. (1981). *Nalî le Defterî Nemrîda*. Bexdad: Babil.
- Marûf, X. (2010a). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duyemîn b., Cilt I). Hewlêr: Aras.
- Marûf, X. (2010c). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duyemîn b., Cilt III). Hewlêr: Aras.
- Marûf, X. (2010ç). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Vol. IV). Slêmanî: Aras.
- Marûf, X. (2010d). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duyemîn ed., Vol. V). Hewlêr: Aras.
- Marûf, X. (2010e). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duyemîn ed., Vol. VI). Hewlêr: Aras.
- Mehmud, Z. (2003). *Dîwanî Zîwer* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Wezaretî Perwerde.
- Mehmudî, G. (2009). *Puxtêy Aînî Islam* (Duyemîn ed.). (F. Nurî, Ed.) Aram.
- Mensur, E. N. (1999). *El-Tac El-Camîe li Iusul* (Vol. IV). (F. H. Nurî, Ed.) Bexdad: El-Zeman.
- Meseûd, M. (2010a). *Çepkêk le Gulzarî Nalî* (Sêyemîn ed.). Hawlêr: Aras.
- Mhemed, F. M. (1989). *Zêwer Jyan û Berhemî*. Zankoy Selahedîn.
- Mhemed, H. (2011). *Zimanî Nalî ne Zimanî Paşaye û na Zimanî Reeîyet*. Slêmanî: Kordonya.
- Mihemed, E. A. (2003). *Jyanî Feqêyayetî le Kurdistanda le Sedey 13 û 14 Koçîda* (Yekemîn ed.). Slêmanî.
- Mihemed, E. E. (2009). *Mekey Pîroz* (Yekemîn ed.). (H. Z. Kemal, Trans.) Hewlêr: Rojhelat.
- Mihemed, E. E. (2012). *Pêkhatey Zmanî Şeirî le Rwaney Rexneyî Edebî Nwêwa* (Yekemîn ed.). Hewler: Mukiryani.

- Mihemed, E. H. (2008). *Jyanî Feqê û Dengî Feqê* (Yekemîn ed.). Slêmanî: Şivan.
- Mihemed, E. Q. (1978). *Dîwanî Wefayî*. Bexdad: Korî Zanyarî Kurd.
- Mihemed, E.-R. L. (2005). *Çonêtî Qurbabî Kirdin le Serdemî Pêximberda* (Duyemîn ed.). Slêmanî: Kitêbxaneî Sunne.
- Mihemed, F. Ş. (2009a). *Beheşt le Qur-an û Fermude Sehîhekanda* (Yekemîn ed.). Narîn.
- Mihemed, F. Ş. (2009b). *Dozex le Que-an û Fermude Sehîhekanda* (Yekemîn ed.). Şivan.
- Mihemed, H. (2013). *Edeb û Mêjû* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Mukiryani.
- Mihemed, H. (2014). *Fîraq û Wîsal le Şerî Nalîda*. Çwarçra.
- Mihemed, K. (2015). *Miqarbat we Bihus Fî El-Tesawif El-Miqarîn*. Beîrut: Dar El-Telîee.
- Mihemed, M. (2007, Huzeyranî). le Nêwan Lêkdanewey Wêjewanî û Etîmolojîda. *Zankoî Slêmanî*(20), 81-99.
- Mihemed, M. K. (1979). *Le Rêgey Edeb û Le Pênaw Nalîda*. Bexdad: Korî Zanyarî Kurd.
- Mihemed, M. K. (2009). *Nalî Le Klaw Rojney Şerekanyewe* (Duyemîn ed.). Hewler: Aras.
- Mihemed, Ş. (1991). *Meclîsî Ewliya* (Çwaremîn b., Cilt I-II). Kurdistan.
- Mihemedî, X. (2005). *Ferhengî Xal* (Duyemîn ed.). Hewlêr: Wezaretî Perwarde.
- Mistefa, M. Z. (1382). *Feqê û Feqêyefî le Kurdistan* (Yekemîn ed.). Tehran: Meharet.
- Muhsîn, E. M. (2013). *Beharî Rewan Bêjî* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Narîn.
- Mwefeq, E. K. (1980). *Dîwanî Kanî*. Bexdad: El\*Hewadis.
- Nazdar, E. S. (2010). *Ladan le Şeirî Letîf Helmetda*. M Têz, Zankoy Slêmanî.
- Necmedîn, E. (1369). *Dîwanî Herîq*. Seqiz: Mhemedî.
- Nesrîn, R. I. (2010). *Erkî Şeir le Edebî Kurdîda* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Roj Helat.
- Nîhad, C. H. (2013). *Jyanî Pêximber bo Mindalan* (Sêyamîn ed.). Slêmanî: Kurdistan.
- Qûmrî, S. E. (2002). *Helwêstêk le Şeirî Kurdîda*. D Têz, Zankoy Slêmanî.
- Rêbwar, M. M. (2016). *Nalî û Saykolojîya Şer*. Hewlêr: Roj Helat.
- Rêbwar, S. (2015). *Ktêbî Nalî* (Duyemîn ed.). Hewlêr: Malî Wefayî.

- Salar , E. M. (2013). *Hizrî Felsefî le Şeirî Melay Cezîrîda* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Mukiryani.
- Samî, M. E.-E. (1983). *Islam û El-Şeir*. Koyt: Ealem El-Meerife.
- Sebah, B. (2008). *le Mîhrabî Edebdâ* (Yekemîn ed.). Slêmanî: Çwar Çra.
- Sebah, B. (2009). Peyamî Nalî. *Nalî Her le Lutkedaye*, 116-135.
- Seeîd, N. (1383). *Mektubat Bedîe El-Zeman* (Ewel b.). (R. Y. Farûq, Çev.) Mihart.
- Selam, N. (2014). *Mhemed Pêxember le Şeirî Kilasîkî Kurdî* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Tefsîr.
- Serdar, H. M. (1390). *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî* (Yekemîn ed.). Kurdistan.
- Seyid, S. (2007). *Fîqî Sunne* (Yekemîn ed., Vol. I). (E. B. Hememîn, Trans.) Slêmanî: Roşinbîr.
- Sidîq, B. (1370a). *Mêjûy Wêjey Kurdî* (Ewel b., Cilt I). Tebrîz: Çhir.
- Sidîq, B. (1370b). *Mêjûy Wêjey Kurdî* (Ewel ed., Vol. II). Tebrîz: Çehir.
- Silêman, M. (2008). *Çîrokî Aynîyekan* (Yekemîn ed.). (Q. Luqman, Trans.) Slêmanî: Serdem.
- Sileyman, E. E. (1983). *El-Meecem El-Kebîr* (El-Sanî ed.). (E. E.-S. Hemdî, Ed.) El-Musl: El-Eilum we El-Hekim.
- Slêman, E. M. (1984). *El-Tewzîe Een Tewhîd El-Exlaq fî Cewab Ehil Eêraq* (Vol. I). Rîyaz: Teyîb.
- Şukrîye, R. (1989). *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*. Bexdad: El teelîm Ealî.
- Tehsîn, H. X. (2007). *Dilî û Çaw*. Yad.
- Tofîq, K. (2012). *Karî Gerî Islam le Ser Kelturî Kurdî* (Yekemîn ed., Vol. I). Zana.
- Tofîq, K. (2015). *Karî Gerî Islam le Ser Kelturî Kurdî* (Yekemîn ed., Vol. II). Hewlêr: Roj Helat.
- Xalid, M. X. (2008). *Pyawanê le Dewrî Pêximber* (Duyemîn ed.). (B. Siham, Trans.) Hewlêr: Tefsîr.
- Xanzad, E. Q. (2012). *Zmanî Şeirî Hacî Qadrî Koîy û Mehwî û Şêx Rezaî Talebanî*. Hewlêr: Hacî Haşim.
- Xeyr El-Dîn, W. (2007). *Mesced fî Islam* (Xemse ed.). Eeman: Dar Eserîye.
- Yehya, E.-C. (1964). *Islam we El-Şeir*. Bexdad, Eêraq: Mektebet El-Nehze.

Zana, X. (2012). *Îrotîk le Şerî Nalîda* (Yekemîn ed.). Hewlêr: Aras.

Zekî El-Dîn, E. E.-M. (2010). *Mixteser Sehîh Mislîm* (Vol. I). (F. Nurî, Trans.) Beyrut, Libnan: Dar Ei-Mearîf.



### **Xwe jînenîgarî**

Di 1/8/1980 li Bajêr a Kelar ê hatim dinya yê. Lise ya xwe ji xwendinge yê “Hemrin” qedandiye herwisa lîsansa xwe li Zanîngeha sûlêmanî qedandiye. Niha jî xebat dikim ku lîsansa bilinda xwe li Zanîngehe Yuzuncu yîlê biqedînim....

